

T.C.
MUŞ ALPARSLAN ÜNİVERSİTESİ
SOSYAL BİLİMLER ENSTİTÜSÜ
KÜRT DİLİ VE KÜLTÜRÜ ANABİLİM DALI

Şerif GÜZEL

CAMÎ'EYA RÎSALEYAN Û HÎKAYETAN ADLI ESERDE
SENTAKS İNCELEMESİ

YÜKSEK LİSANS TEZİ

MUŞ-2018

T.C.
MUŞ ALPARSLAN ÜNİVERSİTESİ
SOSYAL BİLİMLER ENSTİTÜSÜ
KÜRT DİLİ VE KÜLTÜRÜ ANABİLİM DALI

Şerif GÜZEL

CAMÎ'EYA RÎSALEYAN Û HÎKAYETAN ADLI ESERDE
SENTAKS İNCELEMESİ

YÜKSEK LİSANS TEZİ

TEZ YÖNETİCİSİ
Prof. Dr. Hasan ÇİFTÇİ

MUŞ-2018

K.T.
ZANÎNGEHA MÛŞ ALPARSLAN
ENSTÎTUYA ZANISTÊN CIVAKÎ
ŞAXA MAKEZANISTA ZIMAN Û ÇANDA KURDÎ

Şerif GÜZEL

LÊKOLÎNEKE SENTAKSÎ LI SER BERHEMA CAMÎ'EYA
RÎSALEYAN Û HÎKAYETAN

TEZA MASTIRÊ

RÊVEBIRÊ TEZÊ
Prof. Dr. Hasan ÇİFTCİ

MÛŞ-2018

SOSYAL BİLİMLER ENSTİTÜSÜ MÜDÜRLÜĞÜNE

Muş Alparslan Üniversitesi Lisansüstü Eğitim-Öğretim Yönetmeliğine göre hazırlamış olduğum “Camî’eya Rîsaleyan û Hîkayetan Adlı Eserde Sentaks İncelemesi” adlı tezin tamamen kendi çalışmam olduğunu ve her alıntıya kaynak gösterdiğimi taahhüt eder, tezimin kâğıt ve elektronik kopyalarının Muş Alparslan Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü arşivlerinde aşağıda belirttiğim koşullarda saklanmasına izin verdiğimi onaylarım.

Lisansüstü Eğitim-Öğretim yönetmeliğinin ilgili maddeleri uyarınca gereğinin yapılmasını arz ederim.

- Tezimin tamamı her yerden erişime açılabilir.
- Tezim sadece Muş Alparslan Üniversitesi yerleşkelerinden erişime açılabilir.
- Tezimin yıl süreyle erişime açılmasını istemiyorum. Bu sürenin sonunda uzatma için başvuruda bulunmadığım takdirde, tezimin/raporumun tamamı her yerden erişime açılabilir.






17.03.2018

Şerif GÜZEL

TEZ KABUL TUTANAĐI
SOSYAL BİLİMLER ENSTİTÜSÜ MÜDÜRLÜĐÜNE

Prof. Dr. Hasan ÇİFTCİ danışmanlığında, Şerif GÜZEL tarafından hazırlanan bu çalışma 02/03/2018 tarihinde aşağıdaki jüri tarafından Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı'nda Yüksek Lisans Tezi olarak kabul edilmiştir.

Başkan	: Yrd. Doç. Dr. Ayhan TEK	İmza : 
Jüri Üyesi	: Prof. Dr. Hasan ÇİFTCİ	İmza : 
Jüri Üyesi	: Doç. Dr. Mehmet Zahir ERTEKİN	İmza : 

NAVEROK

NAVEROK	I
ÖZET	V
KURTE	VI
ABSTRACT	VII
PÊŞGOTIN	VIII
KURTEBÊJE	IX
ÎNDEKSA TABLO	X
DESTPÊK	1

BEŞA YEKEM

KOMA PEYVAN

1.1. RAVEK	8
1.1.1. Vegetandek.....	9
1.1.2. Raveka Navdêrî.....	13
1.1.2.1. Raveka Navdêrî Wek Kirde	19
1.1.2.2. Raveka Navdêrî Wek Pêveber	19
1.1.2.3. Raveka Navdêrî Wek Bireser	20
1.1.2.4. Raveka Navdêrî Wek Têrker.....	20
1.1.3. Raveka Cînavkî	21
1.1.3.1. Raveka Cînavkî Wek Kirde	22
1.1.3.2. Raveka Cînavkî Wek Pêveber.....	22
1.1.3.3. Raveka Cînavkî Wek Bireser	23
1.1.3.4. Raveka Cînavkî Wek Têrker	24
1.1.4. Raveka Hevalnavî	24
1.1.4.1. Raveka Hevalnavî Wek Kirde.....	26
1.1.4.2. Raveka Hevalnavî Wek Pêveber.....	27
1.1.4.3. Raveka Hevalnavî Wek Bireser	27
1.1.4.4. Raveka Hevalnavî Wek Têrker	38
1.1.5. Raveka Hokerî	28
1.1.5.1. Raveka Hokerî Wek Kirde.....	29

1.1.5.2. Raveka Hokerî Wek Pêveber	30
1.1.5.3. Raveka Hokerî Wek Bireser	30
1.1.5.4. Raveka Hokerî Wek Têrker	31
1.1.6. Raveka Jimarnavan	31
1.1.7. Raveka Zincîrîn	32
1.1.7.1. Raveka Zincîrîn Wek Kirde	34
1.1.7.2. Raveka Zincîrîn Wek Pêveber	34
1.1.7.3. Raveka Zincîrîn Wek Bireser	35
1.1.7.4. Raveka Zincîrîn Wek Têrker	36
1.2. COTEPEYV	36
1.2.1. Ji aliyê Wateyê ve	37
1.2.1.1. Cotepeyvên Hemwate	37
1.2.1.2. Cotepeyvên Nêzwate	37
1.2.1.3. Cotepeyvên Dijwate	37
1.2.1.4. Cotepeyvên Têkilhev	38
1.2.2. Ji Aliyê Şiklî ve	38
1.2.2.1. Cotepeyvên Ducarî	38
1.2.2.2. Cotepeyvên Nêzdeng	38
1.2.2.3. Cotepeyvên Hevedudanî	39
1.2.3. Cotepeyv Wek Kirde	39
1.2.4. Cotepeyv Wek Pêveber	40
1.2.5. Cotepeyv Wek Bireser	40
1.2.6. Cotepeyv Wek Têrker	41
1.3. KOMA JIMARNAVAN	41
1.4. KOMA DAÇEKAN	43
1.4.1. Daçek di Nav Kirdeyê de	46
1.4.2. Daçek di Nav Pêveberê de	47
1.4.3. Daçek di Nav Bireserê de	47
1.4.4. Daçek di Nav Têrkerê de	48
1.5. KOMA GIHANÉKAN	48
1.5.1. Gihanekên Ahengîsaz/Gihanekên Koordînasyonê	49
1.5.2. Gihanekên Alîkar/Gihanaekên Subordînasyonê	49
1.5.3. Koma Gihanekan Wek Kirde	51
1.5.4. Koma Gihanekan Wek Pêveber	51

1.5.5. Koma Gihanekan Wek Bireser	52
1.5.6. Koma Gihanekan Wek Têrker	52
1.6. KOMA BANEŞAN.....	53
1.7. KOMA UNWANAN.....	55
1.7.1. Koma Unwanan Wek Kirde	56
1.7.2. Koma Unwanan Wek Pêveber	56
1.7.3. Koma Unwanan Wek Bireser	56
1.7.4. Koma Unwanan Wek Têrker	57

BEŞA DUYEM

HEVOK Ê CUREYÊN HEVOKÊ

2.1. HÊMANÊN HEVOKÊ	58
2.1.1. Ergatîvî di Kurdî de	58
2.1.2. Hêmanên Bingehîn.....	61
2.1.2.1. Kirde.....	62
2.1.2.2. Pêveber.....	66
2.1.3. Hêmanên Talî	72
2.1.3.1. Bireser	72
2.1.3.2. Têrker	77
2.2. CUREYÊN HEVOKÊ	80
2.2.1. Ji Aliyê Wateyê ve Hevok	80
2.2.1.1. Hevokên Ragihandinî.....	80
2.2.1.2. Hevokên Fermanî	81
2.2.1.3. Hevokên Pirsyarî.....	83
2.2.1.4. Hevokên Baneşanî.....	85
2.2.2. Ji Aliyê Pêveberê ve Hevok	86
2.2.2.1. Li Gorî Cureyên Pêveberê	86
2.2.2.1.1. Hevoka Navdêrî	86
2.2.2.1.2. Hevoka Lêkerî	90
2.2.2.2. Li Gorî Cihê Pêveberê	93
2.2.2.2.1. Hevoka Rêzî	93
2.2.2.2.2. Hevoka Nerêzî	94
2.2.3. Ji Aliyê Avasaziyê ve Hevok	95
2.2.3.1. Hevokên Xwerû	96

2.2.3.2. Hevokên Hevedudanî	97
2.2.3.2.1. Hevokên Hevedudanî yên Serbixwe	98
2.2.3.2.2. Hevokên Hevedudanî yên Pevgirêdayî	101
2.2.3.2.2.1. Pêwendiya Lihevkirin û Guncanîtiyê	102
2.2.3.2.2.2. Pêwendiya Wekhevî û Bijartinê	102
2.2.3.2.2.3. Pêwendiya Veguherîna Birêzî	102
2.2.3.2.2.4. Pêwendiya Dijayetî, Berevajîti an Îstîsnaî	103
2.2.3.2.2.5. Pêwendiya Rêza Periyodîk	103
2.2.3.2.2.6. Pêwendiya Erênî û Neyînî	103
2.2.3.2.2.7. Pêwendiya Hevpar di Neyîniyê de	104
2.2.3.2.2.8. Pêwendiya Hevpar di Erênî de	104
2.2.3.2.2.9. Pêwendiya Sedemî	104
2.2.3.2.2.10. Pêwendiya Encamî	105
2.2.3.2.3. Hevoka Alîkar û Cureyên Wê	105
2.2.3.2.3.1. Hevoka Alîkar a Demê	106
2.2.3.2.3.2. Hevoka Alîkar a Armanc/Mebestê	106
2.2.3.2.3.3. Hevoka Alîkar a Sedemî	107
2.2.3.2.3.4. Hevoka Alîkar a Mercî	107
2.2.3.2.3.5. Hevoka Alîkar a Dijberiyê	108
2.2.3.2.3.6. Hevoka Alîkar a Rêje û Hejmarê	108
2.2.3.2.3.7. Hevoka Alîkar a Hevalnav	109
2.2.3.2.3.8. Navdêrandina (nominalization) Hevoka Alîkar	109
ENCAM	111
ÇAVKANÎ	115
PÊVEK 1	116
PÊVEK 2	118
KURTEJIYAN	210
ÖZGEÇMİŞ	211

ÖZET

YÜKSEK LİSANS TEZİ

CAMÎ'YA RÎSALEYAN Û HİKAYETAN ADLI ESERDE SENTAKS İNCELEMESİ

Şerif GÜZEL

Tez Danışmanı: Prof. Dr. Hasan ÇİFTÇİ

2018, 221 sayfa

Bu çalışmada yaklaşık yüz elli yıl önce kaleme alınan Camîya Rîsaleyan û Hikayetan adlı eser cümle bilgisi (sentaks) açısından incelenmiştir. Bu amaçla eserin sahip olduğu dil özellikleri sözdizimi yönüyle ortaya çıkarılmıştır.

Eser iki bölümden oluşmaktadır. Birinci bölümü kelime gruplarından olan tamlama grubu, ikileme, edat grubu, zarf grubu, bağlaçlar, ünlem ve unvan grubu oluşturmaktadır. Bu bölümde eserden örnekler verilerek açıklamalar yapılmıştır.

İkinci bölümde ise cümle, öğeleri ve türleriyle beraber yine eserden örneklerle izah edilmiştir. Cümle türleri anlamına, yapısına ve yüklem durumuna göre sınıflandırılmıştır.

Son olarak eserin sözdizimi özellikleri, cümle kurulumları, kelime gruplarının cümle öğelerindeki konumu gibi elde edilen bulgular maddeler halinde belirtilmiştir.

Anahtar Kelimeler: Mela Mehmûdê Bazîdî, Kırk Öykü, Kelime Grupları, Sözdizimi.

KURTE
TEZA MASTIRÊ
LÊKOLÎNEKE SENTAKSÎ LI SER BERHEMA CAMÎ'EYA RÎSALEYAN Û
HÎKAYETAN

GÜZEL, Şerif

Şêwirmend: Prof. Dr. Hasan ÇİFTCİ

2018, 221 Rûpel

Di vê xebatê de me hewl daye ku em berhema bi navê Cami'eya Risaleyan û Hikayetan ji aliyê hevoksaziyê ve binirxînin, da ku bê dîtin ku zimanê vê berhema ku sed û pêncî sal berê hatiye nivîsîn ji aliyê peyvrêziyê ve çi reng taybetiyan di xwe de dihevine.

Xebat ji du beşan pêk tê. Di beşa yekem de koma peyvan wek ravek, cotepeyv, koma jimarnavan, daçek, gihanek, baneşan û unwan hatine behskirin, yek bi yek rol û erka wan ya di hevokê de bi mînak ve hatine ravekirin û ji berhemê mînak hatine dayîn.

Di beşa duyem de jî hevok digel hêman û cureyên xwe ve hatine dahûrîn. Cureyên hevokê jî ji aliyê wate, pêveber û avasaziyê ve hatine dabeşkirin. Mînak bo van mijaran jî di xebatê de hatine dayîn.

Di dawiyê de jî encamên xebatê hatine destnîşankirin; taybetiyên rêzepeyvan di hevokê de, hêmanên hevokê û wek koma peyvan hêmanên hevokê digel erk û taybetiyên wan xal bi xal hatine nivîsîn.

Peyvên Sereke: Mela Mehmûdê Bazîdî, Çil Hikayet, Koma Peyvan, Hevoksazî.

ABSTRACT
MASTER'S THESIS
SYNTACTIC ANALYSIS OF CAMÎ'EYA RÎSALEYAN Û HÎKAYETAN
Şerif GÜZEL
Advisor: Professor Dr. Hasan ÇİFTÇİ
2018, Page: 221

In this study, Camîeya Rîsalayan û Hikayetan which had wroten about a hundred fifty years ago has been examined in terms of syntax. For this purpose, linguistic features that the work possesses has been revealed.

The work consists of two parts. The first part consists of the verbal group, the preposition group, the adverbial group, the conjunctions, the exclamation and the title group from the vocabulary groups. In this section, explanations are made by giving examples from the work.

In the second part, with sentence items and genres, it is explained with examples from works. Sentence types are classified according to the meaning, structure and condition of the predicate.

Finally, the syntactic features of the work, sentence setups, the position of the word groups in the parts of speech are briefly listed in the form of findings.

Key Words: Mela Mehmuda Bazîdî, Forty Stories, Word Groups, Syntax.

PÊŞGOTIN

Ev xebat dixwaze hevoksazî (ristesazî/sentaksa) berhema bi navê Cami'eya Risaleyan û Hikayetan Bi Zimanê Kurmancî vekole da ku cudahî û taybetiyên wê li gor kurmanciya niha tespît bike. Lewra hevoksazî/sentaksa mijareke ji mijarên zimannasiyê ye ku vekolîna peyvrêziya zimanan ji xwe re dike armanc.

Berhem ji çil hîkaye û sê gotaran pêk tê ku tê de behsa çend helbestvanên kurd, nav û hejmara qebileyên ekra dan dike û babetên curbicur ên wek çîrokên gelêrî û serpêhatî hene. Me xebata xwe li ser çil çîrokên vê berhemê sînordar kiriye. Orijinala vê berhemê bi xeta erebî ye. Ji ber vê yekê latînzekirina berhemê ya ku ji terefê Ziya Avcî ve hatiye kirin, ji bo vê xebatê wek metna lêkolînê hatiye qebûl kirin.

Xebatên sentaksî li Tirkiyê li ser kurmanciya bakur gelek kê m in. Vê rewşê wek astengiyekê qada xebata me teng dikir. Her çend pirtûkên rêzimanê hebûn jî hin ji wan behsa sentaksê nakin hin ji wan jî bi çend rûpelan mijarê derbas dikin. Bi vî awayî ev xebat dibe yek ji wan xebatên ewil yê n ku nemaze li ser sentaksa berhemeke kurmancî hatiye kirin. Me hêvî heye ku wek mînak bê dîtin ji bo xebatên bi vî rengî û di nav rêzexebatên rêzimanê de cihê xwe bigire.

Di serî de ez ji şewirmendê xwe mamoste Prof. Dr. Hasan ÇİFTÇİ re spas dikim ku ji destpêkê heta dawiyê alîkariyeke mezin da min. Her wiha spas ji mamoste M. Zahir ERTEKİN û mamoste Hemin Omar AHMAD re jî ku bi nêrînên xwe rê li ber min vedikirin. Digel wan mamoste Zafer ATLI, mamoste Ömer DELİKAYA jî helbet di nav vê xebatê de xwedî kedeke giran in ku em dixwazin spasîyên xwe ji wan re jî bişînin.

Axir du kesên din jî hene ku nabe ku ez navên wan li vir nebêjim. Ne li ber çav bûn lê bi hebûna xwe motîvasyon û enerjîya xebatê geş dikirin û sebreke mezin nişan didan. Spas ji Mîrze û diya Mîrzeyî Handan Xanimê re.

Her wiha spasî ji bo Mikail Bülbul re û ji bo wan kesên ku me navên wan li vir nenivîsîne lê bi ked û dema xwe û bi fikr û xema xwe piştgirî dane û beşdarî vê xebatê bûne.

KURTEBÊJE

AMD : Amadekar

HWD : Her wekî din

QR : Qertaf

R : Rûpel

RZ : Rêziman

TDK : Türk Dil Kurumu

VQ : Veqetandek

WEŞ : Weşanxane

ÎNDEKSA TABLO

Tablo 1.1. Veqetandeka Binavkirî (Diyar)	12
Tablo 1.2. Veqetandeka Nebinavkirî (Nediyar)	13
Tablo 1.3. Raveka Navdêrî ya Binavkirî (Diyar)	17
Tablo 1.4. Raveka Navdêrî ya Nebinavkirî (Nediyar)	17
Tablo 1.5. Raveka Cînavkî	21
Tablo 2.1. Cînavk	58
Tablo 2.2. Cînavkên kesane ji bo lêkerên Negerguhêz	59
Tablo 2.3. Cînavkên kesane ji bo lêkerên gerguhêz.....	59
Tablo 2.4. Biresera Pirjimar di Lêkerên Gerguhêz de di Dema Borî de	60
Tablo 2.5. Kopula (Lêkera alîkar/Lêkera bûn)	68
Tablo 2.6. Pêveberên hevokên navdêrî di Kurdî de van qertafan werdigirin	88

DESTPÊK

Ziman, pergaleke civakî û zindî ye ku nîrxên jiyane wek adad û kevneşop, çand û huner, folklor û hafîzeyaya civakî û hwd çî bi devkî çî bi nivîskî jî nîfşekî derbasî nîfşekî din dike. Ziman jî ber ku heyîneke zindî ye bi demê re qaîdeyên wê tene guhertin. Gelek sedem jî bo vê yekê dikare bêne vegotin; wek sebebên erdnîgarî, herêmî, siyasî, tîkiliyên bi zimanên cîranan re û hwd. Ji ber vê hindê heman ziman herêm bi herêm cudahiyan û taybetiyan di nav xwe de dihevine.

Hevoksazî (ristesazî/syntax) hewl dide ku van cudahiyan derxe holê. Hevoksazî dixwaze peyvîziya ziman, tîkiliya hemanên hevokê û cihê cureyên peyvî û destebêjeyan di nav hemanên hevokê de rave bike. Her wiha hevoksazî çawa zimanan dide ber hev bi heman awayî di nav zimanekî de varyantên vegotinên devkî û nivîskî jî tespit dike. Ji ber vê yekê xebatên sentaksî hewcehî bi materyalên devkî û nivîskî hene.

Di edebiyata kurdî de serdema klasîk jî aliyê pexşanê ve lawaz bû. Em dikarin behsa sê pirtûkan bikin heta dewra Mela Mehmûdê Bazîdî. Du heb li ser rêzimanê ne û ya din jî li ser tîbbê ye.

Ji wan berheman ya rêzimanê yek jê muellîfê wê Eliyê Teremaxî ye ku li gor Bazîdî ew di sala 1000ê koçî de ku beramberî tarîxa 1509ê zayînî tî nivîsiye. Ev berhem li ser gramera zimanê erebî ye, Bayezîdî vê berhemê bi zimanê kurdî nivîsiye û di destpêka wê de wiha dibêje:

“Ji tarîxa hezarê koçî bi şûn ve li gundê Teremaxê qeza Miksê jî qezayên Hekariyê melayek bi navê Mela Eliyê Teremaxî hebû gelekî jîr û zana bû û ketibû pey bidestxistina zanîne û demeke dirêj li Bexda û Mûsilê û Behdînan û Soran maye û geriyaye û xwendiyê heta ku di zanîna serfê de gelekî navdar bûye û heta niha nav û nîşanê wî di Kurdistanê de hene. Wî di nêva gund de mizgeft û medrese ava kirine û demekê ders gotiye. Ji bo xwendekaran kitêbeke serfa erebî bi zimanê kurmancî nivîsiyeku gelekî hatiye pejiwandin di nav wan de.” (Dost, 2012: 24)

Di warê pexşanê de berhema duyem jî ya Mele Yûnisê Helqetînî ye. Ew jî rêzimana erebî bi zimanê kurmancî nivîsiye. Ev kitêb di sala 1785an de li Stokholmê bi navê *Terkîb û Zurûf* ê jî nav weşanên Sarayê derket. (Dost, 2012: 24) Destpêka Zurûfê jî wiha ye:

“Tu bîzan! Hingî eşyayê di dinyayê de hene zerf yan xeyrê zerf in. Zerf jû munqesimê li du qisman: Zerfê heqîqî, yan zerfê mecazî. Zerfê heqîqî hulûla halekî yede mehelle xwe da. Wekî niha zeman û mekan dibêjî.” (Adak, 2015: 307)

Pirtûka sêyem ji aliyê mijarê ve cuda ye. Ev pirtûk li ser tîbbê ye. Nivîskarê vê berhemê Mela Mihemedê Erwasî ye, tarîxa nivîsîna wê li derdora 200 sal bere nivîsiye. (Dost, 2012: 24) Di berhemê de mirov dikare derheqê navên nexweşiyên, derman û nîşaneyên wan aliyên dermana yên nerênî û parêzê de agahiyan bibîne. Bo nimûne navên hin nexweşiyên ev in: Ba, bawesîr, birin, êşa diranan germiya bedene, gezkirina mar û dûpişkê, qolinc û hwd. (Adak, 2015: 309)

Di edebiyata kurdî de di warê pexşanê de bi vî awayî rola Mela Mehmûdê Bazîdî gelek girîng e, ku di sedsala nozdehan de seyra pexşannûsiyê guherandiye. Wî di warê pexşanê de gelek berhem li dû xwe hiştine.

Bazîdî li pey xwe 57 berhem hiştine (Pîrbal, 2000: 5). Di nav berhemên Bazîdî de ferheng, çîrok, rêziman, adat û folklorê kurdan û hwd. mijarên curbecur hene. Li jêrê navê van pirtûkan digel naveroka wan bi kurtasî hatiye dayîn.

Şerefname

Mela Mehmûdê Bazîdî yekem kes e ku cara ewil cîlda Şerîfnameya Mîr Şerîf Xanê Bedlîsî ji orijînalê wê ya Farisî wergerandiye li ser zimanê Kurdî lê wergera hin beşan nehatiye kirin. Di sala 1858an de wergera vê berhemê temam kiriye (Avcı, 2010: 14). Berhem ji aliyê Seîd Derêşî ve bi navê “Şerîfnameya Şerîfxanê Bedlîsî Tercumeya Mela Mehmûdê Bazîdî” di nav weşanxaneyên Spîrezê de li Dihokê hat çapkirin (Adak, 2015: 342)

Kitaba Tewarixê Cedîdê Kurdistan

Ev kitêb ji aliyê Mela Mehmûdê Bazîdî ve hatiye nivîsandin yanî telîf e lê mixabin wînda ye (Avcı, 2010: 15).

Adat û Rusumaetnameê Tewayîfê Ekradiye

Ev pirtûk jî ji aliyê Bazîdî ve hatiye nivîsandin, yekem lêkolîna civaknasî, etnografî ya li ser Kurdan e û bi Kurdî/kurmançî hatiye nivîsandin (Avcı, 2010: 17). M. B. Rûdenko di sala 1963an de li Moskowayê bi rûsî diweşîne. Şikriyê Resûl jî ji rûsî

werdigerîne kurdiya soranî û di sala 1982an de li Bexdayê çap dike. Di sala 1998an de li Stenbolê ji weşanxaneya Periyê wergera wê bi tirkî çap dibe. Jan Dost di sala 2010an de kurdiya wê ji weşanxaneya Nubiharê derxist (Adak, 2015: 341).

Ferhenga Kurdî-Fransizî (Dictionnaire Kurde-Francais)

Mela Mehmûdê Bazîdî di nivîsîn û amadekirina ferhenga Kurdî-Fransizî de alîkariyeke gelek mezin daye A. Jaba û bi hev re ferhengê derxistine. Kurdiya wê bi herfên erebî ne (Avcı, 2010: 17).

Ferhenga Kurdî ya Diyalekta Hekarî û Rewendî

Hejmara rûpelên vê pirtûkê 49 in. Di her rûpelê de 13 rêz hatine nivîsandin. Mela Mehmûdê Bazîdî pêşgotinek ji vê pirtûkê re nivîsiye (Avcı, 2010: 17).

Ferhenga Kurdî-Rûsî-Fransizî û Rûsî- Fransizî-Kurdî

Ev kitêb nehatiye çapkirin û li akademiya Zanistî ya Petersbûrgê ye. Alîkariya Bazîdî ji bo A. Jaba di vê berhemê de heye (Avcı, 2010: 18).

Deqên Pexşan yê Mesnewiyên Klasîk

Bazîdî gelek evînî yê klasîk bi terzê çîrok û pexşanan ji nû ve nivîsandine. Hinek ji wan ev in: Mem û Zîn, Yûsif û Zeliyxa, Leyla û Mecnûn, Şêxê Sen'an, Bersîsê Abid, Qewlê Hespê Reş (Adak, 2015: 342).

Rêzimana Erebi

Ev pirtûk a Elî Teremaxî ye. Bazîdî ji nû ve bi rêkûpêk nivîsandiye û pêşgotinek jê re amade kiriye (Avcı, 2010: 18). Berhem bi “î’lem tu bizan”ê dest pê dike, pîştî sermijara “Îsmutt’rîf û Beyana wê” derbasî feslan dibe. 31 yek fesil hene. 14 ji wan derbarê gramera erebî, 3 ji wan derbarê gramera farisî, 6 ji wan berawirdkirina gramera her sê zimanan, 7 ji wan berawirdkirina farisî û kurmancî, 1 ji wan jî fesla xetmulkîtabê ye. Bi gotina Teremaxî: “Zikrê serfa ‘erebî û farisî û kurmancî digel yekûdu hatiye kirin.” Di berhemê de 14 beş bi aweyek ji awayan behsa rêzimana kurdiya kurmancî dikin in. Ev jî têr dikin ku mirov berhemê wekî bingeha rêzimana kurdiya kurmancî bi nav bike (Üneşi, 2016: 34).

Cami'eya Risaleyan û Hikayetan

Ev berhem di sala 1860î de hatiye nivîsîn. Navê vê berhemê digel wergera wê ya fransî ya ku ji layê A. Jaba ve hatiye kirin ji terefê P. Lerch ve bi kurdî bi navê *Cami'eya Risaleyan û Hikayetan* di arşîva Petersburgê de cihê xwe digire (Pîrbal, 2000: 5; Avcı, 2010: 18). Brhem li Petersburgê bi navê “Recueil de Notices et Recits Kourdes” hatiye çapkirin. Piştê bi navê Çîrokên Kurmancî ji aliyê Weşana Çanda Nûjen ve li Stocholmê hat çapkirin (Adak, 2015: 341).

Berhem ji sê meqale û çil çîrokan pêk tê. Navê gotaran bi vî şiklî ye: “Beizê Eşaîr û Qebaîl û Taîfeyed Kurdîstanê”, “Navên Mêr û Jinên Kurmancan” û “Behsa Şaîr û Musenefên di Kurdîstanê”. Ev beş berî çil çîrokan tê. Di van gotaran de behsa hejmar û malbatên eşîran, navên kurmancî çi jin çi mêr û çend helbestvanên kurd hatiye kirin.

Çîrokên vê berhemê ji layê Bazîdî ve hatiye nivîsîn û berhevkin. Jaba jî bi mebesta ku vê arşîva ku ji destxetan pêk tê tomar bike û bişîne Rusyayê (St. Petersburg) têkilî bi Bazîdî re datîne û wî ji xwe re wek mamoste, rênîşander û rêheval dibîne. (Öztürk, 2017: 44)

Heçî çîrok in ew jî hin meselokên gelêrî, serpêhatî, hikayetên dîrokî û derb-i mesel in. Di heman demê de çîrokên ku em ê li serê bixebitin di nav vê berhemê de ne.

Derheqê jiyana Bazîdî de agahiyên li ber dest, pir zêde nîn in. Lê bi saya berhemên wî û hevalê wî Jaba em dikarin gelek tiştan hîn bibêjin.

“Dema dibêjin agahiyên zêde, yanî li ku xwend, mamosteyên wî kî bûn, dê û bavê wî, malbata wî. Gera wî ji bo zanîne û detayên din ên jiyane ku mixabin hemû klasîkên me jê bêpar in. Jiyana Bayezîdî jî eger ne agahiyên heval û şagirdê wî A. Jaba bûya dê ne ewqasî zêde bûya. Peter Lerch nivîseke xwe de çêrî nameyeke Jaba dibe ku ji Lerch re di êlûna 1857an de şandiye. Ew di nameye de dibêje ku temenê Mele Mehmûd 60 sal in. Ev jî dide xuyakirin ku Mele Mehmûd di sala 1797an de ji dayik bûye.” (Dost, 2012: 15)

Derheqê perwerdehiya wî û sebaba çûyîna wî ya Erziromê de Avcı van agahiyan dide:

“Mela Mehmûdê Bazîdî, di sala 1797an de (di hinek çavkaniyan de 1799) li Bazîdê hatiye dinê. Li eynî ciyê dest bi xwendina medreseyê kiriye. Piştî temamkirina xwendina xwe, çûye Tewrîzê û hînî farisî bûye. Dû re vegeriyaye bajarê xwe û dest bi seydatiyê kiriye. Lê ji ber sedemên pevçûnekê biryara dûrketina ji bajarê xwe dide. Seydatî û melatîyê li Erziromê didomîne û li vir bi cih dibe. Ji rewşa Bazîdî û ji têkiliyên bi derdora wî re em fehm dikin ku yekî digel malbata xwe payebilind bûye.” (Avcı, 2010: 11)

Li Erziromê bi Konsolosê Rûsyayê yê Erziromê rojhilatnas Alexandere Jaba re hevaltî dike. A. Jaba derheqê Bazîdî de wiha dibêje.

...wî ziman û edebiyata farisî, erebî û tirkî jî xwendîye û wan zimanan baş dizane... Ew di nav hevalên xwe de ji hemûyan zanatir bû... Di nava rewşenbîrên welat de jî bi nav û deng û bi qedir bû... Piştî sala 1856an Mela Efendî bû seydayê min û derbarê dîrok, ziman û kultura milletê Kurd de alîkariya min kir. Ew karê ji min re hatibû spartin, yanê hînbûna zimanê Kurdî, min bi saya rewşenbîrê Kurd, Mela Mehmûdê Bazîdî dan hev. Piştê min ew destnivîs ji Akademiya Zanistî ya Petersburgê re şandin... (Avcı, 2010: 12)

Dema babet tê ser navê Bazîdî divê konsolê Erzîrûmê A. Jaba jî pê re bê bilêvkin. Ji ber ku di hemû xebatan de ked û alîkariyeke mezin ya Jabaî jî heye. Lewra Jaba ji Bazîdî berhevkirina çand û kelepura Kurdî dixwast wî jî jê re cem dikir. Piştî derbasî nivîsê dikirin Jaba jî wan berheman hem werdigerandin hem jî ji bo Akademiya Zanistî ya Petersburgê dişandin. Ji ber vê yekê xebat bi piranî bi keda her duyan çêdibûn (Pîrbal, 2002: 32; Avcı, 2010: 14).

Bazîdî kesyetekî qedirbilind û xwedî bandor bû di nav kurdan de. Mîrên kurdan li ser soza wî kemerbeste diman. Di dema şerê ku di navbera Osmanî û Mîrekiya Bedirxaniyan de diqewime, Sultan Evdilmecîd, Mela Mehmûdê Bazîdî dişîne cem Mîr Bedirxan da ku qanî bike û serî li hemberî dewletê raneke.

“Sultan Evdilmecîd, Mela Mehmûdê Bazîdî ji bo ragirtina şer û serhildana li dijî Dewleta Osmanî, dişîne Cizîrê ba Mîr Bedirxan Beg. Dixuye ku nasiya Mîr Bedirxan Beg û Mela Mehmûdê Bazîdî beriya vê bûyerê bi hev re hebûye. Wî wextî serleşkerê Osmanî, Osman Paşa ye û beriya Mele Mehmûdê Bazîdî

biçe Cizîrê ba Bedirxan Beg, wî ji vê çûna xwe û wezîfeya jê re hatiye spartin agahdar dike û jê re dibêje, heta ez cewabekê ji Bedirxan Beg nestînim, gereke hereketa eskerî çênebe, lê dixuyê, Osman Paşa kesekî terefdarê şer e û li hêviya cewaba Mela Mehmûd nasekine û diçe ser Cizîrê. Lê dema ew digihîje wir, dibîne ku amadekariya Bedirxan Beg ji bo şerekî gelek bi rêk û pêk in. Li ser vê, ew ji vê rêkûpêkiyê Mela Mehmûdê Bazîdî tawanbar dike û jê re dibêje, ku wî Bedirxan Beg hişyar kiriye û sirên wan gihandiye Bedirxan Beg. Ji ber vê yekê, Osman Paşa, Mela Mehmûd dide girtin û ew qeyd û lele dike û dişîne Stenbolê. Lê qasek şûnde ew ji aliyê sultan ve tê efûkirin û wî dişînin Wanê” (Avci, 2010: 13)

Em ji vir fehm dikin ku Bazîdî hevçerxê Mîr Bedirxan e û him li Kurdistanê him jî li ber çavê dewleta Osmanî alimekî gelek biqîmet û qedirbilind bûye.

Pîrbal (2000: 11), Bazîdî wek yekemin pexşannûs û çîroknûsê kurd dibîne û dibêje ku Bazîdî ji ber ku ji xelkê şerm dikir navê xwe li ser berhemên xwe nedinivîsî. Lewra Jaba xirîstiyar û ew misilman û mela bû. Pîrbal vê angaştê xwe bi bîranînên Jaba piştrast dike.

Di vê xebatê de berhema bi navê *Cami'eya Risaleyan û Hikayetan* ji aliyê sentaksê ve hatiye dahûrandin.

Hem ji ber tarîxa nivîsîna wê hem ji ber ku yek ji berhemên kevn ên pexşanî ye û hem jî kêmbûna lêkolîn û xebatên sentaksî girîngiya vê xebatê derdixe holê.

Xebata me li ser du beşan ava dibe. Beşa yekem komepeyv (destebêje) û cureyên wê di nav hêmanên hevokê de; beşa duyem jî hevok û cureyên wê bi mînakên ji berhemê rave dike.

Ji bo xebata xwe me ewil lîteratura rêziman û xebatên li ser sentaksa kurdî tespît û berhev kir. Piştî me sînoren naveroka xebata xwe û mijarên wê diyar kir. Li gor mijarên ku hatine tespît kirin me nimûne ji berhemê derxistin û taybetî û cudahiyên wê wek encamên xebatê derxistin holê.

Çavkaniyên vê xebatê yek jê berhema bi navê *Kürtçe Gramerî* ye ku C. Bedirxan û R. Lescot bi hev re amade kirine, ji fransî hatiye wergerandin bo tirkî ku tê de mijara sentaksê di derdora 50 rûpelî de hatiye îzahkirin. Lê mijara hevokên kompleks nehatiye

ravekirin. Ya din pirtûka Samî Tan ya bi navê *Rêzimana Kurmancî* ye. Ew jî di nav 40 rûpelî de digel raweyên pêşkerî û daxwazî mijara sentaksê îzah kiriye. Ji bilî vana berhema bi navê *Cümle Bilgisi I-II* du cilt ya ji layê Zanîngeha Anadoluyê derketiye ku sentaksa tirkî rave dike û berhema *Farsça Dilbilgisi* ya Hasan Çiftci jî du berhemên dîtir in ku di vê xebatê de sûd ji wan hatine wergirtin.

BEŞA YEKEM

KOMA PEYVAN

1.1. RAVEK

Di zimanan de carinan hin rewş, tevger û fikir tenê bi peyvekê an jî bi termekê ve nikarin bêne nimandin û derbirîn. Di rewşeke wisa de çend peyv tên li ba hev, her çiqas jî aliyê şikl û dîtbariyê ve jî hev cihê bin jî, ji bo axêver û guhdaran wateyeke yekgirtî berpêş dikin. Di Kurmancî de ji peyvên bi vî şiklî bi hev ve girêdayî re ravek tê gotin.

Wek: mala ehmedî, pirtûka sor, dibistana min, dara li hewşa we...

Hêmanên ravekê, bi taybet ravekên navdêrî ev in;

raveber + veqetandek + raveker + tewang

Di hin ravekan de cihê raveber û ravekerê diguhere an jî wek raveka hevalnavî raveker tewangê wernagire. Dabeşkirina ravekan li gorî Tan bi vî şiklî ye:

- a. Ravekên Navdêran
- b. Raveka Hevalnavan
- c. Raveka Cînavkan
- d. Raveka Hokeran
- e. Raveka Zincîrî (2015: 325)

Her çiqas li vir pênc cureyên ravekan şîrove kiribe jî lê di mijara "Jimarnavan" de wek bi sernavê "raveka jimarnavan" behsa ravekeke din jî dike (Tan, 2015: 213).

Yıldırım ravekê wiha îzah dike: "Bi mebesta tamamkirina wateyê bihev girêdana peyvekê bi peyveke din re wek ravekê tê binavkirin." (2012: 56) Û ravekan wiha dabeş dike;

- a. Raveka Navî
 - i. Raveka Navî ya Diyar
 - ii. Raveka Navî ya Nediya
- b. Raveka Hevalnavî
- c. Raveka Cînavî
- d. Raveka Hokerî
- e. Raveka Zincîrî

Li vir divê em behsa veqetandek û tewangê bikin. Lewra di Kurmancî de raveber û raveker li gorî veqetandek û tewangê qertafê ji hev cuda digirin. Detayên ravekan dê di cureyên ravekan de were îzahkirin. Berî îzah û şîroveya ravekan digel taybetiyên xwe divê em behsa veqetandekan bikin. Lewra ravek bi veqetandekan bi hev ve tîr girêdan.

1.1.1. Veqetandek

Veqetandek (izafe eki/harf-i tarif), raveber û ravekerê bi hev ve girê dide. Li gorî zayend û mêjerê sê awayên veqetandekê hene. Wek herfa îzafeyê jî tê zanîn.

Derheqê vê mijarê de kesên ku li ser rêzimanê xebitîne wiha dibêjin:

Tarîfa Tan ji bo veqetandekê ev e: “Di kurmancî de du peyv bi alîkariya hinek qertafan bi hev ve tîr girêdan anku tîr îzafekirin, ji wan qertafan re veqetandek (zêder) tê gotin. Bi riya veqetandekê tiştê ji yêr din ji aliyê zayend û mêjerê ve tê veqetandin.” (2015: 95) Veqetandekê wek bêjeyê serbixwe dipejirîne û di vê nêrîna xwe de xwe dispêre Celadet Bedirxanî ku ew di Hawarê de kok an jî jêdera veqetandekan digihîne cînavan (pronav).

“Gramêra frensizî dibêje ko zmanê frensizî veqetandekên xwe ji pronaveke latînî girtine. Gelo me yêr xwe, ev bêjeyên hûr, ji kû girtine? Li gora tedqîqatên ko heta niho min çêkirine, me jî veqetandekên xwe ji hin pronavan girtine, lê ne ji pronavine biyanî, ji pronavine xwe.

Belê, veqetandekên me ên binavkirî ji pronavine me ên îşarkî bi der hatine. Herwekî pêşdetir dê bête gotin « yê, ya, yêr » pronavine îşarkî ne û veqetandekên me ên binavkirî ji wan hatine pê. Di esl û bingehê de gava ev pronav diketin pêşiya navdêrekê û dibûn rengdêrîne îşarkî« di » yek diket navbera wan û navdêrê. Mesela gotina «Hespê Soro » di eslê xwe de « Hespê di Soro » ye. (Hawar, cild 2: 839)

Kurdo ji bo veqetandekê peyva hevbendiyê bikar tîne û li ser erka vê peyvê wiha dibêje; “Zimanê kurdî xwedî hinek qertafên hevbendiyê ye ku ji bo nîşandana kategoriyên zayend û mêjer û nasyariyê tîr bikaranîn. Diyalekta kurmancî di qertafên hevbendiyê de dewlemend e û ev awayên wê hene: -a, -ê, -e, -î, -êd, -êt, -ên.” (2013: 81)

Qertafa *-di'yê* ya ku dikeve navbera raveber û ravekerê li her deverê nayê bikaranîn, herwiha forma xwe guheriyê. Bedirxan ji aliyê dîrokê ve qertafa veqetandekê wiha şîrove dike: “Hêmana *-di'yê* ya ku di pêkhateyên modern de cih negirtiye lê di

formên kevn de tê dîtîn di rastiya xwe de daçeka *-di'* yê ye ku di tirkî de beramberî qertafa *-in, -in, -nin, -ninê* tê. Hin rojhilatnas li ser wê fikrê ne ku *-di* ji zimanê aramî hatiye wergirtin.” (2012: 88)

Badıllı: “Du navdêrên ku ji navdêreke bi hevalnav, rader, lêkerhevalnav û cînavkekê ji bo pêwendî û têkiliyeke bi mantiqî werin ravekirin, di kurmancî de peyva ewil bi îlala taybet û ya duyem jî bi îlala tevayî tê îlalkirin.” Îlal artîkela raveber û ravekerê ye.” (1965: 30)

Ciwan ji bo ravekan peyva tarîfkarî bi kar tîne û wiha rave dike; “Wateya peyv an jî komên peyvan ên ku navdêr an jî ji binemala navdêran (cînav, hevalnav) in, heke bi têkiliya wateyên cihêreng re were tamamkirin, jê re ravek an jî kom tê gotin.” Li vir peyva komê em dikarin wek frazan (phrase) bihesibînin. (1992: 175)

Ciwan, ravekan dabeşî sê cureyan dike. Wek peyva reveber (tamlanan kelime), peyva raveker (tamlayan kelime) û partîkela (herfa tarîfê, an artîkel) ku ravekerê bi raveberê ve girê dide. Ravekê li gorî qertafa veqetandek û erka raveber û ravekerê dabeş dike, wek raveka navdêrî û raveka hevalnavî di du sernavan de. Li gorî wergirtina qertafên raveber û ravekerê ji aliyê zayend û mêjerê ve ravekan wek binbabetê ‘*harf-î tarîf*’ û ‘*îlal*’ê difesilîne.

Tan veqetandekê wiha terîf dike: “Di kurmancî de ravek bi alîkariya veqetandekan pêk tê. Ev veqetandek tiştêkî bi taybetiyeke xwe ji tiştên din vediqetînin. Di ravekê de tiştêk ‘*raveker*’ (tamlayan/modifier) e, tiştêk jî ‘*raveber*’ (tamlanan/modified) e. Veqetandek jî dikeve navbera her duyan û wan digihîne hev.” (2015: 325)

Bedirxan erka veqetandekê di çend xalan de wiha rêz dike:

- *Veqetandek bêjeke biçik e ko dikeve paşiya navdêran û pêşiya wan bêjeyên ko li şûna navdêran radibin û wan dinimînin.*

- *Veqetandek carina di pêşiya rengdêran de jî peyda dibin.*

- *Veqetandek bi gelemperî mêjer û zayendê navdêrê şanî didin û navdêr ji wekhevên wê vediqetînin.*

- *Bi pêvebûna veqetandekê navdêr carina binavkirî û carina jî nebinavkirî dibin.*

(2013: 62)

Bi giştî ravek herî kêr ji du peyvên pêk tên û ev peyv jî bi veqetandekê bi hev ve tên girêdan. Qertafên veqetandekan li gor zayend û pirjimariyê diguherin.

Bazîdî ji bo veqetandekan ev qertaf bi kar anîne:

Veqetandekên binavkirî ya

(1) yekjimar û nêr:

Siyahmedê Silîwî (3/40), *destê mirofan* (19/34), *guhê xwe* (23/12), *navê mirinê* (25/14), *kenarê gireyê* (7/3), *gundê Paganê* (8/2)

(2) yekjimar û mê:

tewecuha nasan (15/14), *zilma Şêx Ehmedê Çiplaq* (15/12), *riya Şemas* (8/13), *berayika Şemas* (8/17), *qeza Şaxê* (9/5), *hemama heremê* (14/15)

(3) pirjimarî:

xulamêd bijare (15/23), *mîrofêd Istanbulê* (25/6), *mêrêd bijare* (21/36), *paşayêd Wanê* (21/3), *terefêd Bîngolê* (13/14), *çavêd we* (23/14)

Veqetandeka nebinavkirî ya

(4) yekjimar û nêr:

çiplekî mirofan (19/36), *şûlekî nelayiq* (11/11), *kesekî efrencî* (38/4), *camêrekî meşhur* (40/28), *şermekî mezin* (5/25), *mîrofeke maqûl* (12/18)

(5) yekjimar û mê:

maleka qewî zêde bervekirî (37/61), *tayfeyeka leşkerê Romiyan* (40/1), *keçeka Kirêt* (12/16), *keleka asê** (34/1), *çek û silah alateke herbê* (5/22), *şûleke min* (6/13), *qîzeke qewî zêde rind* (8/2), *qewî saetêke qenc e* (10/29)

* Di mînaka *keleka asê* (34/1) de rayek *kele* ye lewma divê ev ravek wiha bûya; *keleyeka asê*. Ji ber ku qertafa nebinavkirî *ek* li rayekê zêde dibe û heke tîpeke bêdeng hebe tîpa kelijandinê dikeve navbera rayek û qertafa nebinavkiriye. Lê di vê mînakê de ku me ji pirtûkê wergirtiye ‘e’ ya dawî ya rayekê(kele) û tîpa kelijandinê ketine.

kel+ek+a (kele+y(h)+ek+a) > rayek+tîpa kelijandinê+qertafa nebinavkirî+veqetandeka mê

Em dibînin ku di veqetandeka nebinavkirî de ji bo qertafa ‘mê’tiyê carinan ‘e’ carinan jî ‘a’ tê bikaranîn. Ji bilî van mînakên di hin ravekan de ji bo veqetandeka mê qertafa ‘ê’ jî hatiye tespîtkirin.

(6) Wek mînak;

Keçekê Tîmur Paşa (13/2), *hemamekê biçûk* (14/19), *varêlekê barut* (16/14), *yalekê serayê* (16/16), *malekê tîr û tijî* (17/5), *kêrekê firengî* (19/22), *odeyekê meclîsê* (19/24), *eşîrekê Sipkan û Heyderan* (20/1), *jinekê xwe yê sipehî* (26/1), *qawekê giran* (30/30), *kelekê xerabe* (37/9).

Bazîdî li ser zayenda veqetandeka mê ne li ser standardekê ye. Ji xwe berhem di gelek cihan de bi rengê zimanê axaftinê xwe nîşan dide.

(7) pirjimar;

mirofîne me'ruf (26/30), *tiştîne spehî û nadîde* (38/6), *hespine wan* (40/71)

Veqetandeka nebinavkirî ya pirjimariyê nebinavkirina xwe ji ‘hin’ê werdigire. Lewra ev ‘hin’ carinan li pêşiya peyvê jî bi cih dibe. Lê belê mînakên bi vî rengî di vê berhemê de a ku em li ser dixebitin, nehatin dîtin. Bi giştî veqetandekên ku di berhemê de hatine bikaranîn di tabloya li jêr de hatiye destnîşankirin.

Tablo 1.1. Veqetandeka Binavkirî (Diyar)

	veqetandek
Yekjimar mê	a
Yekjimar nêr	ê
Pirjimar	êd

Tablo 1.2. Veqetandeka Nebinavkirî (Nediyar)

	Qertafa nebinavkirî	veqetandek
Yekjimar mê	ek	a/e/ê
Yekjimar nêr	ek	î
Pirjimar	in	e

1.1.2. Raveka Navdêrî

Di kurdî de hemû ravek bi veqetandekê bi hev ve tên girêdan. Ravek ji raveker û raveberê pêk tê. Di raveka navdêrî de him raveber û him jî raveker navdêr in.

Mînak: pelên darê → navdêr + navdêr

Kesên li ser êzimanê xebitîne vê mijarê wiha rave dikin:

Tan: “Di raveka navdêran de hem raveber hem jî raveker navdêr in. Raveker di rewşa tewandî de ye. Bo nimûne di raveka ‘riya bajêr’ de navdêra ‘bajar’ navdêra ‘rê’ rave dike û tewandiye” (2015: 325).

Ciwan: “Raveka hem raveber hem jî ravekera wê navdêr be ew dibe raveka navdêr.” (1992: 175) Ciwan wek du binbeşan vê mijarê (raveka navdêrî ya binavkirî û raveka navdêrî ya nebinavkirî) bi berfirehî îzah dike û ji bo ravekê peyva ‘*tarîfkari*’ yê bi kar tîne.

Zaxoyî behsa *amrazên* (article) *şêş karî* dike ku ji vana ya yekem û ya sêyem bi raveka navdêrî re têkildar e. Zaxo, amrazên *şêş karî* yên ku peywendiyê pêk tînin wiha rêzdike;

(8)

Ê: bo kitek nêr → hevalê Ehmedî

A: bo kitek mê → hevala Ehmedî

Ên (êt, êd): bo koma a nêr û meyan → hevalêd Ehmedî (2009: 19)

Kurd: “Zêder (Harf-i tarîf), pirsek piçûk e, dikeve navbera du navan, yan navek û rewşekê ji bo ku wan bi hev bide girêdan û babet û tibaba wan bide zanîn” (1956: 44). Kurd di babeta harf-î tarîf de ku ew wek zêderê bi nav kiriye exleb li ser zayend û pendî û nependîya wan rawestiyaye. Dîsa di raveka navdêrî de behsa avêtina zêderê dike ku dema ew ji nava raveker û raveberê rabe êdî wek navdêreke hevedudanî bi hev ve tên girêdan.

Kurd van mînakên dide;

guhê ker → guhker → kerguh

masiyê mar → masîmar → marmasî(1956: 46)

Li vê derê mirov dikare behsa çend qaliban bike ku di berhemê de cih girtine.

(9)

a. *erkandewletan* (10/5)

b. *erkandewlet* (28/34)

c. *dewletduşkunî* (6/1)

Di peyva *a* û *b* yê de li gor raveka navdêrî divê bi vi şiklî bûya;

(10)

a. *erkanên dewletê*

b. *erkanê dewletê*

Di *a*) yê de raveber (erkan) di cihê xwe de maye û raveker (devlet) jî pirjimara *erkanê* wek tewangê li *dewletê* barkiriyê (*erkandewletan*). Wate *erkandewlet* wek qalibeke nû yekser bi hev ve hatiye girêdan û bûye navdêr. Ji ber vê yekê pirjimar li dawîya peyvê hatiye nivîsîn. Çunku li vir qest ji pirjimariyê ne dewlet e.

Di *b*) yê de ji xwe raveka me yekjimar e. Ew jî mîna *a*) yê bûye peyveke hevedudanî yanî ravek bi temamî êdî wek navdêrekê ye, veqetandek û tewang dikeve.

Her wiha di *c*) yê de jî mîna *a*) û *b*) yê ravek bûye peyveke hevedudanî lê li gorî qaliba tirkî. Belam tewang yekjimar e û xwe parastiyê.

Li gor Badillî (1965: 35) ravek dema ku bi peyvên wek *ser*, *ber*, *pêş*, *paş* û *xwedî* dest pê bike meyla wê li ser navdêr an jî hevalnava hevedudanî ye. Raveka *serê gir* dibe *sergir*; *berê kayê* dibe *berka*.

Ji bo vê em dikarin ji pirtûkê mînakên wiha bidin:

(11)

serxweşiya wan (26/30), *serêvarî* (31/28), *serkol* (36/7), *berderî* (5/21)

Badıllı (1965: 26) ji bo mijara ravekan terma *îlalê* bikar tîne. Piştî ravekirineke berfireh bo ravek û cureyên wê li ser wateya ravekan radiweste û ravekan ji aliyê wateyê ve disenifîne.

Li gor Badıllı (1965: 26), ravek dema ji du navdêran pêk bê ji aliyê wateyê ve wiha dabeş dibin

a) Raveka raveker (îzafet-î beyaniye)

Ev cure ravek taybetmendiye raveberê ji aliyê cure, şibandin, menşe û hwd ve dide nasîn. (hespê siwarbûnê, dara sêvê, axatiya eşîrê)

Ji pirtûkê em dikarin van mînakên bidin:

(12)

axayê êlekê (12/19), *şûlekî nelayiq* (11/11), *welatê xerîban* (27/39)

b) Raveka ku şibandinê nîşan dide. (îzafet-î teşbîhiye)

Ew ravek e ku ji şebih û muşebbehê pêk tê. (şûrê zimên, nurê ilmê)

Zimên û ilm müşebbeh in û şûr û nur jî şebih in

c) Raveka ku îstîfereyê nîşan dide. (îzafet-î îstîfariye)

Tiştê ku tê şibandin ji bo navdêrekê tê ravekirin. (ax ji destê mirinê)

Lewra destê mirinê nîne. Wek îstîfereyê hatiye bikaranîn.

Di hemû senifandin û dabeşkirinê de di raveka navdêrê de tiştê ku naguhere qertafa raveber û ravekerê ye. Lê di hin hin caran qertafa ravekerê dikeve an jî wek peyveke hevedudanî formeke nû werdigire.

Mînak:

(13)

xalê Ehmedî wek *xalê Ehmed* tê bilêvkin.

Di axaftinê de niyeta axêver ji terefê mixatab ve tê fahmkirin. Lê di rastiyê de nuanseke wiha di navbera her du forman de heye.

Xalê Ehmed (Ahmed dayî); di vê qalibê de tenê mirovek heye ew jî *xal* e û nav *Ehmed* e.

Xalê Ehmedî (Ahmed'in dayîsî); di vê qalibê de du mirov hene yek *xal* e û yê din Ehmed bi xwe ye.

Eger du yan çend navdêrên hemaheng li pey hev rêz bibin qertafa veqetandekê li navdêra dawî bar dibe (Blau-Barak, 1999: 36).

(14)

ga û *çêleka* cotkar,

dê û *bavê* Lezgînî

Di heman demê de ev ravek wek raveka zincîrîn jî tîs hesabandin. Ev ravek dikare wiha bê formulêkirin.

Navdêr + gihanek + navdêr... + qertafa veqetandekê + navdêr + qertafa tewangê

Çend mînak ji berhemê:

(15)

çewal û qewatêd Sarê Salteyî (37/8), *'eqd û eshê û zêr û dirafêd kevin* (37/19), *melayek û dû nefer mirofêd cahil û nexwendî* (1/1).

Di mînaka dawî de em dibînin ku hem raveber hem jî raveker gihaneka *ûyê* wergirtiye.

Ji bo raveka navdêrî ya binavkirî û ya nebinavkirî digel taybetiyên xwe baş bê dîtin em ê li jêrê bi du tabloyan her du rewşan bidin ber hev.

Tablo 1.3. Raveka Navdêrî ya Binavkirî

		Raveber		Raveker	
		navdêr	veqetandek	navdêr	Qertafa ravekerê / tewang
Yekjimar	Nêr	heval	ê	Ehmed	î
	Mê	heval	a	Hîvan	ê
Pirjimar	Ø	heval	ên/êd/êt	heval	an

Tablo 1.4. Raveka Navdêrî ya Nebinavkirî

		Raveber			Raveker		
		navdêr	Qertafa nebinavkirinê	veqetandek	navdêr	Qertafa nebinav kirinê	Qertafa ravekerê / tewang
Yekjimar	Nêr	heval	ek	î	heval	ek	î
	Mê	heval	ek	e/a	heval	ek	ê
Pirjimar	Ø	heval	in	e/ên	heval	in	an

Çend mînak ji berhema Bazîdî ji bo ravekên navdêrî:

(16)

nimêja îne (6/17) navdêr + veqetandek mê navdêr + tewang mê

Destê rastê (1/6) navdêr + veqetandek nêr navdêr + tewang mê

Devê çemekî (1/2) navdêr + veqetandek nêr navdêr + qertafa nebinavkirî
+ tewang nêr

behrekê dirafî (4/5) navdêr + veqetandek nebinavkirî + veqetandek mê navdêr
+ tewang nêr

Veqetandeka pirjimariyê bi ‘*éd*’ ê ve tê çêkirin. Di berhemê de em li rastî qertafa veqetandekê ya pirjimariyê ya ku bi ‘*ên*’ê ve çedibe nehatin.

(17)

xerayibéd semewatan (2/1), *mîréd Xunusê* (5/1), *destéd xanimê* (11/6)

Ji ber ku di mijara veqetandekê de me rewşên veqetandekê li gor zayendan bi mînakên ji berhemê rave kiribû em naxwazin heman tiştan dubare bikin. Ji bo agahiyên zêde divê li wir jî bê nihêrîn. Heçî qertafa tewangê ye ku di ravekan de bi kar tê em dikarin vê agahiyê jî lê zêde bikin; her wekî qertafa tewangê ya pirjimariyê “*an*” di çend cihan de berî xwe “*ek*”ekê hildigire ku çend mînakên wê jî ev in:

(18)

- a. Weha bi vê terzê *şêş heft salekan* me destebirayî digel yekûdu kirîn... (4/6)
- b. Lakin Mihemed Beg jî hal nemaye, *ji çend cihekan* bi duçikê qeme hindêk birîndar bûye. (5/49)
- c. Ew jî di gel *çend etba'ekan* têtin û... (10/9)
- d. ... û *çend rojekan* sakin dibe... (10/15)
- e. Paş *çend saetekan* êdî jehr kar dike... (17/17)
- f. ... weko ez dibêjim bi quwet tu *çend topozekan* li derî bide... (20/12)
- g. Dîsanê Şêx Tarim di gel *çend siwarekan* tên û ... (33/20)
- h. *Serêd çendekan* jî ji axalerêd wan jê dikim... (40/23)

Li vir çend tişt hene ku divê em behs bikin:

- Di kurmançî de qertafa nebinavkirî ya yekjimar “*ek*” e; ya pirjimar jî “*in*” e. Di van mînakan de em dibînin ku di pirjimariyê de “*ek*” hatiye bikaranîn.

- Di hemû mînakan de em dibînin ku raveker ji peyvên “*çend*”, wate nediyariyê pêk tên. Di xala *a*)yê de raveker *şêş heft* e. Ev jî ji xwe nediyar e. Hejmareke teqez nîne, gumanê dihewîne. Heçî xala *h*) ye raveber navdêr e lê raveker dîsa nebinavkirî ye. Ji vir mirov dikare bibêje gelo di rewşa nebinavkirî de wek haleke taybet *eka* yekjimar di pirjimariyê de tê bikaranîn.

- Her wiha di soranî de qertafa nebinavkirî ya pirjimariyê bi *ekanê* çêdibe. Li vir nêzîkahiyeke di navbera her du zaravayan de dikare were destnîşankirin.

1.1.2.1. Raveka Navdêrî Wek Kirde

Raveka navdêrî carna wek hêmana hevokê peywira kirdeyê hildigire.

Mînak:

(19)

a. Lakin *axayêd Bazîdê* ewî pesend nakin... (10/11)

Kirde

b. Meger *dilê Lalîxanê* jî di Hesên Axayî da hebûye. (12/33)

Kirde

c. Lewranê li nik wan *malêd dêran* beytulmal e, ... (22/2)

Kirde

d. û *xelqê temaşaker* jî hemû lê nezer dikin. (23/17)

Kirde

1.1.2.2. Raveka Navdêrî Wek Pêveber

Raveka navdêrî wek pêveberê jî di hevokê de tê bikaranîn.

Mînak:

(20)

a. ...Memed qewî *xweyî mal û hal bûye* û ... (4/36)

Pêveber

b. ...eger çi tu *kurê Leşko yî*... (10/33)

Pêveber

c. *Halê ciwanî ye* me'lûm, ... (13/4)

Pêveber

d. ... eve *welatê xerîban e* ... (27/39)

Pêveber

1.1.2.3. Raveka Navdêrî Wek Bireser

Dibe ku raveka navdêrî wek bireserê jî hemanke hevokê be.

Mînak:

(21)

a. ... tu rabî cilêd berşûya min û nanê zarokan bideye xelqê. (3/14)

Bireser

b. Cezweyê qemeyê pê êre da wê da dihejîne... (5/36)

Bireser

c. ... bila muhlet devê tivingê dide nîva derî û agir dike. (5/28)

Bireser

d. Îcarê xezînedar kurkê simorê tîne ... (10/23)

Bireser

1.1.2.4. Raveka Navdêrî Wek Têrker

Di nav têrkerê de jî em li rastî raveka navdêrî tîn. Têrkerên piştî pêveberê bê daçek in lê heke berî pêveberê bin daçekan hildidin

(22)

a. ... û ji nişkê ve çûye odeyê hindurê, ... (26/20)

Têrker

b. Rojekê Mihemed Efendî çûye hizûra xundkarî ... (28/33)

Têrker

c. ... û mirofêd mayî li jêrê hêsetê bidene xelqê mêwan, (9/13)

Têrker

d. Îcarê axayêd Hertuşiyân Kela Şaxê ji mirofêd miksiyan dizîn... (8/45)

Têrker

e. Neqil dikin ku di welatê Botan da qezayek heye, ... (12/1)

Têrker

1.1.3. Raveka Cînavkî

Cînavk di dewsa navdêran de bi kar tên. Ne navê tiştan in lê şûna wan digirin. Bedirxan cînavkê wiha rave dike: “Pronav ew bêje ye ku dikeve şûna navdêrê. Pronav mêjer û carina jî zayendê navdêrê dide zanîn. Ji hêla din pronav wezîfeya navdêra ku dinimîne li xwe digere û wan ditîne cih.” (2013: 71)

Cînav ew bêje ne, yên ku di rêxistina hevokan de cihên navan digirin. (Ebdulfetah, 2006a: 10)

Her wiha cînavkên kesane yên tewandî di hevokên navdêrî de tu carî nabin kirde. Yanî hevokeke navdêrî wek *Ez xwendekar im* nabe di kurmancî de *Min xwendekar im* bê nivîsandin.

Lê dema em behsa raveka cînavkî bikin: Raveka cînavkî kêmtirîn ji navdêrekê û cînavkekê pêk tê. Cînavk wek ravekerê, navdêran rave dike û ditewe. Cînavkên lihevxiştî, cînavkên girêkî, cînavkên kesandinê û cînavkên qertafî di rewşa ravekê de bikar nayên.

Tiştêk bi alîkariya cînavkan tê ravekirin. Di van ravekan de cînavkên tewandî dibin raveker (Tan, 2015: 325) û tu qertafê wernagirin an jî cînavkên tewandî tu carî nabin raveber.

Qertafa nebinavkirinê li raveberê bar dibe. Wek tabloyekê em li jêrê forma binavkirî û ya nebinavkirî ji bo raveberê nişan bidin.

Tablo 1.5. Raveka Cînavkî

Veqetandeka binavkirî		Veqetandeka nebinavkirî	
Mê	Nêr	Mê	Nêr
Keç-a min	Kur-ê min	Keç-ek-e min	Kur-ek-î min
Keç-a te	Kur-ê te	Keç-ek-e te	Kur-ek-î te
Keç-a wî/wê	Kur-ê wî/wê	Keç-ek-e wî/wê	Kur-ek-î wî/wê
Keç-a me	Kur-ê me	Keç-ek-e me	Kur-ek-î me
Keç-a we	Kur-ê we	Keç-ek-e we	Kur-ek-î we
Keç-a wan	Kur-ê wan	Keç-ek-e wan	Kur-ek-î wan
Keç-a xwe	Kur-ê xwe	Keç-ek-e xwe	Kur-ek-î xwe

Wek di tabloya jorîn de tê dîtin pirtûk ji aliye zayendê ve mê ye; lewma veqetandeka binavkirî qertafa ‘a’yê wergirtiye; lê di veqetandeka nebinavkirî de qertafa ‘ek’ê wergirtiye û veqetandek bûye ‘e’.

Formula vê ravekê wiha ye;

Navdêr + qertafa veqetandekê + cînavk

1.1.3.1. Raveka Cînavkî Wek Kirde

Wek kirde raveka cînavî di hevokê de bi vî awayî ye:

Mînak:

(23)

a. ..birayê wî hebûye... (38/33)

Kirde

b. Kurêd wî jî heyn. (39/31)

Kirde

c. eger dînê te heq e û rast e.. (7/11)

Kirde

d. paşayê me mirofekî bi hikm e... (23/11)

Kirde

1.1.3.2. Raveka Cînavkî Wek Pêveber

Raveka cînavî dikare wek pêveber jî bê nivîsîn.

Mînak:

(24)

a. ... navê yekê Qesr û navê yekê Pagan (e). (5/1)

Pêveber

b. ... ku mixabina te ye, ... (12/12)

Pêveber

c. lewrane ew kurmanc e û xulamê wî ye ... (13/6)

Pêveber

d. êdî kêfa we ye. (21/39)

Pêveber

e. Emrê hewe ye. (38/39)

Pêveber

Di hin hevokan de piştî pêveberê em rastî cînavka qertafî tên ku ji wan çend mînak li jêrê hatine nivîsîn.

Mînak:

(25)

... qederê sê hezaran siwarêd 'ecem û ekradan *dayê*. (39/15)

Pêvebera me ji lêkera *daye* û ji cînavka *wî* pêk tê. Cînavka *wî* di halê qertafî de xwe bi lêkerê re dike yek. Her wekî vê mînakê yên dîtir jî ev in:

(26)

a. Êdî min aman û zeman *nedayê*... (4/10)

b. êdî mecala rabûnê *nedanê*... (8/27)

c. Paş hindek mudeyî Mu'tellah Beg ecelê eman *nedayê*, ... (9/44)

Mînakên wê dikare bê zêdekirin.

1.1.3.3. Raveka Cînavkî Wek Bireser

Bi heman awayî raveka cînavî wek bireserê jî di hevokê de cihê xwe digire.

Mînak:

(27)

a. (Ew) destêd xwe dişon... (32/14)

Bireser

b. ... tu pirsa kî dikî? (25/28)

Bireser

c. ... malêd wan jî talan kirin... (29/29)

Bireser

1.1.3.4. Raveka Cînavkî Wek Têrker

Carinan di nav daçekan de û carinan jî piştî pêveberê tê lê wek hêmanên hevokê erka wê têrker an jî biresera nerastexwo ye.

Mînak:

(28)

a. Îcarê Selîm Paşa ji kela Sasonê cewabê virê dîke nik xuha xwe... (16/13)

Têrker

b. ... min tenbiye kirîne dê birekî siwarêd ekradan bêne riya hewe... (38/12)

Têrker

c. ... bi destura we ez biçim... (35/49)

Têrker

d. ... tu were wê derê ... (25/22)

Têrker

1.1.4. Raveka Hevalnavî

Di Kurdiya Kurmancî de raveka hevalnavî wek raveka navdêrî ji çar hêmanan pêk nayê. Raveberê ku di heman demê de mewsûf e qertaf wernagire. Raveker ji navdêrekê û raveber herî kêr ji hevalnavekê pêk tê. Dema ji hevalnavekê zêdetir hevalnav bi navdêrekê ve werin girêdan an raveber ji peyveke zêdetir bin wê demê herfa îlal yanî veqetandek li gor zayendê dîkeve navbera hevalnavan (Badıllı, 1965: 34).

Mînak: Keçika delal a bejnzirav

Carinan bêyî herfa îlalê jî hevalnavek bi cînavkekê ve tê girêdan ku ev jî wek raveka hevalnavî tê hesibandin (Badıllı, 1965: 34).

(29)

a. Tu ya belengaz → Tu belengaz

b. Hûn ê belengaz → Hûn belengaz

Hevalnav wek qaîdeyekê piştî navdêran tê (a) lê ev qaîde ji bo hin hevalnavan têk diçe, carinan berî navdêran jî tê (b) an jî (Kurdo, 1981: 32)

(30)

- a. Gula sor → sorgul
- b. Xweş mêr → xweşmêr

Hevalnavên pileyekê nîşan bidin jî berî navdêran tên.

Mînak:

(31) mezintirîn mal, berztirîn çiya

Hevalnavên şanîdanê her tim tên pêşiya navdêran, çi xwerû çi tewandî.

(32)

<u>Rewşa xwerû</u>	<u>Rewşa tewandî</u>
→ ev heval	vî hevalî / vê hevalê
→ ew heval	wî hevalî / wê hevalê
→ ew heval	wan hevalan

Ji bo hemû cureyên hevalnavan guncan e ku mirov raveka hevalnavê peyda bike.

Ger hevalnavek, ji yekî zêdetir navdêran biwesfîne veqetandek tê navdêra dawî û hevalnav dibe hevalnava hemû navdêran (Bedirxan, 2009: 209).

(33)

- a. Hesp û mehîna *boz*
- b. Hesp û mehîneke *boz*

Dibe ku hevalnavek ji layê hevalnavekî din ji bo wateyê qehîm bike were ravekirin (Bedirxan, 2009: 209).

(34)

Sora qehweyî sorê qehweyî

Li vir qehwe jî wek sor hevalnav e lê ji bo wateyeke xurttir herdu hevalnav wek raveka navdêrî bi hev ve hatine girêdan; *qehweya* ku hevalnav e paşgira navdêrê wergirtiye û bûye ravekera *sorê*.

Di hevalnavan de pîle jî di nav ravekan de bi kar tê.

pîleya hevrûkirinê *pîleya berztirîn*

Gola mezin → *mezintir* gol → *mezintirîn* gol

Ji bilî vana hemû cureyên hevalnavan wek hevalnava şanîdanê, hevalnava pirsyarî, hevalnava hejmarîn û hwd wek raveker raveka hevalnavî pêk tîne.

Raveka hevalnavî bi vî şiklî tê formulekirin: Navdêr + qertafa veqetandekê + hevalnav

1.1.4.1. Raveka Hevalnavî Wek Kirde

Raveka hevalnavî wek kirde dikare bibe hêmana hevokê.

Mînak:

(35)

a. *Mîrzo*yê *Reş* hebû, ji tayfeyêd Êzdiyêd Wanê bû. (4/1)
Kirde

b. *Wê rojê* jî roja îne bûye ... (6/15)
Kirde

c. Di gel Paşayî *çil pênceh xulaman* hebûn. (6/22)
Kirde

Di vê mînakê de balkêş e ku peyva *xulam* tewiyaye. Di heman çîrokê de heman mînak di hevokeke dîtir de bi vî şiklî derbas dibe:

“Ew *xulam* xwe davên nêva Paşayî û Îsmâîl Axa, yekê-duyan ji wan jî birîndar dike û *ewan çil-pênceh xulam* di nêva mizgeftê da peran peran dike.” (6/24)

Lê di vê derê de jî cînavka *-wan* hatiye bi kar anîn ji ber wê yekê *xulam* tewangê hilnegirtiye.

(36)

.... eva herdu biran, *ew siwarêd 'ereban* belav û perîşan kirîn, ... (29/7)
Kirde

Em rastî hevokên bi vî şiklî jî tên: “*Ewan sed û dused mirofan* li hêşetê belav dikan...” (9/17). Hem cînavk hem jî ravebera wê di rewşa tewangî de bi kar hatiye û hevalnav jî di navbera wan de bi cih bûye.

Dîsa mînakeke dîtir bi vî şiklî ye: “*ewan maaşêd wan* hemû bideme te,” (11/23). Hem raveka hevalnavî hem jî ya cînavkî bi hev ve hatine girê dan.

(37)

Ewan siwaran, dengê gaziye bihîst, ... (7/18)

Kirde

1.1.4.2. Raveka Hevalnavî Wek Pêveber

Raveka hevalnavî wek pêveberê jî di hevokê de cihê xwe digire.

Mînak:

(37)

a. ... û *qewî nêçîrwan e.* (33/7)

Pêveber

b. Ev *şûlekî nelayiq e,* (11/11)

Pêveber

c. Mihemed Beg dibêje ku nabê, *şermekî mezin e...* (5/25)

Pêveber

d. Belê welleh Istenbol *cihekî qewî qewî qenc e.* (28/41)

Pêveber

1.1.4.3. Raveka Hevalnavî Wek Bireser

Her wiha raveka hevalnavî wek bireserê jî dibe hêmana hevokê.

Mînak:

(38)

a. We'd kiriye dê *sî pezî* ji boyê te hediye bînitin. (24/17)

Bireser

b. ... du sê pezêd qelew hildigiritin... (25/26)

Bireser

c. ... çend siwaran jî di gel Domoyî virê diketin... (27/22)

Bireser

d. ... her yek ji we azoxa şeş rojan di gel xwe hilgirin. (27/30)

Bireser

e. ... û navekî mubarek li wî daynim. (28/17)

Bireser

1.1.4.4. Raveka Hevalnavî Wek Têrker

Raveka hevalnavî berî lêkerê an jî piştî lêkerê di rewşa têrkerê de wek hêmana hevokê xwe nişan dide. Her wiha di nav daçek û hokerê de jî tê bi kar anîn.

Mînak:

(39)

a. Mîqdarê pênc şeş deqîqan bi vê terzê keşmekeşa wan dibe. (5/40)

Têrker

b. Ew jî ji vê xeberê sil dibe û têtê mala xwe. (6/7)

Têrker

c. (Ez) heta çend rojekaş dibînim... (26/11)

Têrker

d. ... û li hespekî baş siwar dibitin... (27/5)

Têrker

e. Eve mirofene bi wê terefê da revîne elbet, (29/18)

Têrker

1.1.5. Raveka Hokerî

Di eslê xwe de hoker jî cureyeke ji navdêra nin. Bi tena sera xwe nayên bikaranîn. Rewş, rêje, cih û deman diyar dikin. Nêzî hevalnavan e; lê hoker bandorê li ser lêker,

hevalnav û hokeran dike. Bi taybet em dikarin bibêjin hevalnavên lêkeran e (Badıllı, 1965: 73).

Tan (2015: 183) wateya hokerê wiha dide: “Bêjeyên ku wateya lêker, hevalnav, hokerên wekî xwe ji aliyê dem, bergeh, rewş, sedem, rêje û hejmarê ve tamam dikin ‘hoker’ in. Bi tenê bêjeyên ku ji binyadî hoker in peywira hokerê bi cih naynin.”

Hokerinên cihî û berekê wek ravekerê di nav ravekê de tên dîtin wê demê daçek dikeve navbera raveker û raveberê. (Tan, 2015: 328)

Mînak:

(40)

a. Mirovê *li aliyê rastê*

b. Gula *li baxçeyê me*

Formula vê ravekê wiha ye:

navdêr + hoker / navdêr + daçek + navdêr + tewang/qertafa tewangê

1.1.5.1. Raveka Hokerî Wek Kirde

Raveka hokerî carinan erka kirdeyê tîne cih.

Mînak:

(41)

a. ...“*Her çi ew tiştêd wî yê spehî ku li nik birayê wî Mehmûd Paşayî bûyî û*
Kirde”

lîbas û hûr murêd Jubirî ku li nik xulam û ekrada bûyî, pêkve berhev kirî û înayî bîltemam
Kirde

teslîmî Jubirî kiriye. (38/46)

Ev hevoka dirêj ku bi lêkerhevalnavê re tamam bûye û hatiye girêdan di nav xwe de raveberê ji aliyê cih ve bi ravekerê ve girê dide. Li jêrê raveber û ravekera her duyan hatiye dayîn.

b. *ew tiştêd wî yê spehî* *ku* *li nik* *birayê wî (Mehmûd Paşayî)* *bûyî*
raveber *gihanek* *daçek û hoker* *raveker* *lêkerhevalnav*

mînakên din;

c. ... û *tucarê ku li ser barekî siwar bû* ji hêstirê kete erdê. (4/9)

Kirde

d. *Ew mirofê li ser berî* difikire ... (36/31)

Kirde

Raveka hokerî bi tena serê xwe nabe kirde. Lê di nav şahkomek û komeka alîkar de bi cih dibe. Lewra hoker ji aliyê rewş, dem û cihê ve lêkerê diwefîne. Yanî hevalê lêkerê ye. Di wan mînakên li jorê de jî tê dîtin ku hoker carna bi daçekan û carinan jî bêyî daçekan bandora xwe li ser lêkerê ango pêvebera komeka alîkarê nîşan didin. Ji ber vê yekê me xwest nimûneyên bi vî awayî ji berhemê bide.

e. *Nêzokê du hezar siwarê wan* jî deste girê dabûn... (29/26)

Kirde

1.1.5.2. Raveka Hokerî Wek Pêveber

Raveka hokerî dibe ku wek pêveberê bibe hêmana hevokê.

Mînak:

(42)

a. ... eve *gelekî 'ecêb e*, (32/31)

Pêveber

b. ... *zaf bilind û kûr e*. (13/26)

Pêveber

c. êdî ez jî *weko xwendkarê ekradan im.* (24/26)

Pêveber

1.1.5.3. Raveka Hokerî Wek Bireser

Her wiha ev ravek wek bireserê jî di hevokê de saz dibe.

Minak:

(43)

Îcarê ewan du sê xulamêd Îsmâil Begê ku li wê derê li nik wan bûne, digirin û hepis dikin.
(15/34) *Bireser*

a. ... Îcarê Adile Xanimê mirofeke ji ehlê heremê virê dike ... (9/10)

Bireser

b. Paşî ew mexînî û çendek ji Şaxiyan kuştin ... (9/42)

Bireser

c. û gundekî ji gundêd Bazîdê baberat îhsanê Sîsoyî diketin. (25/55)

Bireser

1.1.5.4. Raveka Hokerî Wek Têrker

Raveka hokerî wek têrkerê jî bi kar hatiye.

Mînak:

(44)

a. ... û tete pêşiya konê malê. (27/8)

Têrker

b. û li wî rewendê ku li serê berî westaye, difikiritin, ... (36/12)

Têrker

c. û înane nik Silêman Axayê Sîpkî. (39/21)

Têrker

d. Weko ew siwarêd hewarê salixa Şems û Siyahmedê hildigirin, ... (13/17)

Têrker

e. Heta rojek dîsanê weko adetê xwe Şêx Ehmed cewabê virê diketin. (15/19)

Têrker

1.1.6. Raveka Jimarnavan

Ev ravek di hin pirtûkan de nehatiye nivîsîn. Sami Tan (2015: 213), di mijara jimarnavan de vê ravekê wiha şîrove kiriye: “Raveka jimarnavan li gorî rola ku ew

jimarnav pêk tînin diguhere. Bo nimûne heke ew jimarnav cînavkên jimarîn bin, raveka wan jî wekî ya navdêra ku cihê wê girtiye pêk tê.”

Ji bo vê ravekê mînakên xwe wiha rêz dike: yeke çeleng, yekî baş, duyên qeşmer, pêncên hêja.

Divê bê zanîn ku ravekbûna jimarnavan ji nû ve bê nirxandin. Yanî jimarnav li gorî erk û pozîsyona xwe di nav ravekan de cuda cuda dikare bê şîrovekirin. Lewra em jimarnavan wek navdêr bihesibînin (ku cînavk di heman demê de cureyek ji navdêra ne) wê demê hevalnavên ku bi vê navdêrê re bîr girêdan wê raveka hevalnavî pêk bînin. Lê wek cureyeke peyvê jimarnav mijareke cuda ye. Ji xwe wek koma peyvyan em ê di behsa koma jimarnavan de vê babetê şîrove bikin.

Lazim li vir em vê jî bibêjin ku mînakek li gor şîroveya Tan di berhemê de nehat dîtîn. Tenê di hejmara yekê de mînakên bi vî rengî hene ku di wir de jimar di şûna kesekî de yanî wek cînavkê li kar e.

(45)

- a. Lakin Şekir Axa jî hinde mecal diye ku *yekî* ji wan xulaman dikuje û *yekî* birîndar

diketin. (21/33)

- b. Lakin meger vê jinbaba wî ya kurmanç di berê danê, weqtê keçiyê danê elaqe di

gel *yekî* rewend hebûye û hez ji yekûdu kirîne. (35/9)

- c. Nêzokê Kela Xoşabê du gundêd Mexînan heyn, *navê yekê* Qesr û *navê yekê* Pagan. (8/9)

Di mînaka dawî (c) de di rewşa raveka cînavkî de ye ku ev mijar li jorê behs bûye.

1.1.7. Raveka Zincîrîn

Dema raveka tiştêkî bi alîkariya çend tiştan bibe, ravekariya zincîrî derdikeve holê. Tiştên ku tiştêkî din rave dikin, bi alîkariya gihaneka “û”yê digihêjin hev (Tan, 2015: 328).

Di raveka zincîrîn de raveber û raveker ji yek zêdetir peyvyan digirin. Wek li jor me gotibû hevalnav veqetandekan nagirin. Dema raveker ji hevalnavan pêk bê gihaneka

“û”yê dikeve navbera raveber û ravekerê. Lê mirov dikare hevalnavan bi veqetandeka navdêr an cînavkan jî bi hev ve gire bide (Tan, 2015: 329).

Mînak:

(46) Hevalê bejinzirav ê çavşîn → hevalê bejinzirav û çavşîn

Dema navdêr an cînavk bibe ravekera ravekerê qertafa veqetandekê diguhere, li gor zayend û mêjerê qertafan werdigire.

(47) Bo nimûne; dara sêvê ya baxçeya apê min

Kêşeyek di raveka zincîrîn de heye ku di hin ravekên zincîrîn de dema qertafa veqetandekê bi raveberê ve bê girêdan an cuda bê nivîsîn wateya xwe jî diguhere (Tan, 2015: 329).

Bo nimûne;

(48)

a. Hevalê xwarziyê minê li gund

b. Hevalê xwarziyê min ê li gund

Di raveka yekem de kesê li gund xwarziyê min e. Lê di raveka duyem de kesê li gund hevalê xwarziyê min e.

Bi kurtî qaîdeyên raveka zincîrîn ev in: Heke ravebera raveka zincîrîn ji yek zêdetir peyvan pêk bê peyvên ewil qertafan wernagirin, lê peyva dawî qertafa ravekê (veqetandek) werdigire çî diyar û çî nediyar. Him raveber him raveker dibe ku ji yek zêdetir peyvan pêk bê an komên peyvan. Dema ravekera raveberê ji gelek komên peyvan pêk bê peyva dawî navdêr û cînavk be ditewe lê havalnav be natewe (Ciwan, 1992: 193).

Wek mînak:

(49)

a. keça *dê* û *bavî* (navdêra dawî tewangê hilgirtiye)

b. çiyayê *bilind* û *asê* û *bidar* (hevalnav netewiyane)

c. para *Osman* û *Silêman* û *Kemalî* (navdêra dawî tewangê hilgirtiye)

d. çiyayê *bilind* ê *asê* yê *bidar* (hevalnav netewiyane)

e. xaniyê *sêtebeq* ê *bilind* ê *sipî* yê *gundî* (piştî hevalnavan navdêr hatiye û tewiyaye)

1.1.7.1. Raveka Zincîrîn Wek Kirde

Her wekî ravekên din ev ravek jî wek hêmanekê dikare bibe kirdeya hevokê.

Kirde (raveka zincîrîn) + bireser + pêveber

Mînak:

(50)

a. ... ji tayfa Dudêran, mirofeke halxweş û xweyî rizq û mal û dewlet hebûye, (24/1)

Kirde

b. Ji wicûhêd Bazîdê axayekî qewî xweyî î'tibar hebûye ... (10/12)

Kirde

c. Mîr û paşayêd wan kenaran hemû ketine qesda Şekir Axayî û ji wî 'ecz

Kirde

mayîn. (21/6)

d. Bi vê munasebetê mala axayê Alikan Şerîf Axa û mala axayê tayfa

Kirde

1.1.7.2. Raveka Zincîrîn Wek Pêveber

Em dikarin wek pêveberê jî binivîsin.

Mînak:

(51)

a. Mamê Xan Mehmud mîrê qeza Miksê bû. (9/2)

Pêveber

b. ... lakin mirofeke begzade û qewî zêde kemal û xwendî û meqbul e. (38/38)

Pêveber

c. paşê min ji cîranêd wî bi xef pirstyara halê Memedî kir. (4/36)

Pêveber

Di lêkerên hevedudanî an jî biwêjî yên kurdî de peyvek an gelek peyvên bi hev ve girêdayî dikarin têkevin navbera navdêr û lêkera alîkar, li gor merama ku em dixwazin di hevokê de rêz bikin. Lê hevoka bingeh an jî alîkar nikare cihê xwe tê de bigire.

(52)

a. Ez dest bi xebatê dikim.

Lêkera pêvebera vê hevokê *dest pê kirin* e. Lêker ji navdêra *dest* daçeka *bi* û lêkera alîkar *kirinê* pêk tê. Ev lêker navdêra *xebatê* hilgirtiye nav xwe. Di lêkerên bi vî awayî de nabe ku hevokeke bimgêh an jî hevoke alîkar di navbera navdêr û lêkera alîkar de bi cih bibe.

b. Dijwar dibêjtin ku (ew) *birayê jinbaba min e*, .. (35/17)

Bireser

c. Îcarê hêj me'lûmê Sîso dibitin ku ev *Baba Muradê xundkar e*. (25/53)

Bireser

Di her du mînakên dawî de ku raveka zincîrîn bûye pêvebera komeka alîkar, komeka alîkar bi xwe jî biresera şahkomekê ye. Komeka alîkar digel erk û bicihbûna xwe ya di hevoksaziyê de bi awayekî berfireh dê bê ravekirin.

1.1.7.3. Raveka Zincîrîn Wek Bireser

Raveka zincîrîn wek bireserê dikare bibe hêmana hevokê.

Formula rêzepeyvan: Kirde + bireser (*raveka zincîrîn*) + pêveber

Mînak:

(53)

a. ... Îcarê Guzel Xatun *milekî din ê laşê Kirêtî* dîsanê dibiritin ... (19/39)

Bireser

b. ... Şêx *qederekî diraf û çend hespêd qenc* hilgirtî ... (16/2)

Bireser

c. û *herdu milêd Kirêtî* jî ji boyê nîşanê tînin... (19/49)

Bireser

d. Xulase peyadekê Şekir Axayî, *meydana şeca'etê û zorê* zebt kirî. (21/5)

Bireser

1.1.7.4. Raveka Zincîrîn Wek Têrker

Raveka zincîrîn bi daçek û hokeran wek têrker dibe yek ji hêmanên hevokê.

Mînak:

(54)

- a. Îcarê Mexoyê file jî *weko tedbîra Sultan Xanimê*, varêla barutê nîvê şevê
Têrker

dibetin.... (16/15)

- b. Êdî her kesek *li ser raya Gewher Xanimê* qerarê dibin ... (34/26)
Têrker
- c. Weqtêkî derwêşek berê biharê têtê *wê qesebeya Bêgiriye* ... (37/2)
Têrker
- d. Ew ga diçite *cihekî qewî asê û nizar* ... (13/26)
Têrker

1.2. COTEPEYV

Cotepeyv, mijareke ji komên peyv an e ku axêver bi wan tesîrekê, herikbariyekê dixê nav gotina xwe. Em vê cureyê zêdetir di axaftinê de dibînin. Di hevokan de jî zêdetir ji bo xurtkirina wateyêke tê îfadekirin. Bi vî awayî her çiqas di nav qada watenasiyê de be jî, ji ber ku di hevokê de wek kirde, pêveber, bireser an hoker bi cih dibe em ê jî li vir cihek ji bo wê vekin.

Cotepeyv di ravekan de wek raveker û raveberan jî bi cih dibin.

Bo nimûne:

(55)

- a. *der û dora hewşê* → raveka navdêrî
b. *xal û xwarziyên me* → raveka cînavî
c. *cih û mekanên paqij* → raveka hevalnavî
d. *şahiya keç û xortan* → raveka navdêrî

Tan (2015: 82) dibêje cotepeyv ji bo xurtkirina wateya peyv an e, bi alîkariya du peyv an bidestxistina wateyêke gelemperî ye. Ji bo vê jî mirov him ji aliyê wateyê ve him

jî aliyê denganiyê peyvên têkildarî hev dineqînin. Piştî jî ew cotepeyvvan ji aliyê wateyê ve dike sê cure; cotepeyvên hemwate, cotepeyvên diywate, cotepeyvên nêzwate.

Derheqê cotepeyvê de wek xebateke hevpar Ertekin û Acar wiha şîrove danê:

“Di axaftina rojane de ji bo ku axaftin bihêz be ev cure peyv tîn bikaranîn. Cotepeyv dikarin ji bêjeyên hemwate, diywate, nêzwate pêk werin, herwiha dikarin bi alikariya gihanek û navbendan bikevin şiklên nû an jî carna di navbera herdu bêjeyan de bi xêzekekê jî ev bêje bîn bikaranîn û vegotinê bitesîr bikin. Em ê ji aliyê wateyê û ji aliyê şiklê ve li ser cureyên wan bisekinin” (Ertekin û Acar, 2012: 83).

Ew cotepeyvvan wiha dabeşkirine: : Ji aliyê wateyê ve wek cotepeyvên nêzwate, diywate, hemwate, têkilhev; ji aliyê şiklê ve jî cotepeyvên ducarî, nêzdeng û hevedudanî (Ertekin û Acar, 2012: 83). Di senifandinê de me jî ev şikl tercîh kir.

1.2.1. Ji aliyê Wateyê ve

1.2.1.1. Cotepeyvên Hemwate

Ji du peyvên ku di heman wateyê de ne pêk tîn. Tan (2015: 82) dibêje heke peyvek bi erebî û ya din bi kurdî be ev bandora medreseyan nîşan dide. Ehlên medresê ji bo ravekirina peyvên erebî di axaftinê de wek rêbazekê bi kar anîne. Dema her du bi kurdî bin wek cotepeyvên dîtir ji bo xurtkirina wateyê ye.

Bo nimûne: kul û derd, ap û mam, kevir û ber

1.2.1.2. Cotepeyvên Nêzwate

Ji aliyê wateyê ve du peyvên nêzî hev in ku wate pê berfirehtir dibe.

(56)

Bo nimûne: çol û çiya, deşt û zevî, gil û giha

1.2.1.3. Cotepeyvên Diywate

Ev cure cotepeyv jî di rewşên texmînî an sînorkirî de tê bikaranîn.

(57)

Bo nimûne: yar û neyar, kê-m-zêde, dûrû nêzîk

1.2.1.4. Cotepeyvên Têkilhev

“Hin cotepeyv jî hene ku bêjeyên wan gava bi hev re hatin bikaranîn hev tamam dikin û her yek xwe wekî perçeya tevahiyê nîşan dike” (Ertekin û Acar, 2012: 84).

(58)

Bo nimûne: dê û bav, kal û pîr, jin û mêr

1.2.2. Ji Aliyê Şiklî ve

1.2.2.1. Cotpeyvên Ducarî

Ev cotepeyv bi peyvên dubarekirî ve çêdibin.

(59)

Bo nimûne: hêdî hêdî, sivik sivik, melûl melûl

“Li aliyekî din di Kurmancî de hin ajal û giya hene ku navên wan bi cotepeyvyan hatine danîn. Ev cotepeyv bi piranî bi ducarîbûna heman peyvê çêbûne yan jî bi tevî paşgira ‘-ok’, ‘-ik’, ‘-îk’, ‘-k’ ve hatine pê. Mînak: ‘şevşevok’, ‘perperik’, ‘qumqumok’, ‘xapxapok’, ‘fatfatok’, ‘pinpinîk’, ‘gezgezok’, ‘lavlavk’, ‘xaşxaş’, ‘kirkirk’ û ww” (Ertekin û Acar, 2012: 85).

1.2.2.2. Cotepeyvên Nêzdeng

Li gor (Ertekin û Acar, 2012: 85): “Ev cure; ji du bêjeyan pêk tên ku yek ji wan biwate yek jiwan bêwate ye û bi piranî bêjeya duwem bi tîpa ‘m’ yê dest pê dike. Tîpa ‘m’ ducarîbûnê xirab dike û bêjeya duwem bêwate dike.”

(60)

Bo nimûne: tişt mişt, pez mez, dar mar

Carinan du peyvên bê wate jî digihîjin hev lê wek sembolekê dibin ifadeya tişteki. Zêdetir di axaftinan de an di listikên zarokan de tên bikaranîn (Ertekin û Acar, 2012: 85).

(61)

Bo nimûne: qilopilo, çizûviz, tiroviro

1.2.2.3. Cotepeyvên Hevedudanî

Cotepeyvên hevedudanî ew in ku du bêjeyên bi gihaneka “û” yê, bi herfa “o” an “e”yê an jî bi navbendekê bi hev ve tên girêdan. Dikare bêjeya pêşî biwate û ya paşî bêwate be û dikare du bêjeyên diwate bi navbendekê bi hev ve girê bide (Ertekin û Acar, 2012: 85).

(62)

Bo nimûne: serobino, gurmegurm, zarezar, xirûxalî, şilfûtazî

Bi çend mînakan em ê binêrin bê ka guncanîya cotepeyvyan ji bo hemû hêmanên hevokê çawa çêdibe.

Cotepeyv carinan bi tena serê xwe û carinan wek raveber an raveker di nav cureyên ravekan de dê werin mînakdan. Lewra di metneke sînorkirî de zehmet e ku ji hemû hêmanan mînak werin dîtin. Lê em ê binerîn bê ka Bazîdî ji cotepeyvyan çawa sûd wergirtiye.

1.2.3. Cotepeyv Wek Kirde

Di mînakên me de ku ji metna em li ser dixebitin, hatine tespît kirin cotepeyv dema kirde be pêvebera me navdêr e an jî lêkereke hevedudanî ye ku ji navdêrek û lêkereke alîkar pêk tê. Helbet divê wiha neyê fahmkirin ku hevokên ku kirdeya wê cotepeyv be divê pêvebera wê jî navdêr be an lêkereke hevedudanî be.

Mînak:

(63)

a. Êdî ji cihekî umîda ehlê kelê namînitin û tab û taqeta dijminî jî tunî nin. (34/15)
Kirde

b. Êdî pirs û pirsiyar nînin, ji xwe evne fermanlo ne, ... (40/22)
Kirde

c. Nîvê şevê tete serbanê ku belê deng û his tunine ... (5/15)
Kirde

d. gelek fitne û fesad peyda dibe. (14/12)
Kirde

1.2.4. Cotepeyv Wek Pêveber

Mînak:

(64)

a. Memed $\underbrace{qewî xweyî mal û hal bûye}_{Pêveber}$... (4/37)

Pêveber

b. Dîsanê ji Lezekiyan mirofekî xweyê cur'et navê Behram hebûye, ku (ew)

$\underbrace{bi dest û pê û qed û qamet}_{Pêveber}$ (p).

Pêveber

c. ... ewan çil-pênçeh xulam di nêva mizgeftê da $\underbrace{peran peran dike}_{Pêveber}$, (6/24)

Pêveber

d. Careke ji caran rehmet $\underbrace{li bab û dayêd guhdaran}_{Pêveber}$ (be), wiha $\underbrace{neqil û beyan}_{Pêveber}$ dikin.

(11/1)

Pêveber

Pêveber

e. ew siwar wisanê $\underbrace{tîş tîş kirin}_{Pêveber}$... (29/27)

Pêveber

1.2.5. Cotepeyv Wek Bireser

Mînak:

(65)

a. Her çi kesê ji we $\underbrace{du dest cil û libas}_{Bireser}$ heyin ... (3/4)

Bireser

b. Êdî min $\underbrace{aman û zeman}_{Bireser}$ nedayê, ... (4/10)

Bireser

c. Êvarê Behram $\underbrace{çek û sîlehêd xwe}_{Bireser}$ girê dide ... (5/14)

Bireser

d. ev xebera paş dibite $\underbrace{mucîbê dijminî û neyariyê}_{Bireser}$, ... (12/20)

Bireser

e. Lakin ji gundê tedarika firawînê dîkin û ji boyê paşayê zad û te'aman çê dîkin.
(32/10) *Bireser*

1.2.6. Cotepeyv Wek Têrker

Mînak:

(66)

a. Kirêt car peya dibê û car ez sancu bûme, nexweş im dibêje, hêdî hêdî hespî
dajotin. (19/13) *Terker*

b. Eger çî jin û xuha Mihemed Begê jî di odê da dîkine hewar û gazi. (5/44)
Terker

c. Paşa zahf û hindik tişteki didete wî. (6/4)
Terker

d. Ew jî diçite Eleşkirê dibite mîr û qewî birebt û zebt hukumet dîke... (10/10)
Terker

e. dem bi dem ji esmanan dibarî., ... (14/26)
Terker

f. êre da wê da Heyder jî tune. (17/22)
Terker

g. deste deste bisekinin. (11/17)
Terker

h. terf erf û kom kom berhev kirîne. (37/19)
Têrker

1.3. KOMA JIMARNAVAN

Qismek ji vê mijarê him di raveka hevalnavî him di raveka jimarîn de hate behskirin. Em ê li vir wek qaîdeyên jimarnavan behsa çend xalan bikin.

- Ji bilî hejmara “yek”ê hemû hejmar nêr in (Celadet û Lescot, 2009: 216; Aydogan, 2012, 236). Dibe ku li hin herêman “yek” wek mê jî bê telafûzkirin.

- Di koma hejmaran de hejmara biçûk li dawiyê ye û ya mezin li serî ye: çil û yek, şêst û çar, nod û pênc.

- Hejmar ji hev cuda tên nivîsîn û bi gihaneka “û”yê bi hev ve tên girêdan: sed û çil û yek, hezar û nehsed û heştê û çar.

- Ji hejmarnav “du”yan heta “nozdeh”an hemû hejmarnav bi “an”ê ditewin: ji çaran, ji bîst û çaran, ji heştan, ji hezar û şêst û heştan (Celadet û Lescot, 2009: 216; Aydogan, 2012, 236). Li hin herêman “dido” wek “didoyan”, “diduyan”, “didiwan” jî tê tewandin.

- Hejmarên bîst, sî, çil, pêncî, şest, heftê, heştê, nod, sed, hezar, milyon, milyar û hwd bi herfa “î”yê ditewe: sihî, çilî, pêncî, şêstî, sedî...

- Heke jimarnav bi pêş daçêkek an jî bi bazindaçêkek were bikaranîn jimarnav ditewe: ji hezaran, ji bîst û çaran, ji pêncan.

- Jimarnav di raveka hevalnavî de wek hevalnavê, di raveka navdêrî de jî wek navdêrê kar dike. Mînak:

(67)

a. Îcarê ji kenarê Sêwas û Toqat û Amasyeyê qederê **du hezar siwarêd lewendan** pev ketî. (40/9)
Têrker

Di vê mînakê de du hezar havalnava navdêra “siwar” e.

Dîsa di van mînakên li jêr de jî erka jimarnavan wek têrkerê ne.

b. Bi vê terzê bê tirs bi kêfa xwe her rojê **du sê saet** diçûn ... (40/14)
Têrker

c. **û ji sê sedî jortir** espê extirme istandî. (39/23)
Têrker

Di vê mînakê de jî di pêveberê de bi cih bûye.

d. Evne **du hezar siwar** îj. (40/29)
Pêveber

Ji van mînan em dikarin bibêjin ku koma jimarnavan xweser di berhemê de ya ku em li ser dixebitin cih negirtine. Yan wek cînavkê yan wek hevalnava ravekekê yan jî wek hokerekê di hevokan de erka xwe bi cih aniye. Ji ber ku ew jî her yek di mijara xwe

de hatiye ravekirin em van babetan li vir hawaleyî wan dikin. Tenê du mînak hene ku divê em behsa wan bikin, ew jî ev in:

(68)

- a. Xelîl Beg dibêje ku Hesên Beg min vê kurka *bi pênc hezarî* kiriye ... (10/23)

Têrker

- b. Riwayet dikin ku *di tarîxa hezar û dused û nozdeyê danê*, di weqtê xîlafeta

Têrker

Sultan ‘Ebdulhemîd Xan danê, ji hakimêd xwecihî Mehmûd Paşa hakimê Bazîdê bûyî.

1.4. KOMA DAÇEKAN

Di lîteratura rêzimanê de wateya daçekan ev e: Daçek bi tena serê xwe bêwate ne lê bi alîkariya peyvên din wateyeke nû derdixin holê.

Ciwan (1992: 139) erka daçekan wiha rave dike: “Çawa dikarin di hevokekê de bi tena serê xwe bin, wisa jî bi hevalnavek, hokerek, lêkerek, cînavkek û navdêrekê re hevalnav û lêker û hokereke nû jî peyda bikin.”

Wek pêşdaçek, paşdaçek, bazindaçek û daçekên ku peyvên dîtir bi xwe ve girê didin cureyên wê hene. Bi van cureyan rol û girîngiya daçekan zêde dibe. Li jêrê em ê behsa cureyên daçekan û taybetiyên wan bikin û piştî jî wek hêmanên hevokê rola daçekan binirxînin.

Pêşdaçekên me ev in:

(69)

- a. *Bi*, wateya bihevrebûn, hevaltî, navgîn û amrazê îfade dike. (bi xweşî, bi Mîrzayî)
- b. *Bê*, wateya jixeynîbûn, bêyîbûn, xaricîbûnê îfade dike. (bê destûr, bê kêmasî)
- c. *Di*, wek daxilbûn, hundirîn, têdebûnê tê îfadekirin. (di polê de, di pirtûkê de)
- d. *Ji*, bi maneya dûrketin, derçûn, devjêberdanê tê îfadekirin. (ji Amedê, ji par)
- e. *Li*, wateya lêbarkirin, cihnişandan û dayînê îfade dike. (li malê, li derve)
(Celadet û Lescot, 2009: 242)


Paşdaçek jî sê heb in ku dikare were dawiya hemû pêşdaçekên ku me li jorê nivîsîn. Ew jî ev in: "... *de*", "... *re*", "... *ve*". Li hin herêman û di helbest û berhemên klasîk de wek "... *da*", "... *ra*", "... *va*" jî tê telafûzkirin. Di vê berhemê de ji paşdaçekan "*de*" û "*re*" wek "*da* û "*ra*" derbas dibe lê heçî "*ve*" ye ew her "*ve*" tê telafûzkirin.

(70)

- a. *Xewfa wî hebû bi xef ji tacdîn*
- b. *Daîm **di** dile wî **da** hebû kîn* (Xanî, 2013: 143)
- c. *Waris **ji** te **ra** kefenbehayî*
- d. *Hetta nekirrin diden hesayî* (Xanî, 2013: 198)
- e. *Ji şekle ebrûyên saqî hilatin sed hîlal îro*
- f. *We bedrek min muqabil dî îşaret min **ji** ekse **da*** (Cizîrî, 2013: 13)
- g. *Bi husna xwe îlahî kî bi sehm û heybete dînê*
- h. *Nicûm û kexkebê lami' ji bala tîn **bi** bejnê **da*** (Cizîrî, 2013: 14)
- i. *Hin **ji** nik dêrê **ve** tîn qesda kenîştê hin dikin*
- j. *Ney ji van im ney ji wan im derê xemmar-i bes* (Cizîrî, 2013: 62)
- k. *Ellah li min hubba te çî şekker û nebat e*
- l. ***Ji** nû **ve** dê ciwan bim ger bihn bikim gula geş* (Cizîrî, 2013: 63)

Heke hem pêşdaçek hem paşdaçek bi hev re bê bikaranîn ev wek bazindaçekê tê pênasekirin. Her çar pêşdaçek her sê paşdaçekan hildigirin.

(71)



Mînak:

(72)

- a. ... hersê bûyne oldaşêd yekûdu û **bi** rê **da** diçûn. (1/1)
- b. Êdî tişte **di** destê min **da** nemaye. (4/32)
- c. ... û derê odayê **ji** hindur **da** dadide ... (5/20)
- d. Meger bi qezaen Mihemed navê mirofekê Heyderî di gel deh siwaran li wan nêzokan **bi** riya xwe **da** diçûn. (7/17)

- e. ... hemû **di** destêd filan **da** bûn. (31/2)
- f. ... Xulase **ji** êre **da** wê da, ... (37/50)
- g. ... û darêd xwe jî **di** kulavê **ra** kiriye, ... (25/31)
- h. ... û **bi** 'Eskerxan **ra** şerê dikin, ... (34/10)
- i. Çerxa felekê **bi** kesekê **ra** nedomandiye. (40/79)
- j. **Ji** wî Îsmâîl Begê **ra** xelqê Kuçîk Şahîn digotin. (15/10)
- k. Paş niha dostiya min û te êdî nîne, **bi** bal min **ve** meyê. (4/33)
- l. Evne **ji** nişkê **ve** peyda bûn, dest bi revê dikin. (7/20)
- m. Êdî ji tirsan bêxtiyar ez **ji** xwe **ve** çûme. (18/17)
- n. ... hêdî hêdî bi rojê Mela Mihemed weko Eflatûnê **bi** jor **ve** diçitin. (25/26)

Ji bilî vê hin daçek an paşdaçek bi awayeke cuda jî hatine gotin.

Bo nimûne:

(73)

- a. **Lewranê** di nêv ehlê ekrad ev şûla qewî zêde 'ar e. (26 (31
- b. **Lewranê** êdî ji kesekî tirs û perwa wan nebûyî. (40/15)
- c. ... bilanê mirofek **ji** terefê me **danê** biçite ser pezêd we bifiroşitin, ... (25/50)
- d. **Di** du mehan **danê** guya xetma quranê diketin. (28/27)

Hin daçek di berhemê de nehatine bi kar anîn. Wek: “ji ber vê yekê, ji bilî, ji xeynî [tenê di cihekî de *ji xeyr* (29/10) derbas dibe], lewma, bi vî awayî,

Ji bilî vana hin daçek hene ku Celadet (2009: 243) wek komdaçek binavkiriye û mînakên wê wiha daye: “*li ber*”, “*bi ser ... de*”, “*di ser ... re*”, “*di bin ... re*”.

Taybetiyeke din ya daçekan jî ev e ku peyva bi xwe ve girêdayî ditewîne. Ji bilî telafûzên herêmî hemû daçek peyva li pey xwe ditewînin.

(74)

Wek: li *malê*, bi *Ehmedî* re, di *polê* de, ji *min*, bi *wî*,

Kirpandin di hevokên bi vî rengî de zêdetir li ser daçekan e.

Daçek bi lêkeran re wek biwêj jî tê pêşberî me û heke ew biwêj wek navdêr bê bikaranîn wê demê daçek û navdêra wê bi hev ve dizeliqin. Di berhemê de lêkerên biwêjî

yên ku wek navdêrê hatibin bikaranîn nehatin dîtin lê gelek pêveber hene ku ji lêkerên biwêjî pêk tên.

Bo nimûne:

Hez jê (ji wî/wê) kirin

(75) Ewî û Barnik *hez ji yekûdu dikirin* û hevûdu hebandine. (8/5)

Dest pê (bi wî/wê) kirin

(76) Êdî Memedî cewaba min nedayî, *dest bi çêran kirî*. (4/25)

Ser jê (ji wî/wê) kirin

(77) Siyahmed jî digehe ser gayê û kêrê bidertîne ku gayê serjêke. (13/28)

Lê (li wî/wê) dan

(78) ... du sê xençeran lê didetin, ... (15/33)

Lêkerên biwêjî bi du awayan çêdibin; yan ji daçek, cînavk û lêkereke alîkar yan jî navdêr, daçek, cînavk û lêkereke alîkar pêk tên. Lê cînavka me li vir bi pişka zor cînavka lihevxiştî ye.

Daçek + cînavk + lêkera alîkar

Navdêr + daçek + cînavk + lêkera alîkar

Di her du şiklî de jî lêkerên biwêjî tenê navdêr, ji koma peyvan cureyek an jî lêkernav, lêkerhevalnavan di xwe de dikare bihewîne. Wate lêkereke kêşayî nikare xwe di nav vê avahiyê de bihewîne. Çawa ku nikare di nav bazindaçekan de bi cih bibe. (Amd. Alan û Opengîn, 2014: 183)

Wexta ku em behsa komdaçekan dikin wate jê ev e ku daçek, bi navdêrek an jî bi koma peyvekê re qalibên nû pêk tîne.

1.4.1. Daçek di Nav Kirdeyê de

Daçek li gor şertên rêzimanê di hevokekê de wek kirde dikare bê nivîsîn, lê belê mînakên bi vî rengî di berhema me de nehatin dîtin. Daçek dibe ku bi navdêrê an bi koma peyvan re an jî di nav hevokeke alîkar de bi kar bê ku ew jî wek kirdeya şahkomekê ji hêla hêmanên hevokê ve cihê xwe bigire.

Bo nimûne:

(79)

a. ... û tucarê ku li ser barekî siwar bû ji hêstirê kete erdê. (4/9)

Kirde

b. Ew mirofê li ser berî difikire ... (36/31)

Kirde

c. ... ji saya hezreta we 'alim û 'ilma di Kurdistanê da zaf bibin. (28/33)

Kirde

1.4.2. Daçek di Nav Pêveberê de

Daçek di nav pêveberê de jî bi cih dibe.

Mînak:

(80)

a. ... herçi îrad gund û medaxil hebûye, di dest e'yan û axayêd cihê da bûne.

(11/2)

Pêveber

b. Ga ji hewla canê xwe şaxekî li Siyahmed didetin... (13/29)

Pêveber

c. Îcarê gundî tên û avê bi îmamî vedireşînin, dereng êdî îmam bi xwe ve têtin, ji wî

Pêveber

dipirsin, ku çi bi te hatî ku eqlê te çûyî, ji xwe ve çûyî? (18/15)

Pêveber

d. Pêxember eleyhisselam melekêkê mezin dît ku dehulkê zêde cisim di estû da ye

Pêveber

çomaxekê mezin di destî da ye, weha muntezer westa ye. (2/2)

Pêveber

1.4.3. Daçek di Nav Bireserê de

Hemû daçek di hevokê de wek bireserê dikare bê bikaranîn. Lê belê daçeka “bi” û “bê” di nav bireserê de dibe pêşqertafa navdêrê û bi peyvê re dizeliqe. Ji ber ku êdî wek

hevalnavê ye. Lewra “bi” û “bê” di rewşa navdêrî û hevalnavî de bi peyvê zeliqandî ne lê di rewşa hokerî de ji hev cuda tê nivîsîn. (<https://sites.google.com/a/baranrizgar.co.cc/azadiya-kurdistane/home/pirs-u-mijaren-zimane-kurdi/bi-u-be>)

Bo nimûne:

(81)

a. evan xulaman ew zadêd bijehrê xwerîn di vê germê danê ... (32/22)

Bireser

Lakin ewî jî *kurêd ji babê bedtir* hebûn ... (16/21)

Bireser

b. Îcarê Adile Xanimê mirofeqî ji ehlê heremê virê dike nik Şêxî Begê ... (9/10)

Bireser

1.4.4. Daçek di Nav Têrkerê de

Daçek carinan di nav têrkerê de jî tê bikaranîn.

Mînak:

(82)

a. ... evne ji boyê min ra miyeser nebûn. (28/40)

Têrker

b. Her sê jî bê mirad çûyîn. (8/24)

Têrker

c. Paş wê îmam nexweş ketî, qederê du mehan bêkêf razayî, ... (8/18)

Têrker

1.5. KOMA GIHANÉKAN

Gihanek peyv an hevokan bi hev ve girê didin. Gihanek, ji yek zêdetir peyv an li gorî rêzê (û), li gorî berawirdkirinê (an... an..., him... him..., ne... ne..., jî... jî... û hwd), li gorî hevtayiyê (an, an jî), li gorî hêzdayînê (ne, jî), an jî wek hevokan (lê, lê belê, digel û hwd.) li gorî wateyê bi hev ve girê didin. Hin gihanek hene ku ji aliyê wateyê tu

bandorê li hevokê nakin wek “û”yê. Hin jî hene wateyê tamam dikin. Dema gihanekên bi vî rengî ji hevokê kêr bibin wateya hevokê têk diçe.

Em gihaneka dikin du beş: Gihanekên koordînasyonê/Gihanekên Ahengsaz û Gihanekên Subordînasyonê/Gihanekên Alîkar (Celadet û Lescot, 2009: 269; Tan, 2015: 201).

1.5.1. Gihanekên Ahengsaz/Gihanekên koordînasyonê

Ev cure gihanek du hêmanên wekhev bi hev ve girê didin. Tan (2015: 201) van gihanekan jî di nav xwe de daye dabeşkirin.

(83)

- a. Gihanekên girêdanê: (û, her wekî, ne... ne..., her wiha)
- b. Gihanekên cudaker (an, an... an jî...)
- c. Gihanekên nakokiyê (lê, lê belê, ji aliyê din, tevî ku, berevajî)
- d. Gihanekên sedemî (ji bo, ji ber vê yekê, loma)

1.5.2. Gihanekên Alîkar/Gihanekên Subordînasyonê

Hin gihanekên alîkariyê tînin pêşiya komekên hokerî û tîkiliya sedem (ji ber ku), navgîn (bi) û demê (dema ku, berî ku, piştî ku) pê tînin. Hin daçek û hoker bi gihaneka “ku”yê ve tê bikaranîn û hevokên alîkar bi hevoka bingeh ve girê didin. An jî raweya daxwazî û xwestekiyê bi hevokekê din ve girê dide (Celadet û Lescot, 2009: 269; Tan, 2015: 201).

Ji bo van gihanekan çend mînak ev in: bes, çawa... wisa..., jî, her çend... ew çend..., çi qas... ew qas..., lewre, dibe ku, heke na, nexwe, dema ku, heta ku, hew, mixabin, di ser de jî, ji ber ku, lê, lê belê, û, qet, nebe, yan,, yan jî..., anku, çi... çi..., hem... hem jî..., û hwd.

Hoker, daçek û gihanek carinan mînakên wan dibe ku wek hev bin. Ji ber ku hin peyv li gor qaîdeyên rêzimanê dikevin nav her sê kategoriye. Ev jî li gor wate û erka peyvê teşe digire.

- Peyvên ku koma gihanekan pêk tînin ji duduyan zêdetir bin gihaneka “û”yê dikeve navbera her du peyvên dawî, hêmanên din bi bêhnokê ji hev vediqetin. Lê di klasîkan de bêhnok pir kêr tê bikaranîn. Ji dêvla bêhnokê gihaneka “û”yê dikeve navbera peyvên

wekhev. Di berhemê de jî ku ji çil çîrokan pêk tê, hejmara gihaneka “û” yê digihê du hezar û not û çaran.

Bo nimûne:

(84)

- a. “Barêd wan hemû *çox û qumaş û etles û canefis û qirmiz* bûyê, li deşta Fazîkulê belav kirîn.” (20/2)
- b. “Lakin ji boyê *bira û kur û xulam û tayfeya wî hemû* ra ye,” (21/47)
- c. “Bi rastî Şomo *qewî nehs û şerîr û xweyî cesaret* bû.” (22/4)
- d. “Êdî min seh kir ku ji der ve bûye *qal û meqal û qûrî û şemate*.” (22/15)

- Dibe ku li pêş û paşê gihanekê an jî tenê li aliyekî, ji koma peyv an ravekan mînak heb in.

Bo nimûne:

(85)

- a. “Riwayet dîkin ku di zemanê pêşîn da ji ekradêd xeymenîşêd Bohtan ji tayfa Dudêran, *mirofekî halxweş û xweyî rizq û mal û dewlet* hebûye”
 - b. “Bi dengê tepançeyê êdî *da Çinarê û du kurêd zarok* hebûye ...” (26/23)
 - c. “... ji saya hezreta we ‘*alim û 'ilma di Kurdistanê da zaf bibin*.” (28/33)
- Carinan dikeve navbera raveker an jî raveberên ku ji yek zêdetir peyvên pêk tên

Bo nimûne:

(86)

- a. Berê niha *mela û feqehayêd Kurdistanê*, gelek dizî ji dêrêd felan dîkirin. (22/1)

{	<i>Raveber</i>	{	<i>Raveker</i>	}
	{			
	<i>Raveka zincîrîn</i>			
- b. “Xulase *kar û kespêd wan* eve bûn.” (22/7)

{	<i>Raveber</i>	{	<i>Raveker</i>	}
---	----------------	---	----------------	---
- c. “Neql dîkin ku li van nêzokan *mirofekî reşîd û camêr* ...” (26/1)

{	<i>Raveber</i>	{	<i>Raveker</i>	}
---	----------------	---	----------------	---

Koma gihanekan wate jê ew e ku di peyvîzê de peyvên ku bi gihanekan re bi hev ve girêdayî ne. Em wek hêmanên hevokê koma gihanekan li jêrê bi mînanan rave bikin.

1.5.3. Koma Gihanekan Wek Kirde

Koma gihanekan di hevokê de rola kirdeyê hildigirin ser xwe. Çend mînak ji berhemê ev in:

(87)

a. Êdî diran û herdu destêd melayî hatine girtin... (1/7)

Kirde

b. Jin û kur diçine mala Şêxî. (6/14)

Kirde

c. Ewî û Barnîk hez ji yekûdu dikirin û hevûdu hebandine. (8/5)

Kirde

d. ... gelek fitne û fesad peyda dibe. (14/12)

Kirde

1.5.4. Koma Gihanekan Wek Pêveber

Koma gihanekan wek pêveberê di hevokê de bi cih dibe.

(88)

a. Îcarê xweyê malê dizane, ev Mam Bapîra cahil û ehmeq e. (24/11)

Pêveber

b. ... tu hinde fazl û alim û kemal î ... (28/4)

Pêveber

c. Lale dibêjitin ku eve ji mirofêd Enatolê û ekradan in ... (25/7)

Pêveber

d. Lakin qewî zêde lawekî ciwan û sipehî bûye... (34/4)

Pêveber

e. Qewî zalim û bêdîn bû.

Pêveber

1.5.5. Koma Gihanekan Wek Bireser

Her wiha gihanek carinan biresera jî bi hev ve gire dide.

Mînak:

(89)

a. *Şerbet û qawe û bulxor û gulab* ji boyê Şêxî Beg tînin... (9/18)

Bireser

b. tobe min *cil û zêr* nevêtin ... (11/24)

Bireser

c. Ez dê *mu'în û oldaşêd Şekir Axayî hemû* bigirim ... (21/40)

Bireser

d. Lakin ewî Mam Bapîrî, meger qet tu caran *mizgeft û xutbe* nedîtiye. (24/6)

Bireser

1.5.6. Koma Gihanekan Wek Têrker

Koma gihanekan wek têrkerê jî di hêmanên hevokê de bi cih dibe.

Mînak:

(90)

a. *Êre û wêda* pirsiyar dikin. (13/15)

Têrker

b. Ew herdu jî *bi lez û bi xar* dajon. (13/19)

Têrker

c. Eba û ecdadêd wî *rûs û ûrde* digeriyan ... (15/2)

Têrker

d. Îcarê *paşê seet û nivê*, şemal digehte barûtê ... (16/16)

Têrker

Ji bilî van hin gihanekên dîtir jî hene ku me tespît kirine. Ew jî ev in:

û: Neql dikin ku carekî melayek *û* dû nefer mirofêd cahil *û* nexwendî (1/1)

hem: ji welatêd Sêwasê û *hem* ciwarêd wê... (40/10)

Gihanekên ku hevokan bi hev ve girê didin:

û: Mela li pêşî bû *û* ew her du mirofêd cahil jî li duyê mela bûn. (1/3)

ku: ... gazî hewalan dike *ku* welleh behra min di wî pîstî da jî heye. (1/9)

lakin: Melekê cewab daye ku hete niha ez muntezer im *lakin* min qet li duhulê nedaye ... (2/6)

lewrane: Yanî xwendeyêd hemû milletan, ekserî kêr ihsan û kêr ikram dibin, *lewrane* ew dixwezin xelq ikram û ihsanê li wan bikin ... (2/7)

da: ... bi şev gote jina xwe ku cilêd dişon bûyne berşuwêd bêne *da* ez cilêd xwe veguhurim. (3/6)

eger çî: Ev qiseye *eger çî* hindekî ji 'eqlan dût e, *lakin* li wan etraf û eknafan meşhur e... (37/58)

her çend: *Her çend* jin û xuh lawahî dikin, eman derî veneke, te çek tunîne ... (5/24)

weko: *Weko* Behram tête hindur û Mihemed Beg li piştê derî bûye, piştê Behram bi bal Mihemed Begê ve dikeve. (5/31)

eger: *Eger çî* jin û xuha Mihemed Begê jî di odê da dikine hewar û gazî. (5/44)

yan... ya...: Karbarê xwe bike *yan* ez dê li rûyê dinê xweş bibim, *ya* dê tu xweş bimînî. (8/16)

yan... weya...: Ew mirofe jî du'a li dewleta hewe diketin û hêvî diketin, bilanê *yan* min bikujin *weya* biderîne û aza bike. (38/37)

1.6. KOMA BANEŞAN

Baneşan ew cure peyv in ku ji bo derbirîna hest, daxwaz û gilî û gazinan an jî ji bo destpêkirina gotûbêjê tîrî bikaranîn. Zor caran wateyeke baneşanan bi tena serê xwe nîne. Gelek caran jî ji peyvên zimîn wek gurmegurm, guregur, teqereq pêk tîrî (Tan, 2015:205).

Zêdetirîn baneşanên ku di Kurmancî de tên bikaranîn ev in: *Aferîn, ah, ax, de, gelî, ha ho, he, herik (errik), heyf hê, ho, lê, lo, ox, pêk, pey, pif, pix, tew tew, tifû, wex, wey, ya, hoşt, oxweş, of, ço ço...* û hwd.

Ji bilî vana carna li pişt hin navdêran herfa “o”, “ê” û “no/ino” jî tê barkirin û wek rewşa baneşanê tê telafûzkirin.

Bo nimûne: Hevalo!, Hevalê!, Hevalno! Birano!, Zarokno! ... û hwd.

Ji bo nêr: o

Ji bo mê: ê

Ji bo pirjimar: no/ino

Her wekî hinek peyvên ji dengên siruştî û teqlîdî jî wekî baneşan tên pejirandin: *vizz!, gurm!, teeq!, virrr!, piss!, zing!, ring!...* hwd (Tan, 2015:206).

Koma baneşanan dibe ku ji ravekan pêk bê:

(91) *Ey cema'etê mislîmîn!* (3/3)

Koma baneşanan ji yekî zêdetir hêmanên navdêran pêk tên: *Hewar ji dest neyaran, ew ên xwînmij û xwînxwar!*

Baneşan wek hêmanên derveyî hevokê tên hesibandin. Lê ji aliyê wateyê ve hevokê tamam dikin an jî wateya hevokê xurt dikin.

Mînakên ku me ji berhemê tespît kirine ev in:

(92)

a. ... *gazî hewalan dike ku welleh* (!) behra min di wî pîstî da jî heye. (1/9)

Xulase, ez çûme serbanê ber kulekê, min gazî kir ku *Memed Memed* (!) were derî veke. (4/24)

b. *Gotine min, welleh* (!) em nizanin, ji kê derê ye, ... (4/37)

c. ... *Îbrahîm, seyê pîsê san* (!) nê ez Çinar im. (26/20)

d. *Wey Çinar Axa* (!) tu kengî hatî û eve çi ehwal e dibêjin. (26/24)

e. *Îcarê paşa jî virêdîketin û Çinar Axayî gazî huzura xwe diketin ku aferîn sed aferîn* (!) û xelatekê jî didete Çinarî û ji boyê xwe dikete delîbaşî. (26/29)

f. *Dikete gazî ku ey mirof* (!), tu çi kes î û eve çi hal e, ji boyê min bêje. (36/13)

- g. *Îcarê sê caran ew mela bi deng ji tirsî pîrî gazî dike ku ya Mihemed (!) ya Mihemed (!) ya Mihemed (!) (7/16)*
- h. Rewend gazî diketin tu *du'a xwe terk meke! ... (36/32)*
- i. Rewend evê xeberê dibêjtin û rikêban li hespê didetin, *ya Allah (!) diçite şûla xwe. (36/33)*
- j. Ewî melekî cewab dayê ku *ya Resulûllah (!) ez mamur im ... (2/4)*
- k. Ew mirofê li ser berî difikire ku rewend qesda çûnê ye, *dikete gazî lo mirof (!) tu çi dikî? (36/31)*

Divê li vir bê zanîn ku di berhema Bazîdî de xala baneşanê nîne. Lêbelê ji hevokên li jor diyar e ku gazîkirin heye. Lewma ji bo vê hevokê xala baneşanê divê. Ji ber vê yekê em baneşanê di nav kevanekê de nîşan didin. Nexwe di berhemên me yê klasîk de xalbandî zaf nehatiye bikar anîn.

1.7. KOMA UNWANAN

Li gor Ergin (2005: 389) “Gruba unwan ji koma peyvan e ku ji navê şexsekî û unwana wî an jî ya ku ji navê merivantiya wî pêk tê. Navê şexs pêşî û unwana wî piştî navê wî tê. Her du jî tu qertafê wernagirin.” Di kurdî em nikarin bibêjin hemû unwan piştî navdêrê tên. Ji ber ku hin unwan tên pêşîya navdêrê jî. Du formulên me hene ku li jêrê em ê mînakên wan binivîsin.

Wek mînak:

navdêr	+	unwan	unwan	+	navdêr
<i>Huseyîn</i>	+	<i>Paşa</i>	<i>Mîr</i>	+	<i>Celadet</i>
<i>Xelîl</i>	+	<i>Beg</i>	<i>apê</i>	+	<i>Osman</i>
<i>Kawis</i>	+	<i>Axa</i>	<i>mamoste</i>	+	<i>Xanî</i>

Koma unwanan bi ravekan re tê bikaranîn.

(93)

- a. Malbata me çû *serdana mala apê Osman.*



Raveka zincîrîn

- b. Dengbêj *strana Kawis Axa* distrand.



Raveka Navdêrî

Koma unwan bi gihanekê re wek koma gihanekê jî kar dike.

(94) *Mîrza Begzade Hecî Mûsa Beg û Sadûllah Efendî* du kesên ji lijneyê bûn.

Koma gihanekê

Di vê hevoka dawî de hem gihanek du koma unwanan bi hev ve girêdaye hem jî navdêr li pêş û paşiya xwe unwan wergirtiye.

1.7.1. Koma Unwanan Wek Kirde

(95)

a. Meger *jina Mela Bazîd* jî hatibûye guhdariyê. (3/5)

Kirde

b. *Mîrzoyê Reş* hebû, ji tayfeyêd Êzdiyêd Wanê bû. (4/1)

Kirde

c. *Mamê Xan Mehmud* mîrê qeza Miksê bû. (9/2)

Kirde

d. Carekê *Mela Mihemedê Qulpî*, xurcekî biçûk kitêban li milan û şîr û mertal li pişte... (7/2) *Kirde*

1.7.2. Koma Unwanan Wek Pêveber

(96)

a. ... navê yekê *Şêx Mihemed Beg* û navê yekê *Şêx Mistefa Beg*. (16/20)

Pêveber

Pêveber

b. ... ez mêwanê *Şekir Axayî me*. (21/15)

Pêveber

c. bilanê navê vî zatî *Mihemed Efendî bitin*. (28/22)

Pêveber

1.7.3. Koma Unwanan Wek Bireser

(97)

- a. Lakin (Wan) Adile Xanim nekuştin, ji kelê bideranîn û şandine nik birayê wê
Bireser

Hekariyan ... (9/43)

- b. Paş mûdeyekê Îbrahîm Xan Begê, Şekir Axayî gazî mala xwe diketin ... (21/13)
Bireser

- c. Îcarê xundkar rica Mihemed Efendî qebûl diketin ... (28/34)
Bireser

1.7.4. Koma Unwanan Wek Têrker

(98)

- a. Rîwayet dikin ku di weqtê Kor Yusif Paşa walîtiya Erziromê, ji mîrêd Xunusê
Têrker

qedîm Mihemed Beg hebû ... (5/1)

- Îcarê jinê gotiye ku ji boyê çî em biçine mala Şêx Îsmail? (6/12)
Têrker

- b. Ew xulam xwe davên nêva Paşayê û Îsmail Axa ... (6/24)
Têrker

BEŞA DUYEM

HEVOK Û CÛREYÊN HEVOKÊ

2.1. HÊMANÊN HEVOKÊ

Hevok ji çar hêmanan pêk tê. Ji wan kirde û pêveber hêmanên bingeh in. Bireser û têrker an hoker hêmanên talî ne. Qesta me ji bingeh û talî ev e: hêmanên bingeh, hêmanên sereke ne, hevok li ser wan ava dibe. Yanî bêyî wan hevok dirist nabe. Heçî yên talî ne ku nebin jî hevok dikare ava bibe, lê dema em wan têxin nav hevokê wateyê tamam dikin an xurttir dikin.

2.1.1. Ergatîvî di Kurdî de

Di zimanên ergatîv de pêveber-hem lêkerên gerguhêz hem jî yên negerguhêz- di hemû deman de dikeve bin bandora bireserê. Di Kurmancî de pêveber, heke lêkera gerguhêz be di demên borî de dikeve bin bandora bireserê ango bireser xwerû dimîne lê tewanga xwe li pêveberê bar dike; di dema niha û di dema bê de dikeve bin bandora kirdeyê, wê demê bireserê ditewîne. Yanî di Kurmancî de ev qaîde yekser ne derbasdar e. Ji ber vê yekê Kurmancî zimaneke nîv-ergatîv e. Bi mînakên li jêr, em vê babetê hinekî din jî şîrove bikin. Cînavkên kesane du cure ne:

Tablo 2.1. Cînav

Cînavkên xwerû	Cînavkên tewandî
Ez	Min
Tu	Te
Ew	Wî/wê
Em	Me
Hûn	We
Ew	Wan

Heke lêker negerguhêz be di hemû deman de cînavka kesane ya xwerû ye.

Tablo 2.2. Cînavkên kesane ji bo lêkerên negerguhêz

<i>Dema borî</i>	<i>Dema niha</i>	<i>Dema bê</i>
Ez çûm.	Ez diçim.	Ez ê biçim.
Tu çuyî.	Tu diçî.	Tu yê biçî.
Ew çû.	Ew diçe.	Ew ê biçe.
Em çûn.	Em diçin.	Em ê biçin.
Hûn çûn.	Hûn diçin.	Hûn ê biçin.
Ew çûn.	Ew diçin.	Em ê biçin.

Pêveber di bin bandora kirdeyê de ye. Hevokên bi vî rengî di hemû deman de li gor kirdeya xwe tên kişandin. Yanî qertafên me bi rêzî ji cînavkên yekjimar “-im, -î, -e (Ø)” û ji bo yên pirjimar jî “-in (n)” in. Hemû cînavkên pirjimar heman qertafê werdigirin.

Heke lêkera me gerguhêz be wê deme mînakên me ji bo dema borî, dema niha û dema bê bi vî şiklî ye.

Tablo 2.3. Cînavkên kesane ji bo lêkerên gerguhêz

<i>Dema borî</i>	<i>Dema niha</i>	<i>Dema bê</i>
Min sêv xwar.	Ez sêvê dixwim.	Ez ê sêvê bixwim.
Te sêv xwar.	Tu sêvê dixwî.	Tu yê sêvê bixwî.
Wî/Wê sêv xwar.	Ew sêvê dixwe.	Ew ê sêvê bixwe.
Me sêv xwar.	Em sêvê dixwin.	Em ê sêvê bixwin.
We sêv xwar.	Hûn sêvê dixwin.	Hûn ê sêvê bixwin.
Wan sêv xwar.	Ew sêvê dixwin.	Ew ê sêvê bixwin.

Di van mînakên de me dît ku lêkera gerguhêz di dema borî de kirdeyê û di dema niha û dema bê de jî bireserê ditewîne. Di hevokên li jor de sêv yekjimar e.

Dema ku em sêvê wek pirjimar hilbijêrin ji bo dema borî hevok bi vî şiklî çêdibe:

Tablo 2.4. Biresera Pirjimar di Lêkerên Gerguhêz de di Dema Borî de

Kirde	Bireser (Pirjimar)	Pêveber
<i>Min</i>	<i>sêv</i>	<i>xwarin.</i>
<i>Te</i>	<i>sêv</i>	<i>xwarin.</i>
<i>Wi/Wê</i>	<i>sêv</i>	<i>xwarin.</i>
<i>Me</i>	<i>sêv</i>	<i>xwarin.</i>
<i>We</i>	<i>sêv</i>	<i>xwarin.</i>
<i>Wan</i>	<i>sêv</i>	<i>xwarin.</i>

Sêv li vir di pirjimariyê de ye lê ji ber ku di dema borî de lêkerên gerguhêz barê tewangê ji bireserê digire ser xwe qertafa tewangê jî di pêveberê de xwe nîşan dide. Yanî pêveber bikeve bin bandora kîjan hêmanê, barên wê hildigire ser xwe.

Mînakeke din ji bo vê yekê:

(99)

- a. Ez Zelalê dibinim.
- b. Zelalê ez dîtîm.

Di hevoka (1) lêkera me gerguhêz e yanî pêdivî bi bireserekê ve dibîne. Di vê hevokê de bireser Zelal e ku ji terefê “Ez”ê ve tê dîtîm. Lewma tewiyaye. Ji ber ku zayenda Zelalê “mê” ye û qertafa zayenda “mê” jî “ê” ye Zelal qertafa “ê”yê wergirtiye. Di hevoka duyem de em dibînin ku kirde tewiyaye. Wê demê bireser tewanga xwe ji ser milê xwe diavêje û li lêkerê siwar dike. Ji ber vê yekê jî lêkera me qertafa kesandinê li gorî “ez”ê wergirtiye. Di dema borî de bo lêkera dîtînê hevokên dîtîr bi vî awayî ne. *Zelalê tu dîtî. Zelalê ew dît. Zelalê em dîtîm. Zelalê hûn dîtîm. Zelalê ew dîtîm.* Cînavka kesane ya yekjimar ya sêyem û cînavka kesane ya pirjimar ya sêyem wek hev in. Lê ji kişandina pêveberê em fahm dikin ku biresera me yekjimar e an pirjimar e.

Her wekî li jor hatibû gotin bireser girêdayî lêkerên gerguhêz e. Yanî hevokên ku lêkerên wê gerguhêz in pêwîstî bi bireserê ve heye. Wê demê divê em hinekî li vir behsa

lêkerên gerguhêz bikin. Wateya gerguhêz ew e ku lêker bi tiştêkî ve girêdayî ye. Mesela di hevoka “*Min xwar.*” de tiştêkî xwarinê ji hevokê tê hişê mirov. An jî “*Min dît.*” Tiştêke bê dîtî di hişê mirov de tê xeyalê. Dema em bibêjin “*Min nan xwar.*” Wate tekûztir dibe lê bêyî wê jî mane tê fahmkirin. An jî “*Min Ehmed dît.*” Bi heman awayî ew hevok ye ku lêkera wê pêdivî bi bireserêke ve dibîne.

Du cure bireser hene: biresera rastexwo (direct object/doğrudan nesne), biresera nerastexwo (indirect object/dolaylı nesne). Biresera rastexwo ew bireser e ku di bin kartêkeriya kirinê kirdeyê de ye. Di lêkerên gerguhêz de hevok li gor dema borî kêşayî be kartêkeriya bireserê li ser pêveberê heye.

(100)

... *me* + *ew mal* + *birine* + *Diyarbekrê* ... (22/27)

Kirde + Bireser + Pêveber Têrker

Di vê hevokê de pêveber li gorî bireserê hatiya kêşan. Lewra biresera hevokê *ew mal* pirjimar e lê li gor pirjimariyê ravebera wê nehatiye tewandin. Yanî negotiye “*me wan malan birin.*” Ji xwe lêkera birinê li gorî dema borî ji bo cînavka kesane ya pirjimar ya yekem divê kêşana wê wiha be:

Me bir.

Heke bireser yekjimar be:

Me ew bir.

Heke bireser pirjimar be:

Me ew birin.

Ji ber ku bireser pirjimar e li gor qaîdeyê hevok hatiye sazkin.

2.1.2. Hêmanên Bingehîn

Wek ku li jor hate gotin hêmanên bingeh du heb in: kirde û pêveber.

2.1.2.1. Kirde

Rêzimannasan kirdeyê wiha tarîf kirine:

Celadet û Lescot ji bo kirdeyê wiha gotine: “Navdêr, cînavk, rader û partîsîpên ku wek navdêr tên hesîbandin, peyvên ku bi çawanî û lêkdanê ve peywendîdar, hevokên navdêrî dikarin erka kirdeyê pêk bînin (2012: 324).”

Tan wateya kîrdeyê wiha daye: “Karek ji aliye bikerekî/bikerinan ve tê kirin, kirde ew hêman e ku biker nişan dide (2015: 332) .”

Yıldırım kirdeyê wiha tarîf kiriye: “Biker ew kes û tişt in ku yan lêkeran pêk tînin, yan jî lêker û hoker der bareyê wan de darazan radigihênin. Ji bo naskirina bikeran, ji pêveberan pirsên ‘kî?’, û ‘çi?’ tên kirin, bêjeyên ku bibin bersiva van pirsan biker in (2012: 302).”

Li gor Badıllı “Kirde ew tişt an kes e ku çêkera rewşê û pêkhênera lêkerê ya ku di hevokê de ye dide ragihandin. Bi kurtî ya ku kirdarê pêk tîne an jî peyv an koma peyv an a ku tiştêk e (1965: 152).”

Xoşnaw kirdeyê wiha tarîf dike: “Wek ewey (biker) debêt kesêk yan şitêk bêt, ke encamdanî yan encamdanî karêkî bikewête esto, yaxûd tenya boşayî û şiwênî biker le hevok kurdî da pîrr dekatewe (2014: 65).”

Tarîfa Xurşîd jî wiha ye: “Biker amaje be ew yeke (zîndewer yan tişt) deda ku karek çî deka yan çêkirdîye û le layen kirdar hatiye diyarkirdin (2013: 178).”

Ebdulfetah di berhema xwe de li ser têgeha kirdeyê zêde ranewestiyaye lê taybetiyên wê bi hûrgilî destnîşan kiriye û di bin du binbeşan de wek *karayên karên derhingêv* û *karayên karên nederhingêv* babetê îzah dike (2006b: 115, 119).

Taybetiyên kirdeyê ev in:

- Kirde berî pêveberê tê.
- Di hevokekê de ji bo ku kirde were dîtin pirsên *kî/çi* ji pêveberê tê pirsîn. Bersiva wê kirdeyê nîşanî me dide.
- Kirde carinan kirdarê lêkerê ye.

Ez dişixulim. Kesê ku karê şuxlê dike “ez” e.

Ji berhemê çend mînak bo vê yekê em ê li jêrê binivîsin.

(101)

a. Ê ku dest hilanî *kuştin*, êd mayî hemû *şelandin* û dest *girê dan*. (40/70)

b. Hêdî min xwe *avête* nehalekî. (4/11)

Carinan heman lêker di hin hevokan de bandorê li kirdeyê dikin carinan di hevokên dîtir de jî kirdeyê di bin bandora xwe de dihêlin.

(102)

a. ... ez dê hinde pez û dewarî *bideme* te. (27/4)

b. 'Erîze *daye*, dîsanê tu jê *çênebûye*. (28/8)

Di hevoka (a) de kesê ku pez û dewar dide kirdeya *ez* bi xwe ye yanî kirdarê lêkerê ye; heçî di ya (b) an de dîsa lêkera dayînê bûye pêveber lê kirde ketiye bin bandora pêveberê yanî ne kirdarê lêkerê ye. Wate xwediyê rewşa pêveberê ye.

- Kirde carinan jî ne kirdarê lêkerê ye lê bandora rewş û rûdanê li ser e.

Ez dimirim. Di vê hevokê de mirin rewşek e lê kirdarê wê ne “ez” e. Kirde di bin bandora rewşa mirinê de ye.

(103)

a. Gule vala *diçe*. (5/29)

b. Êdî mal û hal *dimîne* ji boyê min ... (17/14)

c. ... ew Mîre Beg jina wî berê *dimiritin*. (35/2)

d. Weha bi vê terzê li serê wî berî *disekinitin*. (36/9)

e. Sê gule weha di nêva konê malê da li Terlan Axayî *dikeftin* ... (27/38)

Ji van hevokan em dibînin ku lêkera *sekinîn*, *mirin*, *çûn û keftin* di hevokê de wek rewşekê bandorê li ser kirdeyê dike, lê kirde ne kirdarê van lêkeran in.

- Biresera lêkerên lebatî dibe kirdeya lêkerên tebatî. Ev jî bi lêkera *hatinê* çêdibe.

Mînak:

Min nan xwar.

Di vê hevokê de lêkera lebatî *xwarin* biresera nan hildigire. Dema ku em vê lêkerê bikin lêkera tebatî *nan* dê bibe kirdeya vê hevokê. “*Nan hat xwarin*.”

Gelek mînak ji berhemê dikare bê dîtin ku ji wan çend em ê li jêrê binivîsin.

(104)

a. ... ê ku hatine kuştin ê ku *hatine esîr kirin* ... (31/21)

b. Êdî diran û herdu destêd melayî *hatine girtin* ... (1/7)

- c. Êdî umêda min ji neqebê *hatiye birîn* ... (22/18)
- d. ... îfada halê xwe kir ku îşev malê min *hatiye dizîn*. (23/2)

- Hevoka ku pêvebera wê navdêr be kirdeya wê dibe xwediyê daraza hevokê.
(105)

Lakin ew *siwar e* û Polo *peya ye*. (8/14)

Di van hevokan de *siwar* û *peya* bi alîkariya lêkera *bûnê* pêveberê teşkil dikin. Kirdeya wan jî dîsa kesê *siwar* û *peya* nîşanî me didin. Yanî pêveber, rewşekê bi saya navdêra *siwar* û *peyayê* nîşan dide. Kirde jî di van hevokan de xwediyê vê darazê ye. Çend mînakên din ji berhemê:

(106)

- a. Mamê Xan Mehmud *mîrê qeza Miksê* [*qezaya Miksê*] *bû*. (9/2)
- b. ... navê wî gundî *Leşko ye*. (10/1)
- c. ... ji boyê çi *bêkêfî?* (11/8)
- d. Ez ji vê şûlê *poşman im*. (12/17)

Di hevoka (a) de pêveber wesfê kirdeyê hilgirtiye ser xwe, di ya (b) de pêveber navê gund hilgirtiye, di ya (c) de pêveber hevalnava kirdeyê ye û di ya (d) de jî pêveber wek navdêr rewşa kirdeyê diyar dike.

- Kirdeya hin hevokan veşartî ne. Hin hevok hene ku kirdeya wan neyê nivîsîn jî tê fahm kirin ku kirde kîjan e; yanî diyar e, ne meçhul e.

(107)

- a. (*Ew*) Daîm di vê fikirê da *bûye*. (14/13)
- b. (*Ew*) Niha jî li wê derê *ye*. (16/27)
- c. (*Ew*) Miqdarê şeş mehan *dimîne*. (17/6)
- d. (*Tu*) Ji boyê min rast *bêje*. (36/20)

Di cînavkên kesane yên pirjimar de divê kirde bê nivîsîn. Lewra qertafa kêşana hemûyan wekhev in. Dema kirdeya wê neyê nivîsîn tevliheviyek dê derkeve holê.

(108)

- a. Êre û wê da *pirsiyar dikin*. (13/15)
- b. *Didene* xeberdan. (13/36)
- c. Îcarê cenaza Îbrahîm axayê birin *çal kirin*. (14/26)

Di berhema Bazîdî de em dibînin ku cînavka kesane ya pirjimar ya sêyem carinan bi qertafa –înê tê kêşan. Ji ber vê yekê li gor qaîdeya îroyîn ferqa kêşana lêkeran bi vî awayî ji hev cuda dibin û tê zanîn ku ev lêker li gorî kîjan cînavka kesane hatiye kêşan ku ew cînavk kirdeyê nişan dide.

Mînak:

(109)

- a. Dused sêsed xulam û siwar peyda *kirîn*. (15/7)
- b. ... şerekî qenc *kirîn* ... (16/5)
- c. Îcarê ewan Xelat zebt kirî, dest bi fitne fesad û mirof kuştinê *kirîn* û gelek bêedebî *kirîn*. (16/22)

- Carinan dibe ku kirdeya hevokekê ji yekî zêdetir kes an tiştan pêk bê.

(110)

- a. *Ew bûk û Heyder* bixef hevdû dihebînin ... (17/8)
- b. Îcarê *Cergo û Guzel* heman bi şev filhal siwar dibin ... (19/49)
- c. *Mîr û paşayêd wan kenaran hemû* ketine qesda Şekir Axayî ... (21/6)
- d. Berê niha *mela û feqehayêd Kurdistanê*, gelek dizî ji dêrêd felan dikirin. (22/1)

- Ji bo raveya kirdeyê frazek di navbera bêhnokan de bi cih dibe. Lê ev wek hêmana derveyî hevokê tê dîtin. Ev fraz tê pêşiya kirdeyê jî.

Bo nimûne:

(111)

- a. Neql dikin ku li van nêzokan mirofekî reşîd û camêr, *dîsanê bi esl ekrad*, lakin sakinêd Wanê, navê Çinar Axa digotin, jinekê xwe yê sipehî hebûye, navê Leylê. (26/1)
- b. Neql dikin ku Huseyîn Axayê Zilî, *axayê tayfa Zilan*, dîsanê ji êlata xwe mirofekî qewî camêr û dilêr û zana hebû, Ehmedê Feqî digotin. (30/1)

Hevokên bi vî rengî zêdetir di destpêka çîrokên de hatin dîtin.

- Ji bo xurtkirin û zexmkirina kirdeyê cînavka vegerok an jî daçek (jî) tê bikaranîn bi kirdeyê re.

Bo nimûne:

(112)

- a. Mihemed Beg *bi xwe jî* neh-deh xulam etba'i bûye ... (5/10)
- b. ... Silêman Axa *bi xwe* daye şîrî ... (39/23)
- c. Lakin Hafiz Axa *bi xwe* di gel çend etba'ekan, dê li serê kelê li Mîr Şemdînî bibite mêwan. (40/33)
- d. Behram *jî* rast têtê derê odayê, tîfing hazir di destê da. (5/21)

Ji ber ku di koma peyvan de destebêjeyên ku kirdeyê pêk tînin yek bi yek bi mînakan hatibû ravekirin êdî em li vir pêdivî pê nabînin ku dîsa wek dubare mînakan bidin. Ji bo bê dîtîna bê ka kirde ji kîjan destebêjeyan pêk tê em mijarê hewaleyî beşa yekem koma peyvan dikin.

2.1.2.2. Pêveber

Pêveber hêmana herî girîng e di hevokê de. Pêveber daraza di hevokê de hildigire ser xwe. Çi hevoka navdêrî çi hevoka lêkerî hemû hukm û daraz û rewşên hevokê li ser piştê pêveberê ye. Hevokên navdêrî bi lêkerên alîkar tînin kişandin. Derheqê pêveberê de rêzimana wiha gotine:

Tan ji bo pêveberê wiha dibêje: “Di hevokê de hêmana ku karekî, bûyereke, rewşekê radigihîne pêveber e. Ji bo pêveberê pêwistî bi lêkerê kişandî heye (2015: 334).”

Bedirxan û Lescot li ser peywira pêveberê rawestiyane û wiha rave kirine: “Navdêr û peyvên ku wek navdêran tînin bikaranîn, hevalnav û peyvên ku wek hevalnavan tînin bikaranîn, hin hoker, korelasyonên lêkdanî û çawaniyê, hemû hevok dikare erka pêveberê bi cih bîne (2009: 324).”

Yıldırımî jî wiha gotiye: “Pêveber ew hêman in, ku der bareyê kirdeyan de darazan radigihînin. Pêveber dibe ku lêkerên temam bin, dibe ku lêkerên netemam (lêkerên bûyînê) bin jî (2012: 303).”

Ebdulfettah (2011: 224) jî bo pêveberê peyva kar (lêker)ê bikar tîne û wiha rave dike: “Kar hêmana herî girîng e di warê bêjesaziya hevokê de. Her du regezên derbirînê yê ku axaftin bêtî wan nabe, ‘*bûyer û dem*’ jî, di karan de pêk tînin.”

Ciwan derheqê pêveberê de wiha dibêje: “Pêveber ew tişt e ku hevokê bi darazekê ve girê dide. Pêveber ji peyvekê an jî ji yekê zêdetir peyvan pêk tê. Dibe ku pêveber ji

navdêr, hevalnav, ravek, cînavk, lêker, daçek, gihanek, baneşan, qertaf û hwd ve pêk bê (1992: 201).”

Ebdulfettah: “Karên derhingêv ew kar in, ên ku hevokên wan ji sê hêmanên sereke pêk tên (kara, berkarê rasteder û kar). Karên nederhingêv ew kar in, ên ku hevokên wan ji du hêmanên sereke pêk tên (kara û kar) (2011: 224).”

Xoşnaw pêveberê bi kar neaniye. Wek du sernavan karî têper û karî teneper ji bo kirdeyê rave kiriye ji ber ku ev mijar di kirde û bireserê de hatiye îzahkirin em dê li vir dubare nekin (2014: 96).

Xurşîd pêveberê wiha tarîf dîke: “Le hemû nimuneyên ser ve kirdar guzareşt le kirdewe, rûdaw/bûyer, rewş yan proseyeke hizrî (hestkirdin, bîrkirdineve, dîtin, bîstin) deka(2013: 179).”

Di beşa koma peyvan de me di her cureyeke koma peyvan de nîmûne ji bo wê daye. Lewma em dîsa pêwîstî pê nabînin ku li vir jî binivîsin.

Taybetiyên pêveberê ev in:

- Pêveber dibe ku hem lêker be hem jî navdêr be. Dema navdêr be bi lêkera alîkar tê kişandin. Wek lêkera “*bûn*”ê, “*kirin*”ê.

Pêveberên ku ji lêkerên xwerû pêk tên:

(113)

- a. Şekir Axa weha mixabin *çûyî*. (21/50)
- b. Xundkar û lala ji wî şîrî hindekî *dixwen*. (25/17)
- c. ... mala xwe *ava diketin*. (20/7)
- d. Êdî diketin gazî ku Cergo ez *Guzel im*. (19/44)
- e. ... êdî ez jî weko *xwendkarê ekradan im*. (24/26)

Di hevoka yekem (a) û duyem (b) de pêveber lêkera *çûn/çûyîn* û *xwarin* e. her du jî ji lêkerên xwerû ne. Di hevoka (c), (d) û (e)yê de pêveber ji lêkera alîkar pêk tê. Hevoka (c) ji navdêra *ava* û lêkera alîkar *kirinê*; hevoka (d) ji navdêra *Guzel* û lêkera alîkar *bûnê*; hevoka (e)an jî ji raveka navdêrî *xwendkarê ekradan* û lêkera alîkar *bûnê* pêk tê.

Di vê derê de lêkera *bûnê* wek lêkera xwerû û wek lêkera alîkar bi du awayî hatiye tarîfkirin. Ji ber vê yekê jî lêkera alîkar *bûn* wek cînavkên kesandinê di pêveberê de tê nasandin. Di gelek berheman de lêkera *bûn* wek lêkera alîkar tê hêlsengandin. Ji ber vê yekê jî li vir wiha hatiye pênasekirin.

Lê dema em baş lê dinihêrin em dibînin ku di esasê xwe de ev ne lêkera *bûn* e lê wek lêkera *to be* (-am, -is, -are) a îngilîzî ye ku jê re dibêjin *copula verb*. (Givón, 2001:119) Mînakên di dema borî de cînavkên kesandinê (-m, -î, -e, -n) berî xwe *bû* wergirtine ku ev qertafa raweya çîrokiya dema borî ye. Wate cînavkên kesandinê di hemû dema de cihê xwe di nav pêveberê de diparêzin. Tenê di hin deman de qertafa kesandinê ya cînavka kesane ya yekjimar dikeve. Ev jî niha ne mijara me ye. Ji ber vê yekê em niha pêdivî bi îzaha wê nabînin.

Di dema fireh û dema borî de kopula (*bûn/bûyîn*) li gor hemû cînavkên kesane bi vî şiklî çêdibe:

Tablo 2.5. Kopula (Lêkera alîkar/Lêkera bûn)

Dema fireh	Dema borî
Ez mamoste <i>me</i> .	Ez mamoste <i>bûm</i> .
Tu mamoste <i>yî</i> .	Tu mamoste <i>bûyî</i> .
Ew mamoste <i>ye</i> .	Ew mamoste <i>bû (e)</i> .
Em mamoste <i>ne</i> .	Em mamoste <i>bûn</i> .
Hûn mamoste <i>ne</i> .	Hûn mamoste <i>bûn</i> .
Ew mamoste <i>ne</i> .	Ew mamoste <i>bûn</i> .

- Lêkera *bûnê* bi tena serê xwe wek lêkereke tam jî dibe pêveber.

Bo nimûne:

(114)

- a. ... em yekûdu bibînin û tifaqa me *bibite* yek. (21/13)
- b. ... bila Hafîz Axa li kelê *bibite* mêwan ... (40/30)
- c. ... heta seet *dibe* çar. (14/17)

d. Neql dikin ku carekê ji tayfa Birûkan, mirofek navê Sîso pez *dibete* Istanbulê ji boyê firotinê.

Lêkera bûne di van hevokan de dema wek lêkereke tam dibe pêveber beriya têrker (indirect object/biresera nerastexwo) tê nivîsîn.

- Di hevokeke rêzî de pêveber li dawiya hevokê ye. Lê hin lêker hene ku di hevokê de rola pêveberê hildigirin ser xwe hin têrkeran (indirect object/biresera nerastexwo) diavêjin dawiya pêveberê.

Bo nimûne:

(115)

a. Mirofek *diçite ser pezê Sîsoyî*. (25/51)

Pêveber Têrker

b. ... û li cihê birayê xwe Mehmûd Paşa *dibite paşayê Bazîdê* ... (38/34)

Pêveber Têrker

c. Paşê em dê biborin û *biçine kenarê Mûsilê*. (40/19)

Pêveber Têrker

d. Subeyê Melîke Xanim bi xwe *hatiye yalê mêran* ... (40/42)

Pêveber Têrker

e. Hafiz *didine ber xençeran*. (40/66)

Pêveber Têrker

f. Eger çî jin û xuha Mihemed Begê jî di odê da *dikine hewar û gazî*. (5/44)

Pêveber Têrker

g. Hêdî min xwe *avête nehalekî*. (4/11)

Pêveber Têrker

Lêkerên wek *bûn/bûyîn*, *çûn/çûyîn*, *hatin*, *kirin*, *dan/dayîn*, *avêtin* piştî xwe têrker/biresera nerastexwo werdigirin. Ev mijar di babeta cureyên hevokan de dê bi berfirehî were ravekirin. Têne li vir wek taybetiyekê me xwest em vê xalê binivîsin.

- Di hevokekê de tenê pêveberê heye lê dibe ku hevalkar, bireser, têrker ji yekî zêdetir bin.

(116)

a. *Suban berê dîwan û naş* diçine *nik Îbrahîm Axa* û paşî tene nik mîrî. (14/8)

- Di hin pêveberan de jî kopula nehatiye nivîsîn.

(118)

a. Qewî zêde *xweyî husn û rind û spehî*. (13/3)

Lêkera alîkar *bûn* an jî kopula *(y)e* nehatiye nivîsîn. Heke kopulaya pêveberê bê nivîsîn hevok dê bi vî awayî çêbibe.

Qewî zêde *xweyî husn û rind û spehî ye*. (kopula)

An jî

Qewî zêde *xweyî husn û rind û spehî bûye*. (çîrokiya dema borî + kopula)

b. Zad jî çi ne? (32/17)

c. Hê ron û goşt û mast û to û hingivîn. (32/18)

Ev her du hevokên li jorê bi hev ve girêdayîne. Di hevoka (3) an de wek ku pirsê dibersivîne lê hevoke bê kopula maye. Wek ku pêveber nexuyaye. Heke serî û dawiya babeta bê dîtin dê were fahmkirin ku hevok (3) bi temamî pêveber e lê kopula *e* kêm e. Wê demê hevok bi vî şiklî çêdibe:

Hê ron û goşt û mast û to û hingivîn (e).

- Dema pêvebera hevokê navdêr be, kopula li navdêrê zêde dibe. Li vir navdêr hem wek cureya peyvê hem jî bi eslê xwe navdêr e. Yanî peyvên wek cînavk, hevalnav, hoker, daçek û hwd jî navdêr tên hesibandin.

(119)

a. Lakin xulam û etba'êd wî *zahf in* û em *hindik in*. (21/22)

Di her du hevokên serbixwe de *zahf* û *hindik* kopulaya *inê* wergirtine. Kirdeya her du hevokan cuda ye lê her du jî pirjimar in.

b. Ez xwe bi dewlet û malî ji wan cîranan hemû *zêdetir im*. (24/10)

Ev hevok jî pêvebera wê hevalnav e û paşgira pileya hevrûkirinê wergirtiye. Piştî wê jî kopulaya *im* standiye.

- Pêveber carinan di hevokên hevedudanî yê serbixwe de dibe ku hevpar be.

Nanê tenûrê bi bêhna xwe, çaya qaçax bi tama xwe em kêfxweş kirin.

Pêveber (*kêfxweş kirin*) her du hevokan { (1)*Nanê tenûrê bi bêhna xwe* (2)*çaya qaçax bi tama xwe* } bi hev ve girê daye.

Hevokên bi vî rengî di berhemê de nehatin dîtin.

- Li gor lêkerên gerguhêz û negerguhêz hêmanên hevokê jî diguherin. Yanî pêvebera ku lêkera wê gerguhêz be bireserê jî dixwaze û ji ber ergatîviyê jî rewşa kirde û bireserê diguhere. Lêkerên gerguhêz bireserê werdigirin lê ne şert e du hemû hevokên ku pêvebera wê ji lêkerên gerguhêz pêk hatibe biresera wê jî bê nivîsîn. Lewra bireser hêmaneke talî ye. Heke lêker negerguhêz be wê demê ji xwe bireser jî hewce nîne. Bandora lêkerên gerguhêz wek pêvebera hevokê rewşa hevok û hêmana hevokê jî diguherîne. Qismek ji vê xalê di kirdeyê de hat îzahkîrîn, di bireserê de jî em ê li gor bireserê rave bikin.

2.1.3. Hêmanên Talî

Qesta me ji hêmanên talî ev e ku yên ku hevok bêyî wan jî saz dibin. Hêmanên talî di hevokekê de wateyê temam dikin an jî xurttir dikin. Lê eger ew di hevokekê de tune bin wateya sereke têk nabin an jî saziya hevokê naherifînin.

2.1.3.1. Bireser

Her wekî di rûpelên borî de hatibû gotin bireser girêdayî lêkerên gerguhêz e. Yanî risteyên ku lêkerên wê gerguhêz in pêwîstî bi bireserê ve heye. Wê demê divê em hinekî li vir behsa lêkerên gerguhêz bikin. Wateya gerguhêz ew e ku lêker bi tişteki ve girêdayî ye. Mesela di risteya “*Min xwar.*” de tişteki xwarinê ji risteyê tê hişê mirov. An jî “*Min dît.*” Tişteke bê dîtin di hişê mirov de tê xeyalê. Dema em bibêjin “*Min nan xwar.*” Wate tekûztir dibe lê bêyî wê jî mane tê fahmkirin. An jî “*Min Ehmed dît.*” Bi heman awayî ew riste ye ku lêkera wê pêdivî bi bireserêke ve dibîne. Ji her du hevokan hat dîtin ku lêkerên gerguhêz di hevokê de bireserê derdixin holê û dîsa bi van mînakên em hinekî li ser peywira bireserê rawestiyên. Niha jî em binêrin bê ka kesên li ser vê mijarê xebitîne ji bo têgeha bireserê çi gotine.

Celadet û Lescot ji bo bireserê peyva têrkerê jî bi kar anîne. Li gor wan bireser du beş in: biresera rastexwo (düz tümleş) û biresera nerastexwo (dolaylı tümleş). Biresera rastexwo ew bireser e ku lêkerên gerguhêz di dema niha û dema bê de ditewin. Heke ew lêker di dema borî de bin bireser xwerû dimînin, wê demê lêker li gorî kesan û jimaran bi têrkerê re li hev dikin. Dîsa li gorî wan bireserên ku bi lêkerên xwerû, hevedudanî û yên biwêjî yên ku digel daçekê pêk tên, bireserên nerastexwo ne (2009: 324).

Tanî wiha gotiye: “Di hevokên ku ji lêkerên gerguhêz pêkhatî de kes û tiştê ku di bin bandora tiştê ku tê kirin de dimîne ‘bireser’ e. Jji ber vê yekê jê re ‘*têrkera rasterast*’ jî tê gotin (2015: 336).”

Ebdulfettah jî bireserê di du cureyan de dinirxîne: berkarên rasterast (direct), berkarên nerasterast (indirect). Ji bo berkarên rasterast wiha dibêje: “Berkarên rasterast, ew nav in, ku bûyerên karan (lêkeran) bi şêweyekî rasterê û yekser, li wan dibin.” Bi sê xalan cih û peywira berkarên nerasterast rave dike ku ew jî ev in: “Berkarê nerasterast, li pey pêrbesteke (daçek) avêtî, li pey pêrbesteke berçav û li pey navekî berçav, ku têkiliyeke watedar, di navbera wî navî û berkarê nerasterast (li pey wî) de hebe, tê (2006b: 121).”

Îzaha Badıllı ji bo bireserê ev e: “Bireser ew peyv e ku rasterast ketiye bin bandora kirdeyê (1965: 152).”

Xurşîd di şûna bireserê de peyva berkarê bi kar tîne, wê jî di nav du cureyan de dabeş dike û wiha tarîf dike:

“Berkar be ew zîndewere, tişte yan yeke degotrê ku dekevête jêr kirdewey biker. Eger le hevok berkar hebû, hengo kirdara hevok teper e. Berkar dekrê yek wuşe bê yan wek girêyeka pêşbend bête nişandan. berkar dekrê cênaw jî bê lê cênaw her dem le paş biker dê. Berkar dekrê rastexwo û narastexwo bê (2013: 179).”

Tarîfa Xoşnawê bo bireserê ev e: “Bew wuşane (naw yan cênaw) degotrê, ke berkarîgerî kar dekewn, ewîş be dû şêweyekîyan rastexwo û şêwekeytiryan narastexwo (2014: 115).”

Yıldırımî (2012: 304) jî di heman wateyê de wiha gotiye: “Bireser ew bêje ne ku dikevin bin bandora kirinê bikeran. Di dema niha û débê de navên ku dibin bireser ditewin. Bireser du beş in: bireserên rastexwo, bireserên nerastexwo.”

Taybetiyên bireserê

- Ji bo biresera hevokê bê dîtî ji pêveberê pirsên “kî/kê? û çi?” tê pirsîn.
- Bireser yan ji navdêrê yan jî ji destebêjeyeke ku wezîfa navdêrê dibîne, pêk tê.
- Du cure bireser hene: biresera rastexwo (direct object/doğrudan nesne), biresera nerastexwo (indirect object/dolaylı nesne). Biresera rastexwo ew bireser e ku di bin

kartêkeriya kirinên kirdeyê de ye. Di lêkerên gerguhêz de hevok li gor dema borî kêşayî be kartêkeriya bireserê li ser pêveberê heye. Ji ber ku ev beş di sernava ergatîviyê de hatibû vegotin em bi vê mînaka li jêr îktîfa dikin.

(120)

a. Ekrad dibêjin ku birastî destê me neçûyê, *me înaye*. (38 (18))

Hevoka dawî biresereke veşartî dihewîne û li gorî bireserê pêveber hatiye kêşan. Ji ber ku pêveber yekjimar e û em dizanin ku di bireserê de behsa kesekî tenê dike. Lewma divê hevok li gorî ku bireser bê bi nivîsîn divê wiha buya:

Me (ew) înaye.

- Bazîdî di berhema xwe de carinan li gorî vê qaîdeyê nemeşiyaye.

Bo nimûne:

b. ... weko *ewan jî ez dîtî* şa bûyn û me ew mal birine Diyarbekrê ... (22/27)

Di vê hevokê de li gorî qaîdeyê divê hevok bi vî awayî bê nivîsîn.

ewan jî ez dîtîm.

Lewra bireser bandorê li pêveberê dike. Cînavka kesandinê ya yekem *m* ye.

c. Weko *siwaran ew Mela Mihemed dîtî* hatine riya wî ... (7/5)

Ev hevok jî li gorî qaîdeya rêzimanî divê wiha buya:

siwaran ew Mela Mihemed dît.

Cînavka kesandinê ya pirjimarî divê bikeve lewra bireser yekjimar e. Yanî em kirde û bireserê bi cînavkan binivîsîn hevok bi vî şiklî çêdibe.

Wan ew dît.

d. Lakin li êla Herkiyan dibe qûrî û hewarê ku belê Îsmail Axayê Şikeftî hat û bi ser mala Terlan Axayî da girtî, *Terlan Axa kuştî* û vejeriyan. (27/41)

Ev mînaka dawî jî dîsa wek yên li jor divê wiha bûya:

(wan) Terlan Axa kuşt.

Cînavka kesandinê ya pirjimar dikeve lewra bireser yekjimar e.

Wan ew kuşt.

e. ... me baran ênaye xwarê ... (4/15)

Hem kirde hem jî bireser tewiyaye. Divê bireser tewanga xwe li ser pêveberê nişan bida. *Me bar înanê xwarê.*

- Heçî biresera nerastexwo ye ew jî bi awayekî neyekser, nerasterast an jî wek îma di bin kartêkeriya kirdeyê de ye. Ji ber ku ew wek têrkerê jî hatiye pênasikirin em li vir dûr û dirêj hewcehî pê nabînin. Lewra di mijara têrkerê de dê zelaltir û berfirehtir were îzahkirin.

Wek nimûne:

(121)

a. Ev qiseya jî di nêva 'alemê danê *bûye dastan darb-i mesel.* (35/37)
Pêveber Têrker

b. Madoyê Mêtir vedigeritin û *têje odayê nik Ehmedê Feqî.* (30/18)
Pêveber Têrker Têrker

- Di hevoka alîkar an jî komeka alîkar (parist/subordinate clause) de jî bireser tê dîtin.

Mînak:

c. ... dibêjitin *ku eve jî ehwalê berê mirazan e.* (35/38)

Di vê hevokê de hevoka alîkar bu gihaneka *kuyê* bi hevoka bingeh ve hatiye girêdan. Yanî hevoka bingeh (dibêjitin) ku tenê pêvebera wê hatiye nivîsîn dema pirsî bireserê *çi jê bê pirsîn bersiv hemû hevoka alîkar e* (ku eve jî ehwalê berê mirazan e).

d. Derwêş li Şatirî difekire *ku merama Şatirî cebr e ...* (37/39)

Ev hevok jî wek mînaka berî xwe hevoka alîkar bi gihaneka *kuyê* bi hevoka bingeh ve wek hêmana bireser hatiye girêdan.

Hevokên hevedudanî yên serbixwe dikarin biresera xwe bikin hevpar.

Mînak:

(122)

a. Îcarê paşayê Wanê virêkirî û *Şatir girtî,* (ew) birîne Wanê. (35/54)

Di vê hevoka hevedudanî de sê hevokên serbixwe hene. Her du hevokên dawî xwedî biresereke hevpar in ku biresera wan jî *Şatir e.*

b. ... me *baran* ênaye xwarê û (me *ew*) birine malê ... (4/15)

Baran di her du hevokan de biresera hevpar e.

c. Şekir Axa kuştin, (*ew*) tamam kirin. (21/34)

Heman mînak em di helbestên klasîk de jî dibînin

Ez dîn kirim (*ez*) berdam dinê

Wêran ez im malim xirab (Teyran, 2014: 160)

(*Wê ez* dîn kirim, *Wê ez* berdam dinê)

Di hevoka ewil de lêkereke gerguhêz heye ku biresera wê *ez* e û kirdeya wê veşartî ye, *wê* ye. heman bireser di hevoka ewil hevoka duyem de nehatiye nivîsîn, veşartî ye. nexwe bireser carinan dibe ku veşartî bin jî.

Ji lêkerên gerguhêz re bireser divê. Lê hevokên navdêrî bireserê naxwazin. Heke hevok hevedudanî be hevoka alîkar dibe ku bibe biresera hevoka bingeh ku pêvebera wê navdêr an wek navdêr e. Li jor çend mînak hene ku ji bo vê xalê jî dikare bê dayîn. Di cureyên hevokan de bi berfirehî hatiye izahkirin.

Di tirkî de hevokên alîkar bi vî cureyê wek fiilimsi (isim-fiil, sifat-fiil, zarf-fiil) tên binavkirin. (Doğan, 2012: 95)

- Ji yekî zêdetir bireser di hevokê de dikare bê dîtin.

Mînak:

(123)

a. Ewê Adile Xanimê zaf *mal* û *diraf* û *mucewher* hebûn. (9/7)

Mal, *diraf*, *mucewher* her sê jî bireser in.

b. ... min *cil* û *zêr* nevêtin ... (11/24)

Di vê hevokê de jî *cil* û *zêr* bireser in.

Me di beşa yekem de bireser çawa ji koma peyvan çêdibe, rave kiriye lewma em vê babetê hewaleyî wê derê dikin.

2.1.3.2. Têrker

Çawa ku di mijara bireserê de jî hatibû gotin bireser wek têrkerê jî tê binavkirin. Wê demê têrker jî dibin du cure: têrker rasterast û têrker nerasterast. Têrker rasterast jî di nav xwe de cureyên wê hene. Li gor Celadet û Lescot (2009: 326) têrker nerasterast û biresera nerastrast heman tişt in lê têrkereke dîtir heye ku ew jî têrkerên rewşî ne. Têrkerên rewşî jî dikarin wateya dan, gihiştin, layen, cih, amraz, dem û hwd ragihînin.

Celadet û Lescot cureyan têrkeran bi mînakên li jêr wiha tarif dikin:

(124)

- a. Soro li mişo vegerand. (dan)
- b. Mîn jê re mizgînî da zanîn. (gihiştin)
- c. Hevalê xwe li cem me anî. (gihiştin)
- d. Cotkar genime xwe li sûkê difiroşe. (cih)
- e. Axa li gund e. (cih)
- f. Di gundê me de sî mal hene. (cih)
- g. Tiliyê xwe bi xencera xwe birî. (amraz)
- h. Wê şevê dinya gelek sar bû. (dem) (2009: 326).

Tan jî têrkerê wiha rave dike: “Têrker ji gelek aliyên ve karên ku tê kirin, temam dikin. Ev sergihayîkirin dibe ku ji aliyê demê, yan jî rewşê ve be. Têrker di binyata xwe de hoker û daçek in. Dema ku daçek tîn ber navdêran rewşa wan nîşan didin û bi vî awayî jî hokerên cih û berekê pêk tîn (2015: 336).”

Yıldırım daçek û hokerê wek şaxek ji têrkerê dibîne û peywira wan wiha tarîf dike: “Daçek û hoker wateya lêkeran ji aliyê bandor, dem, cih û rewşê ve temam dikin (2012: 305).”

Ebdulfettah têrkerê di sê beşan de rave dike: “Têrkerên hevokê ew daçek û bêje ne, yê ku di pêvajoya hevoka watedar de bi kar tîn, wateya wê firehtir û ronîtir dikin, wek ‘pêrbest (daçek), hevalnav û hevalkaran...’ (2011: 224).”

Xoşnaw berkara nerastexwo di dewsa têrkerê de bi kar tîne û wiha şîrove dike: “be wuşane detrê, ke be şeweyekey narastexwo dekewne jêr karîgerîyê karewe, mercî derkewtinî berkarî narastexwoş le hevok da peyweste be be pêşbendekanewe (2014: 115).”

Xûrşîd tewawkeran di binbeşên sereke de dabeş dike. Berkara rastexwo û nerastexwo dibe tewawkera ewil û ya duyem jî bi navê tewawkera guzareyî bi sê binbeşan disenifîne: Tewawkera biker, tewawkera berkar, tewawkera kirdar.

Mînakên xwe jî wiha dide:

(125)

Tewawkera biker

a. *Azad, **mîna nenasek**, legel min deaxifit.*

Tewawkera berkar

b. *Min mafa xo, **ku le layen dagîrkeran hatiye zeftkirdin**, destinim.*

Tewawkera kirdar

c. *Azad **gelek be xêrayî çû**. (2013: 181)*

Tewawkera biker (kirde) û berkar (bireser)ê wek hêmanên derveyî hevokê jî tê tarîfkirin.

Em ê di vê xebatê de bireserê wek biresera rastexwo û biresera nerastexwo bidin nişandan. Ji bo ku qesta me ji her du bireseran bê fahmkirin em bi mînakan li jêr mijarê rave bikin.

Mînak bo biresera rastexwo:

(126)

a. *Min **nan** xwar.*

b. *Zelalê **cil** şûştin.*

c. *Hevalan **name** bir.*

Di van hevokan de *nan*, *cil*, *name* mînak in ji bo biresera rastexwo. Mînakên bi vî rengî di mijara bireserê de bi zelalî hatiye îzahkirin û ji berhemê jî bi gelek mînakan hatiye şîrovekirin digel taybetiyên xwe.

Mînak bo biresera nerastexwo:

(127)

a. *Ez çûm **malê**.*

b. *Min pirtûk da **pirtûkxaneyê**.*

c. *Min gote ji hevalan re.*

Di van her sê hevokan de jî *malê*, *pirtûkaxeneyê* û *ji hevalan re* ji bo biresera nerastexwo mînak in. Her wekî di hevokan de tê dîtin piştî pêveberê hatine û cih nişan didin an jî bi daçekan re tên bikaranîn.

Heçî têrker e ku babeta sereke ye di vir de ew jî di nav xwe de li gorî peywir û wateya peyvnan wiha hatine tesnîfkirin: Têrkerên bi daçekî, têrkerên bi hokerî.

Bo nimûne:

(128)

- a. *Mîrza ji malê tê.* (daçek)
- b. *Mîrza di dersê de hişyar e.* (hokera cihî)
- c. *Mîrza sibê tê.* (hokera demê)
- d. *Mîrza xweş dimeşe.* (hokera çawaniyê)
- e. *Mîrza pîr xweş dimeşe.* (hokera çawaniyê ya ku wateya hokera dîtir xurttir dike)

Li gorî vê tesnîfê em ê çend mînakan ji berhemê li jêrê rêz bikin.

(129)

- a. *Ez ji vê şûlê poşman im.* (12/17)
Têrker

Di vê hevokê de têrkera me bi daçekê re li kar e.

- b. *Ew herdu jî bi lez û bi xar dajon.* (13/19)
Têrker

Têrkera vê hevokê çawaniya pêveberê nişan dide. Wek cureyê peyvê hoker e û wek hêmana hevokê têrker e.

- c. *Paşî êvarê digel 'Ebdurrezaq Begê şîvê dixwen û rûdinin, heta seet dibe çar.*
Têrker 1 Têrker 2 Têrker 3

(14/17)

Di vê hevokê de sê têrker hene. *Têrker 1* û *têrker 3* demê nişan dide; *têrker 2* jî wateya bi hevrebûnê dide.

d. Îcarê Selîm Paşa jî *di nêva bajêrê Bitlîsê* kete hesarê. (16/4)

Têrker

Têrkerê vê hevokê jî cihê bûyerê nişan dide.

2.2. CUREYÊN HEVOKÊ

Di vê binbeşê de em ê hevokan ji aliyê wateyê, ji aliyê pêveberê û ji aliyê avasaziye ve bisenifnîn. Êm ê her mijarekê bi mînanan rave bikin.

2.2.1. Ji Aliyê Wateyê ve Hevok

Hevokên ku ji aliyê wateyê ve dabeş dibin di vê mijarê de hatine rêzkirin. Helbet hin hevok dibin ku ji aliyê wateyê ve di nav çendîn sernavan de bîn ravekîrin. Li gorî qaîdeyên rêzimanê ev mimkun e. Divê ev yek, wek tevliheviyekê neyê dîtin. Hevok ji aliyê wateyê ve di bin çar sernavan de hatiye senifandin: Hevokên ragihandinî, hevokên fermanî, hevokên pirsiyarî û hevokên baneşanî. Her çend ku di hin pirtûkan de hevokên erênî û neyînî jî bi cih dibin jî em li vir van her du cureyan naxin nav senifandinê. Lewra ev her du cure di hemû cureyan de ji xwe hene.

2.2.1.1. Hevokên Ragihandinî

Hevokên ragihandinî wateya *erê* û *nayê* an jî *rast* û *şaşê* di xwe de dihevin. Xalbendiyê vê hevokê xal (.) e. Di van hevokan de axêver wek çavkaniya sereke tê dîtin. Yanî hevokên ragihandinî rewşek, zanînek, nûçeyek û heyînekê radigihînin. Hevokên ragihandinî di wateya neyîniyê de jî bi kar tên.

Li gorî Tan hevokên ragihandinî ev in: “Hevokên derbareyê rewş û tevgerê de agahî û ramanekê bi riya ragihandinê didin, hevokên ragihandinî ne. Hevokên ragihandinî bi alîkariya raweyên pêşkerî tene sazîrin (2015: 339).”

Çiftci ji bo hevokên ragihandinî wiha dibêje: “Hevokên ragihandinî ew hevok ne ku ragihandineke erênî an neyînî derdibirin (2013: 215).”

Bo nimûne:

(130)

- a. Ekrađ me'lûm e ku pez û kerîyan dibîne Şam û 'Erebîstanê û İstanbolê. (25/1)
- b. Sultan Murad dibêjîtin ku belê em ji vî bajêrî ne. (25/19)

- c. Wisanê îqtîza diketin ku ew Çinar Axa diçite xurbetê û li Bexdayê, dibite delobaşî û mudeyekî dimînitin. (26/2)
- d. Di berê niha li van nêzokan li deşta Bişêriyê ji 'eşayîrêd Beriye ji tayfa Berazan kurmanckî jîra hebû navê Sîso. (29/1)

Hevokên ragihandinî carinan tenê pêveber in yanî peyvek in. Gelek hêmanên hevokê jî dikarin bihewînin.

2.2.1.2. Hevokên Fermanî

Hevokên fermanî li gori cînavkên kesane yên duyem (ji bo yekjimarî *tu* û ji bo pirjimarî *hûn*) tên kişandin. Ji bo cînavkên dîtir ferman nayê bikaranîn. Ji bo fermanên erênî qertafa 'bi'yê; ji bo yên neyînî jî qertafa 'me'yê tên li pêşiya lêkerê.

Hevokên fermanî di hevokên lêkerî de tên dîtin. Ev hevok carinan wateyên wek daxwaz, xwestek, rica, xemgînî û lavayiyê jî di nav xwe de dihewîne (Özkan, 2013: 152-153).

Hevokên fermanî ferman û qedexeyekê derdibirin (Çiftci, 2013: 215).

Di van hevokan de fermanek heye, ji yekî yan ji hinekan pêkanîna karekî tê xwestin (Tan, 2015: 339).

Heke em formulîze bikin:

Bi + koka lêkerê + qertafa kesandinê.

Ji bo lêkera *xwendinê* û cînavka kesane ya duyem ya pirjimar mînak:

Bi + xwîn + in. \longrightarrow Bixwînin.

Mînakên erênî ji bo hevokên fermanî:

(131)

- a. ... ez da fermanê bideme wan, bilanê ji boyê tayfa Hertuşiyîyan *bixwînin*. (21/41)
- b. Îcarê Çeteçî dibêje wî mirofê xweyê malê ku tu *here* ewî derê malê di gel şimêkê *biderîne* û *bide* pişta hemalêkî ji boyê min *bîne* û *dayne* nêva serayê. (23/5)

Di vê hevoka hevedudanî de ku ji hevokên pevgirêdayî û serbixwe pêk tê, tê dîtin ku hemû hevokên fermanî qertafa *biyê* wernagirin. Lewra di mînaka li jor de pêvebera *here* û *dayne* vê xalê diçespîne.

Dîsa du hevokên dîtir hene ku di rewşa fermanî de ne: *Biderîne û bide*.

- c. Subeyê melayekî tînin û tenbiye dikin ku her rojê *were* odeya Mihemed Efendî û qenc miqeyed *bibe* û ewî *bide* xwendin. (28/24)

Di vê mînakê de jî pêvebera *were* bêyî qertafa fermanî çêdibe. Dîsa pêvebera *bibe* û *bide* mînakên dîtir in ku di rewşa fermanî de hatine bikaranîn.

Lêkerên ku paşgiran werdigirin qertafa fermanî *biyê* wernagirin.

Bo nimûne:

(132)

- a. Îsmâil Axa tedarika durust dike, îcarê dibêje jina xwe ku, *rabe* kurê xwe *bibe* û here mala Şêx Îbrahîm. (6/11)
- b. Hemûyan nîvê şevê di gel xwe *helgire* û nêzokê fecrê werine dora kela Elcewazê, şûlekî min heye. (15/22)
- c. Her çi ku mêr in hûn dergehê kelê *vekin* ... (34/24)

Helbet îstîsnayê vê qaîdeyê jî hene. Wek:

(133)

- a. Dibêje wî ku *were* ji dînê Mihemediyên *biderkeve* û *bibe* êzidî yan ne ez dê te bikujim. (7/8)
- b. Hesên Beg simorê werdigire, paşî Xelîl Beg dibêje ku êdî *biderneyne*, min ew kurk bexş te, li bejna ye. (10/26)
- c. Hûn hemû îşev berê subehê siwar bibin û *biderkevne* dora hêsetê, deste deste bisekinin. (11/17)

Mînakên neyînî ji bo hevokên fermanî:

(134)

- a. ... îcarî tu here şûla xwe, lakin heta du heyvan pê êre da *meyê* ... (4/18)
- b. Paş niha dostiya min û te êdî nîne, bi bal min ve *meyê*. (4/33)
- c. Îcarê derwêş dibêjite Şatirî here dîn *mebe* ... (37/34)
- d. Îcarê paşa dibêje ku *metirse* ... (11/23)
- e. lakin heta du heyvan pê êre da *meyê* ... (4/18)
- f. Paş niha dostiya min û te êdî nîne, bi bal min ve *meyê*. (4/33)
- g. Memed dibêje, eman Mîrzo, min kiriye tu *meke* ... (4/46)

- h. Rewend gazî diketin tu du'a xwe terk *meke*. (36/32)
- i. Îcarê derwêş dibêjite Şatirî here dîn *mebe* ... (37/34)

2.2.1.3. Hevokên Pirsyarî

Di Kurmancî de hevokên pirsyariyê bi du awayan çêdibin. Yek bi riya kirpandinê çêdibe û yê din jî bi hoker, cînavk û hevalnavên pirsyariyê çêdibin.

Hevokên pirsyarî bi rêya pirsê armanc dike ku agahiyan bi dest bixe. Ev hevok dipirse ku bê ka karek hatiye kirin, an jî fikrek hatiye pejirandin. Wateya pirsê bi hevalnava pirsyariyê, cînavka pirsyariyê, hokera pirsyariyê û daçeka pirsyariyê çêdibe. (Özkan, 2013: 148) Di Tirkî de qertafa pirsyariyê jî heye ku pê hevoka pirsyarê çêdibe. Lê di kurdî de di bedêla vê de kirpandin heye.

Ji bo hevokên pirsyariyê yê ku bi rêya kirpandinê çêdibin mînak:

(135)

- a. Îcarê Kelo dibêjîtin ku mîr eseh tu dê min bikujî? (31/10)
- b. Îcarê Şerîf Axa pirsyar diketin ku ev şahîne Şêx Tarim ê hewe ye? (33/6)
- c. Xelîl Begê jî pirsyar dike ku Hesên Beg te hesp begen kir? (10/18)
- d. Ew siwarê rêwî 'ecêb dimînitin ku eve çî hîkmet e û eve çî kesek e, însan e, welî ye, cinnî ye? (36/11)

Her çend di hevoka (c) de cînavka pirsyariyê hebe jî di hevokên serbixwe yê dewama wê de *însan e, welî ye, cinnî ye* pirs hene û bi kirpandinê çêbûne. Di axaftinê de bi kirpandina li ser lêkerê em pê digihêjin ku hevokên pirsyariyê ne.

Yıldırım hevokên pirsyariyê wiha şîrove dike: “Hevokên ku bersivan dixwazin wekî hevokên pirsyariyê tên binavkirin. Pirsyar bi riya cînav, hevalnav, hoker û alavên pirsyariyê an jî bi riya kirpandinê pêk tên.” (2012: 306)

Hevokên pirsê pirsan di nav xwe de dihewînin. Ev hevok hem bi kirpandinê hem jî peyvên pirsan saz dibin. Peyvên pirsê li gorî rewşê tê serê hevokê jî dikeve nav hevokê jî (Çiftçi, 2013: 215).

“Di Kurmancî de hevokên pirsê, dema ku cînavk, hevalnav û hokerên pirsê tune bin, bi alîkariya kirpandinê tene sazkin. Dema ku hevok bi awayekî gumanbar bê bilêvkin, hevoka pirsê derdikeve holê. Kirpandina biguman li ser kîjan peyvê be, tiştê

ku tê pirsîn ew e. Ji bo xurtkirina gumanbariyê daçekên wekî “gelo, ma, qey” jî têne bikaranîn.” (Tan, 2015: 341)

Hevalnavên pirsyariyê ev in: *kîjan, çawa, kusan, çend, çi, ku* û hwd.

Cînavkên pirsyariyê: *kî, çi, kîjan, ku, kanê, çend* û hwd.

Hokerên pirsyariyê: *çawa, ji bo çi, çi ra, ji ber çi, kengî* û hwd.

Daçekên pirsyariyê: *ka, gelo, ma, qey* û hwd.

Mînakên ji berhemê:

(136)

a. Îcarê Pêxember eleyhisselam, ji wî melekî sewal kirîn ku hindê ku tu hatî mamur kirîn te qet *çend caran* li vê dehulê daye? (2/3)

Bi hevalnava pirsyariyê hevok saz bûye.

b. Îcarê jinê gotiye ku *ji boyê çi* em biçine mala Şêx Îsmail? (6/12)

Bi hokera pirsyariyê hevok hatiye sazkirin.

c. Pirsyar dike ku xanim *kanê?* (9/26)

Bi cînavka pirsyariyê hevok hatiye sazkirin.

d. Pirs diketin ku te *çi ye, ji boyê çi* bêkêf î? (11/8)

Hevoka yekem bi cînavka pirsyariyê û ya duyem jî bi hokera pirsyariyê hatiye sazkirin.

e. Guzel jî pirsyar diketin ku *çawanê* bû ku îşeve pê êre da hatî? (19/47)

Ev hevok jî dîsa bi hokera pirsyariyê saz bûye.

f. Îcarê Çeteçî ji wî mirofî sual kir ku *çewanê* bûne, xanî kelaştine weyaxo *kusanê* bûye? (23/3)

Di van hevokan de hokera pirsyariyê hatiye bikaranîn. Peyva *kusanê* di wateya *çawanê* de ye lê niha pir kêmtê bikaranîn.

g. Îcarê şivan ji Sultan Muradî pirs diketin ku navê te *çi ye*, ez dê te li *ku* bibînim? (25/21)

Bi cînavka pirsyariyê *çi* û *ku* hevoka pirsyariyê hatiye sazkirin.

h. Paşî mîqdarekê Sîso li odeyê û yaldozê û esasê tedarika dîwanê difikirê û dibêje Sultan Murad ku qerdaşo, *ev xaniyene te daye çêkirin yan ji babê ji boyê te mîras maye?* (25/46)

Du pirs bi alîkariya gihanekên *ya û anê* tê îfade kirin. (Bedirxan û Lescot, 2009: 330) Ev hevoka pirsiyariyê *ya* di mînaka dawî de bi kirpandinê pêk hatiye bi gihaneka *yanê* wek pirseke dualî tê pêşberî me.

Carinan bi gihaneka *û* yê gelek hevokên pirsiyariyê li pey hev rêz dibin.

(137)

a. Îcarê Îsmâil Axa Domoyî tînite nik xwe û didete xeberdan ku *kuro tu çi kes î û ji boyê çi te eve şûla kir û tu ji ku yî?* (27/17)

Carinan bi rîya pirsê wateyên cuda cuda wek guman, îhtîmal, derewkirin, biçûkxistin, nepayînî, ecibandin, pesinandin, metelbûn, rica, lavayî, azar jî li hevokê tê barkirin. Ev li gorî armanca wî kesê ku ziman bi kar tîne teşe digire û di nav konteksta metnê de derdikeve holê. (Özkan, 2013: 148)

b. ... û qenc bizane ku ez dijminê dîne te bûme, li ku mayî ku dijminê canê te? (31/13)

Ev hevok di rastiyê de ne pirseke herçend ku ji aliyê şiklî ve wek hevokeke pirsiyariyê xuya bike jî. Dema hevokên berî vê hevokê û yê piştî wê bi hev re werin şîrovekirin dê derkeve holê ku axêver qerfê xwe bi muxatabê xwe re dike.

Hevokên pirsiyariyê bi qertafên neyînî jî bi kar tên.

Bo nimûne:

(138)

Îcarê dibêjine Werdê ku *tu ji boyê çi nexweş nebûyî*, meger te ji vê zadê nexwariye û Heyder kanê? (17/21)

2.2.1.4. Hevokên Baneşanî

Hevokên baneşanî di rewşên baş û xerab de hestên mirov nîşan didin. hevokên baneşanî ew hevok ne ku di rewşên wek ecêbmayî, sosretî, kêfxweşî, şahî, azarî, tehdîtî, nifirî, xîtabî, pêşniyazî û hwd de tên bikaranîn. Di van hevokan de nîşandeka baneşanê (!) tê dawîya hevokê.

Ji bo hevokên baneşanî tiştê sereke îfadekirina hestekê ye. Ji ber vê yekê di van hevokan de ravekirina ramanekê ne şert e. Dibe ku carinan xala baneşanê tune be. (Özkan, 2013: 148)

Mînakên ku me ji berhemê tespît kirine ev in:

(139)

- a. Ey cema'etê mislimin (!) (3/3)
- b. Îcarê Çinar dest kiriye tepançeyê û ji nişkê ve çûye odeyê hindurê, kiriye gazî Îbrahîm, seyê pisê san (!) ne ez Çinar im.
- c. Îcarê paşa jî virêdîketin û Çinar Axayî gazî huzura xwe dîketin ku aferîn sed aferîn (!) ... (26/29)
- d. Gazî kire birayêd axayî û torinan ku gelî axalera (!) ... (30/33)
- e. Ew mirofê li ser berî difikire ku rewend qesda çûnê ye, dikete gazî lo mirof (!), tu çi dikî? (36/31)
- f. Xulase, ez çûme serbanê ber kulekê, min gazî kir ku Memed Memed (!) were derî veke. (4/24)
- g. Îcarê sê caran ew mela bi deng ji tîrsa pîrî gazî dike ku ya Mihemed, ya Mihemed, ya Mihemed (!) (7/16)
- h. Êdî dîketin gazî ku Cergo (!) ez Guzel im. (19/44)

Divê bê zanîn ku di berhemê de xala baneşanê nehatiye dayîn. Ji ber vê yekê mînakên ku me li vir dane ji aliyê wateyê ve li gor texmîna me divê xala baneşanê bigrin. Lewra gelek mînakên me hevokên gazî û bangkirinê ne.

2.2.2. Ji Aliyê Peveberê ve Hevok

Hevok ji aliye pèveberê ve di du qîsman de dabeş dibe: Li gorî cureya pèveberê wek hevoka navdêrî û hevoka lêkerî û li gorî cihê pèveberê wek hevoka rêzî û hevoka nerêzî.

2.2.2.1. Li Gorî Cureya Pèveberê

Hevok ji aliye pèveberê ve dibe du şax: Hevoka navdêrî û hevoka lêkerî.

2.2.2.1.1. Hevoka Navdêrî

Di hevoka navdêrî de pèveber navdêr e. Cînav, hevalnav, daçek, lêkerhevalnav, lêkernav, hoker, gihanek û hwd wek navdêr tînin hesabandin. Heke pèveber ji van peyvan

pêk hatibe ev hevok wek hevoka navdêr bi nav dibe. Dî hevokên navdêrî de ji bo ku pêveber bê kişandin kopula divê.

Kopula peyvek e latîni ye ku tê wateya bendik, gire, girêdan, bestandin. Kopula du tiştên ji hev cuda bi hev ve dibestîne. Wek qaîdeyeke gerdûnî di hemû zimanan de neyê dîtin jî wek lêkerê an jî wek peyvek lêkerî tê bikaranîn. Hevokên ku bi kopulayê hatine rîstandin wek hevokên ragihandinî an agahdariyê jî tên binavkirin û ji vê lêkerê re lêkera alîkar an lêkera kopulatîf jî tê gotin. (Çiçekdağı, 2016: 131-141)

Di ferhenga TDKyê de sê wateyên rêzimanê yê kopulayê hatine nivîsîn.

Di hevokên navdêrî de kirde û pêveberê bi hev ve girê dide, têgînên wek teqezî, berdewamî, neyînî, erênî, îhtîmala xurt dide pêveberê ku ew jî di tirkî de bi peyva *değil* (ne, nîne) an bi qertafa *dir, dir* (di kurmancî de ev wek cînavkên kesandinê: Ez xwendekar im.) çêdibe. Wek daçeka ragihandinê peyva ku pêveberê bi kirdeyê ve dibestîne, jê re tê gotin kopula (koşaç). Bi tena serê xwe tu wateya wê tune. Bi peyva ku tê girêdan wateyên wek erênî, neyînî, berdewamî û hwd dide. (http://www.tdk.gov.tr/index.php?option=com_bts&view=bts&kategori1=veritbn&keli_mesec=205314)

Di pirtûkên rêzimanî yê Kurmancî de kopula wek lêkera *bûnê* hatiye tarîfkirin.

Tan ji bo hevokên navdêrî wiha dibêje:

“Hevokên navdêrî bi alîkariya lêkera *buna* ku rewşê nîşan dide û cînavkên kesandinê tene sazkin. Her wekî tê zanîn di Kurdî de lêkera *bûn* xwediyê du wateyan e; ji wan yek rewşê nîşan dide, ya din qewimîn û guherînekê nîşan dide, hevokên navdêrî bi alîkariya wê *bûna* ku rewşê nîşan dide tene sazkin. Ew *buna* ku rewşê nîşan dide di dema niha de bi cînavkên kesandinê re dibin yek, lê belê di demên borî û raweyên din de bi sere xwe xuya dike.” (2015: 342)

Yıldırım hevoka navdêrî wiha îfade dike: “hevokên ku pêveberên wan lêkerên netemam (lêkerên “bûn”ê) bin û berî van lêkeran nav, cînav, hevalnav, hoker, weklêker, daçek, jimarnav, gihanek û baneşan hatibin bikaranîn wekî hevokên navî tene zanîn.” (2012: 318)

Tablo 2.6. Pêveberên hevokên navdêrî di Kurdî de van qertafan werdigirin.

Pêveber bi dengdarekê re biqede			Pêveber bi dengdêrekê re biqede		
Ez	cotkar	im.	Ez	kewanî	me
Tu	cotkar	î.	Tu	kewanî	yî
Ew	cotkar	e.	Ew	kewanî	ye.
Em	cotkar	in.	Em	kewanî	ne.
Hûn	cotkar	in.	Hûn	kewanî	ne.
Ew	cotkar	in.	Ew	kewanî	ne.

Taybetmendiyan hevokên navdêrî

- Heçî hevokên ragihandinî an hevokên navdêrî yê erênî û neyînî ne kopulaya *eyê* werdigirin an jî di wateya hebûn û tunebûnê de peyva *heye, tune, nîne* tê bikaranîn.
- Hevokên navdêrî yan rewşekê radigihîne yan jî dide nişan bê ka kirde çî ye.
- Carinan têrker û hoker jî di hevokên navdêrî de cihê xwe digirin.
- Bi piranî ji kirde û pêveberan pêk tên.
- Hevokên navdêrî bireserê wernagirin.
- Di hevokên navdêrî de kirde tucarî natewin.
- Pêvebera hevokên navdêrî ji peyvekê an ji destbêjeyekê jî pêk tên.

Mînak ji berhemê:

(140)

- a. Lewranê tewecuha nasan hemûyan li Îsmâil Begê *hebûn* û xelq ji edla wî razî bûn. (15/14)

Pêvebera hevoka ewil divê bi lêkera *hebûnê* ve neyê tevlihevkin. Lewra di vir de wek navdêrê hatiye bikaranîn. Hevok (b) û (c) jî bi heman awayî ye.

- b. Axirê kurekî Îsmâil Begê biçûk navê Sadiq Beg *hebû*. (15/41)
- c. Xuhkê Selîm Paşa *hebû* bi navê Sultan Xanim. (16/12)
- d. *Qewî zalim û bêdîn bû*. (15/43)

Hevok (d) di dema borî de hatiye kêşan. Lewra kopula “e” di dema borî de bi lêkera *bûnê* re dibe yek. Heke ev hevok di dema fireh de bihata kêşan dê bi vî şiklî çêbibûya: *Qewî zalim û bêdîn e*.

Hevok (e) û (f) bi heman şêwazê dikare bê şîrovekirin.

e. Lakin Mela Selîm Paşa li Mûşê *mayî bû*. (16/11)

f. *Bê cih û war bûye û navê jî Heyder bûye*. (17/4)

Hevokên navdêrî li gor cînavka kesandinê ya yekjimar ya yekem bê kesandin wek mînakên li jêrê (g), (h) çêdibe.

g. ... ez *mîrê Hekariyan im* ... (21/25)

h. Melekê cewab daye ku hete niha ez *muntezer im* ... (2/6)

Heke hevoka navdêrî li gor cînavka kesandinê ya yekjimar ya duyem bê kesandin wek hevok (i), (j) wiha dibe:

i. Tu *jin î* ew fikira kuştinê ji te naketin. (9/9)

j. Dikete gazî ku ey mirof, tu *çi kes î* ... (36/13)

Li gor cînavka kesandinê ya yekjimar ya sêyem bê kesandin wiha ye:

k. ew jî *fermanlo ye* ... (21/39)

l. ... bi rastî ev mirofe *birayê wê jinê ye* yan ne. (35/12)

Li gor hemû cînavkên kesandinê yên pirjimar bînan kesandin jî wiha ye:

m. Lakin xulam û etba'êd wî zahf in û em *hindik in*.

n. Lalîxan qewî zêde Kirêt e û çavêd wê jî *şevkor in* ... (12/14)

Çend mînakên dîtir:

(141)

a. Ev şûlekî *nelayiq e*. (11/11)

b. Qet mirin li nik wî xem *nebûyî*. (30/38)

c. û mîzacêd wan jî *ne weko mîzacêd mirofêd mayî ne*. (32/33)

d. Di heremê da êdî bi xeyr ji vane kes *tunebûye*. (5/11)

e. Weko Şêxî Beg diçe odeyê dirûnit, dibîne ku xanim li wê derê *nîne*. (9/25)

f. Paşê Sultan Murad dibêjîtin ku em têr in, hewceyê xwerinê *nîne*. (25/12)

2.2.2.1.2 Hevoka Lêkerî

Hevokên lêkerî ji lêkereke kêşayî pêk tê, lêker çi lêkereke xwerû çi lêkereke hevedudanî an biwêjî be.

Yıldırım ji bo hevokên lêkerî wiha dibêje: “Hevokên ku pêveberên wan lêkerên tamam (lêkerên ku tên kişandin) bin, ji wan re hevokên lêkerî tê gotin.” (2012: 319)

Çiftci ji bo hevokên lêkerî vê şîroveyê vedibêje: “Li gor qaîdeyên rêzimanê hevoka ku pêvebera wê ji lêkereke kêşayî pêk tê hevoka lêkerî ye. Divê pêveber teqez dem û kesan nişan bide.” (2013: 213)

Tan sînorek ji bo hevoka lêkerî nişan dide û wiha dewam dike: “Hevokên ku ji bilî lêkera “bûn” a ku rewşê nişan dide, çêdibin hevokên lêkerî ne. Di van hevokan de heke lêker gerguhêz be, bi kêmanî sê hêman; “kirde+bireser+pêveber”, heke lêker negerguhêz be bi kêmanî du hêman; “kirde+pêveber” peyda dibin.” (2015: 343)

Lêkerên gerguhêz her çend ku bireser hildigre jî lê mumkun ee ku di her hevokê de nehatibe nivîsîn. Wate hevokên ku pêvebera wê ji lêkera gerguhêz pêk hatibe jî dibe ku biresera wê di hevokê de nehatibe nivîsîn.

Özkan ji bo hevoka lêkerî wiha gotiye:

“Hevoka ku pêvebera wê kêşayî an jî ji lêkereke hevedudanî pêk hatibe ew dibe hevoka lêkerî. Hevoka lêkerî karê ku kirde kiriye nişan dide. Hevokên lêkerî yên ku bi raweyên pêşkerî (indicative mod/Bildirme kipi) saz dibin; pêkhatinekê, rewşekê bi riya darazkê nişan didin. Hevokên lêkerî yên ku biraweyên daxwaz-xwestekiyê (subjunctive mod/tasarlama-dilek kipi) saz dibin hestekê, daxwazekê diyar dikin. Ji raweyên pêşkerî raweya şert û mercê tenê wateya şertekê dide hevokê, darazê bi wê şertê ve gire dide.” (2013: 111)

Mînak ji bo hevokên lêkerî yên ku pêvebera wan bi lêkereke xwerû hatine sazkin:

(142)

- a. Îcarê ew çi mirof e tu *dizanî*. (35/21)
- b. Weha bi vê terzê li serê wî berî *disekinitin*. (36/9)
- c. Êdî ji wî weqtî û zemanî, navê wî berî *maye* berê mirazan. (36/36)

Mînak ji bo hevokên lêkerî yên ku pêvebera wan ji lêkereke pêşgir girtî pêkhatiye.

(143)

... behrekê dirafê didaye min û behreyek jî ji bo xwe **hildigirtin**. (4/5)

Pêvebera vê hevoka jor *hildigirtin* wek rewşa raderî *hilgirtin* e. Qertafa dema niha (di-) di lêkerên pêşgir girtî de dikeve navbera pêşgir û lêkerê.

(144)

a. Ji herdu kenaran hatin û laşêd wan birin û **hilgirtin**. (8/21)

Di vê hevokê de lêker li gorî dema borî hatiye kêşan. Lewra jî tu qertaf negirtiye.

b. Îcarê ew Mensur Beg tête camekanê û cilêd xwe **werdigirtin** ... (14/23)

c. Îcarê Îsmâil Axa di gel siwarêd xwe **vedigerin**. (27/40)

d. Seyîd Ehmed Paşa bûye hakimê Rojkan û hate Mûşê, li serayê **rûnişt**. (16/9)

Ev hevok (5) pêvebera xwe ji lêkera *rûniştinê* pêk tê. Pêşgira *rû* bi lêkera *niştinê* ve formeke nû wergirtiye.

(145) Filhal têtin û Paşayê ji xewê **radiketin** ... (11/20)

Dîsa di vê hevoka dawî de lêkera *ketinê* pêşgira *ra* wergirtiye û lêkereke nû sazkeriye.

Mînak ji bo hevokên lêkerî yên ku pêvebera wan ji lêkereke alîkar pêk hatiye:

(146)

a. Dused sêsed xulam û siwar **peyda kirîn**. (15/7)

b. Seyîd Ehmed Paşa di gel sî nefer axaler û etba'an **telef bûyîn**. (16/17)

c. Jin û keçêd wî zaf istiranana li Şekir Axa şinik **girê dane**. (21/51)

Mînak ji bo hevokên lêkerî yên ku pêvebera wan ji lêkereke bidaçek pêk hatiye:

Em dikarin wiha formule bikin:

daçek + pêşgir/navdêr + lêker

an jî

navdêr + daçek + cînavk/cînavka lihevxiştî + lêker

(147)

a. Ewî mirofî îfade kir ku ne şimêkêd derî **bi der anîne** û hatine malê û dizî kirine. (23/4)

Lêkera hevok (1) di rewşa raderî de *bi der anîn* e.

b. Îcarê pez *ser jê dikin* û îkram û e'zazê dikin ... (33/13)

Lêkara hevok (2) di rewşa raderî de *ser jê (ji wî) kirin* e.

c. xwînê ji çav girtîne û birînêd serî jî zahf in û gelek xwîn *jê çûye*. (5/47)

Lêkera hevok (3) di rewşa raderî de *jê (ji wî) çûn* e.

d. Êdî Memedî cewaba min nedayî, *dest bi çêran kirî*. (4/25)

Lêkerên bi vî rengî dema navdêr an jî destebêjeyek e ku têkeve dewsa navdêrê bi lêkerê re were bikaranîn wê navdêrê an destebêjeyê dorpeç dikin. Lê tu carî lêkerekê kêşayî nakeve navbera lêkerên bidaçekî an hevedudanî.

e. Evne ji nişkê ve peyda bûn, *dest bi revê dikin*. (7/20)

Mînak ji bo lêkerên lebatî (edilgen):

Lêkerên tebatî bi lêkera *hatinê* pêk tên. Ev lêker wek lêkera alîkar jî tê şîrovekirin. Lêkera *hatinê* her daîm lêkera piştî xwe di rewşa raderî dixwaze û heke ew lêker lêkerekê hevedudanî be bi hev bendî tê nivîsîn.

(148)

a. Êdî umêda min ji neqebê *hatiye birin* ... (22/18)

b. ... îfada halê xwe kir ku îşev malê min *hatiye dizîn*. (23/2)

c. ... weko ew *hate kuştin* ... (21/24)

Mînak ji bo lêkerên dançêker (ettirgen):

Lêkerên bi vî rengî bi alîkariya lêkera *danê* çêdibin. Ev lêker jî wek lêkera *hatin* di nav lêkerên alîkar de jî tê şîrovekirin.

(149)

a. ... wesanê bi xef û dizî mirof *dane kuştin* ... (27/23)

b. ... ewî *bide xwendin*. (25/24)

c. navê xwe li xutbeyê *daye xwendin* ... (24/26)

Çend mînakên dîtir:

(150)

a. Êdî tiştêk di destê min da *nemaye*. (4/32)

b. Lakin dîsanê merama xwe ji boyê xulaman jî beyan *naketin*. (15/24)

- c. Emma di wî zemanî da esla tayîfeyêd efrenca li wan welatan danê peyda *nedibûn* û kesekî efrencî *nedîtibûn*. (38/4)
- d. Kesek belko ji ehlê îslaman heta niha ev terze însaf û merwet *nekirine*. (38/58)
- e. Çerxa felekê bi kesekê ra *nedomandiye*. (40/79)

2.2.2.2. Li Gorî Cihê Pêveberê

Cihê pêveberê li gor rêza xwe ya di hevokê de cureya hevokê diyar dike.

2.2.2.2.1. Hevoka Rêzî

Çi hevoka navdêrî û çî hevoka lêkerî be, hevoka ku pêvebera wê li dawiyê be wek hevoka rêzî tê pênasekirin.

Wek qaîdeyê gelemperî kirde li serî û pêveber li dawiyê bireser û têrker jî di navbera her duyan de bi cih dibe. Heçî hoker e ew jî li gorî rewşê di serî an navendê de an jî berî pêveberê cihê xwe digire. (Çiftci, 2013: 2018)

Di hevoka xwerû de em dikarin hevokên xwe wiha formulîze bikin:

- 1- Kirde + pêveber
Min + xwend.
- 2- Kirde + bireser + pêveber (ji bo lêkerên gerguhêz)
Min + pirtûk + xwend.
- 3- Kirde + bireser + têrker + pêveber
Min + pirtukê + xweş + xwend.

Li gorî vê formulê heke bireser an têrker li hevokê zêde bibe divê berî pêveberê bê an na hevok nabe hevoka rêzî.

Di kurmancî de hin lêker hene ku di nava hevokê de cih digirin û peyva piştî xwe dikin têrker. Dema ku têrkerek tune be ev lêker li dawiya hevokê jî cih digirin. Baran (2012: 207) ji van lêkeran re dibêje lêkerên berpêbûnî. *Hatin, dan, ketin, rahiştin, şandin* û *çûn* çend mînak ji van lêkeran e.

Hevokên rêzî di hevokên navdêrî de:

(151)

- a. Di heremê da êdî bi xeyr ji vane kes *tune bûye*. (5/11)

- b. Di gel Paşayê çil pênceh xulaman hebûn. (6/22)
- c. Çunko ew Îsmâîl pîr û heftê sal bû. (6/25)
- d. Ez bi kuştinê *razî me*. (7/10)
- e. Ev hikayete di nêva xelqê da *me'lûm bû*. (7/24)

Hevokên rêzî di hevokên lêkerî de:

(152)

- a. Êdî tiştêk di destê min da *nemaye*. (4/32)
- b. Lakin weko pêjina kêtik û deng *têtin*. (5/17)
- c. Gule vala *diçe*. (5/29)
- d. Ew Şêx Ehmed riya eba u ecdadêd xwe *negirtiye*. (15/3)
- e. Ji wî Îsmâîl Begê ra xelqê Kuçik Şahîn *digotin*. (15/10)

Hevoksaziya hevoka (5) di nivîsînê de bi vî şiklî jî tê telafûzkirin: *Xelqê ji wî Îsmâîl Begê ra digotin Kuçik Şahîn*. Lewra lêkera *gotinê* jî yek ji wan lêkeran e ku piştî xwe biresera nerastexwo hildigire. Lê xuyaye ku di axaftinê ev qaîde têk çûye.

2.2.2.2. Hevoka Nerêzî

Hevoka ku pêvebera wê ne li dawiyê be hevoka nerêzî ye. Di hevokên nerêzî de li gorî kirpandin û girîngtirîn peyva di hevokê de cihê hêmanan diguhere. Ev cure hevok zêdetir di helbest, gotinên pêşiyar, axaftin û hwd de tînin.

Hêmanên hevoka nerêzî ji aliyê gramerê ve li gorî qaîdeyê nayê ristîn û bi taybetî jî pêvebera wê berî kirde û bireserê tê. Hevokên nerêzî zêdetir di metnên edebî de yên ku hunerên devkî tê de zahf tînin bikaranîn, di xîtaban de û di zimanê axaftinê de tînin. (Çiftci, 2013: 2018)

Carinan tîrkerên bergê û dayînê yên bi lêkerên *wek hatin, dan, ketin, rahiştin, şandin* û *çûnê* tînin bikaranîn dema daçekên xwe terk dikin piştî lêkerê bi awayekî tewandî bicih dibin.

Wek mînakên li jêrê:

Têrkera bi daçek

Em *ber bi* malê *ve* hatin.

Me *ji* wê *re* name şand.

Têrkera piştî pêveberê û bê daçek

Em hatine *malê*.

Me name şand *wê*. / Me name şandê.

Ew *bi ku ve çû*.

Ew *çû ku*.

Di van mînan de wek ku tê dîtin di hevokên pêşî de têrker/bireser bi daçekê tê bikaranîn lê di hevokên li hemberî wê de têrker/bireser daçeka xwe avêtiye û piştî pêveberê hatiye nivîsîn.

Yanî em hevoka “*ez ber bi malê ve çûm*” nikarin bê daçek bi heman rêzê wiha bilêv bikin: *Ez malê çûm*. Lêkera *çûnê* biresera berî xwe ya ku terka daçekê kiriye diavêje paş xwe. Di van hevokan de ji ber ku daçeka bireserê/têrkerê hatiye avêtin êdî ne mimkun e ku li pêşiya pêveberê bê nivîsîn. Ji ber wê ev cure hevok di nav hevokên nerêzî de tên hesabandin.

Nimûne ji berhemê:

(153)

- a. Meger jina mela Bazîd jî *hatibûye* guhdariyê. (3/5)
- b. Paşî carekê *ez çûme* kenarê Tebirîzê. (4/7)
- c. Hêdî min xwe *avête* nehalekî. (4/11)
- d. Lakin derdê Memedî *maye* di dilê min da. (4/40)
- e. Behram îcarê *dide* qemeyê, ji derê odayê *tête* hindur. (5/30)
- f. Behram jî rast *tête* derê odayê, tîfing *hazir* di destê da. (5/21)
- g. Jin û kur *diçine* mala Şêxî. (6/14)
- h. Lakin daîm *ketine* qesda Adile Xanimê û ewan mexînan. (9/37)

Di hevoka (a) de lêkera *hatinê* di dema borî de. Di hevoka (b) de lêkera *çûnê* di dema borî de. Di hevoka (c) de lêkera *avêtinê* di dema borî de hatiye kêşan. Di hevoka (d) de lêkera *mayînê* di dema borî de hatiya sazkirin. Di hevoka (e) de du pêveber hatiye bikaranîn ya ewil lêkera *dan* ya duyem lêkera *hatinê* ye ku her du jî di dema niha de hatine sazkirin.

Hevoka (f) dîsa du pêveber hene ku yek jê lêkera *hatin* û ya din jî navdêr (*hazir*) e. Ji navdêran jî hevokên nerêzî saz dibin. Hevoka (g) û (h) jî lêkera *çûn* û *ketinê* piştî xwe têrker hildane.

2.2.3. Ji Aliyê Avasaziyê ve Hevok

Hevok ji aliyê avasaziyê ve dibin du cure.

2.2.3.1. Hevokên Xwerû

Ew cure hevok ne, ku tenê darazek, kirinek an wateyek jê der bibe. Hevokên sade jî tê gotin. Dî van hevokan de tenê lêkereke kişandî heye an heke hevokeke navdêr be dîsa tenê ji pêveberekê û ji ragihandinekê pêk tê.

Hevokên xwerû anku sade ew cure hevok in ku hest û ramanek tenê rave dikin û bi lêkereke tenê ya kişandî têne sazkin. (Tan, 2015:: 343)

“Di hevokên xwerû de tenê darazek heye, ev daraz tenê bi pêveberekê ve encam dide. Ev pêveber yan lêkereke kêşayî ye yan jî destebêjeyekê wek navdêrê bi kar tê yan jî navdêreke lêkera alîkar hilgirtiye. Tiştê ku avahiya hevokê diyar dike ne hejmara peyvên di hevokê de ye an jî hejmara destebêjeyan. Tiştê ku avahiya vê hevokê diyar dike têkilîdanîna wan ya bi pêveberê ve ye.” (Özkan, 2013: 65)

Çiftci (2013: 220) di mijara hevokên xwerû de du binbeş vekiriye: hevokên lêkerî yên bêşexs, hevokên navdêrî yên bêşexs. Ji bo hevokên lêkerî yên bêşexs wiha dibêje:

Pêvebera vê hevokê kesa/ê xwe winda kiriye ji bilî cînavka kesane ya yekjimar ya sêyem.

(154)

- a. Îcarê *dizane* ku ew şûla ku li wî qewimî hîle bûye. (12/30)
- b. ... *dizane* ku di xanê da avahî heye ... (19/37)
- c. Îcarê xweyê malê *dizane* ev Mam Bapîra cahil û ehmeq e. (24/11)

Hevoka navdêrî ya bêşexs jî wiha şîrove dike: ev hevok jî bi lêkera alîkar û navdêr an rengdêrên wek *teqez*, *hewce*, *îhtîmal*, *mumkun*, *dîyar*, *kifşê* pêk tê. Her daîm ji bi cînavka kesane ya yekjimar ya sêyem tê bikaranîn. Kirdeya van pêveberan ji bo ku watedar be divê ne şexs lê hevokek be.

(155)

- a. Qenc e ku tu destûra min bideyî. (32/35)
- b. ... her çi kesê tişteki ji wî zêde heye *lazim e* di riya Xwedê bidene jaran. (3/11)
- c. Îcarê paşa dibêje ku *lazim e* gundêd çend axan jê bistînim ... (11/16)
- d. ... *lazim e* ku biçime huzûrê. (28/10)
- e. ... *lazim e* ku ez bi lepekê ji van xelas bibim. (22/19)
- f. *Meşhûr e* dibêjin ji boyê miryan paşê kes namirîtin. (21/43)

Di vê mînakê de tê dîtîn ku *tu destûra min bideyî* wek hevoka alîkar dibe kirdeya *Qenc e*. Wate heke bê pirsîn çî qenc e, bersiva wê hevoka alîkar e.

Mînak:

(156)

- a. Xundkar û lala ji wî şîrî hindekî dixwen. (25/17)
- b. Mirofek diçite ser pezê Sîsoyî. (25/51)
- c. Lewranê di nêv ehlê ekrad ev şûla qewî zêde 'ar e. (26/31)
- d. Şeva çarê nîva şevê diçine nêzokê malêd Herkiyan. (27/34)
- e. Mîr 'Eliyê hekîm jî di gel wan e. (32/13)

2.2.3.2. Hevokên Hevedudanî

Ev cure hevok ji darezekê zêdetir darazan di nav xwe de dihevin. Hevokên hevedudanî di nav du sernavan de dabeş dibe: hevokên hevedudanî yên serbixwe û hevokên hevedudanî yên pevgirêdayî.

Nêrînên kesên li ser rêzimanê xebitîne wiha ne:

“Hevokên ku darazeke bingehîn û darazên talî di xwe digirin wekî hevokên hevedudanî tînan zanînan di hevokên hevedudanî de pêvebereke bingehîn û herî kêmtir pêvebereke alîkar cih digirin.” (Yıldırım, 2012:320)

“Hevokên hevedudanî ew hevok ne ku di nav de ji yek zêdetir lêker an daraz hene. Hevoka ku daraza sereke di xwe de dihevine hevoka bingeh e, yên mayî hevokên alîkar in.” (Çiftçi, 2013: 222)

“Dema ku mirov nikare hest û ramanên xwe bi hevokerê tenê derbibe, mirov dixwaze hest û ramanên xwe bi çend hevokan vebêje. Ev hevok dibe ku hevokên serbixwe bin û bi gihanekan li hev hev rêz bûbin an jî dibe ku çend komek bin û pêk ve girêdayî bin, wan bi vî rengî hevokerê mezin pêk anîbin.” (Tan, 2015: 344)

Hevokên hevedudanî yên serbixwe bi bêhnok, xalebêhnokan yên pevgirêdayî bi gihanekan bi hev tînan girêdan.

2.2.3.2.1. Hevokên Hevedudanî yên Serbixwe

Di hevokên hevedudanî yên serbixwe de gelek daraz hene ku bi hev ve hatine girêdan. Lê ev girêdan ji aliyê wate û têkiliyêke mantiqî ve pêk tê. Girêdana hevokan bi gihaneka *û* ye an jî bi bêhnok, xalebêhnok û hwd ve çêdibe.

Tan ji bo van hevokan wiha gotiye:

“Carinan hevokeke tenê têrê nake ku mirov hest û ramanên xwe der bibe, ji bo vê yekê çend hevokan li pey hev rêz dike, wan hevokan bi hinek gihanekan bi hev ve girê dide. Di van hevokan de her hevok serbixwe ye, bi alîkariya bêhnok û gihaneka ‘û’ bi hev ve têne girêdan, bi vî awayî hevoka hevedudanî dibe xwediyê hevgirtineke wateyî.” (Tan, 2015: 344)

Çiftci hevokên hevedudanî yên serbixwe wiha şîrove kiriye: “Ew hevok ne ku hin hevokên xwerû û hevedudanî yên ku ji aliyê wateyê ve bi hev ve têkildar bi bêhnok û xalebêhnokê ve bi hev ve hatine girêdan ne ku bi gihanekan. Di navbera wan de rêzên wateyî û mantiqî hene.” (2013: 222)

Ji ber ku di klasîkan de di dewsa bêhnokê de gihaneka *û* hatiye bikaranîn xalbendî wek îroyîn bi awayekî xurt nehatiye bikaranîn û ji ber ku berhema me jî yek ji wan berhema ye destê me ji aliyekî ve tê girêdan. Helbet di temamê hevokan de gihaneka *û* yê nehatiye bikaranîn. Lê ji aliyê wateyê ve mirov dikare tespît bike bê kîjan hevok bi kîjanê ve girêdayîye. Ji ber wê di gelek cihan de me bêhnok daniye û em ê li gorî vê qaîdeyê mînakên xwe hîlbijêrin.

Di hevokên hevedudanî yên serbixwe de carinan kirde carinan pêveber û carinan jî bireser an têrker dibe ku hevpar bin. Hevokên ku hêmanên wan hevpar in wek hevokên serbixwe yên girêdayî (dependent clause/bağimli sıralı cümle); hevokên ku hêmanên wan ne hevpar in jî wek hevokên serbixwe yên negirêdayî (independent clause/bağımsız sıralı cümle) tînin binavkirin.

Mînak ji bo kirdeya hevpar:

(157)

a. (*Ew*) Sê pîst girtiye, hêj razî nîn e, teme'a pîstê dinê jî diket. (1/11)

Sê hevokên serbixwe di vê mînakê de hene ku kirdeya wan *Ew* e û hevpar e lê veşartî ye.

b. *Mîrzoî Reş* hebû, ji tayfeyêd Êzdiyêd Wanê bû. (4/1)

Di vê hevokê de jî *Mîrzoî Reş* kirdeya hevpar ya her du hevokan e.

c. Êdî *Memedî* cewaba min nedayî, dest bi çêran kirî. (4/25)

Memedî kirdeya hevpar ya her du hevokên serbixwe ne.

Mînak ji bo pêvebera hevpar.

(158)

a. xweyê nav û nîşan *dibît*, xweyî îhsan û kerem. (10/10)

Di vê hevokê de *dibît* pêvebereke hevpar e.

b. Navê yê mezin Hesên Axayê Hesamiyan û navê yê biçûk Çeleng Axa *bûye*.
(12/3)

Di vê hevokê de em dibînin ku lêkera *bûn* hevpar e.

c. ... *birîne* mala babê, çend rojekan (birine) mêtwanîyê. (19/2)

Pêvebera *birîne* hevpar e. Hevoka duyem berî mewaniyê pêvebera *birîne* hildigire

d. Ehlê meclîsê û bagê kafeyê wan etrafan, *aferîn û tehsînê* ji boyê pakî û paqijîya
Guzelê (dikin) û curat û cesareta Guzelê dikin.

Di van hevokan de hem bireser hevpar e û hem jî pêveber hevpar e. biresera hevoka yekem biresera hevpar e ji boyê hevoka duyem û pêvebera (dikin) ku di hevoka duyem de hatiye bikaranîn pêvebereke hevpar e ji bo hevoka yekem.

Mînak ji bo biresera hevpar:

(159)

a. Bi xwe bi xwe dibêje ku ez dê *milekî vî laşê Kirêtî* bibirim û (ew) bavêjime
ser vî siwarî. (19/33)

Di van hevokan de *milekî vî laşê Kirêtî* wek bireserê hatiye bikaranîn û di her du hevokan de biresereke hevpar e.

b. *Şekir Axa* kuştin, tamam kirin. (21/34)

Şekir Axa bireser hevpar ya van hevokan e.

c. Ez dê *mu'în û oldaşêd Şekir Axayî hemû* bigirim û (wan) bikujim.

Di hevokên hevedudanî yê serbixwe yê ku biresera wan hevpar de bireser di hevokê de tê bikaranîn, hevokên dîtir yan cînavkek dikeve şuna wê yan jî nayê nivîsîn.

Mînak ji bo têkera hevpar:

(160)

a. Ew Îbrahîm Axa jî *carinan bi xef bi şev* tête mala wî û diçitin. (26/14)

Carinan (mêjer), *bi xef* (çawanî), *bi şev* (dem) hoker in û wek têkerekê rola hêmana hevpar wergirtine.

b. Wisanê îqtîza diketin ku ew Çinar Axa diçite xurbetê û *li Bexdayê*, dibite delobaşî û mudyekî dimînitin. (26/2)

Li Bexdayê (têkera cih) hem ji bo hevoka *dibite Delobaşî* hem jî ji bo hevoka *mudyekî dimînitin* dibe têkerekê hevpar.

c. ... da ez benî biçime welatê Silêmaniyê û *li wê derê* dersan bibêjim û (li wê derê) neşra ilûman bikim, ji saya hezreta we ‘alim û ‘ilma di Kurdistanê da zaf bibin. (28/33)

Çend mînak ji bo hevokên serbixwe yê negirêdayî (independent clause/bağımsız sıralı cümle):

(161)

a. Ewî Sîsoyî du kur *peyda bûyîn*, navê yê mezin *Kerhê* û navê yê biçûk *Ehmê*.

b. Waliyê Celê Namiq Paşa *nivîsî*, eve mirofane ji Eyûb Axayê Milî Îskanbaşî *xwast*. (29/17)

c. Lakin di konan danê *nabîtin*, em zivistanê *biçîne* qışlaqê, li wê derê ez wî *digrim*. (30/11)

d. Lakin kurê wî Bêlo û ew hepis hemû *digirîn*, li wan veso hat ku ji boyê çî hûn *digirîn*, ne *şerm e*, elbete berxê nêr *ji boyê kêrê ye*, *xeman nekin*. (30/27)

e. Wê şevê ew xelqê di zincîrê danê sê çarîk jê *bizdiyan*, du mehan zêde *nexweş bûn* û Madoyê file jî, eger çî Ehmedê Feqî *xeniqand*, lakin *nîvruhî bûyî*, ew jî subeyê *bizdiyabû*, *çûyî* û *nexweş bûyî*, paş hefteyekê ew file jî *mir*.

2.2.3.2.2. Hevokên Hevedudanî yên Pevgirêdayî

Ev hevok ji hevoka bingeh a ku daraza sereke di xwe de dihewîne û hevoka alîkar a ku daraza sereke ji hêla erk û wateyê ve tamam dike, pêk tê. Ji ber vê yekê hevoka bingeh, hevoka sereke ye û bi tena serê xwe jî dikare bê bikaranîn. Hevokên alîkar herçend ji hêla saziyê ve serbixwe bin jî di hevokên hevedudanî de erka wê tamamkirin, zexmkirin û dupatkirina hevoka bingeh ango şahkomekê ye.

Derheqê van hevokan de yên li serê lêkolîn kirine wiha gotine:

“Hevokên ku ji yekê zêdetir pêveberan di xwe de digirin û ji aliyê rêzimanê ve serbixwe ne lê ji aliyê wateyê ve bi ve girêdayî ne wekî hevokên pevgirêdayî tên naskirin. Di van hevokan de pêveber gelek caran bi hinek gihanek û nîşandekan bi hev ve tên girêdan û bi pêvebera dawîn xelas dibin.” (Yıldırım, 2012: 320)

“Hin hevok hene ku çend hevokan di nava xwe de dihewînin. Di hevokên wiha de hemanke bingehîn û yeke alîkar heye. Hêmana alîkar her çiqas bi xwe hevokek be jî ji aliyê wateyê ve bi tena serê xwe kêm dimîne. Ji ber ku ew ji aliyê wateyê ve girêdayî hêmana bingehîn e.” (Tan, 2015: 344)

“Hevokên Hevedudanî yên Pevgirêdayî ew hevok in ku bi gihanekekê ve hatine girêdan û di navbera wan de pêwendiyek heye.” (Çiftci, 2013: 223) Çiftci hevokên hevedudanî yên pevgirêdayî bi deh binbeşan de yek bi yek bi mînakên îzah kiriye. Em ê jî li vir li gorî van binbeşan ji berhemê mînakên bidin.

Navê binbeşan ev in:

- a- Pêwendiya lihevkerin û guncanîtiyê
- b- Pêwendiya wekhevî û bijartinê
- c- Pêwendiya veguherîna birêzî
- d- Pêwendiya dijayetî, berevajîtî an îstîsnaî
- e- Pêwendiya rêza periyodîk
- f- Pêwendiya erênî û neyînî
- g- Pêwendiya hevpar di neyîniyê de
- h- Pêwendiya hevpar di erênîyê de
- i- Pêwendiya sedemî
- j- Pêwendiya encamî

2.2.3.2.2.1. Pêwendiya Lihevkirin û Guncanîtiyê

Pêwendiya lihevkirin û guncanîtiyê bi gihaneka *û* û daçeka *jî* bi hev ve tèn girêdan:

Bo mînak:

(162)

- a. *Ez pirsiyarê ji derê şimêkê dikim û dizê te peyda dikim û malê distînim.* (23/6)
- b. *Îcarê Paşa ji german têne wê rezê û li kenarê hewzê peya dibin û hêsayî dibin û qawe vedixwin.* (32/9)
- c. *Mîqdarê nîv saetan ew sifre wisanê li ber rojê disekinitin, heta ew xulam xizmet dikin û ava destan dideyn û qawe û qelûnan dideyn, paşê diçin û ew etba'î rûtînin û ewan zadan dixwin.* (32/16)
- d. *Siwar dibin û têne mala Şerîf Axayî û peya dibin.* (33/11)
- e. *Êdî ji cihekî umîda ehlê kelê namînitin û tab û taqeta dijminî jî tînînin.* (34/15)
- f. *Mela li pêşî bû û ew her du mirofêd cahil jî li duyê mela bûn.* (1/3)

2.2.3.2.2.2. Pêwendiya Wekhevî û Bijartinê

Pêwendiya wekhevî û bijartinê ew e ku ji du yan zêdetir hevok ji aliyekî ve rewşa wekhevîyê nişan didin. Gihanekên wek *xwezî* an *çi* tèn pêşîya van hevokan.

Mînak ji bo vê mijarê nehatin tespîtkirin.

2.2.3.2.2.3. Pêwendiya Veguherîna Birêzî

Pêwendiya veguherîna birêzî di nav ji yekî zêdetir hevokan de tenê îmkana yekê heye ku pêk bê an jî dikare yek bê tercîhkirin. Bi gihaneka *ya*, *an* û *yanê* bi hev ve tèn girêdan.

Bo nimûne:

(163)

- a. *Karbarê xwe bike yan ez dê li rûyê dinê xweş bibim, ya dê tu xweş bimîni.* (8/16)
- b. *... were ez dê te birevînim, yan ew e ku em xelas dibin, yan ew e ku bi pê me dikevin û me dikujin ...* (13/8)
- c. *Ew mirofe jî du'a li dewleta hewe diketin û hêvî diketin, bilanê yan min bikujin weya biderîne û aza bike.* (38/37)

2.2.3.2.2.4. Pêwendiya Dijayetî, Berevajîtî an Îstîsnaî

Pêwendiya dijayetî, berevajîtî an îstîsnaî bi gihanekên *lê*, *lêbelê*, *feqet*, *lakin* hevokên li dijî hev bi hev girê dide. Di berhemê de gihaneka *lê*, *lê belê* û *feqet* nehatin dîtin. Hemû hevokên hevedudanî yê pevgirêdayî yê ku ji aliyê wateyê ve li dijî hev bi gihaneka *lakinê* bi hev ve hatine girêdan.

Mînak:

(164)

- a. *Eger çî biratiya Îsmail Begê sadiq bûye, **lakin** dostiya Şêx Ehmedê bi heramzayî bûye.* (15/18)
- b. *Qe deng naketin, dizane ku di xanê da avahî heye, **lakin** ins e, cin e, çî ye nizane.* (19/37)
- c. *Her çend Îbrahîm Xan Begê evê teklîfa li Şekir Axayî kir, **lakin** Şekir Axayî bawerî nekirî, qebûl nekir.* (21/14)
- d. *Êdî xulaman ger çî kiriye hela hela û gotin em dê odayê bisojin, **lakin** newêran.* (21/37)

2.2.3.2.2.5. Pêwendiya Rêza Periyodik

Pêwendiya rêza periyodik bi daçek an hokerên wek *pişt re*, *paşê*, *dû re* re çêdibe. Hevoka ku li paş hevokeke din pêk bê ji aliyê demê ve alîkarî ji van peyvên dibîne.

Mînak:

(165)

- a. *Ew mirofê mamur, dîsanê bi tekrar bi topoze li derî didetin, **paşê** dîsanê guhê xwe didete derî, guya cewabê jê distîne ...* (23/17)
- b. *Îcarê subeyê xelatekê jî didete Domoyî û aza diketin û çend siwaran jî di gel Domoyî virê diketin ku bibine silametiye û **paşê** vegerin.* (27/22)
- c. *... heta ew xulam xizmet dikin û ava destan dideyn û qawe û qelûnan dideyn, **paşê** diçin û ew etba'î rûtinin û ewan zadan dixwin.* (32/16)

2.2.3.2.2.6. Pêwendiya Erênî û Neyînî

Pêwendiya erênî û neyînî ji nav jî diyar e ku di van hevokan de hevokek bi karekî erênî û ya din jî bi karekî neyînî bi hev ve tînin girêdan.

(166)

- a. *Min bi xwe bi çavê xwe evene weha dîtin, ez dizanim ku evene zêde muhkem in û mîzacêd wan jî ne weko mîzacêd mirofêd mayî ne. (32/33)*
- b. *Îcarê qenc me'lûmî we bû ku ez 'eşîr im, ne zen qehbe me û bi xwe jî serê Zeman Xanê Ayromî di gel serêd mayî û esîran birî û çûye nik Mehmud Paşayê waliyê Wanê. (39/25)*
- c. *Min wisanê we'z kirin ku xelq cilêd xwe yê zêde û nanê bidene min, ne webû ku tu rabî cilêd berşûya min û nanê zarokan bideye xelqê. (3/14)*

2.2.3.2.2.7. Pêwendiya Hevpar di Neyîniyê de

Du yan zêdetir hevok bi daçeka *ne* yê bi wateyeke neyînî ya hevpar bi hev ve tèn girêdan.

Mînak:

(167)

Îcarê Şerîf Axa laşê Şebîbî davête nik Şêx Tarimî û dibêjîtin ku haza Şebek, ne tu bîyî û ne jî Şebîbê te bibitin, eve çi ye ... (33/22)

Mînak ji bo vê babetê di berhemê de tenê ev hat dîtin.

2.2.3.2.2.8. Pêwendiya Hevpar di Erênî de

Di van hevokan de wateyek erênî ya hevpar du yan zêdetir hevokan bi hev ve girê dide. Ev cure hevok bi gihneka *hem* tê girêdan.

Ji bo vê babetê jî di berhemê de mînak nehatin dîtin.

2.2.3.2.2.9. Pêwendiya Sedemî

Pêwendiya sedemî di hevokên hevedudanî yên pevgirêdayî de bi gihanekên wek *lewra, ji boyî, ji ber wê, ji wê, ji ber ku* tèn sazkirin. Di van hevokan de daraza hevokekê sedema daraza hevoka din rave dike. Di berhemê de gihanekên *ji ber ku, ji ber wê nehatin dîtin*.

Bo mînak:

(168)

- a. *Yanî xwendeyêd hemû milletan, ekserî kê mî ihşan û kê mî ikram dibin, lewrane ew dixwezî xelq ikram û ihşanê li wan bikin ... (2/7)*

- b. *Weko bûye şev Memedî gote min ku Mîrzo, îcarî tu here şûla xwe, lakin heta du heyvan pê êre da meyê, lewranê eve mal malike zaf e, heta ez difroşim, paş du mehan were êre behra xwe bibe.* (4/18)
- c. *Min **ji boyê** heyfa Memedî ew mala û talan li wan siwaran parîvekirin, da heyfa min **ji boyî** Memedî nemîne.* (4/48)
- d. *Wê rojê jî roja îne bûye ku Paşa û xelq hemû **ji boyê** nimêja îne tene mizgeftê.* (6/15)
- e. ***Ji wê** jî min tu heta şevê gêro kirî eger ne elbet ez dê te bikujim.* (19/20)

2.2.3.2.2.10. Pêwendiya Encamî

Pêwendiya encamî jî daraza hevokekê encama daraza ya din îzah dike. Ev jî bi gihanekên wek *nexwe*, *lewma*, *wê demê*, *ji ber vê yekê* bi hev ve tîr girêdan.

Mînak:

(169)

- a. *Gote Madoyî ku here **ji boyê** min cêrekî avê bîne hazir bike û zincîrê ji ûstûyê min biderîne, **da** ez xeslekê bikim û nimêj bikim.* (30/24)
- b. *Îcarê weko êvarê Mela Bazîd hatiye mala xwe, bi şev gote jina xwe ku cilêd dişon bûyne berşuwêd bêne **da** ez cilêd xwe veguhurim.* (3/8)

2.2.3.2.3. Hevoka Alîkar û Cureyên Wê

Di kurdî de hevoka bingeh/sereke (main clause) zêdetir bi gihaneka *kuyê* bi hevoka alîkar (pariste/subordinate clause) tîr girêdan. Ji hevokên alîkar hinek weke hêmanên hevoka bingeh bi mînakan hatibûn îzahkirin. Li vir jî ji aliyê wateyê ve hinek fonksiyonên hevokên alîkar dê bîr îzahkirin.

“Dema ku navdêrek ji aliyê hevokekê tîr modîfîyekirin ku bingihaneka (subordinator) *kuyê* peywendiyê di navbera sere (head noun) û hevokê de çêdike, ew hevok dibe hevoka peywendiyê û sereyekê modîfîye dike. Em ji bîr nekin ku di kurmancî de gelek fonksiyonên bingihaneka ka *kuyê* hene. Bikaranîna wê ya herî berbelav ew e ku deema hevokeke bingehîn (main clause) û hevokeke nebingehîn (subordinate clause) hebe wan bi hev ve girê dide.” (Bûlbûl, 2016: 24)

Her hevoka alîkarek li erk û fonksiyon û wateya xwe digel gihaneka *kuyê* hin peyvan werdigirin wek *hoker*, *navdêr* û *daçekan*. Lê di berhemê de tîr were dîtin ku di hin

hevokan de tenê *ku* hatiye bikaranîn. Lê ji fonksiyon û wateya hevokê em têdigihên bê ka kîjan cure hevoka alîkar e. Divê di mînakên de ev xal li ber çavan bê girtin.

“ Di hin rewşan de hevoka peywendiyê ji cihê xwe yê eslî dûr dikeve. Lê fonksiyona wê ya modîfîyekirinê dewam dike. Di rewşên wisa de *îzafe* ku girêdana sereyê û hevoka peywendiyê çêdike jî êdî nayê bikaranîn.” (Bûlbûl, 2016: 32) Bazîdî di berhema xwe de gelek caran hevokên peywendiyê bi vî awayî bi hev ve girê daye. Li jêr mînakên wê dê werin nişandan û şîrovekirin.

2.2.3.2.3.1. Hevoka Alîkar a Demê

Hevoka alîkar a ku demê nişan dide, hevoka bingeh ji aliyê demê ve تمام dike. Dema rewş û rûdana hevoka bingeh diyar dikin, bi van gihanekan bi hev ve tîr girêdan: *roja ku, dema ku, wexta ku, berî ku, hinde ku û hwd.*

Bo nimûne:

(170)

- a. *Dema ku daxilê Istenbulê bûyî, çûye medreseyekê, lakin ser û guh perîşan ...*
(28/6)
- b. *Di weqtê Tîmûr Paşayê Millî ku îskanbaşî bûye û malêd wan havînan ji beriyê dihatine zozanêd Bîngolê, ji tayîfa Silîwanêd Diyarbekrê lawekî qewî jêhatî û bi husn û camêr, lakin bê hal û mal, navê Siyahmed dibêjin, ew law têtin û dibite xulamê Tîmur Paşayê Millî û mudeyek di xizmeta Tîmur Paşa da dimîne.* (13/1)
- c. *Adile Xanim virê dike ji Mexînan deh mirofêd gurbiz û bi quwet xweyê tîfing û xençer, wê roja ku dibê Şêxî Beg bêtin, ewan mexînan guya ji boyê xizmet tênite kelê.* (9/14)
- d. *Ewê rojê ku ewan etba'i û xulamêd te ew zadêd ronî û goşt ku hinde qeder li ber tavê mayî xwarîn û qet yek ji wan nexweş û telef nebûyî, eve gelekî 'ecêb e.* (32/31)
- e. *Îcarê Pêxember eleyhisselam, ji wî melekî sewal kirîn ku hindê ku tu hatî mamur kirîn te qet çend caran li vê dehulê daye?* (2/5)

2.2.3.2.3.2. Hevoka Alîkar a Armanc/Mebestê

Armanca pêvebera hevoka bingeh diyar dikin. Di van hevokan de amrazên wê wek (da, da ku, heta ku, ji bo ku) bi kar tê.

Bo nimûne:

(171)

- a. *Îcarê Îbrahîm Xan Beg dibêje melan ku **da ku me'lûmê we bibitin** ku Şekir Axa bi emrê dewletê fermanlo bû û emrê min bûyî, ez hatim û min kuştiye û ez dê serê wî bibirim û virêkeme dewletê. (21/46)*
- b. *Carekê Mela Mihemedê Qulpî, xurcekî biçûk kitêban li milan û şîr û mertal li piştê, bi tenê tê **ku bête Bazîdê ji boyê xwendinê**. (7/2)*
- c. *Weko siwaran ew Mela Mihemed dîtî hatine riya wî, xweşgerî girtin û şelandin û birne nêva gireyê **ku bikujin**. (7/5)*
- d. *Weko sê seet ji şevê dibore, navmal têtî fanos di destê da, dibêje Şêxî Begê ku xanim te dixwaze heremê **ku digel te xeber det**. (9/22)*
- e. *Siyahmed jî digehe ser gayê û kêrê bidertîne **ku gayê serjê ke**. (13/28)*

2.2.3.2.3.3. Hevoka Alîkar a Sedemî

Ev cure hevokên alîkar boçûn û sebebek nişan didin ji bo hevoka bingeh. Amrazên wê ji bo ku, ji ber ku, çima ku, çunkî. Di van hevokan de sedem hevoka alîkar be encam wek hevoka bingeh e.

Mînak:

(172)

- a. *Her çend Polo verê dike nik babê keçê û Barnîkê ji boyê xwe dixwaze, babê keçê nadet, **ku Polo rûs e**, ez keça xwe nadime wî. (8/6)*
- b. *Paşê xanim evê xeberê qebûl nake **ku îlla min jî çek û zêr û xemil divêtin**. (11/15)*
- c. *Îcarê li êlê dibîte hewarê **ku Siyahmed û keça Tîmur Paşa Şems herdu wenda ne**. (13/13)*
- d. *Weko Cergo tête ber derê xanê û peya dibitin ku bête hindurê xanê û nîşanê danîtin, Guzel Xatun seha pêjnê diketin, ditirse **ku eceba vê şevê nivê şevê eve heravê be û rê birîn evne çi ne?***

2.2.3.2.3.4. Hevoka Alîkar a Mercî

Di van hevokan de daraza hevoka bingeh bi mercekê ve tê girêdan. Ev merc jî di nav hevoka alîkar de bi amrazên wek (heke, eger, ger) tê bikaranîn.

Bo nimûne:

(173)

- a. *Ekra dan gotine ku belê eve gaza Koroxli ye, li çiy an hêlaye, ji boyê jaran ku eger mirofêk çend gez bi vê bikire, mala xwe ava diketin. (20/7)*
- b. *Îcarê Terlan Axa bi xef dibêjîte Domoyî ku te bibînim, eger tu diçî û bi dizî guleyekê davêyi Îsmâil Axayê Şikeftî û dikuji, ez dê hinde pez û dewarî bideme te. (27/4)*
- c. *Eger ev waqî'e li Îranê bibûya, elbet nivê wan mirofan telef dibûn û nivê jî di piştî zaf 'îlacan paşî belko xelas dibûn. (32/32)*
- d. *Eger Şerîf te divêtin ez bideme te, da ji boyê te kewan şikarî biketin. (33/8)*

2.2.3.2.3.5. Hevoka Alîkar a Dijberiyê

Di van hevokan de ji aliyê wateyê ve dijberiyek di navbera hevoka bingehîn û ya alîkar de heye. Bi gihanekên wek *her çi qas, her çend, tevî ku, eger çi* bi hev tên bestandin.

(174)

- a. *Her çend mîrêd wan jî se'î û cihed dikirin ku feqe Şomoyê bi dest bînin û bigirin, mimkun nedibû. (22/8)*
- b. *Min wisanê we'z kirin ku xelq cilêd xwe yê zêde û nanê bidene min, ne webû ku tu rabî cilêd berşûya min û nanê zarokan bideye xelqê.*
- c. *Îcarê eger çi Çeleng Axa çûbûye ku Lalîxanê jî boyê birayê xwe yê mezin Hesên Axa bixwezîtin û ewan jî erê gotine, lakin weko Çeleng Axa Lalîxanê dibîne û bêxtiyar lê aşiq dibe. (12/8)*
- d. *Eger çi ev şûla bi xef e, lakin êre da pê da cîran dikevîne şibheyê û eve gufteguya cizwî di nêva 'ewanan da tête gotin. (26/4)*

2.2.3.2.3.6. Hevoka Alîkar a Rêje û Hejmarê

Ev hevok mîqdar, rêje û hejmara hevoka bingehîn diyar dike. Bi gihanekên wek *heta ku, qasî ku, qederê ku* bi hev ve tên girêdan.

(175)

- a. *Memed dibêje, eman Mîrzo, min kiriye tu meke, eman herçî ku mal heye bibe, min nekuje. (4/46)*

- b. *Naçarî Şomo dibêje, ez daketime neqebê û çûme nêva dêrê, min şemal hilkirî, her çi ku di dêrê da hebûn; xaçêd zîv û şemdan û peyalûn min berhev kirî û înaye daye oldaşêd xwe, ji neqebê dikêşan û dibirin. (22/13)*
- c. *Paşê çend rojekan ku Îbrahîm Paşa dibite waliyê Bazîdê û serî ji qerebalixî hêsayî dibitin, rojekê ew dizdar Qasim Axa tête huzûra Îbrahîm Paşa û bi xef ehwala hepsiyê Jubirî weko bûyî ji boyê Îbrahîm Paşayî neql û beyan diketin ... (38/36)*
- d. *Êdî Şatir jî qederê ku qadir dibitin hemil biketin, ji zêran tijî çewalê diketin û ji defîneyê biderdikevin. (37/23)*

2.2.3.2.3.7. Hevoka Alîkar a Hevalnav

Hevokên alîkar carinan taybetiyên navdêr an frazekê nişan didin di hevokên pevgirêdayî de. Wê demê hevoka alîkar wek hevalnav kar dike.

(176)

- a. *Jina Mela Bazîdî înan ew destê cilêd melayî ku bersû bûn, daye jaran û nîveka nanê hazir hey daye feqeran. (3/7)*
- b. *Meger çavê Çeleng Axa bi keçê dikeve, weko ewê keçê dibîne, bê îxtiyar ewê keça ku ji boyê birayê xwe Hesên Axa dixwestin dihebîne. (12/6)*
- c. *Îcarê dizane ku ew şûla ku li wî qewimî hîle bûye. (12/30)*
- d. *Şems jî li wê navê di dereca helakê da, ew siwarêd ku bi pê wan ketine, ew jî digehine wî derî û hespêd wan dibînin û paş têne ser laşêd wan. (13/34)*

2.2.3.2.3.8. Navdêrandina (nominalization) Hevoka Alîkar

Hin lêker dikarin di fonksiyona navdêran de bên bikaranîn û bibin argumenta lêkerekê din. Hevokên peywendiyê wek hevokên tam ji dikare bê hesibandin û lêkera wan jî li gorî dem û kesan wek hevokê normal û resen çêdibe. Dema lêkera hevoka peywendiyê were navdêrandin peyvrêziya hevoka peywendiyê diguhere û wek xwe namîne an jî ji holê radibe. (Bülbul, 2016: 32)

(177)

- a. *Îcarê Behram ehwalê xwe û hatinê û hûrîkirina Welî Paşa ji boyê wan dibêje. (5/51)*
- b. *Êdî ew jî ji boyê evan tiştêd tuhef dikevite tem'ê û qesda şelandin û kuştin û wendakirina Jubirî diketin. (38/10)*

c. Weko cewaba *hatina Şêxî Beg* digehe Adile Xanimê ... (9/13)

Di van hevokan de lêkerên ku weke navdêr hatine bikaranîn li jêrê em ê wek hevoka xwerû û peywendiyê binivîsin da ku mijar baştir bê fahmkirin. Lewra angaşt ew e ku hevoka peywendiyê li gorî dem û kesan dibê hevokeke resen û lêkera wê jî tê navdêrandin (nomînalîzekirin).

(178)

- a. Welî Paşa *hûrî kirine*.
- b. Jûbirî *wenda kirine, şelandine û kuştine*.
- c. Şêxî Beg *hatiye*.

Ev ristana ku bi hevoka bingehîn ve wek hevoka peywendiyê bê nivîsîn bi vî şiklî ye:

(179)

- a. Îcarê Behram ji boyê wan dibêje ku (wî) *Welî Paşa hûrî kiriye*.
- b. Êdî ew jî ji boyê evan tiştêd tuhef dikevite qesd û tem'e ku *Jubirî dişêlîne, wenda dike, dikuje*.
- c. Weko cewab digehe Adile Xanimê ku *Şêxî Beg hatiye*.

ENCAM

- 1- Bazîdî, ji bo qertafa veqetandekê ya pirjimar “êd” bikar aniye. Veqetandekên din her wekî di berhemên klasîk de tên dîtin ji bo nêr *ê*; ji bo mê *a* ye. Xala balkêş ew e ku veqetandeka mê di rewşa nebinavkirinê de jî her wekî xwe dimîne, lê em di berhema Bazîdî de carinan li rastî derveyî vê qaîdeyê jî tên. Di qertafa tewangê ya pirjimariyê de ne pir zêde be jî di hin cihan de berî *anê ek* hatiye bikaranîn ku niha di kurmançî de mînakên wê tune ne.
- 2- Raveka jimarnavan ne tê de di hemû cureyên ravekan û koma peyvan de wek hêmanên hevokê mînak hatine dîtin. Bikaranîna wan û peyvrêziya hevokan wek rêje pir nêzî hev in.
- 3- Hin hevok kêr hêman in. Di van hevokan de lêkerên alîkar, pêveber an kirde nayên nivîsîn. Ji ber ku ev cure zêdetir di axaftinan de tên bikaranîn û ev berhem jî berhemeke folklorîk e gelek mînakên bi vî awayî di xwe de dihewîne.
- 4- Her du paşdaçek bi vî awayî ne: *-da, -ra*. Lê tenê ya sêyem wek *-vêyê* hatiye bikaranîn û her *-vê* ye. Bi vî awayî ji berhemên klasîk vediqete. Bazindaçek carinan destebêjeyan û carinan jî hevokên alîkarî girtine nav xwe û gelek caran ji lêkerên biwêjî jî em van mînakan dibînin. Berhema bi van mînakan têr û tije ye. Lê bazindaçek tu carî hevoka bi lêkereke kêşayî honandî di xwe nehewandine.
- 5- Gihaneka *ûyê* pir hatiye bikaranîn. Jixwe ev taybetmendiyeke berhemên klasîkan e ku di dewsa bêhnokan de jî tê bikaranîn. Gelek hevok çî yên serbixwe çî yên pevgirêdayî bi vê gihanekê li pey hev hatine ristîn. Ji ber vê yekê gelek caran kirdeyên û pêveberên an jî hêmanên din ên hevpar derdiketin holê. Ev rê lê vedikir ku ji aliyê şiklî ve hevok bişibihin hev.
- 6- Kirde li hin ciyan wek frazekê an hêmana derveyî hevokê dihatin ravekirin. Hevokên bi vî rengî di hevokên destpêka çîrokan de zêdetir bûn.
- 7- Cînavka ku piştî pêveberê tê wek cînavka qertafî di hin hevokan de bi pêveberê ve dibe yek (*gotê, dibêjê*).
- 8- Di berhemê de bi erebî, soranî hin formen vegotinê hatin tespîtkirin. Digel wê hin ravek hebûn ku peyv bi tirkî lê form bi kurdî bûn.
- 9- Di lêkerên gerguhêz de hevok li gor dema borî kêşayî be kartêkeriya bireserê li ser pêveberê heye. Bazîdî di berhema xwe de carinan li gorî vê qaîdeyê nemeşiyaye. (*ewan jî ez dîtî*), (*siwaran ew Mela Mihemed dîtin*)

- 10-** Di hevokên fermanî yên neyînî de qertafa *–me* hatiye bikaranîn (*mebe, meyê*). Di lêkerên hevedudanî û pêşdaçekî de jî wekhevîyek nehat tespîtkirin. Mînak: *biderkeve, helgire*.
- 11-** Di berhemê de xala baneşanê nehatiye dayîn. Ji ber vê yekê mînakên me li gor wateyê xala baneşanê digrin. Lewra me gelek mînakan li gorî gazî û bangkirinê yanî li ser wateya hevokên baneşanê dane.
- 12-** Tu carî lêkereke kêşayî neketiye navbera lêkerên bidaçekî an hevedudanî.
- 13-** Gelek mînak hatine tespîtkirin bi hevokên peywendî yên ku bi navdêr an raveka navdêrî re modîfîyekirî.
- 14-** Cînavkên kesan/şexsan di berhemê de dişibihin devoka Behdînî lê cînavkên kesandinê hin cudahiyan di nav xwe de dihewînin.
- 15-** Di hevokên hevedudanî yên pevgirêdayî de yên ku li ser wateya erênî bi peywendiyê hevpar bi hev ve hatibin girêdan nehatin tespîtkirin.
- 16-** Hevokên berhemê gelek caran hevedudanî ne û zêdetir bi gihaneka “û”yê ve bi hev hatine girêdan.
- 17-** Hevokên kompleks hindik in. Ziman yê axaftinê ye ji ber vê yekê di hin hevokan de kirde û pêveber hev nagirin.
- 18-** Lêkerên hatine navdêrandin ku bi esl ew jî hevok ne di hevokên pevgirêdayî de bûne navdêrên ku bi hevokeke alîkar ve hatiye girêdan.
- 19-** Di gelek hevokên hevedudanî yên pevgirêdayî de cihê hevokên peywendiyê digel bikaranîna fonksiyona xwe guheriye.
- 20-** Mirov dikare bibêje ku Bazîdî li ser zayenda veqetandeka mê ne li ser standardekê ye. Ji xwe berhem di gelek cihan e bi rengê zimanê axaftinê xwe nîşan dide.
- 21-** Di hin hevokan de piştî pêveberê em li rastî cînavka qertafî tên. [dayê (39/15, nedanê (8/27)]
- 22-** Li hin ciyan kirde û pêveber wate qertafa kesandinê li hev nedikir.

ÇAVKANÎ

- Adak, A. (2015). *Destpêka Edebiyata Kurdî ya Klasîk*. İstanbul: Weşanxaneya Nûbihar.
- Alan, R. û E. Öpengin. (2014). *Tîr û Armanc, Gotarên Rexneyî li ser Edebiyata Kurdî ya Modern*. İstanbul: Weşanxanên Peywend.
- Avcı Z. (Amd.). (2010). *Cami'eya Rîsaleyan û Hikayetan, Bi Zimanê Kurmancî*, Diyarbakır: Weşanên Lîs.
- Aydoğan, M. (2012). *Rêbera Rastnivîsînê*. İstanbul: Weşanxaneya Rûpel.
- Badıllı, K. (1965). *Türkçe İzahlı Kürtçe Grameri (Kürmançça Lehçesi)*. Ankara: Ankara Basım ve Ciltevi.
- Bedirxan, C. A. (2013). *Elfabêya Kurdî & Bingehên Gramera Kurdmancî*. Stenbol: Weşanên Doz.
- Bedirxan, C. A. û R. Lescot (2012). *Kürtçe Gramer*. İstanbul: Weşanxaneya Avesta.
- Bedirxan, Celadet Ali (1941). “Bingehên Gramêra Kurdmancî” *Hawar*, Hejmar 34,
- Blau, J. – V. Barak, (1999). *Mannel de Kurde: Kurmanji*. Elî Belxkanlu (Çev.). Paris: Zanîngeha Sorbon.
- Bülbül, M. (2016). “Hevokên Peywendiyê û Peyvrêziya Wan (Devoka Mêrdînê)” *Bingöl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü Dergisi*, Cilt 2, Hejmar 4, 22-45.
- Ciwan, M. (1992). *Türkçe Açıklamalı Kürtçe Dilbilgisi*. Swêd: Jîna Nû.
- Çiçekdağı, C. (2016). “Kopula Üzerine” *Kaygı Uludağ Üniversitesi Fen-Edebiyat Fakültesi Felsefe Dergisi*, Sayı 26, Bahar, 131-141.
- Çiftci, H. (2013). *Uygulamalı Farsça Grameri*. Erzurum: Eser Ofset Basım Yayın Matbaacılık.
- Doğan, E. (2012). *Türkçe Cümle Bilgisi-I*. Eskişehir: Anadolu Üniversitesi.
- Dost J. (Amd.). (2012). *Adat û Rusûmetnameê Ekradiye*, İstanbul: Weşanxaneya Nûbihar.
- Ebdulfettah, D. (2006a). *Cînav di Zimanê Kurdî de (Kurmanciya Jorîn)*. Stenbol: Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Amedê.

- Ebdulfettah, D. (2006b). *Nav di Zimanê Kurdî de (Kurmanciya Jorîn)*. Hewlêr: Weşanxaneya Spîrêz.
- Ebdulfettah, D. (2011). *Kar di Zimanê Kurdî de (Kurmanciya Jorîn)*. Diyarbakır: Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Amedê.
- Ehmedê Xanî. (2013). *Mem û Zîn*. (Amd. Huseyn Şemrexî). İstanbul: Weşanên Nûbihar.
- Ergin, M. (2005). *Türk Dil Bilgisi*, İstanbul: Bayrak Yayınları.
- Ertekin, M. Z. û Z. Açar (2015). “Di Kurmancî de Cotepeyv û Cureyên Wan”. *Bingöl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü Dergisi*, Cilt 1, Hejmar 1, 82-62.
- Givón, T. (2001). *Syntax An Introduction, Volume 1*. Amsterdam/Philadelphia: John Benjamins Publishing Company.
- Narozî E. (Amd.). (2013). *Gerdeniya Gewherî Şerha Dîwana Melayê Cizîrî (Bi Alfabeya Erebî û Latînî)* Cilt III. İstanbul: Weşanên Avesta.
- Hawar (2012). İstanbul: (Amd. Weşanên Belkî).
- http://www.tdk.gov.tr/index.php?option=com_bts&view=bts&kategori1=veritbn&kelime=205314 (Erişim Tarihi: 24.01.2018)
- Kurd, R. (1956). *Rêzman a Ziman ê Kurmancî*. Çapxaneya Kerem.
- Kurdo, Q. (1981). *Zimanê Kurdî-Rêzman (Gramatîk)*. Frankfurt: Weşanên Komkar.
- Kurdo, Q. (2013). *Rêzimana Kurdî Kurmancî-Soranî*. İstanbul: Weşanxaneya Nûbihar.
- Özkan, M. (2013). *Türkçe Cümle Bilgisi-II*. Eskişehir: Anadolu Üniversitesi.
- Öztürk, M. (2017). “Aleksandre Jaba Ve Onun El Yazmaları Koleksiyonundaki Türkçe Eserler” *Uluslararası Sosyal Araştırmalar Dergisi*, Cilt 10, Sayı 49, 41-49.
- Pîrbal, F. (2000). *Mela Mehmûdê Bayezîdî (1799-1860) Yekemîn Çiroknûs û Pexşannûsî Kurd*, Hewlêr: Weşanxane Aras.
- Pîrbal, F. (2002). *Mêjûy Wergêran le Edebiyatî Kurdî da, (Le Konewe ta 1936)*, Hewlêr: Çapxaney Wezaretî Perwerde.
- Rizgar, B. “Bi û bê di kîjan rewşê de bi peyvê re yan cuda binivîsin” <https://sites.google.com/a/baranrizgar.co.cc/azadiya-kurdistan/home/pirs-u-mijaren-zimane-kurdi/bi-u-be> (Erişim Tarihi: 14.01.18)

- Sadinî, M. X. (2014) *Feqiyê Teyran (Jiyan, Berhem û Helbestên Wî)*. İstanbul: Weşanxaneyê Nûbihar.
- Tan, S. (2015). *Rêzimana Kurmancî*. İstanbul: Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê.
- Üneşi, A. (2016). *Tesrîfa Teremaxî (Metn û Lêkolîn)*. Teza Lîsansa Bilind ya Çapbûyî. Mardin: Zanîngeha Mardin Artuklu, Enstîtûya Zimanên Zindî yê li Tirkiyeyê.
- Xoşnaw, N. E. (2014). *Hevoksazî*. Hewlêr: Çapxaney Rojhelat.
- Xurşîd, X. E. (2013). *Rêzimana Fermî*. Silêmanî: Çapxaney Serdem.
- Yıldırım, K. (2012). *Temel Alıştırma ve Metinlerle Kürtçe Dilbilgisi (Kurmancî Lehçesi)*. Mardin: Mardin Artuklu Üniversitesi Türkiye'de Yaşayan Diller Enstitüsü Yayınları.
- Zaxoyî, Î. R. (2007). *Rêzman a Kurdî*, Dihok: Çapxana Spîrêz.

PÊVEK 1

Pênaseyên Rêzimanê yên vê Xebatê

Pênaseya Di Berhemê De	Varyantên Din ên bi Kurmancî	Îngilîzî	Tirkî
Alfabe	Elfûbê	Alphabet	Alfabe
Baneşan	Bangnîşan	Interjection	Ûnlem
Bazindaçek	Komdaçek	Prepositional Complexes	Edat Takımları
Bireser	Berkar / Tişte	Object	Nesne
Cînav	Cînavk / Pronav	Pronoun	Zamir
Daçek		Preposition	Edat
Dijwate	Dijmana	Antonymous	Karşıt Anamlı
Erênî	Belênî	Positive	Olumlu
Gihanek		Conjunctions	Bağlaç
Hevalnav	Rengdêr	Adjective	Sıfat
Hemwate	Hevmana	Synonymous	Eşanamlı
Hevedudanî		Compound	Bileşik
Hevok	Hevok	Sentence	Cümle
Hevoksazî	Ritesazî	Syntax	Sözdizimi
Hevoka Sereke	Hevoka Bingeh/Şariste/Şah komek	Main Clause	Temel Cümle
Hevoka Alîkar	Hevoka Pêrayî/Pariste	Subordinate Clause	Yan Cümle
Hevokên Hevedudanî		Compound Clause	Bileşik Cümle
Hevokên Serbixwe		Independent Clause	Bağımsız Cümle
Hêmanên Hevokê		The Elements of the Sentence	Cümlenin Öğeleri
Hoker	Hevalkar	Adverb	Zarf
Kirde	Biker	Subject	Özne
Komepeyv	Destebêje	Kelime gruplari	Phrase/Word orders
Kîte	Hece	Syllable	Hece
Kopula	Lêkera Bûn	Copula	Yardımcı Fiil
Navdêr	Nav	Noun	İsim
Neyînî		Negative	Olumsuz
Lêker		Verb	Fiil
Lêkerên Alîkar		Auxiliary Verbs	Yardımcı Fiiller
Lêkera Gerguhêz	Lêkera Têper	Transitive Verb	Geçişli Fiil
Lêkera Negerguhêz	Lêkera Têneper	Intransitive Verb	Geçişsiz Fiil
Nêr		Masculine	Eriş
Mê		Feminine	Dişil
Paşgir	Pêşpêvek	Suffix	Son Ek
Paşdaçek		Postposition	Art Edat
Peyv	Bêje	Word	Kelime
Pêşgir	Paşpêvek	Prefix	Ön Ek
Pêşdaçek		Preposition	Ön Edat
Pêveber		Predicate	Yüklem
Pirjimar		Plural	Çoğul
Qertaf	Pêvek	Additional	Ek
Raderî	Masdar	Infinitive	Mastar

Pênaseyên Rêzimanê yên vê Xebatê (Berdewam)			
Rayek	Kok	Verb Root	Fiil K�k
Ravek		Subordinative	Tamlama
Raveber		Genitival	Tamlanan
Reveker		Determined	Tamlayan
Rewa Binavkir�	Rewa Diyarkir�	Definite State	Belirlilik Durumu
Rewa Nebinavkir�	Rewa Nedyarkir�	Indefinite State	Belirsizlik Durumu
R�ziman	Gramer / Serf�nehv	Gramer	Dil Bilgisi
Rastniv�s	�mla/Vek�t	Orthography	�mla
T�rker		Complement	T�mle�
T�rkera Y�kser	T�rkera Rasterast/Rastered	Direct Object	D�z T�mle�
T�rkera Ney�kser	T�rkera Nerasterast /Nerastered	Indirect Object	Dolaylı T�mle�
T�p	Herf / P�t	Letter	Harf
T�p�n Dengd�r	Herf�n Bideng	Vowel Letters	�nl� Harfler
T�p�n Dengdar	Herf�n B�deng	Consonants Letters	�ns�z Harfler
Xalbend�		Punctuation	Noktalama İşaretleri
Vegetandek		Article	Harf-i tarif, İzafe eki
Yekjimar		Singular	Tekil
Zayend		Gender	Cinsiyet

PÊVEK 2

Di vê pêvekê de ji latînzekirina Camî'eya Rîsaleyan û Hîkayetan ya ku ji terefê Ziya AVCI ve hatiye kirin sûd hatiye wergirtin. Vê berhema ku ew amade kiriye ji terefê weşanxaneya Avesta ve di sala 2010an de çap bûye. Her hevokê çîrokê bi reqemekê ve hatiye diyarkirin. Hejmara rûpela berhemê jî ji bo ku bi hêsanî bê dîtî di nav kevanekê de bi xeta reşkirî hatiye nivîsîn.

Hikayeta Yekê (r. 59)

(1) Neql dîkin ku carekî melayek û dû nefer mirofêd cahil û nexwendî, hersê bûyne oldaşêd yekûdu û bi rê da diçûn.

(2) Ew hersê mirof hatine devê çemekî û xwe şelandîn ku ji avê derbaz bibîn.

(3) Mela li pêşî bû û ew her du mirofêd cahil jî li duyê mela bûn.

(4) Weko evan daye avê, melayê dît ku çar pîstêd biçûk ronê bi ser avê ketye têtin.

(5) Mela li berayikê bû.

(6) Giha pîstkê ew pîst bi diranêd xwe girt û destê rastê dirêjkirî pîstekê dî girt û destê çepê jî dirêjkirî pîstê siyê girt.

(7) Êdî diran û herdu destêd melayî hatine girtin melayî ji boyê xwe birî.

(8) Hewalan hersê pîst girtin, mayî pîstek, ew pîst jî li wan herdu oldaşan girtin.

(9) Melayî sê pîst girtine, dîsanê bi wan qenaet nake, gazî hewalan dike ku welleh behra min di wî pîstî da jî heye.

(10) Lewranê qîsim xwendî û mela di nêv ekradan, bi tame'e û xesetî meşhur in.

(11) Sê pîst girtiye, hêj razî nîn e, teme'a pîstê dinê jî diket.

Hikayeta Duyê (r. 60)

(1) Di nêva ekradan lewce temsîl weha meşhur e ku guya neql dîkin, ku weqtê Pêxember eleyhisselam weko çûne mî'racê Hezret Cebraîl di gel bûyî û seyra 'ecayib û xerayibêd semewatan dikirîn.

(2) Pêxember eleyhisselam melekêkê mezin dît ku dehulkê zêde cisim di estû da ye û çomaxekê mezin di destî da ye, weha muntezer westa ye.

(3) Pêxember eleyhisselam ('eleyhî's-selam), pirsyar kirîn ku evîne çi ne û tu memurê çi şûlê yî?

(4) Ewî melekî cewab dayê ku ya Resulûllah ez mamur im ku eger mirofek ji tayfa xwendeyan ihsan û sedeqeyekê bikin, weyaxo te'am û zadekê bidene feqîrekê, ez dê çomaxekî li vê dehulê bidem ku ev ihsan û sedeqeya wî xwendeyeyî, me'lûmî melayikêd semawatan bibin.

(5) Îcarê Pêxember eleyhisselam, ji wî melekî sewal kirîn ku hindê ku tu hatî mamur kirîn te qet çend caran li vê dehulê daye?

(6) Melekê cewab daye ku hete niha ez muntezer im, lakin min qet li duhulê nedaye, paşê niha jî êdî Xwedê bizanê.

(7) Yanî xwendeyêd hemû milletan, ekserî kê m ihsan û kê m ikram dibin, lewranê ew dixwez in xelq ikram û ihsanê li wan bikin, lakin bixwe tişte kê nadine jaran.

Hikayeta Sêyê

(1) Hikayet dikin, melayek di Kurdistanê da hebû navê mela Bazîd.

(2) Ekserê we'z û şîret didaye ekradan û li mizgeftê nesîhet dikirin û di we'zê da digot:

(3) Ey cema'etê mislimin!

(4) Her çi kesê ji we du dest cil û libas heyin, yekê di riya Xwedê da bidene jaran û her çi kesê ji we du nan hebin, yekê di riya Xwedê bidene feqîran.”

(5) Meger jina mela Bazîd jî hatibûye guhdariyê.

(6) Bi eve şîretêd mêrê xwe Mela Bazîdî dibihistin, weko jin vegeriya û çûye mala xwe, du dest cilê Mela Bazîd hebûn, yek berşû bû, yek dişuştin û ê dinê ber dikirin.

(7) Jina Mela Bazîdî înan ew destê cilêd melayî ku berşû bûn, daye jaran û nîveka nanê hazir hey daye feqeran.

(8) Îcarê weko êvarê Mela Bazîd hatiye mala xwe, bi şev gote jina xwe ku cilêd dişon bûyne berşuwêd bêne da ez cilêd xwe veguhurim.

(9) Jinê gote (r. 61) melayî ku min îroke cilêd te yê zêde hemû li jaran belav kir û nîveka nanê malê hazir jî min daye feqîran.

(10) Îcarê Mela Bazîd sil bûyî, gote jina xwe te ji boyê çi cil û nan daye xelkê.

(11) Jinê gote melayî, îroke te li mizgeftê şîret dikirin û digot ku her çi kesê tişteki ji wî zêde heye lazim e di riya Xwedê bidene jaran.

(12) Evne ji me zêde bûn, min daye feqîran.

(13) Melayî weko ev xebera ji jinê seh kirî, xwe sil kir û got ku keçê min şîret li xelqê dikirin li nefsa xwe nedikirin.

(14) Min wisanê we'z kirin ku xelq cilêd xwe yê zêde û nanê bidene min, ne webû ku tu rabî cilêd berşûya min û nanê zarokan bideye xelqê.

(15) Mirada min dayna nasan bû, te îna ev şîreta ji boyê xelqê derheqê min îcra kiriye.

Hikayeta Çarê

(1) Mîrzoî Reş hebû, ji tayfeyêd Êzdiyêd Wanê bû.

(2) Lakin qewî diz û heramzade.

(3) Ewî bixwe neql dikir ku ez di gel yekê Salmasî navê Memed buyine bira û dost.

(4) Dayîm ez diçûme ji etrafan min dizî dikirin û heywan û mal bi şev tîna Salmasê mala destebirakê xwe Memed û du şev û sê şev li mala Memedî dimam.

(5) Îcarî Memedê ew mal û heywanêd dizî dibire Xoyê û Urumê wan deran difrûtin û bihayêd wan tanîn, behrekê dirafê didaye min û behreyek jî ji bo xwe hildigirtin.

(6) Weha bi vê terzê şeş heft salekan me destebirayî digel yekûdu kirîn û qewî dost û aşna buyîn.

(7) Paşî carekê ez çûme kenarê Tebrîzê.

(8) Bi şev nêzokê bajêrî ji qafileyê bi şuve mayî, haciyek ticar, li gel sê barê hêstiran qumaş ji karwanê hindekî dûr diçit.

(9) Min xwe li serê rê weko miriyan dirêj kir, weko hêstir nêzokê min buyîn, hêj şev û tarî bû, ji min veciniqîn û tucarê ku li ser barekî siwar bû ji hêstirê kete erdê.

(10) Êdî min aman û zeman nedayê, gihame ser ticarê û bala muhlet burhan (berhan, berehan, birhan) girtî serî jê kirî di cih da hişt, her sê hêstir di gel baran averê kirî.

(11) Hêdî min xwe avête nehalekî.

(12) Bi rojê di niwalê da xwe veşartî.

- (13) Weko bûye şev tarî, min hêstir digel baran nêzokê subeyê înaye derê mala dostê xwe Memed.
- (14) Ez çûme ser kulekê, min hêdî gazî Memedî kirî.
- (15) Mihemed hatiye derve, me baran ênaye xwarê û birine malê û (r. 62) hêstir kêşane tewleyê.
- (16) Weko Memedî ev hêstiran û barêd qumaşan dîtin qewî şa bûyî, izet û îkrama min kirin.
- (17) Bi rojê ez jî di xanîkê xilwet razam û hêsayî bûm.
- (18) Weko bûye şev Memedî gote min ku Mîrzo, îcarî tu here şûla xwe, lakin heta du heyvan pê êre da meyê, lewranê eve mal malike zaf e, heta ez difroşim, paş du mehan were êre behra xwe bibe.
- (19) Min got ku bilanê wisa bibe.
- (20) Ez çûme mala xwe.
- (21) Weko mudeyê du mehan tamam bûyî, ez dîsanê bi şev hatime berderî Memedî.
- (22) Min dît ewî ji boyê xwe xanîne nû û mezin bina kirine.
- (23) Min xwe bi xwe got ku welleh Memedî ji wan malê dizî gelek diraf peyda kirîne, eve xanemanê înşa kirîne, eve çend sal bû ku ez dihatim û diçûm, xaniyê wî herweha bû.
- (24) Xulase, ez çûme serbanê ber kulekê, min gazî kir ku Memed Memed were derî veke.
- (25) Êdî Memedî cewaba min nedayî, dest bi çêran kirî.
- (26) Tifîng di dest da hate berê derî û agirê min kirî, kiriye hewar ku diz hatine mala min.
- (27) Êdî ez revîm û cîran berhev bûyîn ku diz hatiye.
- (28) Ez jî revîm ji dûrve min xwe veşarî.
- (29) Paş bi rojê min ji dûr ve mirofek virê kir û Memed gazî nik xwe kirî.
- (30) Memed hate nik min, me hevûdu dît û min gote Memedî, eve çi bû ku bi şev bi serê min îna û te ji boyê çi weha kir.
- (31) Mihemedî cewab daye, ku paş te xweyê malê û hêstiran peyda bûye û zehmet daye min, (malêd) xwe hemû istandin û birin.

- (32) Êdî tiştekan di destê min da nemaye.
- (33) Paş niha dostiya min û te êdî nîne, bi bal min ve meyê.
- (34) Eger êdî carekî dinê tu bêy Salmasê, ez dê bibêjim eve diz e û te bideme girtin.
- (35) Her çend min lavahî Memedî kir ku însafê bike, ji hinde malê tiştekanî bide min.
- (36) Memedî çêrê min kirî, ez qewirandim, paşê min ji cîranêd wî bi xef pirsiyara halê Memedî kir.
- (37) Gotine min, welîh em nizanin, ji kê derê ye, Memed qewî xweyî mal û hal bûye û ji boyê xwe xaneman ji nû ve bîna kirîne û îşek ji bo xwe kiriye û niha qewî xweşhal bûye.
- (38) Meger Memedî ew mal û hêstir birîne Tiflîsê firûtine û zaf diraf înaye û hêle ev şûla di gel min kiriye ku li wî malî bi tenê bixwet û nedete min.
- (39) Êdî ez naçar buyî, bi şûve hatime mala xwe.
- (40) Lakin derdê Memedî maye di dilê min da.
- (41) Heta ku sefera Romê û Îranê qewimî û bûye dijminayî.
- (42) Îcarê min şevêkê çil siwarêd reş pev xistî, ez bûme beled û min înaye kenarê Salmasê.
- (43) Nîvê şevê dor (**r. 63**) avahî, em ji hespan peya buyîn û deh mirof li nik hespan mayî, min sî mirof înaye dora mala Memedî.
- (44) Ez bi mala wî beled bûm.
- (45) Ji kulekê peya bûm û min derî vekirî, em çuyîne nêva malê û min Memed û jin û zarok girtin.
- (46) Memed dibêje, eman Mîrzo, min kiriye tu meke, eman herçî ku mal heye bibe, min nekuje.
- (47) Min guhdarî nekirî, serê Memedî jê kirî û herçî mal û eşya hebûn talan kirî, înayî bi şûve hatine.
- (48) Min ji boyê heyfa Memedî ew mala û talan li wan siwaran parîve kirin, da heyfa min ji boyî Memedî nemîne.

Hikayeta Pêncê

- (1) Rîwayet dikin ku di weqtê Kor Yusif Paşa walîtiya Erziromê, ji mîrêd Xunusê qedîm Mihemed Beg hebû, ew bideranî û bi aile ve înaye nêva Erziromê.
- (2) Ji tayfa Lezkiyan ji Daxistanê, firarî Welî Paşa hebûye ew kirîne mîrê Xunusê û çûye sakin bûye.
- (3) Lakin dîsanê ji Mihemed Begê ditirsa ku Welî Paşa ezil biken û Mihemed Beg bite mîrê Xunusê.
- (4) Rojekê Welî Paşa dibêje mirofêd xwe, ku her çi kes ji we, bi xef biçite Erziromê û Mihemed Begê bi dizî bikuje û bêtin, ez dê hezar quruş û hespekî çê bideme.
- (5) Dîsanê ji Lezekiyan mirofekî xweyê cur'et navê Behram hebûye, ku bi dest û pê û qed û qamet.
- (6) Ewî Behramê der'ehde kiriye, ez dê biçim û Mihemed Begê bi xef bikujim û bêm.
- (7) Îcarê Behram tedarika xwe dîtî, hatiye nîva Erziromê û hespê xwe li xaneke girêdayî.
- (8) Bi xwe çûye û menzela Mihemed Begê dîtiye û cesesandiye û rojke û duyan li Erziromê mayî û riya malê Mihemed Begê û cihê razana wî û cihê çûna xwe ya nêva malê, evne qenc hûrî bûye.
- (9) Ew Mihemed Beg jî di qonaxekê mezin da sakin dibûye, ku yalê mêran cuda û heremxane cuda bûye.
- (10) Mihemed Beg bi xwe jî neh-deh xulam etba'i bûye û Mihemed Begê jî di heramê da jin û xuhikê bakîre hebûye.
- (11) Di heremê da êdî bi xeyr ji vane kes tunebûye.
- (12) Çekêd Mihemed Begê yêd herbî jî li diwanxaneyê da bi dar da bûne û odeya heremê çek û sîlah tune bûne û du ode hebûne di nêv yekûdu da.
- (13) Di oda hindur Mihemed Beg di gel xanima xwe radizên û li odeya bi derve xuha bakîre bi tenê radizê.
- (14) (r. 64) Êvarê Behram çek û sîlehêd xwe girê dide û tivinga xwe jî cor gule tijî, texmîna (?) cihê çûna malê kiriye.
- (15) Nîvê şevê tête serbanê ku belê deng û his tunine hemû razane.

- (16) Îcarê Behram tivinga xwe beraberê bejina xwe digre û xwe li kuleka 'eşxaneyê hêdî bi jêr da berdide û li ser piyan dikeve nêva 'eşxaneyê.
- (17) Lakin weko pêjina kêtik û deng têtin.
- (18) Meger xuha Mihemed Beg bi pêjinê hişyar dibe, dikeve şubhê.
- (19) Berê zen dike ku belko kêtik e guhdarî dike seha nefsa mirofan dike.
- (20) Ji xew radibe û têtê odeya Mihemed Begê û derê odeyê ji hindur da dadide û Mihemed Begê hişyar dike ku ehwal ev e, diz hat.
- (21) Behram jî rast têtê derê odeyê, tifing hazir di destê da.
- (22) Ger çi Mihemed Beg û jin radibin, lakin çek û silah alateke herbê li nik wan tune û Behram jî tifing di dest da li ber derê odeyê westaye.
- (23) Mihemed Beg dibêje çare nîn e, ez dê derê odeyê vekim bilanê diz bête hindur û kanê em çawan dikin.
- (24) Her çend jin û xuh lawahî dikin, eman derî veneke, te çek tunîne, paşî te telef dikin.
- (25) Mihemed Beg dibêje ku nabê, şermekî mezin e ez bi dizê bihesim û derî venekim.
- (26) Îcarê Mihemed Beg dibêje jin û xuha xwe, ku hûn ji dûr ve biwestin, ez derî vekim, kanê çewanê dibe.
- (27) Mihemed Beg derî ji nişkî ve vedike, lakin xwe bi derî ve dizeliqîne û dide pişta derî.
- (28) Weko Behram dibîne derî vebû, bila muhlet devê tivingê dide nîva derî û agir dike.
- (29) Gule vala diçe.
- (30) Behram îcarê dide qemeyê, ji derê odeyê têtê hindur.
- (31) Weko Behram têtê hindur û Mihemed Beg li pişta derî bûye, pişta Behram bi bal Mihemed Begê ve dikeve.
- (32) Êdî Mihemed Beg ji tirsê xwe, ji şûve bi herdu destan ji ser milêd Behram muhkem himêz dike û herdu destêd xwe li ser singê Behram kîlîd dike, ku êdî herdu destêd Behram ranabin û me'tel dibin.
- (33) Lakin qeme di dest dane, di nêva derê odeyê dibe cirenîxa Mihemed Begê û Behram.

- (34) Lakin di nêv derî dane, jin û xuha Mihemed Begê jî dixwazin ku hewarê bi der ve bibin.
- (35) Lakin rê tune, Behram qeme di dest dane, lakin zebt bûye naxebitê.
- (36) Cezweyê qemeyê pê êre da wê da dihejîne û caran serkêra qemeyê li rû û istûyê Mihemed Begê dikevin.
- (37) Lakin cezweyê xwîn dike.
- (38) Mihemed Beg hîs dike ku eve mirofa qewî zêde bi qiwet e û gurbiz e.
- (39) Eger ez berdim ew min dikuje, ji tirsan destêd xwe muhikem dike.
- (40) Mîqdarê pênc şeş deqîqan bi vê terzê keşmekeşa (r. 65) wan dibe.
- (41) Mihemed Beg difikire ku êdî ew mirofa begê kenarê diçit, Mihemed Begê di gel xwe ra radikişêne û dibe, Mihemed Beg taqeta zebta wî nîne û serê Behram jî kum jê çuyî tazî bûye.
- (42) Îcarê Behram xwe ji dest Mihemed Beg radikêşit, bi semtê derve herdu têne ber şimika derî û serê Behram nêzûkê berê şimikê tîj dibe.
- (43) Mihemed Beg qiwet dike, bi derb serê Behram ji pişt ve eniya wî li wê li berê derî didet û serê ji pêş ve zahf dişkê û xwîn bi ser û çavêd Behram da têtin.
- (44) Eger çi jin û xuha Mihemed Begê jî di odê da dikine hewar û gazî.
- (45) Lakin nîvê şevê boriye, kes hişyar nînin.
- (46) Mihemed Beg difikire ku xwînê ser û çavêd Behramî piçavid û ew jî êdî weko berê nemayî, sist buyî, qeme ji destan ket.
- (47) Êdî Mihemed Beg Behramê berdide û bi zûyî qemeyê hildigire qemekî li serê Behram dide û yekê dinê û yekê dinê, xulase êdî Behram mecala lipatê nebuyî, xwînê ji çav girtîne û birînêd serî jî zahf in û gelek xwîn jê çûye.
- (48) Êdî jin xeberê dibe ji boyê xulaman û ew jî tîn.
- (49) Lakin Mihemed Beg jî hal nemaye, ji çend cihekan bi duçikê qeme hindek birîndar bûye.
- (50) Îcarê ewî Behramê didine xeberdan ku tu çi kes î û tu diz î û çi yî rast bibêje.

(51) Îcarê Behram ehwalê xwe û hatinê û hûrîkirina Welî Paşa ji boyê wan dibêje.

(52) Êdî xulam emanê nadine wî, Behram li ber xençeran tamam dikin û leşê wî bidertênine ber derî û subeyê ev ehvale me'lûmê xelqê dêy û leşê Behram diben defn dikin.

(53) Eve neqla ê bi şûve mayî bûye dastan.

Hikayeta Şeşê

(1) Di weqtê hukumeta Îbrahîm Paşa, li Bazîdê ji axayêd wî derî mirofekê dewlet duşkunî hebû.

(2) Pîr û heftê salî bêhal.

(3) Navê Delî Îsmâil Axa digotin.

(4) Her carinan diçe nik Îbrahîm Paşa û ehwalê xwe îfade dike, Paşa zahf û hindik tiştêkî didete wî.

(5) Rojekê dîsan Îsmâil axa diçite nik Îbrahîm Paşa û xercîkê dixwaze.

(6) Paşa dibêje wî ku îroke pare hazir nînin, guh nade Îsmâil axayê.

(7) Ew jî ji vê xeberê sil dibe û tête mala xwe.

(8) Kitek tepançe hebûye tijî dike û hindekî barut û gule datîne kurka xwe û xençera xwe di ber piştê xwe ra dike.

(9) Meger merama wî kuştina Îbrahîm Paşa bûye ku çiranê îcarê xerc nedaye min.

(10) (r. 66) Ewî Îsmâil Axayî jinekê pîr û kurekî deh-diwanzde salî hebû.

(11) Îsmâil Axa tedarika durust dike, îcarê dibêje jina xwe ku, rabe kurê xwe bibe û here mala Şêx Îbrahîm.

(12) Îcarê jinê gotiye ku ji boyê çî em biçine mala Şêx Îsmâil?

(13) Dibêje ew ocax e, hûn biçine wê derê, îroke şûleke min heye, belko durust bibe.

(14) Jin û kur diçine mala Şêxî.

(15) Wê rojê jî roja îne bûye ku Paşa û xelq hemû ji boyê nimêja îne tene mizgeftê.

(16) Weqtê selayê Îsmâil Axa tepançeyê di bin biniş (?) dikete ber piştê xwe û xençerê jî dikete ber piştê xwe û diçite mizgeftê û li ser riya Îbrahîm Paşa nêzokê rûtine.

- (17) Paşa û xelq jî têne mizgeftê û nimêja îne dikin û xelas dibin.
- (18) Xelq bir bir biderdikevin.
- (19) Îsmaîl axa bidernakeve.
- (20) Weko Paşa têtin ku ji nik Îsmaîl Axa biborit û biderkevit, Îsmaîl axa tepançeyê didete teniştê Îbrahîm Paşayê û agir diketin.
- (21) Gule li şala piştê Paşayê dikevit û dibore, li ser parsûyan li rûyê çermê diçe û derbaz dibe.
- (22) Di gel Paşayê çil pênceh xulaman hebûn.
- (23) Îcarê Îsmaîl Axa difikire ku Paşa bi guleyê neket, dide xençerê kurh vedike Îbrahîm Paşa ku bi xençerê bikuje.
- (24) Ew xulam xwe davên nêva Paşayê û Îsmaîl Axa, yekê-duyan ji wan jî birîndar dike û ewan çil-pênceh xulam di nêva mizgeftê da peran peran dike.
- (25) Çunko ew Îsmaîl pîr û heftê sal bû.
- (26) Îcarê pê li secadeyekê diale û dikeve.
- (27) Îcarê xulam gehane ser wî, êdî mecala rabûnê nedanê, ew dayne ber xençeran, di nîva mizgeftê da kuştin, bi der ve deranîn.
- (28) Leşê wî bi agirê sotin û Îbrahîm Paşa jî birîndar bûyî.
- (29) Mîqdarê du mehan mu'alice kirin sax bûyî.
- (30) Ew jin û kurê wî jî ji bajêrê surgun kirin û du-sê pismamêd wî hebûn, bi xeyr heq girtin û kuştin û mal û xaniyêd wan xirab kirin.
- (31) Tayîfeyêd ekrad wehe bê aqil in, dumahiya şûlê mulahaze nakin, her çi bête eqlê wan îlla dikin.
- (32) Mêr bin û jin û zarok û xema wan da nînin.

Hikayeta Heftê (r. 67)

- (1) Qedîm di nêva tayfeyêd êzdiyêd Kurdistanê û qismê mela û feqehan dijminahî hebû.
- (2) Carekê Mela Mihemedê Qulpî, xurcekî biçûk kitêban li milan û şîr û mertal li piştê, bi tenê tê ku bête Bazîdê ji boyê xwendinê.

- (3) Tête deşta Abeqeyê (Ebexeyê) kenarê gireyê.
- (4) Meger heşt siwarêd êzdiyan rêbir, ji bo xerabiyê di nêva girêy da depan.
- (5) Weko siwaran ew Mela Mihemed dîtin hatine riya wî, xweşgerî girtin û şelandin û birne nêva gireyê ku bikujin.
- (6) Xulase Mela Mihemed birin û di girey da dest û pê gire dan.
- (7) Paşî pîrekê êzdiyan didete şîrê û tête ser Mela Mihemed.
- (8) Dibêje wî ku were ji dînê Mihemediyan biderkeve û bibe êzidî yan ne ez dê te bikujim.
- (9) Mela Mihemed dibêje, estexfirullah eve şûla nabê, min dikujî bikuje emrê xwedê ye.
- (10) Ez bi kuştinê razî me.
- (11) Îcarê pîrê êzidî dibêje Mela Mihemed, eger dînê te heq e û rast e, bilanê Mihemedê we bêtin û te ji kuştinê xelas biketin.
- (12) Mela Mihemed dibêje, Mihemedê min nizanî ku ez di vê halê me.
- (13) Îcarê pîrê êzidî dibêje, ji bo te destûre gazî Mihemedê xwe bike, bilanê bêt û te ji destê me biderîne û xelas bike.
- (14) Xulase ew pîrê êzidî guya lewce û îstîhza zorê li Mela Mihemedê diketin.
- (15) Elbet dê tu sê caran bi deng gazî Mihemedê xwe bikî, paş ez dê te bikujim.
- (16) Îcarê sê caran ew mela bi deng ji tirsî gazî dike ku ya Mihemed, ya Mihemed, ya Mihemed.
- (17) Meger bi qezaen Mihemed navê mirofekê Heyderî di gel deh siwaran li wan nêzokan bi riya xwe da diçûn.
- (18) Ewan siwaran dengê gaziye bihist, bi kenarê gireyê rikêb dikin û rast tene wî heşarî ku heşt siwarêd êzidî di wê kurî da peya bûne, mirofek girê dane.
- (19) Êzidî jî pê dihesin, belê çend siwar.
- (20) Evne ji nişkê ve peyda bûn, dest bi revê dikin.
- (21) Ew siwarêd Heyderan digihin çar nefer êzdiyan di cih da dikujin û çar jî direvin xelas dikin û dest piyê Mela Mihemedê vedikin û pirsiyar dikin ku eve çi ehwal e.

(22) Îcarê Mela Mihemed macerayê weko bûyi ji boyê wan siwaran neql diket.

(23) Paşî ew siwar hespekî jî ji hespêd ihtirame didine mela û birê dikin tête Bazîdê.

(24) Ev hikayete di nêva xelqê da me'lûm bû.

Hikayeta Heştê (r. 68)

(1) Nêzokê Kela Xoşabê du gundêd Mexînan heyn, navê yekê Qesr û navê yekê Pagan.

(2) Di gundê Paganê da qîzeke qewî zêde rind bi navê Barnik hebûye

(3) Dîsanê di wî gundê Paganê kurekî Mexînî cîranê Barnik hebûye.

(4) Lakin ew kur feqîrhal bûye, navê Polo.

(5) Ewî û Barnik hez ji yekûdu dikirin û hevûdu hebandine.

(6) Her çend Polo verê dike nik babê keçê û Barnikê ji boyê xwe dixwaze, babê keçê nadet, ku Polo rûs e, ez keça xwe nadime wî.

(7) Mudeyekê bi vî halî borî.

(8) Ji gundê Qesrê kurekî xweyî mal û hal hebûye navê Şemas.

(9) Ew kur mirofan virê dike û Barnikê ji boyê xwe dixweze û babê Barnikê jî keçê dide Şemas û şêrîne vedixwin û nîşan dikin.

(10) Îcarê Polo dikeve qesda kuştina Şemas.

(11) Îcarê Polo dayîm dicesisîne ku li cihekî rastî Şemas bêtin û bikujitin, lakin dilê keçê Barnik jî, dil di Polo da ye.

(12) Rojekê Polo pirsiyar dike ku Şemas ji boyê şûlekê çûye hêşetê.

(13) Îca Polo tête ser riya Şemas û disekine, dibîne ku Şemas bi siwarî ji wê da têtin.

(14) Lakin ew siwar e û Polo peya ye.

(15) Îcarê Polo gazî dike ku kuro Şemas tu kî yî ku berdilka min Barnikê bixwezî.

(16) Karbarê xwe bike yan ez dê li rûyê dinê xweş bibim, ya dê tu xweş bimînî.

(17) Diçe berayika Şemas, dibêje ku çi bikem heyf ku tu siwar û ez peya me, em dê îroke li êre kifşiya yekûdu biken, kanê Barnik digehîte kî.

(18) Weko Şemas xebera Polo dibihê, ew jî xwe ji hespê da davê xwarê û herdu didine xençeran û bala yekûdu dikin û pêsirê hevûdu digirin û yekûdu didine ber xençeran.

(19) Herdu bêhal dikevin û tamam dibin.

(20) Îcarê cewab diçite herdu gundan jî ku ehwal weha bûye.

(21) Ji herdu kenaran hatin û laşêd wan birin û hilgirtin.

(22) Weko cewab giha keçê, êdî ew jî dibêje ku paş Polo min jîn navê, xençerê tazî dike û bi ser dikeve, xwe dikuje.

(23) Îcarê laşê Barnikê jî birin li nik qebira Poloyê çal kirin.

(24) Her sê jî bê mirad çûyîn.

Hikayeta Nehê (r. 69)

(1) Ji Begzadeyêd Hekariyan, Şêxî Beg hebû.

(2) Mamê Xan Mehmud mîrê qeza Miksê bû.

(3) Lakin zêde jêhatî û camêr û xweyî reşt û reşadet, di wî weqtî da, nav û deng hebûye, hemû kesê jê ditirsan û hindekan dexesî dikirin û ew bi xwe jî li Miksê mîr bû.

(4) Mîrê Hekariyan Îbrahîm Xan Begê, ji vî kiriye dexesî û lê dixebitî ku belko bidest bêne û bikuje, mumkîn nedibû.

(5) Xuhekê Îbrahîm Xan Begê mîrê Hekariyan hebû, jina Mîr Şerîfê mîrê qeza Şaxê bû û ew fewt bûyibû.

(6) Xuha Îbrahîm Xan Begê, Adîle Xanimê digotin, li şûna mîrê xwe mîr Şerîf, di Kela Şaxê da hakim bû.

(7) Ewê Adile Xanimê zaf mal û diraf û mucewher hebûn.

(8) Îcarê ji nepenî ve Îbrahîm Xan Begê, virê kiriye nik xuha xwe Adile Xanimê ku tu dikarî bi terzekî Şêxî Begê bînî Kela Şaxê nik xwe û bideyi kuştin.

(9) Tu jin î ew fikira kuştinê ji te naketin.

(10) Îcarê Adile Xanimê mirofekî ji ehlê heremê virê dike nik Şêxî Begê ku bilanê bête Kela Şaxê.

(11) Ez û ew yekûdu bibînin û xeber bidin, merama min heye ku ez Şêxî Begê mar bikim û hinde mal û tecemal min heye û min ewlad nînin, eve kela û eve mal emlak, bilanê bigehite Şêxî Begê.

(12) Weko ev xebere ji boyê Şêxî Begê diçit, ew jî vê xeberê rast hesêb dike û her wisa ciwanî û temeha xanim û malê didete serî, cewabê virê dike ku belê ez dê di gel sed û dused mirofan filan rojê bême kelê, bilanê xanim di tedarikê da be.

(13) Weko cewaba hatina Şêxî Beg digehe Adile Xanimê, ew jî dibêje mirofêd xwe bilanê Şêxî Beg di gel deh etba'êd xwe yê muqerreb li serê kelê bibine mêwan û mirofêd mayî li jêrê hêşetê bidene xelqê mêwan.

(14) Adile Xanim virê dike ji Mexînan deh mirofêd gurbiz û bi quwet xweyê tîfing û xençer, wê roja ku dibê Şêxî Beg bêtin, ewan mexînan guya ji boyê xizmet tênite kelê.

(15) Îcarê weko Şêxî Beg têtin diçite serê kelê peya dibit, herem kehyasî dibêje Şêxî Begê ku, mîr im Xanim dua dike û dibêje ku mîr di gel deh axalera bibine mêwanê kelê û mirofêd mayî jî bibine mêwanê hêşetê.

(16) Şêxî Beg jî dibêje bilanê wisa bibe.

(17) Ewan sed û dused mirofan li hêşetê belav dikin û mîr digel deh axalera li yalê mêran li serê kelê li dîwanxaneyê dibine mêwan.

(18) Şerbet û qawe û bulxor û (r. 70) gulab ji boyê Şêxî Beg tînin, ku xanim silaf dike, ser seran û ser çavan hatiye.

(19) Bilanê rahet bibe, paş bi şev ez ê mîr dixwezme heremê, bila bînin em di gel yekûdu xeber dideyn.

(20) Îcarê xanim tîne ewan deh mexînan tîne û dibêje, ku ez dê Şêxî Begê bikujim û daynime odeyekê heremê, kengî gazî we dikim hûn biçine odeya wî Şêxî Begê, bidene ber xençeran û bikujin.

(21) Îcarê êvarê te'am û zad ji boyê Şêxî Begê virê dikin û îkram û î'zazê dikin.

(22) Weko sê seet ji şevê dibore, navmal têtin fanos di destê da, dibêje Şêxî Begê ku xanim te dixwaze heremê ku digel te xeber det.

(23) Îcarê mirofêd Şêxî Begê ku di gel bûne, li dîwanxaneyê dimînin, lewranê heremxane ye kes biyanî naçitin.

- (24) Şêxî Beg jî bawer kiriye ku Adile Xanim dê wî şo biketin, radibe diçite heremxaneyê odayê.
- (25) Weko Şêxî Beg diçe odayê dirûnit, dibîne ku xanim li wê derê nîne.
- (26) Pirsiyar dike ku xanim kanê?
- (27) Dibêje Şêxî Begê ku xanim dê niha bêtin.
- (28) Îcarê xanim emrê wan deh nefer mexînan diketin, pêkve dest bi xençer diçine odayê û bala Şêxî Begê dikin.
- (29) Di gel Şêxî Begê tenê xençer hebû, êdî çek û sîlah tunebûn.
- (30) Edî eger çî, Şêxî Beg didete xençerê, lakin bê fayde, mirofek di gel deh mirofan dê çî biketin?
- (31) Şêxî Beg dû sê mirofan ji wan birîndar diketin û ew mirof ewî didine ber xençeran, tamam dikin.
- (32) Îcarê xanim emrê wan mirofan diketin, diçine dîwanxaneyê û axayêd mirofêd Şêxî Begê digirin û dişelînin û hepis dikin.
- (33) Cewabê virê dikine xelqê hêşetê ku min Şêxî Beg da kuştin, bilanê her kesek mêwanêd xwe bigirin û bişelînin û berdin.
- (34) Îcarê xelqê hêşetê her kesek mêwanêd xwe weha bê de'wa û şer girtin û şelandin û berdayin.
- (35) Subehê, Îcarê leşê Şêxî Begê ji bedena kelê avêtine xwarê û birin defn kirin û ew deh axayêd mehbus kirî jî virê kirin ji boyê mîrê Hekariyan birayê xwe Îbrahîm Begê.
- (36) Weko ev xebera kuştina Şêxî Begê gihaye Miksê mala wî, kurêd mamê wî Xan Mahmud û Xan Ebdal û Xan Ehmed, êdî ewane jî kirîne şîn û matem, êdî çî çare.
- (37) Lakin daîm ketne qesda Adile Xanimê û ewan mexînan.
- (38) Mudet di nêv da borî, kurê Şêxî Begê hebû Mu'tellah Beg, lakin qewî zêde cesûr û reşîd bûyî.
- (39) Duwanzde salî bûyî cihê babê xwe mîrîtiya Miksê zebt kirî û ev de'wa jî kevin bûyî.
- (40) Paş çar salan bi xef tedarik kirî kurê Şêxî Beg Mu'tellah Beg, sêsed (r. 71) mirofêd bijare bi şeşxane hilgirtî û çend terece digel xwe birin.

(41)Nivê şevê danîne ber bedena kelê û çuyîne nêva Kela Şaxê û Adile Xanim girtin û mirofêd wê girtin û hêşetê jî zebt kirin.

(42)Paşî ew mexînî û çendek ji Şaxiyan kuştin û mal û eşya û herçi ku Adile Xanimê hebûn hemû zebt kirin.

(43)Lakin Adile Xanim nekuştin, ji kelê bideranîn û şandine nik birayê wê Hekariyan û zayîata mirofêd xwe ji xelqê hêşetê istandin û mudeyekî jî qeza Şaxê zebt kirî, teserif kirin.

(44)Paş hindek mudeyî Mu'tellah Beg ecelê eman nedayê, bi emrê xwedê fewt bûyî.

(45)Îcarê axayêd Hertuşiyân Kela Şaxê ji mirofêd miksiyan dizîn û ew bideranîn.

Hikayeta Dehê

(1) Ji gundêd Eleşkirê, gundekî re'yan heye navê wî gundî Leşko ye.

(2) Ji wî gundî tixayek filan qewî zîrek û xweyî şeca'et peyda bûyî.

(3) Diçe Istanbulê mudeyekê êre wê da xizmet diket, qewî jêhatî.

(4) Axirê misilman dibe, navê Xelîl Beg danitin.

(5) Roj bi rojê ew Xelîl Beg pêş ve çuyî, li nik erkandewletan meqbûl bûyî.

(6) Dixwezin ku ewî Xelîl Begê bikene hakimê cihekî.

(7) Îcarê ew Xelîl Beg bi xwe, çunkê eslê ji Eleşkirê ye, îstîd'a diket ku mîrîtiya Eleşkirê bidene min.

(8) Îcarê ji dewletê mîrîtiya Eleşkirê bi ferman didine Xelîl Beg.

(9) Ew jî di gel çend etba'ekan têtin û rast diçite Bazîdê nik Mehmûd Paşayê kal û fermanê nîşê didetin, ew jî se'na û ete'na dibêje, mîrîtiya Eleşkirê didete Xelîl Begê kurê Leşko.

(10) Ew jî diçite Eleşkirê dibite mîr û qewî birebt û zebt hukumet dike û xweyê nav û nîşan dibît, xweyî îhsan û kerem.

(11) Lakin axayêd Bazîdê ewî pesend nakin û dibêjin ku ew kî ye, kurê feleyekî ye, şûla dewletê wiha ye, mîrîtiya qezayekê didete kurê Leşko.

- (12) Ji wicûhêd Bazîdê axayekî qewî xweyî î'tibar hebûye Hesên Begê Mankî, xweyî etba'î û xulam û qonax.
- (13) Rojekê ew Hesên Beg di dîwana xwe da dibêje ku fereza dewletê kurê Leşko kiriye mîr, kengê dibitin ku ez destê wî ramûsim û mezinayiya wî qebûl bikim?
- (14) Îcarê Xelîl Beg vê xeberê seh dike ku ji e'yanêd Bazîdê Hesên Beg Mankî wiha gotiye weqtekî.
- (15) Îcarê Xelîl Beg peşkeş ji boyê Mehmûd Paşa (r. 72) tîne û têtê Bazîdê û li Hesên Beg li qesdî dibite mewan û çend rojekan sakin dibe, rojekê Hesên Beg min hespekî kehêl qewî sipehî bi sê hezar quruş istandiye, bilanê taxum biken û bînin tu lê siwar bibe, kanê begen dikî?
- (16) Îcarê Xelîl Beg emrê xulaman ku filan hespê taxum û zîn biken bilanê Hesên Beg li hespê siwar bibitin kanê begen dike?
- (17) Îcarê hespê zîn û taxum dikin, Hesên Beg lê siwar dibe û hindeki digerîne û tê peya dibitin.
- (18) Xelîl Begê jî pirsiyar dike ku Hesên Beg te hesp begen kir?
- (19) Hesên Beg dibêje ku belê maşaallah qusûr tune, mibarek bi.
- (20) Îcarê Xelîl Beg dibêje ku min ew hesp bexşî te, bilanê wisanê bi taxum bidene mirofêd Hesên Begê bikişîne tewla wî.
- (21) Hesên Beg temenna dike û diçite eteka Xelîl Begê.
- (22) Du sê seet dibore, Îcarê Xelîl Beg emrê xezînedarê xwe dike filan kurkê min ê simor biderîne û bîne, bilanê Hesên Beg lê mêrzeke (mêzeke) kanê begen dike?
- (23) Îcarê xezînedar kurkê simorê tîne û Xelîl Beg dibêje ku Hesên Beg min vê kurka bi pênc hezarî kiriye, lê mêrzeke ku dihêjtin.
- (24) Hesên Beg dinêre û dibêje ku mibarek e, êdî qet soz tunine.
- (25) Îcarê Xelîl Beg dibêje ku wergire kanê çewan e?
- (26) Hesên Beg simorê werdigire, paşî Xelîl Beg dibêje ku êdî biderneyne, min ew kurk bexş te, li bejna ye.
- (27) Hesên Beg dîsanê temenna dike û eteka Xelîl Begê radimûse

(28) Du sê saet dîsanê dibore, îcarê Xelîl Beg saeta xwe ji ber piştâ bidertîne û lê mêzer diket û dibêje Hesên Begê ku were li vê saetê mêzer bike, kanê begên dikî?

(29) Hesên Beg li saetê difikire û dibêje ku mibarekê, qewî saetê qenc e û corci ye û nû ye.

(30) Xelîl Beg dîsan dibêje ku Hesên Beg min ew saet bexşî te, bilanê ji me yadigarek bê.

(31) Dîsanê Hesên Beg temennayî dike û diçe eteka Xelîl Begê.

(32) Îcarê Xelîl Beg dibêje ku Hesên Beg eqteda naket ez kurê Leşko me di rojekê da sê caran eteka min ramûsan ji boyê te şerm e.

(33) Îcarê Hesên Beg dibêje ku belê welleh min weko tebolê (?) min nemaqûlî kiriye, eger çi tu kurê Leşko yî, lakin wucuda te heye, hemin mezinayî bi esl û neseb nabin, belko wucud û himmet zatê ji kenarê Xwedê ye bilanê ferew maye (?) bi te jî.

Hikayeta Yanzdehan (r. 73)

(1) Careke ji caran rehmet li bab û dayêd guhdaran, wiha neqil û beyan dikin.

(2) Di zemanê mazî da paşayêd Bazîdêd bêmal û perişan el-ehwal bûne, herçi îrad gund û medaxil hebûye, di dest e'yan û axayêd cihê da bûne.

(3) Lakin ew axa û e'yan xweyî etba'i û xulam û daim ji boyê herb derbê hazir bûne.

(4) Lakin mala paşayêd wan rojê xwarin û vexwarin bi dûr ji mala axa begê dibirin û jinêd 'eyan û axan xweyî zîb û zînet û elbasêd faxire di ber.

(5) Lakin xanima paşayêd wan bêzib û zînet libasêd mun di ber da bûyin.

(6) Rojekê 'eyd ew jinêd axa û e'yanan diçine 'eyda xanimê û destêd xanimê ramûsin, xanim ji libasêd xwe ji xatunêd axa û e'yan qewî şermî dibin û bêkêf bûyî, mirûzê diketin.

(7) Weko êvarê paşa tête heramserayê dibîne ku xanim bi mirûz e.

(8) Pirs diketin ku te çi ye, ji boyê çi bêkêf î?

(9) Îcarê xanim dibêje, çi bêkêf nebim, îroke 'eyd bûyî, jinêd axa û e'yan hemû bi zîz çak û xemil û libasêd faxire bûyin û ew bi wê libas û xemlê dihatine destê min, rastî min ji wan şerm dikir.

(10) Ez Xanim bim, libas û halê min eve bit.

- (11) Ev şûlekî nelayiq e.
- (12) Paşa dibêje xanimê ku mezinayî ji boyê te bes e, xeml ji boyê wan, mezinayî ji boyê te.
- (13) Hinde jinêd axa û etba'i û xulamêd te heyn, ev qedir ji boyê te fexr e, bes e û ev xulam û etba' me ji dijmin hefiz dikin.
- (14) Mezinayî bi re'yet û xulam û etba'an dibe, mezinayî bi diraf û çek û zêran nabê.
- (15) Paşê xanim evê xeberê qebûl nake ku îlla min jî çek û zêr û xemil divêtin.
- (16) Îcarê paşa dibêje ku lazim e gundêd çend axan jê bistînim û çend etba'an bider kim ku mewacibêd wan zêde bimîne û bideme te ku ji boyê te bibine zêr û libas û xeml.
- (17) Îcarê paşê çend rojekan, paşa bi xef tenbiye axa û e'yanan diketin ku ehwalê xanimê weha ye, hûn hemû îşev berê subehê siwar bibin û biderkevne dora hêşetê, deste deste bisekinin.
- (18) Îcarê ew axa û e'yan di gel siwarêd xwe miqdarê sê hezar siwaran siwar dibin û dibin şeş tîp û her yek nêzokê hêşetê disekinin û muntezerê emrê dibin.
- (19) Weko sube ron dibe, Xanim ji pencera eywanê nezer dike ku etrafêd Bazîdê siwaran damedorê girtine.
- (20) Filhal têtin û Paşayê ji xewê radiketin, ku çi razayî, dijminan dora kelê girtine.
- (21) Paşa dibêje xanimê (r. 74) ku zêr û libasêd faxirê biderîne û virêke pêşiya dijminan, bilanê ewan def'i biketin.
- (22) Îcarê xanim dibêje, dijmin bi wan def'i nabin, eman zêr û libas ji boyê min lazim nînin, tu vê belayê ji ser me def'i bike.
- (23) Îcarê paşa dibêje ku metirse, evne hemû xulam û leşkerêd min e ku jinêd wan te digot ku bi zêr û cil in, eger dixwezî ez wan biqewirînim û ewan maaşêd wan hemû bideme te, ji boyê xwe bike zêr û cil.
- (24) Paşî xanim dibêje, tobe min cil û zêr nevêtin, eger dixwezî evne cilêd min jî bibe bide xulam û leşkiran.
- (25) Bi rastî ku mezinayî bi xulam û leşkerê dibitin û ger ne zaf bazirgan jî heyn, ku gelek zêr û cil heyn, lakin çi fayde ew mezin nînin.

(26) Îcarê paşa tête derve û cewabê virêdike ji boyê siwaran ku bilanê belav bibin û her kes biçite malêd xwe.

(27) Êdî siwar cewab didin ku em belav nabin, em dê ji boyê xanimê biçine talanekê û ji boyê wê bînin, ji boyê xwe bidete bi zêr û cil.

(28) Îcarê ew siwarêd e'yan û axan Qeredaxê talanekê tînin, miqdarê sed hezar quruş ku bidene xanimê ji boyê xwe bidete bi cil û bikete zêr, xanim qebûl naketin, ku bilanê ji boyê leşkerê bitin, ez bê cil û zêr dibim, lakin mezinayî bê leşker nabitin.

Hikayeta Duwanzdeyê

(1) Neqil dikin ku di welatê Botan da qezayek heye, Namiran (Nemiran) dibêjin.

(2) Axayêd wan qedîm hebûne, du bira û her du jî bêkar bûne.

(3) Navê yê mezin Hesên Axayê Hesamiyan û navê yê biçûk Çeleng Axa bûye.

(4) Îcarê ewî Hesên Axayî virêkiriye keça axayê tayfa Mîran ji boyê xwe xwastiye û axayê Mîran keça xwe daye wî.

(5) Lakin di tedareka şîrînî boyê birayê Hesên Axa yê biçûk Çeleng Axa çûye mala axayê Mîran ku xeber bideyn û qalanê bibirîn.

(6) Meger çavê Çeleng Axa bi keçê dikeve, weko ewê keçê dibîne, bê îxtiyar ewê keça ku ji boyê birayê xwe Hesên Axa dixwestin dihebîne.

(7) Navê keçê jî Lalîxan bûye.

(8) Îcarê eger çî Çeleng Axa çûbûye ku Lalîxanê ji boyê birayê xwe yê mezin Hesên Axa bixwezitin û ewan jî erê gotine.

(9) Lakin weko Çeleng Axa Lalîxanê dibîne û bêîxtiyar lê aşiq dibe.

(10) Îcarê têtin hîleyekê (r. 75) diketin.

(11) Pîrejinekê dibîne û qederekî diraf ji boyê wê we'de diketin, ew pîrejî dibêje, ku te şûle pê nînin, ez dê we bikim, ku Hesên Axa bi xwe bi vê keçê razî nebitin û dest jê bikêşitin û keçê bide te.

(12) Îcarê ew pîrejîna mel'un tête nik Hesên Axayî û dibêje Hesên Axayî, ku mixabîna te ye, meger keç ji dinyayê xelas bûn ku tu Lalîxanê dixwezî.

(13) Hesên Axa dibêje ku ji boyê çî?

- (14) Îcarê ew pîrejina mel'une dest diketin ji cihê dirûda dibêje ku Lalîxan qewî zêde Kirêt e û çavêd wê jî şevkor in û ji wê zêde qewî bêhna pîs ji devê têtin.
- (15) Xulase her çî eyb heyn ji cihê derew da bi Lalîxanê nesib diketin.
- (16) Weko Hesên Axa evan xeberan dibihitin zêde melûl buyî, gazî birayê xwe Çeleng Axayî diketin û dibêje ku bira tu çûyî û te keçeka kirêt û kore ji boyê min xwestî ye, wellehî ez wê keçê nastînim û qebûl nakim.
- (17) Ez ji vê şûlê poşman im.
- (18) Paşî birayê wî Çeleng Axa dibêje ku bira, eger qenc û eger kirêt, me ev keçe ji boyê te xeberdan kiriye, tu jî mirofekî maqûl î.
- (19) Babê keçê jî axayê êlekê ye, ev poşmanî şerm e û fihêt e.
- (20) Belko jî di nêva me û eşîrêd Mîran, ev xebera paş dibite mucîbê dijminî û neyariyê, eve şûlekî eyb e.
- (21) Me ji boyê te xeberdan kiriye, êdî çare nabe Hesên Axa înadê diketin, îlla ku nabe û ez wê keçê nastînim.
- (22) Hind mirof dibêjine Hesên Axayê ku şerm e, ev şûla nalayiq e, çare nabe.
- (23) Îcarê Hesên Axa dibêje ku min bi riza destûr daye, bilanê Lalîxanê, Çeleng Axa ji boyê xwe binitin.
- (24) Paşî li ser vê xeberê qerar didin û cewabê virê dikin ji boyê axayê Mîran ku Hesên Axa me'zur e, em dê şêrîniya Lalîxanê ji boyê Çeleng Axayê vexwun.
- (25) Şerbetê ji boyê Çeleng Axayê vedixwun û wekê dibite dawet, tedarik dibê, Hesên Axa digel dawetiyên diçitin ku bûkê bînin.
- (26) Bûkê siwar dikin û têne deşte heye, Deşta Dubanê.
- (27) Dibêjin weko xêlî têne wê deştê, bi emrê Xwedê, ba rupekê ji rûyê Lalîxanê direvîne û rûyê Lalîxanê vekirî dimîne.
- (28) Hesên Axa rûyê Lalîxanê dibîne ku her weko hîvê bedira di çardehê da.
- (29) Êdî mehbubêd wekê wê belko kêm heyn.
- (30) Îcarê dizane ku ew şûla ku li wî qewimî hîle bûye.

(31) Êdî heman ji wê derê dewetiyar diterikîne û hespê xwe dajo û diçîte diyar xurbetê, ew çûyîne ku çûye.

(32) Paşê li Hesên Axa û Lalîxanê zaf istiran girêdayine.

(33) Meger dilê Lalîxanê jî di Hesên Axayê da hebûye.

(34) Îcarê Lalîxanê jî têtê mal jehrê (r. 76) dixwe û dimire.

(35) Hesên Axa jî kete xurbetê kes nezanî ku ku ve çûye û telef bûyî.

(36) Eve dastana ji wan mayî.

(37) Lakin Hesên Axayê Hesamiyan û qezya Lalîxanê di ekradêd Hekarî û Bohtan qewî zêde meşhur e û belko sed bendê zêdetir lawij û panîzok bo wan gotine û niha ekserêd istiranêd wan evne ne.

Hikayeta Sêzdeyê

(1) Di weqtê Tîmûr Paşayê Milî ku îskanbaşî bûye û malêd wan havînan ji beriyê dihatine zozanêd Bîngolê, ji tayîfa Silîwanêd Diyarbekrê lawekî qewî jêhatî û bi husn û camêr, lakin bê hal û mal, navê Siyahmed dibêjin, ew law têtin û dibite xulamê Tîmur Paşayê Millî û mudeyek di xizmeta Tîmur Paşa da dimîne.

(2) Keçekê Tîmur Paşa jî hebûye, şanzde hevde salî, navê Şems.

(3) Qewî zêde xweyî husn û rind û spehî.

(4) Halê ciwanî ye me'lûm, wisa diqewime, ev Siyahmedê Silîwî û Şems keça Tîmur Paşa hez ji yekûdu dîkin û hevûdu dihebînin.

(5) Êdî roj bi roj evîna wan zêdebûyî.

(6) Siyahmed dizane ku Tîmur Paşa bi ixtiyarî keça xwe nadete Siyahmed, lewranê ew kurmanc e û xulamê wî ye, û ew bi xwe îskanbaşî û paşa ye, û agirê evîn jî defî nabê.

(7) Rojekê Siyahmed dibêje Şemsî ku em heta kengê weha zar vê belaya eşqê bikêşin.

(8) Ez dizanim eve şûla me bi rahatî nayête serî, were ez dê te birevînim, yan ew e ku em xelas dibin, yan ew e ku bi pê me dikevin û me dikujin, em ji belaya evînê xelas dibin.

(9) Xulase, Siyahmed û Şems herdu di gel yekûdu xeber didin, li tedarika revê dibin.

- (10) Weko ku koçêd Tîmur Paşa ji Bîngolê zozanan bar dîkin û bera xwe didin beriyê, Siyahmed û Şems herdu siwar dibin û xwe didene paşiya koçan û ji wê derê ew herdu bi şûve, bi semtê Muşê da direvin û riya Xelatê digirin û diçin.
- (11) Koçêd Tîmur Paşa jî serêvarê têne waran.
- (12) Şev dibe, îcarê dibînin ku Şems û Siyahmedê Silîwî herdu tunînin.
- (13) Îcarê li êlê dibîte hewarê ku Siyahmed û keça Tîmur Paşa Şems herdu wenda ne.
- (14) Qederê panced siwarêd bijare bi şûve li dewsa koçan vedigerin û bi şev dajon û subeyê ew siwar têne terefêd Bîngolê.
- (15) Êre û wê da pirsîyar dîkin.
- (16) Paşî mirofekî ixtiyar bi şûve mabûye, (r. 77) ew ixtiyar dibêje ku belê min dît, weko koç axir bûn, Siyahmedê Silîwî û Şems herdu rim di destan da bi semtê riya Xelatê bilez dajotin û diçûn.
- (17) Weko ew siwarêd hewarê salixa Şems û Siyahmedê hildigirin, ew siwar jî rast bi pê wan dikevin, dajon û diçin.
- (18) Em bêne ehwalêd Siyahmedê Silîwî û Şems.
- (19) Ew herdu jî bi lez û bi xar dajon.
- (20) Şev û rojekê diçin û riya bîst seetan rê dibirin û têne eteka Çiyayê Xelatê ku Sîpan dibêjin.
- (21) Guya evne jî êdî emîn dibin û li kenarê çiyayê ji hespan peya dibin.
- (22) Li wê navê bi emrê Allah çend gayêd kovî bi ser wan da têtin.
- (23) Îcarê Siyahmed tivengekê davêje û li gayekî kovî didetin û birîndar diketin.
- (24) Lakin gayê kovî bi wê derbê nakevitin û direve.
- (25) Îcarê Siyahmed jî tivingê hildigirtin peya li pê gayê kovî yê birîndar deçitin.
- (26) Ew ga diçite cihekî qewî asê û nizar ku di bin da uçurim e û zaf bilind û kûr e.
- (27) Li wê cihê asê, birîna gayê kovî sar dibe, îcarê dikeve.
- (28) Siyahmed jî digehe ser gayê û kêrê bidertîne ku gayê serjêke.
- (29) Ga ji hewla canê xwe şaxekî li Siyahmed didetin û Siyahmed ji wî nizarê gêr dibitin.

(30) Li jêrê li binê nizarê darekî diriyê hişk serî tîj hebûye, rast ji jor ve bising devarûyê Siyahmed dikeve ser wî darê tîj, serê darê rastê kevçika dilê têtin û ji piştê biderdikeve, filhal ruh teslîm diketin, lakin hêj Şems xeber pê nîne.

(31) Mîqdarekê Şems li nik hespan disekine û dibîne ku Siyahmed derengî bûyî, êdî Şems jî li dewsa Siyahmedî têtin û gayê dibînitin û bi jêr ve li binê nizarî nezer dike, dibîne ku Siyahmed li ser darê ye.

(32) Berê zan dibe ku belko hêjanê xwoş e, du sê dangan Siyahmed Siyahmed dikete gazî, weko tehqîq diketin ku Siyahmed tamam bûye.

(33) Şems jî digirî û ay dibêje, xwe ji nizarî davêje ser laşê Siyahmed.

(34) Şems jî li wê navê di dereca helakê da, ew siwarêd ku bi pê wan ketine, ew jî digehine wî derî û hespêd wan dibînin û paş têne ser laşêd wan.

(35) Hêjanê heyat di Şems da hebûye.

(36) Didene xeberdan.

(37) Paşê dû sê seetan Şems jî tamam dibe.

(38) Îcarê ewan herdukan jî li wê derê defn kirîne.

(39) Niha jî ziyaretêd wan me'lûm in.

(40) Paşî xuha Siyahmedê Silwî hebûye, zav istiran li wan girêdaye û el an ew istiran û qezaya wan di nêva ekradan da meşhur e, hikayetxwanêd di meclisan da neql dikin, lakin istiranêd wan jî di gel dibêjin, qewî zêde hezîn e û giryê mirofan têtin, gelek bi zarî û jarî fewt bûyne.

Hikayeta Çardeyê (r. 78)

(1) Neql dikin ku di weqtê hikumeta 'Ebdurrezaq Begê mîrê Xoşabê, di nava hêseta kelê, ji axa û e'yanêd wan kurekî Çelebî Axa peyda bûyî, navê Îbrahîm Axa.

(2) Ku gihaye şanzdeh hevdeh salî di reşt û reşadet û camêrî di rimbazî da qewî meşhûr bûyî.

(3) Talana Îbrahîm Axa li pê biçitin elbete dê vegeîne û exterman bêne û her çi şerê ku Îbrahîm Axa tê da bê elbete berê namusê ya Îbrahîm Axa ye û ew li kinarê dinê xalib dibe.

- (4) Xulase kelam, dana Xwedê.
- (5) Êdî nêva hindik mudeyekê da Îbrahîm Axa li wan kenaran û li Mehemdan zêde şûhret dît û roj bo rojê tereqî kir û xweyê xulam û etba'i û nan û kerem û mal bûyî.
- (6) Te hesêb fikir ku ji boyê vî mal û eqbal, dem bi dem ji esmanan dibarî.
- (7) Herkesê êdî behsa ewsafêd wî ne, Îbrahîm Axa weha got weha da weha kir êdî behsa mîr û axayêd mayî esla nîne.
- (8) Suban berê dîwan û nas diçine nik Îbrahîm Axa û paşî têne nik mîrî.
- (9) Bi vê terzê çar salan kêşayî.
- (10) Mîr fikirî ku belê Îbrahîm Axa êdî gelek mezin û bê perwa bûyî.
- (11) Îcarê mirada kuştina Îbrahîm Axayî diketin.
- (12) Lakin ger çi 'Ebdurrezaq Beg jî ji malê çar pênc Begzade heyin, êla Îbrahîm axa qewî dilêr e, eger dest bidete xençerê bi wî ra muqawemet zehmet e û ji dûr ve sî çil etba'i heyin, eger qesda kuştina Îbrahîm Axayî biketin, gelek fitne û fesad peyda dibe.
- (13) Daîm di vê fikirê da bûye.
- (14) Axirî rojekê begzade dibêjine Îbrahîm Axayê îşev were serê kelê ziyafetê.
- (15) Lakin em paşî biçine hemama heremê û keyf biken.
- (16) Qeza hatiye, Îbrahîm Axa jî bê perwa digel dû xulaman diçite serê kelê ziyafetê.
- (17) Paşî êvarê digel 'Ebdurrezaq Begê şîvê dixwen û rûdinin, heta seet dibe çar.
- (18) Îcarê Begzade dibêjine 'Ebdurrezaq Begê ku destûra me û Îbrahîm Axayî bide em dê biçne hemama heremê keyf biken.
- (19) Lewranê di Xoşabê da hemam tunîne, îlla hemamekê biçûk li herema serê kelê heye.
- (20) Îcarê Îbrahîm Axa jî emîn, bê tirs xulamêd xwe jî li dîwanxaneyê dihêlitin, bi xwe bi tenê digel hersê begzadan diçite hemamê û dişelin û diçine nêva hemamê.
- (21) Paş seetekê, begzadeyek hebûye kurê birayê 'Ebdurrezaq Begê, (**r. 79**) navê Mensur Beg, bi dest û pê xweyî qiwet û cesaret bûyî.
- (22) Ew Mensur dibêje Îbrahîm, kêfa min qelûnekê dixwezê, ez biçim camekanê qelûnekê vexwim û bêm.

(23) Îcarê ew Mensur Beg tête camekanê û cilêd xwe werdigiritin û xençerê di ber pişta xwe diketin û diçite hindûr û nêva hemamê û Îbrahîm Axa didete ber xençeran.

(24) Begzade sê bûne, Îbrahîm Axa bi tenê û rûs, dîsanê Îbrahîm Axa xençerê ji dest wan distîne û begzadeyekî birîndar diketin, paşê Îbrahîm Axa dikujin, tamam dikin.

(25) Subeyê laşê Îbrahîm Axayê kêşane bin kelê û ew begzade di gel xulamêd xwe, çûyî mala Îbrahîm Axa û malêd xulamêd wî talan kirîn.

(26) Îcarê cenaza Îbrahîm axayê birin çal kirin.

(27) ‘Ebdurrezaq Beg rahet bûyî, hikumet kir.

(28) Lewranê weko di Kurdistanê da mirofek navê dide û meşhur dibitin, êdî teweciha xelqê li wî mirofî zêde dibin û her kesek xwe didete terefê wî.

(29) Êdî hakim jî bi wan çare nakin, roj bi rojê ew mirofê navê dayî qiwet û şûhret zêde dibitin, ekserê fesada ekradan ji mirofêd wehane peyda dibin.

Hikayeta Panzdehê

(1) Ji etba’ û xulamêd mala Eladîn Begê hakimê Rojkan, Şêx Ehmedê Çiplaq hebû ku li Xelatê eba u ecdad wan meşhûr bûn, Şêxêd Çiplaq digotin.

(2) Eba û ecdadêd wî rûs û ûrde digeriyan û ekserî di xilwetê da rûs û ûrde sakin dibûn û gûya di f’îqada ekradan da evne xweyî keraman bûne.

(3) Ew Şêx Ehmed riya eba u ecdadêd xwe negirtiye.

(4) Xulam û etba’ xweyî kirî, bi xwe jî mirofek camêr û xunxwar û zalim bûyî.

(5) Axirê mîrîtiya Xelatê zebt kirî û hespêd qenc û xulamêd dilêr peyda kirîn û ji yalekê da jî mirof dikuştin û cerîme digirtin, ji yalekê da didaye xelqê û kerem dikirin.

(6) Bi vê terzê qeza Xelatê zebt kirî.

(7) Dused sêsed xulam û siwar peyda kirîn.

(8) Di wî weqtî bi wî ra hem'esir ji mîrêd qedîm qeza Elcewazê Îsmâil Beg hebû.

(9) Ew jî qewî şecî’ û aqil û ehl însaf û ehalî jê xoşnud û memleket ebad.

(10) Ji wî Îsmâil Begê ra xelqê Kuçik Şahîn digotin.

(11) Ew herdu qeza nêzokê yekûdu ne, mîqdarê çar saetan.

- (12) Her çi kes ku ji (r. 80) zilma Şêx Ehmedê Çiplaq direvîn, dihatin bi Îsmaîl Begê disekinîn û xelas dibûn.
- (13) Şêx Ehmed êdî nedikarî şûlekî biketin, her çend mullaheze dikir ku belko bi terzekî Îsmaîl Begê mexlub biketin, qadir nedibû.
- (14) Lewranê tewecuha nasan hemûyan li Îsmaîl Begê hebûn û xelq ji edla wî razî bûn.
- (15) Îcarê Şêx îna ye bi hîle dostiyek di nêva xwe û Îsmaîl Begê daniye, ku belê bi şev min di xewna xwe da dîtiye ku ez û tu bûne birayê axretê.
- (16) Bi vê terzê Îsmaîl Begê dide baweriyê.
- (17) Êdî herdu dibine birayêd axretê û qewî zêde destebirak û dost, zêde bi yekûdu bawerî dikin.
- (18) Eger çi biratiya Îsmaîl Begê sadîq bûye, lakin dostiya Şêx Ehmedê bi heramzayî bûye.
- (19) Heta rojek dîsanê weko adetê xwe Şêx Ehmed cewabê virê diketin ku ji mêj e min Îsmaîl Beg nedîtiye, kêfa min ewî dixwezitin.
- (20) Ez dê bême silaviya Îsmaîl Begê.
- (21) Ew jî dibêjtin ku bilanê kerem bike û bêtin.
- (22) Îcarê Şêx kurê xwe Şêx Mihemed Begê gazî nik xwe diketin û bi xef tenbiye diketin ku ez digel deh xulaman diçime kela Elcewazê nik Îsmaîl Begê, tu bi şev tenbîye bike, her çi siwar û peya di nêva qeseba Xelatê da hebin, hemûyan nîvê şevê di gel xwe helgire û nêzokê fecrê werine dora kela Elcewazê, şûlekî min heye.
- (23) Evê tedbîrê û tenbîhê diketin û bi xwe di gel deh xulamêd bijare têtê kela Elcewazê nik Îsmaîl Begê.
- (24) Lakin dîsanê merama xwe ji boyê xulaman jî beyan naketin.
- (25) Weko Şêx têtin û diçite serê kelê peya dibitin.
- (26) Îsmaîl Beg jî e'zaz û îkram diketin û di gel hevûdu di meclîsê da heta saet çaran rûtînin.
- (27) Xulam û etba'êd Îsmaîl Begê bîst sî mirof heyn.

(28) Îcarê Îsmaîl Beg radibe diçite heremê û xulamêd Îsmaîl Begê jî her kesek diçine malêd xwe hêşî û dergêhêd kelê jî dadidin.

(29) Li dîwanxaneyê dimîne dergewan û qawecî û mêtir sê çar mirof ji etba'êd Îsmaîl Begê dimînin, êdî mayî diçine malêd xwe.

(30) Paş weko saet dibite şeş, Şêx di cihê dirûdanê sancu digire, eman ez dimirim, feryad û gazî ez mirim dermanekî li min biken û cewabê ji boyê Îsmaîl Begê bibin, bilanê bêtin çarekî li min biketin.

(31) Îcarê dergewan diçite derê heremê û diqute û cewabê ji boyê Îsmaîl Begê vire diketin ku Şêx Ehmed sancu girtiye û qewî bêhal e, nêzoke helak bibe, ta dikete gazî ji boyê wesiyetan.

(32) Îcarê bêçare Îsmaîl Beg jî bawer diketin, ji nivînê radibe û libasêd xwe ber diketin û tête dîwanxaneyê nik Şêx.

(33) Weko Îsmaîl Beg têtin (r. 81) û rûtinin, êdî ew bêdîn, Şêx Ehmed, ew xulamêd Îsmaîl Begê ku hazir heyin, ewan jî her yekî bi şûlekî gêro diketin û bi xwe ji nişkê ve didete xençerê û hucûmê Îsmaîl Begê diketin û du sê xençeran lê didetin, emîr xulamêd xwe diketin, Îsmaîl Beg tamam dikan.

(34) Îcarê ewan du sê xulamêd Îsmaîl Begê ku li wê derê li nik wan bûne, digirin û hepis dikan.

(35) Îcarê dergêhê kelê vedikin û xulamekî virê dikete teleba kurê xwe Şêx Mihemed bikê di gel leşkerê Xelatê ku berê tenbîh kiribûn.

(36) Xulam diçin, berî fecrê sêsed çarsed siwaran tênite nêva kela Elcewazê.

(37) Ehlê hêşetê her kesek bê xeber li malêd xwe razayne. Bi vê terzê Şêx kela Elcewazê zebt kirî.

(38) Îsmaîl Beg bi vê hîleyê kuşt û subeyê cenazeya wî defn kirîn.

(39) Emwal û eşyayêd wî zebt kirî, 'eyal û etfalêd Îsmaîl Begê ji kelê bideranî û ehlêd Adilcewazê yeko yeko cerîme kirin.

(40) Mudeyê du sê salan bi zora xwe Adilcewazê zebt kirî.

(41) Axirê kurekî Îsmaîl Begê biçûk navê Sadiq Beg hebû, ahaliyan bi xef di gel Sadiq Begê ittîfaq kirin.

(42) Şêx çûbûye Xelatê êdî dayine ber tivengan û qewirandin û nehêlane nêva xwe û kurê Îsmâil Begê Sadiq Beg kirîne mîrêd xwe û Şêx çûye Xelatê.

(43) Qewî zalim û bêdîn bû.

(44) Bi xwe bi nefsa xwe bela şer derket bi destê xwe digotin ku ji misilman û filan sî û sê nefer mirof kuştibûn.

(45) Paşê bela xwe jî dît.

Hikayeta Şanzdehê

(1) Şêx Ehmedê Çiplaq, ku belaya xwe dît paşê îcarê ewî Şêx Ehmedê zaf diraf ji zilm û dizî bi hev xistî, di gel Selîm Paşayê Rojki bûye dijmin û neyarî kirî.

(2) Axirê di weqtê Hacî Salih Paşa, Şêx qederekî diraf û çend hespêd qenc hilgirtî hate Erziromê û paşatiya Rojkan ji boyê xwe istandî bûye.

(3) Seyîd Ehmed Paşa û leşkerê Erziromê û Bazîd û Wanê hilgirtî çûye ser Selîm Paşa.

(4) Îcarê Selîm Paşa jî di nêva bajêrê Bitlîsê kete hesarê.

(5) Şêx Ehmed Paşa di gel heşt hezar leşkerê çûye ser bajêrê Bitlîsê û şerekî qenc kirîn û ji du kenaran nêzokê sed mirof telef bûyî.

(6) Leşkerêd ekradêd Seyîd Ehmed Paşa, êroş birîne mehela Bitlîsê û gelek malêd re'yan yexma kirin.

(7) Axirê Selîm Paşa taqet neînayî, Bitlîs berdayî.

(8) Di gel çend etba'ekan revî û çûye kela Sasonê û li wê derê mayî.

(9) (r. 82) Seyîd Ehmed Paşa bûye hakimê Rojkan û hate Mûşê, li serayê rûnişt.

(10) Mîqdarê sê mehan hikumet kirî.

(11) Lakin Mela Selîm Paşa li Mûşê mayî bû.

(12) Xuhkê Selîm Paşa hebû bi navê Sultan Xanim.

(13) Îcarê Selîm Paşa ji kela Sasonê cewabê virê dike nik xuha xwe Sultan Xanimê, ku min ji te divêtin, ku belayekê ji boyê Seyîd Ehmed Paşayî çêkî.

(14) Êdî Sultan Xanim jî fileyekî ji serîdarêd serayê gazî nik xwe diketin û qederekî diravî we'd diketin ku ez varêlekê barut bideme te, bi şev bibe, Seyîd Ehmed Paşa li tebeqa

zorê ye, tu vê varêlê bibe di bin odeya wî da li tebeqa jêrê dayne nêva merehkê û şemalekê vêxîne û biçikîne nêva barûtê û tu bireve ji dûr ve xwe xef bike.

(15) Îcarê Mexoyê file jî weko tedbîra Sultan Xanimê, varêla barûtê nivê şevê dibetin û li bin oda Seyîd Ehmed Paşa li merehkê datinîtin û şemalê di nêva barûtê da dadiçikine û bi xwe bi dûr ve diçitin û xwe xef diketin.

(16) Îcarê paşê seet û nivê, şemal digehte barûtê, odeya Seyîd Ehmed Paşa di gel yalekê serayê ber hewa bûyî.

(17) Seyîd Ehmed Paşa di gel sî nefer axaler û etba'an telef bûyîn.

(18) Subeynê laşêd wan ji riya niv seetan berhev kirîn û înan defîn kirin.

(19) Mizgînê ji boyê Selîm Paşa çûyî, hat û dîsan cebirî bûye hakimê Rojkan.

(20) Ew fileyê ku eve şûla kiribû zaf malê dayê, çirax kir û Şêx Paşa jî belaya xwe dît û xelq ji şerêd wî xelas bûn.

(21) Lakin ewî jî kurêd ji babê bedtir hebûn, navê yekê Şêx Mihemed Beg û navê yekê Şêx Mistefa Beg.

(22) Îcarê ewan Xelat zebt kirî, dest bi fitne fesad û mirof kuştinê kirîn û gelek bêedebî kirîn.

(23) Ewî Şêx Mihemed Begê zaf jinêd file û misilmanan rakêşan û bi zorî înan li xwe mar dikirîn.

(24) Ewî jî dibêjin ku bi xwe bi destê xwe bela şiriket (?) çil nefer mirof file û misilman qetl kirîn.

(25) Paş weko de'wa Bedirxan Begê bûyî û Rom li Kurdistanê xalib bûyî, ew Şêx Mihemed tebidîl el-lîbas bûyî, revî û çûye Bexdayê, wenda bûyî.

(26) Birayê wî Şêx Mistefa girtin, di gel Xan Mehmûd birîne Urisçuxê nefî.

(27) Niha jî li wê derê ye.

(28) Pesîra 'ebadillahê ji wan xelas bûyî û xelq rahet bûyî.

Hikayeta Heftdehê (r. 83)

(1) Neql dikin ku ji gundêd Herîrê gundekî mezin ê ekra dan heye, navê xanekî li wî gundî mala rîspiyê wî gundî Elî Nasiran hebûye.

- (2) Xweyî mal û dewlet û kur û bûk û keç di malê da jî zav bûyne.
- (3) Rojekê mirofekî biyanî bê nav û nîşan, têtin û li mala Elî Nasiran dibite mêwan û çend rojekan dimîne.
- (4) Bê cih û war bûye û navê jî Heyder bûye.
- (5) Êdî ew Heyder dibîne ku malekê têr û tijî û xweyî nan û av, nanozikî xizmeta wan diketin û li mala Elî Nasiran sakin dibitin.
- (6) Miqdarê şeş mehan dimîne.
- (7) Meger bûkeke Elî Nasiran bedesil û bêsewî hebûye, navê wê Werdê.
- (8) Ew bûk û Heyder bixef hevdu dihebînin û bi dizî digel yekûdu didin û distînin.
- (9) Lakin kes pê waqif nabê.
- (10) Rojekê Heyder dibêje Werdê ku were ez te birevînim û bibem û biçîn.
- (11) Îcarê Werdê dibêje Heyder, revandin nabê, Elî Nasiran ji malê hinde mêr heyin bi pê me dikevin, li ku ye me digrin û dikujin.
- (12) Ya qenc ew e ku em şûlekî biken kifş nebê û ev mal û hale ji boyê me bimînitin û em yekûdu mar biken.
- (13) Tu here qederekî merkemoş ji boyê min bîne, ez dê têkel zadê bikem û bideme van, da pê helak bibin.
- (14) Êdî mal û hal dimîne ji boyê min û te û ez jî te mar dikem, ji vê çêtir nabê.
- (15) Îcarê Heyder bi behaneyekê diçite bajêrê Êrmûyê û qederekî zaf merkemoş tînitin û didete bûkê.
- (16) Îcarê bûk jî tînîtin ewî jehrî hemû bi carekê dikete nêva zadê êvarê û didete xelqê malê.
- (17) Paş çend saetekan êdî jehr kar dike, ji malê mêr û jin hefde nefer hebûne, pêkeve nexweş dibin û çar jê hesêb ke di hindik weqtê da helak dibin.
- (18) Êdî mayî jî qewî bedhal in û cîran û xelqê gundê têne ser wan ku eve çî behs e, bi pê pirs û pirsyaran dikevin.

- (19) Heyder ji pirsyara wan ditirse, heman weqtê fecrê ji gundê biderdikeve û direve diçite şûla xwe.
- (20) Lakin Werdê dimîne û xelqê gundê pirsiyar dikan ku ev zade kê çêkiriye.
- (21) Îcarê dibêjine Werdê ku tu ji boyê çi nexweş nebûyî, meger te ji vê zadê nexwariye û Heyder kanê?
- (22) Xulase xelq dikevîne şubeyê, êre da wê da Heyder jî tune.
- (23) Îcarê cebrê li Werdê dikan ku elbete tu dê ji vê zadê bixweyî.
- (24) Werdê zadê naxwetin.
- (25) Îcarê Werdê digirin û girê didin ku em dê te bikujîn weyanê (r. 84) tu dê rastê bibêjî.
- (26) Naçarî, îcarê Werdê wekê bûyî dibêje.
- (27) Çend siwar dibin û bi pê Heyder dikevin û gelek lê digerin, Heyderê nabînin.
- (28) Heyder bê nam û nîşan çûyî û xelas bûyî.
- (29) Îcarê Werdê jî warejan ji keziyan bi darda kirîn û kuştin
- (30) Elî Nasiran jî di gel yanzde neferan kur, bûk û keç telef bûyî.
- (31) Êdî mayî şeş nefer biçûk û zarokan me'alece kirîn sax bûyîn.
- (32) Lakin ji Heyderî esla nam û salix û nîşan peyda nebûyî, çûye şûla xwe.
- (33) Paş vê şûlê li etrafêd Herîrê êdî kes biyanî û name'lûm nêzokê malêd xwe nakin, ji xiyaretê ditirsin.

Hikayeta Hejdeê

- (1) Mela Osman hebû ji tayfa Xaniyan.
- (2) Neql dikir ku zivistanê ez diçûme Cezîrê, riya min bi gundê Kahê ket.
- (3) Lakin bi rojê li min bûye tîpî û bager, şeveder mayî.
- (4) Pênc şeş saetan ji şevê çûyî, ez gihame nêva gundê Kahê ku xelq hemû razayine, deng û his tunine.
- (5) Rast çûme derê mizgeftê ku derî vekirî ye, min jî der vekirî çûme nêva mizgeftê ku ez qederekê razêm, heta sube dibê.

(6) Di nêva mizgeftê pê min hingifte tişteki, tarî ye, min bi destê xwe seh kirî ku mirofek e raza ye.

(7) Îcarê min xwe bi xwe got ku qey eve jî weko min mêwan e, qenc e, ji boyê min oldaş e, min jî piştî xwe daye wî mirofî û pê ve zeliqandî razam.

(8) Lakin qederekî dinivim û hişyar dibim ku ew yalê min ê ku bi wî mirofê zeliqiye bûye weko cemedê û tezî ye.

(9) Lakin ez ferq nakim.

(10) Îcarê teniştî xwe vedigorim û yalê dinê bi wî mirofî dizelqînim, meger ew mirofî mirî ye.

(11) Nêzokê êvarê fewt bûye, êdî seb bi êvarê weqt nebûye, defn nekirîne û îname û danîne mizgeftê, ku subeynê bibin defn bikin.

(12) Îcarê ew Mela Osman jî bi şev hatiye, wisa zaniye ku ew mirî sax û razaye, teniştî xwe dayê, razaye.

(13) Mela Osman neql dike ku nêzokê fecrê min dît ku derê mizgeftê vebûyî, meger îmam hate mizgeftê, çirax hilkirî, weko ewî çirax ronahî kirî, Mela Osman ji teniştî cenazeyê radibe û rûtinê.

(14) Weko îmam çav bi Mela Osmanê dikeve ji teniştî cenazeyê serê xwe hildigirtin û radibitin, îmam we zen diketin ku ew mirî rabû, dîtirse wey dibêje îmam, dikevîtin û ji xwe diçîtin.

(15) Îcarê gundî tîn û avê bi îmamî (r. 85) vedireşînin, dereng êdî îmam bi xwe ve têtin, ji wî dipirsin, ku çi bi te hatî ku eqlê te çûyî, ji xwe ve çûyî?

(16) Îmam dibêje ku weko min çirax ronahî kirî, evî mirofê serê xwe ji nik mewtayê hilanî, min zen kir ku ew mewtaye rabû.

(17) Êdî ji tirsan bêxtiyar ez ji xwe ve çûme.

(18) Paş wê îmam nexweş ketî, qederê du mehan bêkêf razayî, paş şîfa dît.

Hikayeta Nozdehê

(1) Neql dikin ku di nêva bajêrê Bitlîsê mirofek hebûye navê Cergo, jina wî jî ji gundêd Xelatê ji gundê Tunusê bûye.

- (2) Îcarê ji mala babê jinê mirof hatine pê jina Cergo Guzel Xatunê, birîne mala babê, çend rojekan mêwaniyê.
- (3) Cergo bi xwe jî bi tenê maye di mala xwe da.
- (4) Îcarê Cergo dibîne ku jina wî Guzel Xatun bi derengî bûyî nehat, xulamekî Cergo ciwan û heramzade ji tayfa Reşkotan hebûye, navê Kirêt.
- (5) Cergo dibêje xulamê xwe Kirêt ku siwar bibe û here xatuna xwe bêne.
- (6) Kirêt jî siwar dibe û tête teleba Guzel Xatunê.
- (7) Ew gundê ku Guzel Xatunê çûyî jî deh û pazde se'etan ji Bitlîsê dûr bûye.
- (8) Îcarê Guzel Xatun jî tedarika xwe dike û siwar dibe, di gel Kirêt her du bi riya bajêrê da tîn.
- (9) Lakin bi rê ve Kirêt dilê xwe li Guzel Xatunê xirab diketin, fesadî di dilêd xwe da peyda diketin.
- (10) Her çend êre ve pê da bi kinayet xeber didetin.
- (11) Guzel Xatun fehm diketin fesada dilê wî, cewabê nadetin.
- (12) Îcarê Kirêt heramzade xwe vir da wê da gêro diketin ku şev bi ser wan da bêtin, êdî cebrê xereza xwe îcra biketin.
- (13) Kirêt car peya dibê û car ez sancu bûme, nexweş im dibêje, hêdî hêdî hespî dajotin.
- (14) Her çend Guzel Xatun hêvî û rica diketin ku Kirêt dereng e, em êdî nagehine bajêrê, lezê bike.
- (15) Kirêt guhdariya Guzel Xatunê naketin.
- (16) Xulase kelam, ew heramzade Kirêt, Guzel Xatunê gêro û mijûl diketin rojavayi bi zorê digehne Deştê Rehwayê Xana Başxanê ku hêjam sê saet bajêrê Bitlîsê dikêşe, êvar jî dibe.
- (17) Îcarê Kirêt dibêje Guzel Xatunê ku em dê îşve li vê xanê sakin bibin û subeyê biçin.
- (18) Guzel Xatun êdî naçarî li xanê dawerin û hespêd xwe girê didin, demekî disekin.
- (19) Îcarê Kirêt dibêje Guzel Xatunê, êdî çext fayde naketin û şerm nabê elbet tu dê şûla xirab di gel (r. 86) min bikî.

- (20) Ji wê jî min tu heta şevê gêro kirî eger ne elbet ez dê te bikujim.
- (21) Her çend Guzel Xatunê, eman dad feryad dibêje û lawahiyan diketin, çare nabê.
- (22) Îcarê Guzel Xatunê kêrekê firengî di kurkê da hebûye, ji xwe xane tarî ye, kêrê bi dizîkan ji kurka xwe bidertîne û digre destê xwe, ji yalekê da jî lawahiyan ji Kirêtî diketin, heta firset dibînitin û kêrê ji pêrve li zengilokê Kirêtî didetin û dikişêtin zengilokê dibiritin û Kirêtî dikujitin û tamam diketin.
- (23) Êdî bi xwe jî naçarî li goşeyekî xanê sakin dibitin.
- (24) Mêrê Guzel Xatunê Cergo jî êvaran li bajêrê diçite odeyekê meclîsê ji boyê mijulî qesan.
- (25) Wê şevê di wê meclîsa Cergo tê da dibite mebahesa camêrî, dilêrî û şeca'etê.
- (26) Îcarê dibêjin ku di vê şeva tarî û birqetavê, herçi kes curet biketin û siwar bibe û biçite Başxanê û nîşanekê daniye nêva xanê û bi şûve bêtin, em subeyê biçin ewê nîşanê ji xanê bînin, ji wî kesî şecî'tir kes nabê, em dê hinde şertê bidene wî mirofî.
- (27) Ev şerta di meclîsê da muzakere dikirîn, yekê go ez diçim, paşî poşman bûyî.
- (28) Îcarê Cergo kete şertê ku belê çî heye ez diçim, nîşanê datînimê xanê û tîm, hûn jî ji meclîsê belav nebin, hetanê ez vedigerim.
- (29) Îcarê Cergo rabûye hatiye mala xwe û ratibêd xwe girêdayî, siwar bûye û çûye Xana Başxanê ku nîşanê dayne xanê û vegere betin.
- (30) Weko Cergo tête ber derê xanê û peya dibitin ku bête hindurê xanê û nîşanê danîtin, Guzel Xatun seha pêjnê diketin, ditirse ku eceba vê şevê nivê şevê eve heravê be (?) û rê birîn evne çî ne?
- (31) Sakin dibe û guhdarî dike ku siwareke, hate derê xanê û peya bûyî, hesp di destê da kêşaye û hate nêva xanê.
- (32) Guzel Xatûn evê hatina siwarê nêva xanê dibîne, êdî zêde ditirse.
- (33) Bi xwe bi xwe dibêje ku ez dê milekî vî laşê Kirêtî bibirim û bavêjime ser vî siwarî.
- (34) Weko siwar destê mirofan jêkirî dibîne, elbete ditirse û xofê diketin, ji xanê bider dikevitin.
- (35) Îcarê Guzel Xatun milekî laşê Kirêtî dibire û davêje semtê siwarê.

- (36) Weko siwar dibîne ku tiştekek hat û li ber piyêd wî ketiye erdê, siwar xwar bûyî seh kir, çiplekî mirofan e.
- (37) Qe deng naketin, dizane ku di xanê da avahî heye, Lakin ins e, cin e, çi ye nizane.
- (38) Îcarê dîsanê Cergo li goşeyê meger dixebite ku nîşana xwe daçikîne û Guzel Xatun weh guman dike, ev siware hespê xwe girê (r. 87) didetin.
- (39) Îcarê Guzel Xatun milekî din ê laşê Kirêtî dîsanê dibiritin û davête ser siwarê ko belko tekrar bitirsîne.
- (40) Siwar dibîne ku dîsanê terpîn li nik wî hat, bi destê xwe seh diketin ku belê eve jî çiplekî mirofan e.
- (41) Êdî dikete gazî, ne ez Cergoyê Kêsanî me, ez weha bi çiplan natirsim.
- (42) Tu xwe bigre ez bême nik te, em seha yekûdu bikin.
- (43) Weko Guzel Xatun dengê mêrê xwe Cergo dibihê û nas diketin.
- (44) Êdî diketin gazî ku Cergo ez Guzel im.
- (45) Êdî mêr û jin têne bal yekûdu û Cergo ji Guzelê dipirse ku eve çi hale?
- (46) Îcarê Guzel ehwalê xulamê Kirêt heramzade, weko bûyî neqil diketin.
- (47) Guzel jî pirsiyar diketin ku çawanê bû ku îşeve pê êre da hatî?
- (48) Ew jî Cergo jî ehwalê şertê dibêje.
- (49) Îcarê Cergo û Guzel heman bi şev filhal siwar dibin û herdu milêd Kirêtî jî ji boyê nîşanê tînin û têne bajêrî, rast siwarî herdu jî dajone ber derê cihê ku meclîsa behsa bûyî.
- (50) Dibînin ku hêj meclîs belav nebûyî, muntezerê Cergo ne.
- (51) Îcarê Cergo di gel Guzelê herdu pêkve diçine nêva meclîsê û herdu çiplan jî davêjine mabeyne.
- (52) Êdî ehlê meclîsê pirsiyar dikin ku eve çi ehwal e?
- (53) Êdî Cergo qisseyê weko bûyî macerayê neqil diketin.
- (54) Ehlê meclîsê û belkî kafeyê wan etrafan, aferîn û tehsînê ji boyê pakî û paqijiya Guzelê û curat û cesareta Guzelê dikin.

(55) Aferîn sed aferîn ji boyê jinêd wehe nêreşêrîn, lewranê fî elwaqî'î, ew xanine zêde muhîb û bitirs in, yanî bi rojê mirof bi tenê li wan xanan ditirsitin, barekallah ji boyê Guzelê wê cesaretê û paqjiyê.

Hikayeta Bîstê

(1) Qise dikin ku carekê eşîrekê Sipkan û Heyderan herdukan di gel yekûdu, mikdarê pansed serî karwanê qafîlebaşî 'Ebdulqedir Axayê Bexdayî lêdan û talan kirîn.

(2) Barêd wan hemû çox û qumaş û etles û canefis û qirmiz bûyî, li deşta Fazîkulê belav kirîn.

(3) Wisanê ku ekra dan çox û atles û qumaş bi rîman dipîvan û li yekûdu parve dikirîn û hîse dikirîn.

(4) Li wê navê mirofekî xwecihê jî rastê wan hatî, gote ekra dan, qederekî çoxê û qumaşê bifroşne min.

(5) Îcarê ekra dan înan wesanê bi rîmê, çox û qumaşê pîvayî dayne wî mirofê yêrlu.

(6) Îcarê ewî mirofê pîrsiyar kirî eve gaza we çi mîzîn e?

(7) (r. 88) Ekra dan gotine ku belê eve gaza Koroxli ye, li çîyan hêlaye, ji boyê jaran ku eger mirofek çend gez bi vê bikire, mala xwe ava diketin.

(8) Di wê talanê da çar pênc bar qirmiz bi dest ekra dekî ketibûn û nezaniye ku çi ye.

(9) Paş hatibûye Bazîdê fileyek biriye ku were hîdekî dermanê min heye, ez bideme te.

(10) Îcarê file çûye ew barêd qirmîzan ji wî ekra dî istandîye û înayê fîrotîye û gelek diraf ji wê qazanc kiriye.

(11) Niha jî ji cînsê wî fileyî heyin.

(12) Di Bazîdê da bûyîne bazîrganêd meşhûr û ew gaza Koroxlî di Kurdistanê da me'ruf e.

Hikayeta Bîst û Yekê

(1) Rawî rawêd dikin ku ji silsîla 'Ebasîyan di weqtê Îbrahîm Xan Begê ku mîrê 'umûmê Hekariyan bûyî û ji tayfa Hertuşîyan ji mala axayêd Grawîyan mirofekî qewî zêde reşîd û camêr peyda bûyî, navê Şekîr Axayê Şeng digotin.

- (2) Di weqt û zemanê xwe da gelek nav deng peyda kirî û zaf di nêva ekra dan da xweyî î'tibar bûyî.
- (3) Di etrafan da dihate gotin, heta paşayêd Wanê jî leşker virêdikirine ser Şekir Axayî ku belko bi dest bixînin, mimkun nebûyî.
- (4) Mîrê Hekariyan leşker kirî çûye ser Şekir Axayî, dîsanê cihê wan kelêyî erakê (?) bûyî ji berasîte (?) Îbrahîm Xan Beg zefer pê neanî, meyûs vegeriya.
- (5) Xulase peyadekê Şekir Axayî, meydana şeca'etê û zorê zebt kirî.
- (6) Mîr û paşayêd wan kenaran hemû ketine qesda Şekir Axayî û ji wî 'ecz mayîn.
- (7) Mirofêd wî Şekir Axayî li etrafan xirabî dikirin.
- (8) Heta weqtê ku çeteçî 'Ebdullah Paşa ser'eskerê Erziromê bû, ewî jî emir virêkiriye ji boyê paşayê Wanê ku Şekir Axa fermanlo ye, ji te dixwezim.
- (9) Îcarê paşayê Wanê jî cewab ji boyê mîrê Hekariyan Îbrahîm Xan Begê virê diketin ku ehwal eve ye, Şekir Axa fermanlo, bilanê çarekê lê biketin.
- (10) Îcarê Îbrahîm Xan Beg dinivîse ji boyê paşayê Wanê ku ev şûla bi zorî nabê.
- (11) Bilanê paşa mudeyekê sebrê biketin, belko bi hîle û terzekê em Şekir Axayî bi dest bînin.
- (12) Mudeyekî li ser wê borî, Îbrahîm Xan Begê, dostî xiste nêva xwe û Şekir Axayî, kaxez û qasid diçin û tên.
- (13) Paş mudeyekê Îbrahîm Xan (r. 89) Begê, Şekir Axayî gazî mala xwe diketin, bilanê bêtin em yekûdu bibînin û tifaqa me bibite yek.
- (14) Her çend Îbrahîm Xan Begê evê teklîfa li Şekir Axayî kir, lakin Şekir Axayî bawerî nekirî, qebûl nekir.
- (15) Îcarê Îbrahîm Xan Beg, cewab virêdiketin ku ez mêwanê Şekir Axayî me.
- (16) Ez dê digel deh pêşyekaran bême silaviya Şekir Axayî, em yekûdu bibînin, xeber bidin.
- (17) Îcarê weko ev cewaba gihaye Şekir Axayî got bilanê Îbrahîm Xan Beg kerem biketin û bêtin, li ser seran û li ser çawan bêtin.

- (18) Îcarê Îbrahîm Xan Beg ji xulamêd xwe deh nefer bijartin û di gel xwe birî, çûye Kela Şaxê mala Şekir Axayî.
- (19) Şekir Axa jî di gel sêsed û çarsed siwar û peyan hatiye berayîka Îbrahîm Xan Begê û birî li kelê, li mala xwe kiriye mêwan.
- (20) E'zaz û îkram diketin û di gel yekûdu zêde muhebet û ulfet dikin.
- (21) Îbrahîm Xan Beg du şevan dimîne, şeva sê bixef dibêje xulamêd xwe, ez îşeve Şekir Axayî dê bikujim.
- (22) Lakin xulam û etba'êd wî zahf in û em hindik in.
- (23) Bi şev paşê zadî ez dê di gel Şekir Axayî bikeme xilwet, ez û ew bi tenê dimînin.
- (24) Paş mudeyekê ez dikeme gazî ku qelûnê werin nûvekin hûn her deh jî werêne hindur odayê û filhal derî ji hindur ve dadin û Şekir Axayî bidene ber xençeran, bikujin û weko ew hate kuştin, êdî ew xulam û etba'êd wî dest hilnagirin.
- (25) Em yanzdeh mirof lêreyin û çek û ratibêd me di odayê da li nik me ye, ez mîrê Hekariyan im, êdî kesek paşê mirina Şekir Axayî newêrine Îbrahîm Xan.
- (26) Weha tenbe û tekîdê li xulamêd xwe diketin.
- (27) Bi şev paşê zadî, Îbrahîm Xan Beg emir diketin ku xilwet bike, ez û Şekir Axa bi tenê bimînin, xeberdana me heyn, ez dê subeyê biçim, em şewra xwe tamam bikin.
- (28) Îcarê xulamêd Îbrahîm Xan Begê û xulamêd Şekir Axayî hemû biderdikevin.
- (29) Îbrahîm Xan Beg û Şekir Axa, herdu bi tenê di odayê da dimînin.
- (30) Lakin xulamêd Îbrahîm Xan Begê hazir, her deh jî guhdarî bûne, lewranê ew tenbiye bûne.
- (31) Paşê saetekê, Îbrahîm Xan Beg dikete gazî ku agirekî qelûnê bînin.
- (32) Îcarê xulamêd Îbrahîm Xan Begê di gel gaziyê, her deh jî diçine nêva odayê û derê odayê ji hindur ve qifil dikin û digehne Şekir Axayî û didene ber xençeran.
- (33) Lakin Şekir Axa jî hinde mecal diye ku yekî ji wan xulaman dikuje û yekî birîndar diketin.
- (34) Şekir Axa kuştin, (r. 90) tamam kirin.

- (35) Lakin xulam û etba'êd Şekir Axayî li ber derê odayê bûye xewxa û qiyamet.
- (36) Lakin deh mêrêd bijare bi ratib û şeşxane di gel mîr di odayê da nin.
- (37) Êdî xulaman ger çi kiriye hela hela û gotin em dê odayê bisojin, lakin newêran.
- (38) Lewranê ekradêd re'ye li ber mîran û begzadan dest hilnagirîn û ji paşê mullaheze dikan.
- (39) Îcarê Îbrahîm Xan Begê ji odayê kiriye gazî ku Şekir Axa fermanlo bû, hate kuştin û tamam bûye, hûn belav bibin û biçine malêd xwe û ger ne herçi kesê tagiriya Şekir Axayî biketin, ew jî fermanlo ye û subeyê dê leşkerê min bêtin, êdî kêfa we ye.
- (40) Ez dê mu'în û oldaşêd Şekir Axayî hemû bigirim û bikujim.
- (41) Hûn bi rahetî biçine malêd xwe û muderris û qaziyê hêşetê ji boyê min virê ken, ez da fermanê bideme wan, bilanê ji boyê tayfa Hertuşiyân bixwînin.
- (42) Weko Îbrahîm Xan Beg ev xebera ji nêva odayê gote xulam û etba'êd Şekir Axayî, êdî ew jî tirsîyan û sist bûyî, herkesek belav bûyî, çûyne malêd xwe.
- (43) Meşhûr e dibêjin ji boyê miryan paşê kes namirîtin.
- (44) Êdî etba'ê û xulamêd Şekir Axayî belav bûyî.
- (45) Muderris û qazî hatine derê odayê û gazî Îbrahîm Xan Begê kirîn ku mîrim te emir kiribû, em hatine, çi ferman dikan.
- (46) Îcarê Îbrahîm Xan Beg dibêje melan ku da ku me'lûmê we bibitin ku Şekir Axa bi emrê dewletê fermanlo bû û emrê min bûyî, ez hatim û min kuştîye û ez dê serê wî bibirim û virêkeme dewletê.
- (47) Lakin ji boyê bira û kur û xulam û tayfeya wî hemû ra ye, bilanê rahet bibin û ger ne paşê hûn xelqê hêşetê hemû fermanlo dibin.
- (48) Êdî muderris û qazî xelqê sakin kirî, derê odayê vekirin û serê Şekir Axayî jêkirî virêkirine Wanê û laşê wî defn kirî.
- (49) Îbrahîm Xan Beg îna kurê Şekir Axa yê mezin, mîr Mehmûd xelat kirî, kiriye li cihê babê, axayê tayfa Hertuşiyân û vegeyayî hate mala xwe.
- (50) Şekir Axa weha mixabin çûyî.
- (51) Jin û keçêd wî zaf istiranana li Şekir Axa şinik girê dane.

(52) Di nêva Hertuşiyân û ekradêd wan kenaran meşhûr e, istiranêd Şekir Axayî distirên û niha jî dîsanê ji neseba wî Şekir Axayî, axayêd tayfa Hertuşiyân heye, 'Emerê Mîr Mihemed dibêjin, di Kela Şamanisê da sakin dibitin.

Hikayeta Bîst û Duyê (r. 91)

- (1) Berê niha mela û feqehayêd Kurdistanê, gelek dizî ji dêrêd felan dikirin.
- (2) Lewranê li nik wan malêd dêran beytulmal e, herçi kesê bibitin dirust e û guneh nînin.
- (3) Di nêva Miksê da, Hacî Şaqo hebû, kurekî feqe hebû navê Şomo bûyî.
- (4) Bi rastî Şomo qewî nehs û şerîr û xweyî cesaret bû.
- (5) Esla ji kuştin û girtinê xof nedikir.
- (6) Çend feqehne dinê jî weko xwe heramza li xwe girê dabû, ekserê şûlêd wan ew bûn ku diçûn û bi rojê dicisisandin û bi şev dêrêd filan neqeb dikirin û xaç û şemdanêd zîvîn û peyalûn didizîn û dibirin û diçûne welatekê dinê, ew mal telef dikirin.
- (7) Îcarê ji wê derê jî tekrar dêr dicisandin, ew jî neqeb dikirin. Xulase kar û kespêd wan eve bûn.
- (8) Her çend mîrêd wan jî se'î û cihed dikirin ku feqe Şomoyê bi dest bînin û bigirin, mimkun nedibû.
- (9) Ekserê bi şev û rojan xwe li çiyayê xef dikirin.
- (10) Ewî Şomoyî bi xwe neql dikir ku em carekê sê mirof çûne dêra Yêdîkilîsa Wanê diziyê.
- (11) Weko nîvê şevê bûyî, me cihekî dêrê neqeb kirî, kun kir, lakin berêd dêrê birîne, kun fireh nebûyî, bi zorekî mirof bi zehmet piya dibê.
- (12) Min gote oldaşan ku yek ji we dakevin biçine nêva dêrê, yek ji wan cesaret nekirin.
- (13) Naçarî Şomo dibêje, ez daketime neqebê û çûme nêva dêrê, min şemal hilkirî, her çi ku di dêrê da hebûn; xaçêd zîv û şemdan û peyalûn min berhev kirî û înaye daye oldaşêd xwe, ji neqebê dikêşan û dibirin.
- (14) Meger li wê navê, êrêsan ji dûr ve hisa me kirîne û zanîne ku diz ketine nêva dêrê.
- (15) Êdî min seh kir ku ji der ve bûye qal û meqal û qûrî û şemate.

(16) Weko oldaşan ji dûr ve seha qal û meqal kirî, ew jî ser neqebê revîne, min jî di dêrê da qesda neqebê kir ku guya ez jî ji dêrê biderkevim û ji neqebê birevim.

(17) Ez çûme derê neqebê, min dît ku ji derve filan derê neqebê girtine û çend file bi tîfing û çek li ber neqebê hazir westane.

(18) Êdî umêda min ji neqebê hatiye birîn û muteheyîr mayîm û hatime derê dêrê ku ji derve hîn mîqdarê deh file û êrêsan bi çek westane û li derê dêrê dixebitin.

(19) Îcarê min mullaheze bi xwe kir ku çare nine evne dê min destegîr bikin, bê hîle nabê, lazime ku ez bi lepekê ji van xelas bibim.

(20) Min (r. 92) berê dêrê ji hindur ve daxistibû, file lê dixebitin ku goya bi terzekî vekin û yaxo bişkînin.

(21) Îcarê ez çûme nêveka dêrê min şemdanekê bilind û 'eba xwe avêt ser şemdanê.

(22) Ê ku ji dûr ve bidîta, mirof hesêb dikirin.

(23) Îcarê ez hatim piştê derî ji nişkê ve min derî vekirî, xwe daye piştê derî û pêve zeliqîm.

(24) Weko derî ji nişkê ve vebûyî, du sê tifeng vebûyî nêva derî, duyêd tifengan tijî nêva derî bûyî û gule çûne nêva dêrê û filan dayne şîr û tifengan weh bi kom hicum kirêne kenarê şemdanê ku 'eba min li ser bûyî.

(25) Ez jî li piştê derî bûm, weko koma filan ji min xericîn, min xwe li derî dayî, ez biderketim û ji der ve fileyek hate berayiya min û min ew jî bi xençerê hingaftî.

(26) Xulase bi wê min bazdaye û ji pêyê bûyî qal û meqala filan.

(27) Lakin negihane toza min, ez xelas bûyî û hatim ku oldaşêd min ketine xêra min û weko ewan jî ez dîtî şa bûyn û me ew mal birine Diyarbekrê û frotin û jê xelas bûyn.

Hikayeta Bîst û sê

(1) Neql dikin ku Çeteçî 'Ebdullah Paşa waliyê Erziromê, bi şev diz ketine malekê û mîqdarekê diraf û eşya birîn.

(2) Subeyê xweyê malê hatiye, ehwal ji boyê Çeteçî Paşa neql kirî, îfada halê xwe kir ku îşev malê min hatiye dizîn.

(3) Îcarê Çeteçî ji wî mirofî sual kir ku çewanê bûne, xanî kelaştine weyaxo kusanê bûye?

- (4) Ewî mirofî îfade kir ku ne şimêkêd derî bideranîne û hatine malê û dizî kirine.
- (5) Îcarê Çeteçî dibêje wî mirofê xweyê malê ku tu here ewî derê malê di gel şimêkê biderîne û bide pišta hemalekî ji boyê min bîne û dayne nêva serayê.
- (6) Ez pirsiyarê ji derê şimêkê dikim û dizê te peyda dikim û malê distînim.
- (7) Îcarê ew mirof jî eger çî evê xeberê bawer naketin, lakin bazerûr diçitin, derî û şimêkê didete pišta hemalekî û tênîte nêva serayê û dispêrine dîwarê.
- (8) Çeteçî dibêjite xweyê malê ku to îroke biçe, sube weqtê dîwanê were êre, ez dê ji derî pirsiyar bikim û dizê te peyda û malê çûyî biderînim.
- (9) Xweyê malê tête mala xwe û ev xebere di nêva bajêr da belav dibitin ku şûlekî weha qewimiye û Çeteçî jî derî û şimêkê birîne serayê guya dê ji derî tehqîq biketin ku diz kî ne.
- (10) Eve (r. 93) şûla 'ecêbe, Paşa dîn bûye, derî çawanê cewab didetin ku diz kî ye?
- (11) Diz jî meger vê seh dikin û dikenin ku belê maşallah paşayê me mirofekî bi hikm e, mesxere dikin.
- (12) Her kes subeyê ji boyê seyr û temaşa û meraq berhev hewşa serayê dibin û Çeteçî jî ji pencere nezer dike û berê tenbiye mirofekî diketin topozekê bigire destê xwe û li nik derî bisekine, weko ez dibêjim bi quwet tu çend topozekan li derî bide û paşê bisekine û guhê xwe bide derî, ez ji te pirsiyar dikim ku derî çî dibêjîtin, tu cewabê bide ku belê derî dê niha cewabê bidetin.
- (13) Meger xelq jî zav hatine seyrê ku bibînin Paşa çawanê pirsiyar dê ji derî biketin.
- (14) Paşayî çend nefer tebdîl jî tenbiye kirîne di nêva seyêrciyan bigerin û guhdar bin û çavêd we jî li xelqê bitin, weko ji derî îşaret dibitin, hûn miqyed bin, her çî kes lixwe difikire, ewan mirofan bigirin û bênine nik min.
- (15) Meger du nefer ji wan dizan jî hazirê temaşayê bûyne.
- (16) Îcarê dîsanê Paşa gazî wî mirofê ku mamurê kutana derî diketin û emrê wî diketin ku derî biqute, bilanê dizan rast bibêje, û ger ne paşê ez wî disojim.
- (17) Ew mirofê mamur, dîsanê bi tekrar bi topozê li derî didetin, paşê dîsanê guhê xwe didete derî, guya cewabê jê distîne û xelqê temaşaker jî hemû lê nezer dikin, hin dikenin û hin teeccub dikin.

(18) Îcarê ew mirofê mamurê derî gazî diketin ku belê efendim derî saloxê dizan didetin, di vê komê da ew mirof hazirin û ji milêd wan her yekî, marek ji boyê 'elamet daliqîne.

(19) Weko mamurê derîqutanê evê xeberê dibêje, meger ew herdu diz bi şibe dikevin û li milêd xwe difekirin û ew mirofêd tebdîl, weko ewan du mirofan bi vî terzê dibînin, filhal ewan herdukan digirin û ténite nik Paşayî û ehwal ji boyê Paşayî neql dikin ku belê weko mamurê derî behsa maran kirî, ev herdu mirofne, bi şibe bûyîn, evne li milêd xwe fikirîn.

(20) Îcarê Paşa emirê wan herdu mirofan diketin, ku hûn diz in, rastî bibêjin û ger ne dê we qetl bikim.

(21) Berê ew herdu mirof înkâr dikin, Paşa dibêje ku elbete dê hûn rastî bibêjin û ger ne çare tunê ne.

(22) Weko hûn rast bibêjin, dibitin ku belko xelas bibitin û ger ne elbete we qetil dikim.

(23) Îcarê dizan îqrar kirîne ku belê fî-elwaqî'î em diz in, du oldaşêd me jî heyn li filan meheleyê û mal jî li filan derê veşartî ye.

(24) (r. 94) Îcarê Paşa virêdiketin ewan herdu dizêd oldaşêd wan digiritên û tînitin û mal jî bidertînin.

(25) Îcarê ewan çar nefer dizan virêdiketin û her yekî li derîkî kelê bi dar da diketin.

(26) Ev qeziye ji eqil û derîta Çeteçî 'Ebdullah Paşa yadgar maye û tète neql kirin.

Hikayeta Bîst û Çarê

(1) Riwayet dikin ku di zemanê pêşîn da ji ekradêd xeymenîşêd Bohtan ji tayfa Dudêran, mirofekî halxweş û xweyî rizq û mal û dewlet hebûye, navê Mam Bapîr û bi xwe jî ixtiyar.

(2) Lakin ehlê xêmnê, kê m têne qesebe û bajêran.

(3) Rojekê weh îtîfaq diqewimitin ku ew Mam Bapîr ji boyê şûlekê tète hêseta Berêspî û du sê rojan ji boyê şûla xwe li wê derê sakin dibitin.

(4) Roja eynê xweyê mal dibêjite Mam Bapîr ku tu jî were em biçne xutbeyê, îroke eyn e.

(5) Îcarê Mam Bapîr jî di gel xweyê malê diçite mizgeftê û rûtinin û guhdarî xutbeyê dikin.

- (6) Lakin ewî Mam Bapîrî, meger qet tu caran mizgeft û xutbe nedîtiye.
- (7) Îcarê Mam Bapîr dibîne ku îmam li ser mînberê di xutbeyê da navêd çar yaran û navêd hezretî 'Ebbas û hezretî Hemze û hezretî Hesên û Huseyn dixwonitin.
- (8) Evne jî nimêjê di gel îmam dikin û biderdikevin û têne malêd xwe.
- (9) Îcarê Mam Bapîr dibêjite xweyê malê ku eve îmamê we çî tov mirofekê bê hurmet e, di xutbeyê da navêd cîranêd min xwend û gazî wan hemûyan kir, ji boyê çî qet navê min jî nexwend û gazî min jî nekirî.
- (10) Ez xwe bi dewlet û malî ji wan cîranan hemû zêdetir im.
- (11) Îcarê xweyê malê dizane ev Mam Bapîra cahil û ehmeq e.
- (12) Êdî dibêjite Mam Bapîrê ku ewan cîranêd te îkrama îmamî kirîne, pez û tişt dayîne xutbeyê, lewranê ew jî navêd wan di xutbeyê da zikir diketin.
- (13) Îcarê Mam Bapîr qewî ebramê (?) li xweyê malê diketin ku rabe here nik îmamî û di gel wî xeber bide ku eyina dinî, ez tême êre û ji boyê îmamî sî pezî hediye tînim.
- (14) Elbet dê navê min di xutbeyê da bixwonitin.
- (15) Îcarê xweyê malê jî diçite nik îmamî, ehwalî îfade diketin ku belê ji ekradan mirofekî weha ehmeq hatiye û bûye mêwanê min, îroke di xutbeyê da we navêd sehaban zikir kiriye, ewî we zen biriye ku ew (r. 95) navêd cîranêd wî ne û qewî ji we sil bûye ku ez ji wan mirofêd ew di xutbeyê da zikir diketin, ji hemûyan xweyî maltir im, ji boyê çî navê min zikir naketin.
- (16) Ji te iltimas diketin ku vê eyina ku têtin tu navê wî jî di xutbeyê da zikir bikî.
- (17) We'd kiriye dê sî pezî ji boyê te hediye bînitin.
- (18) Îcarê îmam weko ev xebera seh kirî, dikenîtin û dibêje bilanê wesên bitin ku ez eyina dinê navê Mam Bapîrî jî di xutbeyê da zikir bikim.
- (19) Xweyê malê cewabê ji boyê Mam Bapîrî tînitin, ew jî şabûyî diçite mala xwe û eyina dinê filwaqî'î sî pezan ji boyê îmamî tînitin û têtê hêşeta Berêspî û dîsanê li xweyê mala xwe dibite mêwan, pezan ji boyê îmamî virêdiketin.
- (20) Weqtê selayê Mam Bapîr di gel xweyê malê, ew jî têne xutbeyê.
- (21) Îmam diçite ser mînberê.

- (22) Îcarê Mam Bapîr jî ji pêş ve runiştîye û muntezir e ku îmam navê wî bixwonitin.
- (23) Îcarê îmam dibêje ku “Eyyûh’el-Mam Bapîr enteke el-kelb el-kebîr. ”, muezzin difikire ku îmam berê xutbeyê ev kelama got, we zen dibetin ku belko îmam xeletî ye, îşaret diketin.
- (24) Îcarê îmam dibêjîtin ku lê “Mîn’el exnam 'eşerûn we lek 'eşre”
- (25) Îcarê êdî muezzîn deng naketin û xetîb xutbeyê dixwonitin û nimêjê tamam diketin, wekî biderdikevin êdî xetîb ehwalê ji boyê muezzin beyan diketin û deh pezan didete muezzinê û bîst pezan jî bi xwe dixwetin.
- (26) Mam Bapîr jî şabûyî diçite nêva ekradan ku îroke min sî pez dayî îmamî, navê xwe li xutbeyê daye xwendin, êdî ez jî weko xwendkarê ekradan im.
- (27) Lewranê navê xwendkarî jî di xutbeyê da zikir dikin û navê min jî îroke di xutbeyê da zikir bûye.
- (28) Îcarê ekradan bi mesxere digotîne wî Mam Bapîrî, xwendkarê bijî.
- (29) Wisan ehmeq bû ku fehma vê xeberê nedikir û li nik xelqê fexr dikir ku belê goya ku ez bi rastî xwendkar im.

Hikayeta Bîst û Pêncê

- (1) Ekrad me'lûm e ku pez û kerîyan dibine Şam û 'Erebistanê û Istanbulê.
- (2) Neql dikin ku carekê ji tayfa Birûkan, mirofek navê Sîso pez dibete Istanbulê ji boyê firotinê.
- (3) Kulavê şivanan li ser milê Sîso, li dora Istanbulê kerîyê xwe diçêrîne.
- (4) Rojekê Sultan Murad di gel lalayê xwe, herdu tebdîl lîbas, li (r. 96) sûreta derwêşan digerin û li etrafêd Istanbulê seyr û geşt dikin û tèn rastê Sîso tèn ku pezê xwe diçêrîne.
- (5) Sultan Murad jî di 'emrê xwe da ekrad û şivan bi vê qiyafetê esla nedîtiye.
- (6) Îcarê Sultan Murad weko Sîso bi vê terzê xerîb dibînitin, qewî te'ecub diketin û dibêje lalayê ku lala eve çî terz mirof e ku naşibe mirofêd Istanbulê, ser û çav bi pirç û me'de poş e?
- (7) Lale dibêjîtin ku eve ji mirofêd Enatolê û ekradan in, pez înane firotinê.

- (8) Îcarê Sultan Murad dibêje lalayî ku em demekê biçine nik vî mirofê 'ecêb-el menzer kanê ku çî terz mirof e.
- (9) Êdî xundkar û lala herdu bi wê libasê derwêşiyê diçine nik şivanî û silav didin şivan silav vedigirên û ser seran û ser çawan baba derwêş dibêjîtin.
- (10) Îcarê xundkar û lala rûtinin, ew şivan qelunekê qotik heye tijî diketin û tînitin û didete derwêşan û îkrama wan diketin.
- (11) 'Ecêb xeberan di gel wan didetin û dibêje wan nan û şîr heye, ez dê ji boyê we bînim bixwen.
- (12) Paşê Sultan Murad dibêjîtin ku em têr in, hewceyê xwerinê nîne.
- (13) Şivan israr û îlhahê diketin ku nabê, elbette hûn dê tiştêkî li nik min bixwen, bê xwerin nabîtin.
- (14) 'Ereb dibêjin ku “Min zar heyya we lem yezeq şey-i kenem zareh meyta-i”, ez bi xweşî navê mirinê qebûl nakim û bê xwarin we bernadim.
- (15) Sultan Murad ji van xeberêd şivanî hez dike û dibêje ku bilanê bitin, em îkrama te qebûl dikin, şîr û nanî bîne.
- (16) Îcarê şivan ji piştî xwe hebanê vediketin û qodkê bidertêne û diçe çend pezan didoşitin û tînitin û nanî datînitin.
- (17) Xundkar û lala ji wî şîrî hindekî dixwen.
- (18) Paşê îcarê şivan jî ji derwêşan pirs û pirsîyar diketin ku hûn ji xelqê Istanbulê ne û ji ku ne?
- (19) Sultan Murad dibêjîtin ku belê em ji vî bajêrî ne.
- (20) Îcarê Sultan Murad dibêjîte şivanî ku Xwedê dihebînî, eger tu tîyî bajêrî, were bibe mêwanê min.
- (21) Îcarê şivan ji Sultan Muradî pirs diketin ku navê te çî ye, ez dê te li ku bibînim?
- (22) Xundkar cewab didetin ku navê min Baba Murad e, lakin mala min nêzokê sera xundkarî dibitin, tu were wê derê elbet min dibînî.
- (23) Îcarê ew herdu derwêş xatir ji şivanî dixwezin û diçine Istanbulê Serayê Humayunê.

(24) Lakin xundkar mexsus mirofekî tenbiye diketin ku li Bab Humayunê biweste û çavera bike ku şivanekî bi vê qiyafeyê û bi kulav dê bête vê terefê, weko tu wî şivanî dibînî, bêje ku mirofê (r. 97) Baba Murad im.

(25) Ewî şivanî bibe odeyekê mexsuse, bilanê rûnitin û cewabê ji boyê min bêne.

(26) Paşê du sê rojan şivan radibitin, du sê pezêd qelew hildigiritin û dajotin tete nêva Istanbulê.

(27) Pirs û pirsiyaran diketin sera Baba Murad li kê terefê ye.

(28) Xelq jî bi ser vî şivanî dikenin û mesxere dikin, heta ku tete nêzokê serayê, ew mirofê ku xundkarê mamur kiriye, ew rastê şivanî têtin û jê pirsiyar diketin ku tu pirsî kî dikî?

(29) Şivan dibêjîtin, Baba Murad heye, derwêş e di gel min bûye birak, ez li wî dipirsim û eve pezan jî min ji boyê birakê xwe hediye îname.

(30) Îcarê ew mirofê mamur bûyî, dibêje şivanî, belê ez eve mirofê Baba Murad im, were ez te bibeme menzelê.

(31) Pezan didete mirofekî dinê, ew mamur şivanî bi wê qiyafeta muhib û bikulav û darêd xwe jî di kulavê ra kiriye, wisanê dibete odeyekê mezin û mucella.

(32) Şivan çaroxêd xwe bidertêne û rûnitin.

(33) Îcarê ew mirofê mamur cewabê ji boyê xundkarî dibetin ku belê li ser emrê hezreta we şivan hatiye û min biriye odeyê, çi emir dikin.

(34) Îcarê Sultan Murad dîsanê xwe tebdîl libas diketin, di gel lalayî di cilêd dewrêşan herdu tene odeyê nik şivanî.

(35) Selamû 'eleyk, xweş û bêş dikin.

(36) Lakin dîsanê şivan padşahiya Sultan Muradî qet fehm naketin.

(37) Sultan Murad emir diketin, qawayê tînin û fincanan da didene wan.

(38) Îcarê şivan dibêje ku qerdaşo, eve şîrêd we ji çi reş û tal e û eve kodkêd we ji boyê çi wisanê biçûk in?

(39) Devê min dişewite, ez di vê da şîrê naxwim, bilanê kodka min tijî ken, ez ê dê nanê hûr bikim û bixwom.

- (40) Îcarê xundkar dikenitin û emir diketin, mesînekê qawê çêdikin û tînin.
- (41) Îcarê Sîsoyê şivan qawê tijî kodekî diketin û nanê hûr diketin û bi kevçikan dixwetin û dibêje xundkarê, welleh qerdaşo şîrê we nexweş e û tal e.
- (42) Îcarê Sîso li balgê û di mînderêd odeyê mêze diketin ku qumaşêd zerlewne guman diketin ku evine çît in.
- (43) Dîsanê dibêje Sultan Muradî ku qerdaşo, te eve çîtêd sipehî ji ku kirîne?
- (44) Hindekî ji van çîtan ji boyê zarokêd me jî bikirîn, ez dê pezê bifroşim û paran bide.
- (45) Sultan Murad dibêje ku qewî qenc dibitin.
- (46) Paşî mîqdarekê Sîso li odeyê û yalozê û esasê tedarika dîwanê difikirê û dibêje Sultan Murad ku qerdaşo, ev xaniyene te daye çêkirin yan ji (r. 98) babê ji boyê te mîras maye?
- (47) Îcarê Sultan Murad dibêje ku ne evene ji boyê min mîras mayine.
- (48) Îcarê Sîso serê xwe dihejîne ku min zanî ku evene şûla derwêşan nînin.
- (49) Xulase qederekî Sîso dimîne, îcarê desturê dixwaze ku izna min biden, bi destura we ez biçim pezêd min mişemirîn.
- (50) Îcarê xundkar emir diketin, bilanê mirofek ji terefê me danê biçite ser pezêd we bifiroşitin, ez êdî te bernadim.
- (51) Mirofek biçite ser pezê Sîsoyî.
- (52) Xundkar emir diketin şivanê dibine hemamê û tînin, libasêd faxîre dikene ber.
- (53) Îcarê hêj me'lûmê Sîso dibitin ku ev Baba Muradê xundkar e.
- (54) Weko îcarê xundkarê dibînitin, biçite piyan ku sultanê min evî binêyê qisûrê kiriye bibexşîne.
- (55) Êdî Sultan Murad îkram û 'ezaza Sîso diketin û pezêd wî difroşin, û zaf îhsan diketin û gundekî ji gundêd Bazîdê baberat îhsanê Sîsoyî diketin.
- (56) Elan ji wê sîlsîleyê mirof heyn bûyne şêxêd tayfa Birûkan, li gundêd Kerberanan sakin dibin.

Hikayeta Bîst û Şeşê

(1) Neql dikin ku li van nêzokan mirofekî reşîd û camêr, dîsanê bi esl ekrad, lakin sakinêd Wanê, navê Çinar Axa digotin, jinekê xwe yê sipehî hebûye, navê Leylê.

(2) Wisanê îqtîza diketin ku ew Çinar Axa diçite xurbetê û li Bexdayê, dibite delobaşî û mudeyekî dimînitin.

(3) Meger li Wanê jina wî, Leylê ku zaf sipehî bûye, ji xanedanêd waniyan Îbrahîm Axa lawekî ciwan hevûdu bi xef hebandine û carinan bi dizî ew û Îbrahîm Axa têtin û diçite mala Çinar Axayî û di gel jina Çinar Axayî Leylê mesahebetê diketin.

(4) Eger çî ev şûla bi xef e, lakin êre da pê da cîran dikevîne şibheyê û eve gufteguya cizwî di nêva 'ewanan da tête gotin.

(5) Li wan eyaman mirofek ji Wanê diçite rumyetê û digehte Bexdayê û diçite nik Çinar Axayî wanî hemşerî li nik wî sakin dibitin.

(6) Îcarê Çinar Axa pirsra Wanê û mala xwe û cîranan hemûyan yek bi yek ji wî mirofê ku ji Wanê nû hatiye diketin.

(7) Berê ew mirof rastiya ehwalê jina wî nabêjîtin, xef diketin.

(8) Paşê Çinar Axa bi nehanî û dizî ewî mirofî didete sondê ku rast bibêje ku ehwala malê çî ye.

(9) Lewranê çend carekê ez mala xwe di xewn da dibînim, qewî tari ye, **(r. 99)** elbete kederek heye, tu dê rastî bibêjî.

(10) Îcarê ew mirofê hatî jî bi xef ehwala jina wî ku bi vê terzê dibêjin, keyfîyetê ji boyê Çinar Axayî weko bihîstî neql û beyan diketin.

(11) Weko Çinar Axayî ehwalê seh diketin êdî hesêbke, diçite dereca helakê. Subeyê ji çiraxêd xwe yekî, li cihê xwe dikete wekîl û bi xwe di gel du xulaman ji Bexdayê bi der dikevîtin ku li nêzokê Bexdayê şûlekî min heye, heta çend rojekan dibînim û dîsanê bi şûve dêm.

(12) Îcarê di gel du mirofêd xwe dajotin û têtin gundek nêzokê Wanê.

(13) Lakin tebdîlê libas bitin, kes nas naketin û têtin evê şûlê ji hindek cîranan didete pirsiyarkirin ku belê fi'l-waqî' ev xebere tête gotin.

- (14) Ew Îbrahîm Axa jî carinan bi xef bi şev tête mala wî û diçitin.
- (15) Îcarê ew Çinar Axa di gel herdu mirofêd xwe tête gundekî ku Şahbaxî dibêjin, nîv saet ji Wanê, li wê derê ji boyê xwe qonaxekî digiritin ku em xerîb in û li wê derê sakin dibitin.
- (16) Weko dibite şev, her şevê peyatî bi çek û sîlah têtin û li xerabeyekê ji dûr ve li malê dipêtin.
- (17) Du şev wiha, şeva siyê, dibînitin ku belê nîvê şevê bûyî, ew Îbrahîm Axa hatî ji kulekê hêdî gazî kirî, ji hindurê jî derî vekirin, Îbrahîm çûye mala wî.
- (18) Bi çavê xwe weko dibîne, êdî mecala Çinarî namînitin.
- (19) Îcarê bi xwe jî bi tenê bûye, radibitin ji ser xaniyê ji cihekî kulekê tête nêva malê û hêdî têtin ku belê zarokêd wî û da wî hemû li odeyekê razane û jina wî Leylê çûye odeyekê dî ew û Îbrahîm Axa li nik yekûdu rûniştine û xeber didin.
- (20) Îcarê Çinar dest kiriye tepançeyê û ji nişkê ve çûye odeyê hindurê, kiriye gazî Îbrahîm, seyê pîsê san (!) ne ez Çinar im.
- (21) Êdî Îbrahîm jî û jinikê Leylê jî herdukan ixtiyar ji destan çûbe, tirsane û xwe şaş kirîne, esla mecala xeber û lipatê nebûye û ji cihê bûyî nebizivîne.
- (22) Îcarê Çinarî keta tepançeyê bere singê Îbrahîm Axayî daye û keta dinê tepançeyê bere singê jina xwe Leylê daye, di cih da mayî, herdu jî dayine ber xençeran tamam kirî.
- (23) Bi dengê tepançeyê êdî da Çinarê û du kurêd zarok hebûye, ji ode dinê biderdikevin û tîn û cîran jî bi dengê şemateyê tîn û Çinarî dibînin.
- (24) Wey Çinar Axa tu kengî hatî û eve çî ehwal e dibêjin.
- (25) Îcarê Çinar laşê Îbrahîm Axa jî û laşê jina xwe Leyliyê jî bidertîne ber derî û serê herduyan jî jê diketin, cuda cuda datînite ser singêd wan.
- (26) **(r. 100)** Subeyê eve şûla di nêva Wanê şayi' bûyî, xeber birin ji boyê birayêd Îbrahîm Axayî û birayêd Leylê virêkirin û laşêd xwe birin û defn kirin.
- (27) Ev cewabe gihaye sem'a paşayê Wanê ku belê şûlekî weha qewimiye.
- (28) Çinar bi xef ji Bexdayê hatiye û îşeve Îbrahîm Axa di mala xwe da dîtiye, ew jî jina xwe jî herdu jî qetl kirîne.

(29) Îcarê paşa jî virêdiketin û Çinar Axayî gazî huzura xwe diketin ku aferîn sed aferîn û xelatekê jî didete Çinarî û ji boyê xwe dikete delîbaşî.

(30) Birayêd Îbrahîm Axa û Leyliyê eger çi mirofine me'ruf bûn di Wanê da û ji deh neferan zêde bûn., lakin esla û qet'a qaderê de'wa û dijminayî yekî nebûn û kesek ji boyê vê şûlê neçûye serxweşiya wan jî.

(31) Lewranê di nêv ehlê ekrad ev şûla qewî zêde 'ar e.

(32) Îcarê paşê ew Çinar Axa êdî tobe kirî, nezewicî, heta wefat kiriye.

Hikayeta Bîst û heftê

(1) Neql dikin ku di weqtê Îbrahîm Xan Mîrê Hekariyan bûyî, axayê tayfa Şikeftiyan Îsmâil Axayê Mezin jî li nik wî bûyî.

(2) Li deşta Geverê konêd xwe vedabûn, meger dijminayî di nêva Îsmâil Axayê Şikeftî û Terlan Axayê tayfa Herkiyan hebûye.

(3) Terlan Axayê Herkî dizekî qewî zêde meşhur li nik hebûye, navê Domo.

(4) Îcarê Terlan Axa bi xef dibêjîte Domoyî ku te bibînim, eger tu diçî û bi dizî guleyekê davêyi Îsmâil Axayê Şikeftî û dikujî, ez dê hinde pez û dewarî bideme te.

(5) Îcarê Domo jî radibitin ji xaka Behdînan tedarika xwe diketin û li hespekî baş siwar dibitin û tete nêva êla Şikeftiyan.

(6) Bi behana dewarkirîne û tete nêzokê konê Îsmâil Axayî.

(7) Bi şev hespê xwe li dorê konê di newalekê da girê didetin.

(8) Weko nîvê şevê dibitin, Domo şeşxaneyê digirte destê xwe û bi çarlepî devarûyî, weko kelban disorike û tete pêşiya konê malê.

(9) Lakin pawan jî pê nahesin, devarû dikevte nêva hespan ku li ber derê konê malê girêdayne.

(10) Îsmâil Axa jî di konê malê da li ser cihê xwe rûniştiye, qalûnê vedexwetin ku paşî razêtin.

(11) Domo şeşxaneyê digirte armancê û bi kêfa xwe diçeqîne.

(12) Bi emrê Xwedê tîzek agirê digire, lakin ji hindurê wê şeşxanê agirê nagiritin.

- (13) Êdî Îsmaîl Axa ji pêş ve dibînitin ku exzoniya tîfingê ji nêva (r. 101) hespan biriqî û rabû filhal didete tepançeyê û gazî pawanê diketin.
- (14) Êdî bi mecala dibite hewarê, Domo mecala têz kirinê namînitin, etrafan li Domoyî wertînin û Domoyî digirin û tînine nik Îsmaîl Axayî.
- (15) Ekrad jî ji zoman tên û berhev dibin û qesda kuştina Domoyî dikin.
- (16) Lakin Îsmaîl Axa nahêlitin ku Domoyî bikujin.
- (17) Îcarê Îsmaîl Axa Domoyî tînite nik xwe û didete xeberdan ku kuro tu çi kes î û ji boyê çi te eve şûla kir û tu ji ku yî?
- (18) Rast bibêje, ez dê te aza bikem.
- (19) Îcarê Domo rastiya ehwal û şandina Terlan Axayî pêk ve rast û dirûst dibêjite Îsmaîl Axayî.
- (20) Kur û birayêd wî qewî gem dikojin ku lêdin û Domoyî bikujin, Îsmaîl Axa razî nabitin û dibêje ku aferîn ji boyê Domoyî ku xebera axayê xwe girtiye û bi emrê wî û ger ne min û Domoyî tu dijminayî di gel yekûdu nînin, belko dijminê min Terlan Axa ye.
- (21) Ev e xulam e û gunahê xulamî nînin û ‘elakulî ez Domoyî nakujim.
- (22) Îcarê subeyê xelatekê jî didete Domoyî û aza diketin û çend siwaran jî di gel Domoyî virê diketin ku bibine silametiye û paşê vegerin.
- (23) Lakin dibêje Domoyî ku here bibêje axayê xwe Terlan Axa ku Îsmaîl Axa digot ku dijmin ew e ku ji dijminê bi destê xwe aşkara li meydanê heyfê bistînitin, wesanê bi xef û dizî mirof dane kuştin, ew karê muna ne.
- (24) Bilanê di weqtê xwe da hazir bibe, ew xulamêkî bi dizî virê dikete kuştina min, lakin ez dê bi xwe di gel koma bira û pismaman bême derê malê ji boyê kuştina wî, êdî kanê Xwedê didete kê û kî dimiritin û kî dimînitin.
- (25) Îcarê weko Îsmaîl Axayî ev xebera gote Domoyî û aza kirî, destûr dayê.
- (26) Domo jî hat û ehwalê xwe û girtinê û qewlêd Îsmaîl Axayî hemû jî gotine Terlan Axayê Herkî.
- (27) Lakin Terlan wesanê hesêb kir ku belê Îsmaîl Axayê Şikefî, medheke ji boyê xwe kiriye, zena hicuma Îsmaîl Axayî nekirin.

- (28) Lewrranê di nêva wan da mesafa pênce saetî hebû.
- (29) Êla Şikeftiyan li Geverê bû û êla Herkiyan li cihê Behdînan li nahya Zêbarê bûye.
- (30) Îcarê Îsmâil Axayî heman rojekê di pêçûna Domoyî siwarêd êla xwe yekane heft sed siwarî dibijêritin û tenbîye diketin ku her yek ji we azoxa şeş rojan di gel xwe hilgirin.
- (31) Îcarê Îsmâil Axa di gel heft sed siwarêd bijare ji nêva êlê siwar dibitin û berê xwe didete Zêbarê û diçin û bi şev heta subeyê bi rê diçin û dajon.
- (32) Weko dibe roj, li cihekî nepenî (r. 102) peya dibin û radizên û rahet dibin.
- (33) Heta dîsanê dibite şev, siwar dibin û dajon.
- (34) Şeva çarê nîva şevê diçine nêzokê malêd Herkiyan.
- (35) Ji dûrve şivanekî digirin û pîrsa zoma Terlan Axayî dikin û ewî şivanê di gel xwe dibin.
- (36) Berê fecrê dora malê Terlan Axayî digirin û ew heft sed siwara pêkve destekî agirê didine konê Terlan Axayî.
- (37) Qiyamet di nêva malan ji nişkê ve radibitin.
- (38) Sê gule weha di nêva konê malê da li Terlan Axayî dikeftin û ji xelqê malê jî jin û mêr û zarok hevde mirof def'et telef bûyî.
- (39) Êdî Îsmâil Axa dibêje siwarêd xwe ku eve bes e, mirada min Terlan Axa bû, hate kuştin û hinde telefîyat bûyî, eve welatê xerîban e û êla Herkiyan zaf in, paşî berhev dibin, êdî kitek ji me xelas nabê.
- (40) Îcarê Îsmâil Axa di gel siwarêd xwe vedigerin.
- (41) Lakin li êla Herkiyan dibe qûrî û hewarê ku belê Îsmâil Axayê Şikeftî hat û bi ser mala Terlan Axayî da girtî, Terlan Axa kuştin û vegeriyan.
- (42) Êdî siwarêd gaziye tîn û mîqdarî sê hezar siwaran pev dikevîtin û li pê Îsmâil Axayê Şikeftî tîn.
- (43) Wê rojê weqtê 'esrê xwe digehînine Îsmâil Axayî.
- (44) Îcarê siwarêd Şikeftiyan jî donekê didine Herkiyan û dest bi şerî dikin.

(45) Îsmaîl Axa dibêjite siwarêd xwe ku gelî sey pisanan, eve welatê biyaniyan e û Herkî ne, xîret lazim e ger ne kesek ji we cewabê nabete malan.

(46) Li wê derê şerekî ceng mexlûbe dikin.

(47) Siwarêd Şikeftiyan li tayfa Herkiyan xalib dibin û leşkerê Herkiyan dişkên û direvin.

(48) Nêzokê panced exterman distînin û gelek mirof ji herdu kenaran telef dibin.

(49) Ji wê rojê heta niha jî ew dijminî di nêva tayfeya Şikeftî û Herkiyan baqî ye.

(50) Li kî derê rast yekûdu bên û firset bibînin, yekûdu dikujin.

(51) Fewta firsetê nakin û dayîm Herkî li tola xwîna Terlan Axayî digeriyan.

Hikayeta Bîst û Heştê

(1) Neqlî dikin ku di eyamê xîlafeta Sultan Ehmed danê ji qeseba Xoşnavê Mela Mihemed navê mirofekî zêde zekî û ehlê ilm û kemal peyda bûyî ku li wan kenaran şohret dîtî.

(2) Îcarê ji Xoşnavê hatiye bajêrê Silêmanî û li wê derê jî mudeyekê miderisî kirî, sakin bûyî.

(3) Lakin feqîrulhal malê dinyayê tunîne.

(4) (r. 103) Îcarê ehlê Silêmaniye dayîm digotine Mela Mihemedî ku qenc e tu biçeyî Istanbulê, tu hinde fazl û alim û kemal î, elbete dê xundkar wezîfeyê weyaxo gundekî li te îhsan biketin, ji vê jariyê xelas dibî.

(5) Îcarê Mela Mihemedî jî tedarika xwe her çi ye dîtî, çûye Istanbulê.

(6) Dema ku daxilê Istenbulê bûyî, çûye medreseyekê, lakin ser û guh perîşan, herçend got ku ez mela me û ibraza kemal û 'emel û ilm kiriye jî çendan kesekî guhdarî Mela Mihemedî nekirin.

(7) Her çi ye çend rojekan di nêva Istanbulê sakin bûyî, geh çûye nik muderisan û gah çûye nik Şeyxulîslamê îfadeyê hal kirî, îmtîhan teleb kir û hêviya wezîfeyekê kirî, esla kesekî guh nedaye Mela Mihemedî.

(8) 'Erîze daye, dîsanê tu jê çênebûye.

(9) Naçar mayî bi xwe jî ciwan bûye, çûye çend rojekan paletî kiriye û çend quruş diraf peyda kirî.

(10) Biriye daye destekî libasêd reş ê êrisyan ji serî heta piyan daye çêkirin û ênaye rojekê subeyê ew destê libasêd êrisyan ber kiriye û esayek girtiye destê xwe, rast hatiye derê Şeyxulîslamî û gotiye mirofêd wî ku şûla min di gel Şeyxulîslamî heye, lazim e ku biçime huzûrê.

(11) Hemelan jî destûr dayê, Mela Mihemed di qiyafeta êrisan da rast diçite huzûra Şeyxulîslamî û ser dihingive Şeyxulîslam, dibêje ku êris were rûnê.

(12) Mela Mihemed rûtinitin û îfada Şeyxulîslamî diketin ku efendî îşeve min di xewa xwe danê dîtiye ku dîne îslamê heq e, ez hatime nik hezreta we ku misilman bibim.

(13) Weko Şeyxulîslam evê xeberê ji êrisê dibihitin, kêfxweş bûyî, şadibitin, ku li ser seran û ser çavan hatî.

(14) Êrisî tînite nêzokê û kelîmeyê şhadet dibêjite Mela Mihemed û guya ji nûve misilman diketin û gazî mirofêd xwe diketin ku zû evê bibine hemamê û destekî cilêd melatî faxire bikene ber vî mirofî û zû bênine êre.

(15) Şeyxulîslam Mela Mihemedî virêdikete hemamê û bi xwe tezkîre diniwîse ji boyê xundkarê ku ji yên dewleta hezreta we, îroke êrisek bixwe bi riza hatiye û misilman bûyî, min virêkiriye hemamê, lakin min nav danenayiye, mewqûfê emrê cenabê xundkarê ye.

(16) Bi xeyrê ji wê jî dîsanê Şeyxulîslam tezkîre nivîsî ji boyê sedir'ezem û rical û kebaran ku ehwalekê weha qewimiye, mizgîn dane yekûdu û xundkarî qewî hez kirî.

(17) Emir kir ku bilanê navê lê daneynin heta ku ez jî dê bi xwe bême silaviya wî zatî û ewî bibînim û navekî mubarek li wî daynim.

(18) **(r. 104)** Xulase Mela Mihemedî dibine hemamê û libasêd melatî faxire dikine ber û bi şev xundkar bi xwe teşrîf dibete menzela Şeyxulîslamî û Mela Mihemedî dibînitin.

(19) Pê kêfxweş dibitin.

(20) Paşî îcarê xundkar emir diketin ku navekî minasib li wî êrisê ku guya misilman bûyî daynin.

(21) Paşî ew mirof bi xwe îfade diketin ku min bi xwe qewî meyla îsmê Mihemed heye.

(22) Îcarê xundkar emir diketin ku bilanê navê vî zatî Mihemed Efendî bitin.

(23) Xulase navê Mela Mihemedî Mihemed Efendî datînin û xundkar û erkan dewlet û rical, kibar qewî zêde zêr û hediye û îhsan dikin.

- (24) Subeyê melayekî tînin û tenbiye dikin ku her rojê were odeya Mihemed Efendî û genc miqeyed bibe û ewî bide xwendin.
- (25) Êdî her rojê me'lim têtin û dersa Mihemed Efendî weko zarokan elîf ba ta didete xwendin.
- (26) Lakin berê Mihemed Efendî zanînê kifş naketin, hêdî hêdî bi rojê Mela Mihemed weko Eflatûnê bi jor ve diçitin.
- (27) Di du mehan danê guya xetma quranê diketin.
- (28) Êdî me'lim îfada xundkar û şeyxulîslam diketin, ev Mihemed Efendî feyzê bi xwe bi xwe dixwînitin.
- (29) Êdî dibêjinê ku Mihemed Efendî yê feyzê xelas e, weha hêdî hêdî bi tadrîc Mela Mihemed di nêva du sê salan da li nik wan dibite melayê mezin û qewî di ilim danê fayîq dibitin.
- (30) Me'eheza ji berê da hinde salan ewî melatî û tehsîl kiriye.
- (31) Îcarê dîsanê Şeyxulîslam ziyafetekê umûmî diketin û ferman didene Mihemed Efendî feyzê ku belê mideris e û herkes di wê meclîsê da, ji xundkarî bigir heta Paşa û rical û kebaran, zêde bê hesêb îhsan ji boyê Mihemed Efendî virêkirîn.
- (32) Mîqdarê sêsed çarsed kîs diraf pev ketin û hediye behiye bê qiyas dayîne Mihemed Efendî û zaf teklîf dikirin ku were em te bizewicînin, lakin Mihemed Efendî jin û zarok li Silêmaniyê hebûn, eşkar nedikir.
- (33) Rojekê Mihemed Efendî çûye hizûra xundkarî, paşî du'a û senayê îfade kir, ev da'î bi esl ji Silêmaniyê me û li wan kenaran ilm qewî kême, ji saya we min ilm tehsîl kiriye, ez niyazê dikim ku çend kerêd gundan li bendeyî îhsan û berat bikeyî, da ez benî biçime welatê Silêmaniyê û li wê derê dersan bibêjim û neşra ilûman bikim, ji saya hezreta we 'alim û 'ilma di Kurdistanê da zaf bibin.
- (34) Îcarê xundkar rica Mihemed Efendî qebûl diketin û sê ker gundêd cesîme li **(r. 105)** ser Mihemed Efendî weqf diketin û ferman û beratan didetê û bi tîkrar xundkar û şeyxulîslam efendî û erkan dewlet her kesek mîqdarekê îhsanê ji boyê Mihemed Efendî virêdikin.

(35) Bi diraf û malekî zaf Mihemed Efendî me'zuz û mukerrem di gel bar û barxane û ferman û beratan ji Istanbulê virêdikin û emirnameyan jî didinê û dinûsin ku feyz Mihemed Efendî bi wan kenaran da hatiye, her kesek 'izzet û îkramê biken.

(36) Xulase-î kelam, Mela Mihemed pênc salêd wî tamam dibitin, ew jî têtin, bi dezgah û esbab û tecmîl tête bajêrê Silêmaniyê û ehalî diçine beraykê û bi îkram têtin li mala xwe sakin dibitin.

(37) Gundan zebt diketin û muderisî diketin.

(38) Lakin çend dostêd wî hebûne ji qedîm da ku gotine wî here Istanbulê, tu mezin dibî û gundan distînî.

(39) Îcarê ew Mela Mihemed bi xef dibêjîte dostêd xwe ku belê welleh ez çûme Istanbulê û pênc salan mayîm û hinde mal û esbab min înaye û gund berat kirîne.

(40) Lakin heta ez nebûme êris û ji nû ve misilman nebûm, evne ji boyê min ra miyesser nebûn.

(41) Belê welleh Istenbol cihekî qewî qewî qenc e.

(42) Lakin heta mirof ji nû ve misilman nekin rexbeta mirofî nakin û tiştêkî nadine mirofan.

(43) Êdî paş wê şûlê, navê Mela Mihemed mayî ku digotin Mela Mihemedê Êrisiyan.

(44) Wesanê meşhûr bûye.

(45) Belko heta niha jî ewladêd wî li wî bajêrê peyda dibin, Ellah 'elem ba el-sewab.

Hikayeta Bîst û Nehê

(1) Di berê niha li van nêzokan li deşta Bişêriyê ji 'eşayîrêd Beriyê ji tayfa Berazan kurmancekî jîra hebû navê Sîso.

(2) Ewî Sîsoyî du kur peyda bûyîn, navê yê mezin Kerhê û navê yê biçûk Ehmê.

(3) Lakin herdu jî zêde reşîd û dilêr û rimbaz û camêr, yanî bêmisel bûn.

(4) 'Emrê yê mezin bîst û 'emirê yê biçûk nozde salî.

(5) Lakin di nêva du sê salan danê, wisanê meşhur bûyîn, her çi koma ku Kerhê û Ehmê berê xwe bidanayê, elbet dê belav bikirana.

- (6) Ew herdu bira bi tenê diçûn, ji 'Erebêd 'Henzeyê û ji (r. 106) êla Şemarê 'ereban dewe didane ber xwe tînan.
- (7) Ji sed siwaran zêde 'ereb bi pê Kerhê û Ehmê diketin, eva herdu biran, ew siwarêd 'ereban belav û perîşan kirîn, te digot ku evne herdu jî 'eynê ecnî ne, wisanê fars û rimbaz û çapik siwar.
- (8) Xulase kelam, qewî zêde bi nav û deng bûyîn.
- (9) Mîqdarê sed mal jî ji êre da pêre da xwe dayne ser Kerhê û Ehmê bûyîne cîranêd wan.
- (10) Êdî ji xeyr bi navê Kerhê û Ehmê, êdî navê kesekî tunebûn û di gel ekrad û e'rebêd wan kenaran yeko yeko xwe hildawêtin û ji hemûyan talan dibirin.
- (11) Heta Eyûb Axayê Milî di gel heft sed siwarêd Milî hate ser mala Kerhê û Ehmê, herdu bira di gel sed siwaran siwar bûyîn û bere Eyûb Axayê Milî dayin û rûswa kirîn.
- (12) Êdî hîz û fizêd axayêd 'eşayîrêd wan kenaran nemayî û axayêd qedîm ji tayfa Beraziyan ji van herdu biran kirine dexesê û dayîm ketine qesda kuştina wan herdu biran.
- (13) Lakin çî fayde nedibirin dîsanê bûyî ku herçî firarêd qer'e û leşkeran jî li wan kenaran dibûn direvîn û dihatine li nik Kerhê û Ehmê, êdî xelas dibûn.
- (14) Ekradêd wan kenaran hemûyan ji Kerhê û Ehmê kirîne çavreşî û bûyîne dijminê bixef.
- (15) Lakin aşkar nakin û xwe bi xwe rû bi rû newêrine çûna ser Kerhê û Ehmê.
- (16) Paşan wisan qewimî ku çend mirofek ji qer'a Urfayê revîn û hatine nik wan herdu biran.
- (17) Waliyê Celê Namiq Paşa nivîsî, eve mirofane ji Eyûb Axayê Milî Îskanbaşî xwast.
- (18) Eve mirofene bi wê terefê da revîne elbet, ji te evane dixwezim.
- (19) Îcarê Eyûb Axayî 'erîze ji boyê Namiq Paşayî virêkir ku belê filwaqî'i ew firarî li vê kenarê ne.
- (20) Lakin du bira ji ekradêd Beraziyan peyda bûyne, ji feromayan qewî taxî û baxî ne, guh nadine xebera kesekî û me jî quweta wan nînin û bê leşkerê nîzamî û bê top evne nayne dest.
- (21) Îcarê Namiq Paşa leşkerê nîzamî û çar top hilgirtin û hate binya Urfayê.

(22) Cewab ji boyê Kerhê û Ehmê virêkirin ku bilanê ewan firariyan bînin û bi xwe jî bîn, ger ne dê leşker û nîzam û top dilêbîne ser malêd wan.

(23) Îcarê Kerhê û Ehmê ew mirove jî nedayîn û bi xwe jî nehatin.

(24) Malêd xwe barkirin û derxistine çiyayekî asê û herdu bira di gel pênceh siwarêd bijare mayîn.

(25) Subeyê Namiq Paşa di gel taburêd nîzamî û topan çûyîne binê çiyayê (r. 107) û deste girê dayîn û gelek jê siwarêd ekraan di gel Namiq Paşayî hebûn, Milan, Berazan û Mirdîsan.

(26) Nêzokê du hezar siwarê wan jî deste girê dabûn ku Kerhê û Ehmê herdu bira destvemalî, bi tenê ji çiyayê hatine xwarê û qesda tabura ekraan kirîn û rikêb kirine du hezar siwarê Namiq Paşa.

(27) Leşkerêd nîzamî seyr dikirin weko du gur çawanê dikevîne nêva kerekî pezî, ew siwar wisanê tîş tîş kirin, bila xîlaf ji çil jortir siwar avêtin û kuştin.

(28) Îcarê guleyek li enya Kerhê ketî, ji hespê danê kete xwarê weko birayê wî Ehmê dît ku birayê wî ji hespê da kete xwarê, êdî ew jî ji hespê peya bûyî û hat û xwe avête ser leşê birayê Kerhê.

(29) Îcarê Ehmê jî girtin û hepis kirin û malêd wan jî talan kirin û ew firarî jî istandin.

(30) Êdî Kerhê ji xwe filhal bi guleyê helak bûyî, Ehmê jî girtî birine Helebê, li meydana ûstûyê wî hingaftin.

(31) Niha jî camêriya wan herdu biran li etrafê Urfayê û deşta Bişêriyê dête kirin û xwahid wan hebûne, istiran li wan girê dane.

Hikayeta Sîhê

(1) Neql dikin ku Huseyîn Axayê Zilî, axayê tayfa Zîlan, dîsanê ji êlata xwe mirofekî qewî camêr û dilêr û zana hebû, Ehmedê Feqî digotin.

(2) Ew Ehmed ji boyê xwe kiribûye kehya û herçî amor û xisûsa Huseyîn Axayî hebûye hemû di dest wî Ehmedê Feqî danê bûye.

(3) Gelek li nik Huseyîn Axayî meqbul û merxub bûye kela ixtiyar bûyî, lakin ewî Huseyîn Axayî jî heft bira û ji panzdehan zêde pismam û torin hebûne.

- (4) Meger ewan birayêd axayê û torinan kullen ji vî Ehmedê Feqî kirîne çavreşî û derew û iftiran ketine qesda kuştina Ehmedê Feqî û bi her wechê ew birayêd Huseyîn Axa û torinêd wî hemû bûyne yek qesda û îhlaka Ehmedê Feqîyê û ji boyê vî şûlî gelek caran xemeza, Ehmedê ji boyê Huseyîn Axayî kirîne.
- (5) Lakin Huseyîn Axa guhdarî nedikir û Ehmed qewî zêde mirofekî buce bûyî, Huseyîn Axa ji Ehmedê Feqî neborî û qet guh nedida biran û torinan.
- (6) Mudeyekê weha çûyî, birayêd axayî û torinan fikirîn ku bi van derew û iftira wan, Huseyîn Axa ji Ehmedê Feqî naboritin û telef naketin.
- (7) Îcarê çar jinêd Huseyîn Axayî hebûn, du jê navserî û du jê (**r. 108**) ciwan.
- (8) Evan birayêd axayî û torinan, dadêd xwe birine nik wan herdu jinêd Huseyîn Axayî ku ciwan bûn ku aman çare maye bi we, hûn iftirayekê derheqê vî Ehmedê Feqî bikin û evî bidene telef kirin, Huseyîn Axa bawerî bi xeberêd me naketin, lakin ji xeberêd hewe bawer diketin.
- (9) Îcarê bi çî terzê be ewan herdu jinêd ciwanêd Huseyîn Axayî, şikwa Ehmedê Feqî kirine û her çî ye Huseyîn Axa ewan jinêd wî dayine baweriyê ku belê weha bûye.
- (10) Êdî Huseyîn Axa li Ehmedê Feqî hatiye xezebê û gotiye jinan ez dê xereza we îcra bikim û Ehmedê Feqî bigirim.
- (11) Lakin di konan danê nabitin, em zivistanê biçine qîşlaqê, li wê derê ez wî digrim.
- (12) Wî zemanî Huseyîn Axa zivistanan li deşta Sê'tê 'îmaret hebûye, xanî û menzelêd wê hebûne, li wê derê qîşlaq dibûn.
- (13) Îcarê weko Huseyîn Axa têtin û dikevîne qîşlaqê û li 'îmaretê bi cih dibin, Huseyîn Axa Ehmedê Feqî jî û kurê wî Belo jî înan û herdu jî hepis kirin û xistine zencîrê û malêd wan talan kirin.
- (14) Mudeyekê ew herdu bab û kur di hebsê danê mayîn.
- (15) Lakin her rojê dîsanê birayêd Huseyîn Axa û torinan, ibram û ilhah li Huseyîn Axayî dikirin ku te ji boyê çî Ehmedê Feqî hêlaye û nakuji.
- (16) Xulase şevêkê Huseyîn Axa izin dayê ku herin kewne lasetêd we bibêjine fileyê Mêtir Madoyî, bilanê Ehmedê Feqî bixeniqîne.

(17) Îcarê ew bira û torîn nîvê şevê têne pişta derê pagê û gazî Madoyî dikin û dibêjine fileyî ku axayî emir kiriye ku bilanê niha Ehmedê Feqî bixeniqîne, zû here Ehmedî bixeniqîne, em ê jî ji êre li wî seyr bikin.

(18) Madoyê Mêtir vedigeritin û tête odayê nik Ehmedê Feqî.

(19) Îcarê Ehmed ji Madoyî pirsîyar diketin ku weha bê weqt ew kî ne ku derê pagê diqutin û gazî te dikin.

(20) Mado digirî û dibêje ku Ehmed Axa ez jî nizanim ku çi bela ye, birayêd axayî û torinin hatine pişta derî, dibêjin ku axayî emir kiriye ku bilanê Ehmed Axayî Mado bixeniqîne ez çawanê bikim?

(21) Evê cewabê dibêje Ehmedî û bi xwe digirîtin.

(22) Îcarê Ehmed dibêje kuro Mado, ez dê bimirim tu ji boyê çi digirî?

(23) Di wê şevê danê şêst mirofan zêdetirî di zincîrê da hebûye, yekî ji wan girtiyan navî Zebo bû, neqil dikir ku weko bûye behsa helaka (r. 109) Ehmedê Feqî, em hemû tirsan, di me da can nemabî, lakin Ehmed bi xwe qelûn dikişand qe esla di xemê da nebûyî.

(24) Gote Madoyî ku here ji boyê min cêrekî avê bîne hazir bike û zincîrê ji ûstûyê min biderîne, da ez xeslekê bikim û nimêj bikim.

(25) Îcarê Mado çû cêrê avê îna û zincîr vekirî, Ehmed çû û xusul kirî, hat libasêd xwe berkirîn û gote Mado ku kuro ji boyê min qaweyekê çêke.

(26) Qelûna xwe jî tijî kirî û vexwar û çend şîret li kurê xwe Bêloyî kirîn ku lawê min, guhdarî da û zarokan bibî.

(27) Lakin kurê wî Bêlo û ew hepis hemû digirîn, li wan veso hat ku ji boyê çi hûn digirîn, ne şerm e, elbete bexê nêr ji boyê kêrê ye, xeman nekin.

(28) Îcarê Mado qawe îmand, Ehmedî dû fincan qawe vexwarin û qelunekê dinê jî vexwar.

(29) Lakin ew birayêd axayî û torin jî ji ber derî li Ehmedî seyr dikin.

(30) Îcarê gote Madoyê sîs ku kuro Mado, bi vê qaweyê nebû, ji boyê min qawekê giran çêke û bîne.

- (31) Mado çû mesinkê dinê qawe çêkirî îna Ehmedê Feqî ji wê qaweyê jî du fincan vexwarin.
- (32) Îcarê qelûn dawêşandî, rabûye du reka'et nimêj kirî.
- (33) Gazî kire birayêd axayî û torinan ku gelî axalera kuştina Madoyî huner nîne û camêrî hesêb nabitin, werne hindurê em yeke yeke yekûdu biceribînin.
- (34) Deng ji axalera biderneket.
- (35) Îcarê Ehmed ber bi qible runişt, gote Madoyî were min bixeniqîne.
- (36) Mado dest diricîfî û digiriya.
- (37) Ehmed bi xwe ben avête ûstûyê xwe û serêd benî daye destêd Madoyî go kuro, zû bikêşe, û bi xwe jî digot ku “La îlahe îlallah Mihemmed resûlullah” bi vê terzê can dayê.
- (38) Qet mirin li nik wî xem nebûyî.
- (39) Wê şevê ew xelqê di zincîrê danê sê çarîk jê bizdiyan, du mehan zêde nexweş bûn û Madoyê file jî, eger çî Ehmedê Feqî xeniqand, lakin nîvruhî bûyî, ew jî subeyê bizdiyabû, çuyî û nexweş bûyî, paş hefteyekê ew file jî mir.
- (40) Paş mudeyekî êdî Huseyîn Axayî, kurê Ehmedê Feqî Bêlo jî ji zincîrê bideranî û azad kirî.

Hikayeta Sîh û Yekê

- (1) Neqlî dikin ku berê umera û beglerêd Kurdistanê zêde î'tibar û bawerî bi sêdaqeta tayfa file û re'yan hebûn.
- (2) Her çî ku emrêd malêd wan û dayîn û istandinêd heremêd wan û naw (**r. 110**) malêtî hebû, hemû di destêd filan da bûn.
- (3) Guya carekê î'tibar ji wan dîtibûn, heta ku di Hekariyan danê, di weqtê Mîr Izedîn Şêrî danê, fileyekê wî di heremê da hebûye, navê Kelo û çil salan xulamî û nawmalî kiriye.
- (4) Îcarê wesane diqewime ku xiyanetekî aşkar ji wî fileyî Keloyê nawmalê sadir dibîtin ku êdî ew file labid musteheqê kuştinê dibîtin.
- (5) Mîr Izedîn jî emir diketin ku Keloyî bînin û bikujin.
- (6) Mufreze jî Keloyî digirin û destan girê didin ku bînin bikujin.

- (7) Îcarê Kelo dibêje mufreziyan ku min bibine huzûra Mîr Izedîn, xeberekî min heye da ez ji boyê mîr bibêjim û paşî min biben û qetl biken.
- (8) Îcarê ew mufreze tekraren Keloyî dibine huzûra Mîr Izedîn.
- (9) Îcarê mîr ji Keloyê file pirsiyar diketin, kuro çi dibêjî?
- (10) Îcarê Kelo dibêjîtin ku mîr eseh tu dê min bikujî?
- (11) Mîr dibêjîtin ku tu dê elbete bêyi kuştin çare nîne.
- (12) Îcarê Kelo dibêjîtin ku mîr me'lûmê te bitin ku eve nêzokî çil salan e ku min xizmet dikir û ava xusul û destmêja te min tanî, her çi qederê ku ava xusul û destmêja min ji boyê te îna ye, me'ezellah berê min mîztiye nêva wê avê, ji boyê te paşî îna ye.
- (13) Eve ez dibêjime te her çi xusul û destmêj û nimêjêd ku te heta niha kirîne, ew hemû jî dayîn û dînê te danê betal in, tu evan nimêjêd çil salan qeza bike û qenc bizane ku ez dijminê dînê te bûme, li ku mayî ku dijminê canê te?
- (14) Min xema kuştinê jî nîne, me'lûmê te jî bibitin ku min ev îhaneta çil salan di gel te kiriye, min tu ji heddê mîran rûreş kiriye, ez jî tême qetl kirin xem nîne.
- (15) Îcarê Mîr Izedîn qewî zêde tete xezebê û bi xwe radibitin Keloyî didete ber xençeran û dikujitin.
- (16) Bi xwe jî ji boyê vê xebera hanê ku Kelo wî çil salan wisanê îhanet û xiyamet kiriye, qewî zêde melûl û mehzûn dibitin ku evî fileyi hinde nimêjêd min daye fesadê, ez dê çawanê bikim.
- (17) Îcarê melan gotine Mîr Izedîn ku boyê kefareta vê şûlê mehsus e, medreseyekê bîna bike, dibitin ku Xwedê te'ala te 'efû biketin û gunehêd te bibexşitin.
- (18) Îcarê fî el-waqî'i, ewî Mîr Izedîn xaseten ji boyê vê şûlê medreseyek bîna kiriye û ewqafêd kafî lê weqf kirîne û heta niha jî ew medrese heye, 'Izye dibêjin.
- (19) Heta ku ev şûla neqewimî bûyî, umera û axayêd ekradêd xwecihêd Hekariyan qewî zêde itibar û bawerî bi re'ye û filan hebûn û ew tayîfe (r. 111) ji boyê emîn hesêb dikirin.
- (20) Lakin paşê vê şûlê ku waqî'i bûyî, êdî ew çend itibar fileyan naken û bi wan baweriyê naken.

(21) Lewrranê sulba f'tiqada wan bûyî, êdî xanim û heremêd wan jî bi rû filan nakevin û ji re'yetan xwe sitr dikin.

Hikayeta Sîh û Duyê

(1) Neql dikin ku di weqtekê danê ji paşayêd Bazîdê Ishaq Paşa di gel xanê xwe yê xwecihî, Huseyîn Qulîxan, gelek dostî û aşnayî hebûye.

(2) Pêkve diçûn û dihatin û e'zaz û ikram li yekûdu dikirin, guya weko cism wahid bûyin.

(3) Îcarê Huseyîn Qulîxan ji hekîmêd xwe neferekî ku Mîr 'Elî digotinê, kaxezekê didetê ji boyê Ishaq Paşayî û virêdikete Bazîdê û emirê Mîr 'Elî tebîb diketin ku here li Bazîdê li nik Ishaq Paşayî sakin bibe û di xizmeta wî danê bibe, şayed mi'alice û medawî ji boyê nexweşan îqtîza diketin, muqeyyed bibe.

(4) Îcarê bi emrê Huseyîn Qulîxanî, Mîr 'Elî tête Bazîdê û diçite huzûra Ishaq Paşayî û kaxeza Huseyîn Qulîxan didete Ishaq Paşa û ew jî xweşhal û memnun dibitin.

(5) Odeyekê di nêva sera xwe danê ji boyê Mîr 'Elî hekîm vediketin, qewî e'zaz û îkramê derheqê Mîr 'Elî hekîm dikin.

(6) Mudeyê pênc heyvan Mîr 'Elî li Bazîdê li nik Ishaq Paşayî sakin dibitin.

(7) Bi emr Allah di wê mudeyê danê qeza îqtîza medawa û 'ilacê nabîtin.

(8) Bûye weqtê havînê rojekê Ishaq Paşa di gel şêst heftê siwaran ji etba'êd xwe û Mîr 'Elî jî di gel wan, diçine seyr û geryanê û qederekê digerin, nîvro jî dibitin û germe ji şiddetê diketin, rezekê Ishaq Paşayî nêzokê gundê Zengezorê li bin bajêrê Bazîdê heye û di nêva rezê danê hewz û av heye.

(9) Îcarê Paşa ji german têne wê rezê û li kenarê hewzê peya dibin û hêsayî dibin û qawe vedixwin.

(10) Lakin ji gundê tedarika firawînê dikin û ji boyê paşayê zad û te'aman çê dikin.

(11) Ji gundî tijî amanan dikin û li ser destê filan li ber tavê tînin ji boyê Paşayî.

(12) Weko ew zad tête rezê sofre radixînin, paşa di gel çend mirofan ji wan zadan dixwin.

(13) (r. 112) Mîr 'Eli hekîm jî di gel wan e.

(14) Lakin ew hekîm ji wan zadan naxwetin, paşa di gel çend axalera ku di gel paşayî li sofreyê rûniştine, zadî dixwen û destêd xwe dişon, etba'î ewê sofreyê hildigirin dibine ber tavê datinin.

(15) Datînine ber tavê, ew tava havînê weqtê nîvrojê bi wê şiddeta germê li wan amanêd zadan didetin.

(16) Mîqdarê nîv saetan ew sifre wisanê li ber rojê disekinitin, heta ew xulam xizmet dikin û ava destan dideyn û qawe û qelûnan dideyn, paşê diçin û ew etba'î rûtinin û ewan zadan dixwin.

(17) Zad jî çi ne?

(18) Hê ron û goşt û mast û to û hingivîn.

(19) Eve zadana jî hemû di amanêd sofrê danêne ku bi zûyê jeng lê didetin û dibîte weko jehrê û mirofan carinan ew jeng dikujitin.

(20) Îcarê ew xulam û etba'êd Ishaq Paşayî ewan zadêd ku qederê saetekê li ber germa rojê mayine dixwin.

(21) Meger Mîr 'Eliyê hekîm jî ji bin çavan li wan zadan û li wa etba'an xwarinê bûye.

(22) Mîr 'Elî di dilê xwe danê dibêjîtin ku belê evan xulaman ew zadêd bi jehrê xwerîn di vê germê danê elbet çendek ji wan nexweş dibin û çend jî elbete bêçare telef dibin.

(23) Ew Mîr 'Eliyê hekîm li vê me'mulê ye.

(24) Îcarê paşa û etba'êd wî û Mîr 'Eliyê hekîm radibin siwar dibin û têne bajêrê.

(25) Lakin Mîr 'Elî xwe bi xwe muntezir e ku elbete êvarê û subeyê ji wan etba'êd paşayî ku ew zadêd bi ronê li ber tavê mayî li wê germê danê xwarîn, qa ta çend dê nexweş bibin.

(26) Rojekê û du û sê û heftê Mîr 'Elî çavrê kir ku esla yek ji wan mirof û xulaman nexweş nebûyî, qe ji berê çêtirin.

(27) Êdî Mîr 'Elî diçite nik Ishaq Paşayî û temenna diketin ku qenc e hezreta we izn û destûra bende bidetin ez biçime Îranê.

(28) Paşa dibêjîtin ku Mîr 'Elî tu ji boyê çi hatî, çi dê biçî, çi bûye?

(29) Huseyîn Qulîxan, tu ji boyê me'alicata me virêkiriye, munasib nînin ku tu biçî.

(30) Îcarê Mîr 'Elî dibêjîtin ku paşa, ev mîzac û teb'êd ku min li ekra d û ehaliyêd van kenaran muşahede kirî, tehqîq me'lûmê cenaba we bibîtin ku eger ev mexluqane jehrê jî dest bi dest vexwin, li vane kar û tesîr naketin û evne muhtacê 'ilacê nabin.

(31) Ewê rojê ku ewan etba'i û xulamêd te ew zadêd ronî û goşt ku hinde qeder li ber tavê mayî xwarîn û qet yek ji wan nexweş û telef nebûyî, eve gelekî 'ecêb e.

(32) Eger ev waqî'e li Îranê bibûya, elbet nîvê wan mirofan telef dibûn û nîvê jî di piştî zaf 'ilacan paşî belko xelas dibûn.

(33) Min bi xwe bi (r. 113) çavê xwe evene weha dîtin, ez dizanim ku evene zêde muhkem in û mîzacêd wan jî ne weko mîzacêd mirofêd mayî ne.

(34) Evne bi rastî muhtacê 'ilac û dermanan nabin.

(35) Qenc e ku tu destûra min bideyî.

(36) Îcarê Ishaq Paşa jî destûra hekîmî didetin û qederekê îkram û îhsan diketin, virêdikete Xoyê nik Huseyîn Qulîxanî û mektub dinûsitin ku belê Mîr 'Elî, me destûr dayê bi wê terefê danê hatiye.

(37) Weko Mîr 'Elî digehîte Xoyê û mektuba Huseyîn Qulîxanê didetin, paş xeberdan û pirsîyaran, Huseyîn Qulîxan pirsê diketin ku Mîr 'Elî tu ji boyê çi hatî, min tu virêkirî ku her dayîm di xizmeta paşayî da bibî û bimînî.

(38) Îcarê Mîr 'Elî dibêjîtin ku Xan te ez virêkirime nêva tayfeyekê ku wucûda wan bi xwe derd û bela ne, mirin û kuştin ji wan peyda dibîtin, ew xelqê û 'ibadullahê dikujin û rencîde dikin, bedena wan bi xwe jehrî ye, nexweşî û jehr dê bi jehrê çi biketin, hal û hîkayeta Ishaq Paşayî û ehaliyêd Kurdistanê eve ye û ez pênc mehan di nêva wan danê sakin bûm, esla yek ji wan muhtacê 'ilacê nebûn, û axirê jî min dît ku ewan ew zadêd weko jehrê xwarîn, dîsanê li wucûda wan tesîr nekirin, êdî min zanî ku betal e, ez hatim.

Hikayeta Sîh û Sê

(1) Riwayet dikin, ku me'lûm, 'eşayîrêd Bohtan, zivistanê diçine beriyê û mabeyna Cizîr û Mûsilê û konêd xwe vekirin û zivistanê li wê çolê ji der ve dimînin.

(2) 'Erebêd 'enzeh jî kezalîk ew jî zivistanan di konan danê sakin dibin.

(3) Li wê weqtê malêd ekra d û 'ereban nêzokê yekûdu dibin û carinan dostî di gel yekûdu dikin û be'zen diçine malêd yekûdu tîn.

- (4) Bi vê munasebetê mala axayê Alikan Şerîf Axa û mala axayê tayfa Gergeran ji 'erebêd Xezeyê Şêx Tarim, nêzokê yekûdu bûne û caran ev Şerîf Axa û Şêx pêkve diçin û tîn.
- (5) Rojekê Şerîf Axayê Alikî diçite silaviya Şêx Tarimî, dibînitin ku teyrêkê şahîn di nêva konê danê li ser otraxê ye.
- (6) Îcarê Şerîf Axa pirsîyar diketin ku ev şahîne Şêx Tarim ê hewe ye?
- (7) Şêx Tarim dibêjtin ku belê eve teyrê min e û navê jî Şebîb e û qewî nêçîrwan e.
- (8) Eger Şerîf te divêtin ez bideme te, da ji boyê te kewan şikarî biketin.
- (9) Îcarê (r. 114) Şerîf Axa dibêjtin qewî qenc e, tenbiye mirofêd xwe diketin, teyrî di gel xwe tînin û têne malêd xwe.
- (10) Wê rojê dimînin, dotira rojê Şêx Tarim qewî bîst siwarêd 'ereban ji cîranêd xwe hildigiritin ku werin em biçin kêfîya Şebîbê bipirsîn.
- (11) Siwar dibin û têne mala Şerîf Axayî û peya dibin.
- (12) Rûtînin, kêf kêf Şebîb dibêjin, Şerîf Axa dibêjtin, teyîb.
- (13) Îcarê pez ser jê dîkin û îkram û e'zazê dîkin, xwarin û vexwarin, mesarif.
- (14) Êvarê siwar dibin û Şêx Tarim diçite mala xwe rojekê disekine, dotira rojê dîsanê birekê siwaran hildigiritin û têne mala Şerîf Axayî peya dibin, kêf kêf şebîb dibêjin û rûtînin.
- (15) Dîsanê e'zaz û îkram heta dibite êvarê, Şêx Tarim siwar dibitin û diçite mala xwe.
- (16) Rojekê li mala xwe disekine, dotira rojê dîsanê weha.
- (17) Xulaseyê kelam, êdî paşî nabiritin.
- (18) Şerîf Axa aciz dibitin, rojekê dîsanê dibînitin ku belê şêx dîsanê di gel birekî siwaran ji pêş ve peyda bûyî tîn.
- (19) Şerîf Axa êdî filhal teyrê dixeniqîne û datîne nik xwe.
- (20) Dîsanê Şêx Tarim di gel çend siwarekan tîn û li ber derê konê peya dibin û têne hindurê, selamu 'eleyk.
- (21) Îcarê dîsanê Şêx Tarim dibêjîte Şerîf Axayî kêf kêf, Şebîb.

(22) Îcarê Şerîf Axa laşê Şebîbî davête nik Şêx Tarimî û dibêjîtin ku haza Şebek, ne tu bîyî û ne jî Şebîbê te bibitin, eve çî ye, me ruyê xwe reş kirî, teyrek ji hewe istandî, êdî eve mudeyeke, te em li ber piyê hespan aciz kirin.

(23) Îcarê Şêx Tarim dibêjîtin, ku ne wesan nînin, resema me 'erebanan heye, elbete lazim e êdî mudyekê em bêne serxweşî û mudyekê bêne xêratê.

(24) Elbete lazim e ku ji boyê Şebîbî xêr û xêrat jî hebitin.

(25) Şerîf Axa dibêjîtin ku di riya Xwedê her çî we divêtin em bideyn, êdî ji me vegerin, em aciz bûyin.

Hikayeta Sîh û Çarê

(1) Neql dikin ku di weqtê Şah Îsmâil ku şahê Îranê bû, li Merexayê xanekê 'ecemêd rafizî hebû, navê 'Eskerxan bû û qezayêd Hekariyan jî li sînorê Îranê keleka asê heye, li ser berekî waqî'î bûye.

(2) Lakin qewî muhkem e, kela Dimdimê dibêjin.

(3) Mîrekî kela Dimdimê hebûye navî Xan 'Ebdal bûye.

(4) Lakin qewî zêde lawekî ciwan û sipehî bûye, zêdenavî mîrê Çepilzêrîn digotin.

(5) Ewî (r. 115) xanê rafizî 'Eskerxanî dayîm edawet û dijminî di gel Xan 'Ebdalî û ehaliyêd Dimdimê hebûye.

(6) Dayîm ji yekûdu talan dibirin û mêr dikuştin.

(7) Îcarê ewî 'Eskerxanê rafizî ji etrafêd Meraxayê yanzdeh hezar siwar û peya berhev kirî, bi top û ordu çûye ser Kela Dimdimê, ser Xan 'Ebdal.

(8) Kela Dimdimê daye hesarê û çar kenarê kelê girtî ku êdî ji terefekî esla hatin û çûn tune, di nêva Kela Dimdimê jî mezin û biçûk heft sed mirof hebûne.

(9) Ewan jî dest bi şerê û de'wayê kirîne.

(10) Her rojê Xan 'Ebdal di gel sed mirofan ji kelê biderdikevin û bi 'Eskerxan ra şerê dikin, miqdarek telef dibitin, qederê mayî bi şûve vedigerine kelê, bi vî terzê her rojê şer û de'wayê di gel leşkerê Îranê dikin û guya Xan 'Ebdalî virê kiriye nik paşayê Wanê û ehwalêd muhasera xwe îfade dikin û îmdadê dixwazin.

(11) Roj bi rojê leşkerê 'Eskerxanî têtin û zêde dibitin.

- (12) Lakin mirofêd Xan ‘Ebdalî ku di hesarê dane telef dibin û kêr dibin.
- (13) Xulaseyê-kelam, mîqdarê sê mehan 'elîel-tewalî ‘Eskerxan kela Dimdimê didete hesarê û her rojê top û qunbaran davête kelê û şer û de'wayê dikin û ji mirofêd Xan ‘Ebdal di nêva kelê danê ji heft sed mirofan heftê mirof dimînin.
- (14) Êdî di kelê danê cebxane û azûxe jî kêr bûyî, zêde ew 'eyal û etfal bê çare û perîşan dibin.
- (15) Êdî ji cihekî umîda ehlê kelê namînin û tab û taqeta dijminî jî tênîn.
- (16) Rojekê Xan ‘Ebdal êdî ji naçarî di gel wan mirofêd mayî dikine şewir ku ehwalê me dê çewanê bibitin û em çî tedbîr û çareyê li xwe bikin.
- (17) Ji Romê û Hekarê û ehlê îslaman hinde mudeye ferdekî îmdad û yariyê ji boyê me nehat û me jî heft sed mêr hebûn di vê mudeyê hesarê şehîd û telef bûyî.
- (18) Niha mayine heftê mirof û ji nêva kelê cebxane û azûxe jî xelas bûyî.
- (19) Ev ehl û 'eyal bîrsî dimînin. em dê kusanê biken, hûn çî re'yê û tedbîrê dikin, em re'yê bixwazîn teslîm bibin, weya em kusanê bikin?
- (20) Ew mirofêd şewrê her yek re'yekê dikin, da Xan ‘Ebdalê Gewher Xanim jî di nêva şewrê danê bûye.
- (21) Îcarê Gewher Xanim dibêjîtin ku ne re'yê û teslîmbûn kêr nayê û munasib nîne.
- (22) Lewranê ray û 'ehd û emana qizilbaşan bê'tibar û bê bawerî ne, eger çî sûreta rayê didine we, lakin paşê nabine xweyî xeberêd xwe û dîsanê îhanet û xiyanetê di gel we dikin.
- (23) Ya qenc ew e ko eve sê meh in me **(r. 116)** eve hesar û zehmet û cefa kêşaye û hinde mirofêd me şehîd bûyîne, em jî di gel yekûdu 'ehd û emanê bikin.
- (24) Her çî ku mêr in hûn dergehê kelê vekin û ji kelê biderkevin, ew dê hicûma we bikin û ji me jinan jî her çî qudret hebin, em jî çek û erkanan radibestin û di gel hewe tîyine şerê.
- (25) Her çî keç û bûk in ku qudreta şerî nînin, bilanê ew jî jehrê hazir bikin weko hûn fewt bûyî, bilanê ew jehrê bixwin da bi dest rafîziyan nekevin û bilanê yek jî memûr bibitin, herçî cebxana ku mane berhevê cihekî biketin, weko ew rafîzî tijî nêva kelê dibin,

wî demê bilanê ew memûr agirê bidete wê cebxanê, bi awê em heşr dibin, bilanê rafîzî jî qir bibin.

(26) Êdî her kesek li ser raya Gewher Xanimê qerarê dibin û ewê tertîbê dikin.

(27) Lakin ji xwe qet'i umîd her kesek ji boyê mirinê hazir bûyî.

(28) Roja eynê nêzokê zewalê Xan 'Ebdal di gel heftê nefer xaziyan û bîst û heft nefer jinan derê kelê vedikin, ji yekûdu mezin û biçûk ciwan û pîr jin û mêr xatir dixwezin û du'ayê ji hevûdu dikin, bi qêrîn û zarî ji kelê bi der dikevin.

(29) Her çi keç û bûkêd ciwan jî heyn, jehrê hazir dikin û ji bircan nezerê li wan çûyi û Xan 'Ebdal dikin.

(30) Jina Xan 'Ebdal 'Asme Xanim jî her çi cebxana mayî berhev mexazeya binê derê kelê diketin û ew jî ji bircan difikire, muntezer dimînitin, weko Xan 'Ebdal di gel komekê ji kelê bi derdikevitin, qizilbaş zen dibetin ku ew dê birevin.

(31) Êdî qizilbaş jî deste şîr êrûşê tînine Xan 'Ebdal û xaziyan li binê kelê dikine şer.

(32) Lakin ehlê Dimdimê hindik û rafîzî zaf in û jin û keç jî ji bircan nezer dikin û selewat tînin û zarî û girînê dikin, dengê feryad û fixan û zariya zarok û me'sûman diçite felekan.

(33) Xulaseyê kalam, heta neferek ji wan xaziyan mayî, ceng dikin û hemû jî şehîd dibin.

(34) Lakin ji qizilbaşan jî du çendan û sê çendan mirar dikin.

(35) Weko Xan 'Ebdal û mirof û jinêd biderketî bîltemam şehîd dibin, êdî ew rafîzî jî, êdî mayî hucumê Kela Dimdimê dikin û tijî nêva kelê dibin.

(36) Her çi ku ji keç û bûkan hebûn, zafan jehr vexwarî û 'Asme Xanim jî agirê didete cebxaneyê û yalekî kelê berhewa dibitin, ji Îranî û ji 'eyal û etfalêd ehlê Dimdimê her çi ecel temam bûyî telef û helak bûyin û her çi ji rafîziyan mird nebûyî xelas bûyî.

(37) Ew jin û zarokêd kelê mayî, ji boyê xwe esîr kirin û birin û her çi şayed pîr û **(r. 117)** ixtiyar mabûn ew jî hemû kuştin û şehîd kirin.

(38) Agir dayne kelê jî kele û avahî hemû sotin.

(39) Lewranê ji rafîziyan bê hesêb helak û mird bûbûn.

(40) Êdî ji wê rojê heta niha jî Kela Dimdimê wesane xalîte el-xalîye xerabe dimîne.

(41) Êdî ava nebûyî, eve qisseyaya şerê Kela Dimdimê qewî meşhur û me'rûf e di Kurdistanê danê.

(42) Melayê Bateyî M. H. li vê qiseya mewzûn dastanek însa kiriye, ekserê ekradan wê dastanê di meclîsan danê dixwînin û ji boyê şehîdêd Kela Dimdimê heyf dixwen û digirîn û du'ayê dikin.

Hikayeta Sîh û Pêncê

(1) Neql dikin ku ji qezayêd Bohtan di qeza Berwaran danê gundek heye navê Xesxêr û ekserêd ahalêd wê derê begzade û pisaxa ne û ji wan ranê jî tayfa Adiyar dibêjin, guya ji wê tayfe mayîne.

(2) Ji wan pisaxan mirofêk hebûye navê Mîre Beg, ew Mîre Beg jina wî berê dimiritin.

(3) Kurek ji wê jinê dimînitin, navê Dijwar, heft salî.

(4) Îcarê Mîre Beg diçitin keçekê ji ekradêd Bohtan ji boyê xwe dixwezitin û tînitin û mar diketin.

(5) Mudeyekê di gel yekûdu diborînin, sê çar salan li ser vê diçitin, wesanê diqewimîtin ji boyê şûlekî Mîre Beg ji mîrê Bohtan xufê diketin û ji mala xwe direvîtin diçite Istanbulê û mudeyekê li wê derê bîl-zarûre sakin dibitin.

(6) Di malê da jina wî û kurê wî Dijwar dimînin.

(7) Ewan milk û rez heyin, di gel wan mudarê dikin.

(8) Dijwar jî diwanzdeh sêzdeh salî ye.

(9) Lakin meger vê jinbaba wî ya kurmanc di berê danê, weqtê keçiyê danê elaqe di gel yekî rewend hebûye û hez ji yekûdu kirîne.

(10) Ew mirofê rewend ku elaqe di gel jinbaba Dijwarî heye, carinan tête mala wan û diçitin.

(11) Lakin xîreta Dijwarî qebûl naketin, ji jinbaba xwe dipirsîtin ku eve kî ye, her tête êre û diçitin?

(12) Paşê jinbaba Dijwarî dibêjîtin ku eve birayê min e, lakin Dijwarê jar nizanîtin û ewan ekradan ji berê danê nas naketin ku bi rastî ev mirofê birayê wê jinê ye yan ne.

(13) Berê bawerî diketin ku ev mirofê birayê jinbaba min e.

- (14) Mudeyekê ew mirof carinan tête mala wan û bi şevan dimîne û diçitin.
- (15) Rojekê dîsanê ew mirof tête mala wan, jinbaba Dijwarî (r. 118) dibêjtin kuro here rezê ji boyê xalê xwe tirî werîne.
- (16) Îcarê Dijwar jî biderdikevitin ku biçite rezê ji boyê tirî.
- (17) Kurekî cîranan dibêjtin kuro Dijwar ew kî ye ku her dayîm tête mala we û diçitin, Dijwar dibêjtin ku birayê jinbaba min e, xalê min e.
- (18) Îcarê ew kurê cîranî dibêje Dijwarî ku xwelî li serê te bitin, ew zirbabê te ye û yarê da te ye.
- (19) Weko ew kurê cîranî evî xeberî dibêjite Dijwarî, êdî Dijwar wekî evê pirsê ji wî kurikî seh diketin, didete berê û dibezite wî kurê cîranî.
- (20) Îcarê ew kurik dibêjite Dijwarî ku birader ji boyê çî sil dibî, îşeve tu li wan herdukan bipê.
- (21) Îcarê ew çî mirof e tu dizanî.
- (22) Ev xebere li Dijwarî qewî zêde 'ar têtin.
- (23) Îcarê Dijwar diçitin û qederekê tirî ji rezê tînitin û didete jinbaba xwe û dibêje jinbabê ku xençerê babê min ku di sinduqê dane bide min, îşeve ez dê biçime ber rezê, karwanek li nêzokê rezê hatiye ew rê ne ne ku îşeve ji rezê tirî bidizin.
- (24) Jinbabê jî menê diketin ku Dijwar biçitin û mal ji boyê xalî bibitin.
- (25) Xençerê bidertîne û didete Dijwarî, dibêje kuro sêwiyo lêdan ji destê te têtin.
- (26) Xwelî li serê wan bitin ku tu wan bideyi ber xençeran.
- (27) Îcarê Dijwar dibêjtin dayê eger Xwedê rast tînitin ez lê didim, subeynê tu dibînî.
- (28) Îcarê Dijwar xençerê dikete ber piştî xwe û serêvarî biçite rezê.
- (29) Miqdarekê li rezê disekine û paş bi xef weqtê razanan tête ser kuleka malê û xwe devarûyî bi dizî vedişêre û li ehwalê jinbabê û ewî mirofê ku yarê jinê, difikiritin.
- (30) Dibînitin ku belê cihek bi tenê li koşeyekê malê danîn û çirax vemirandin, herdu jinbab û ew yarê wê ketine nêva cihan, paşîla yekûdu û razan.

(31) Weko Dijwar evane bi vê terzê dibînitin, demek xwe digiritin û ji kuleka pagê dête nêva malê ku evne herdu jî razayne.

(32) Tête ber serêd wan, berê ibitîda xençerê li singê wî mirofî didetin û xençerekê jî filhal bêmecal li jinbabê didetin, xulase êdî qudreta wan ê libatê nabitin.

(33) Xençerekê li wî û yekê li dayê, bi vê terzê herdukan jî tamam diketin.

(34) Îcarê gazî cîranan diketin ku werin ehwalekî weha qewimiye.

(35) Êdî ewan herdu cenazan defn dikin û herkesek tehsîn û aferîn ji boyê Dijwarî diketin.

(36) Heta ev şûla bi guhê mîrê Bohtan ketî, virrêkirî Dijwar biriye huzûra xwe û xelat kirî.

(37) Gote wî ku min babê te beşî ye, ji boyê vê xîret û cesareta te, mexsus mîrê Bohtan mirof virêkirî babê Dijwarî (r. 119) ji Istanbulê înaye û herdu jî kirîne pêşekarêd xwe.

(38) Her çi şûlekê asê hebûya Dijwar di gel babê virêdikirine wê şûlê û pêkve tînan.

(39) Eve qisseyaya ji Dijwarî bi şû ve mayî, bûye dastan di nêva Bohtan danê.

Hikayeta Sîh û Şeşê

(1) Neql dikin ku di zemanê berê danê rewendekî rût û jar û qewî perîşan ji mala xwe biderdikevitin ku ji boyê xwe çare û 'lfacekê biketin.

(2) Ew mirof di Geliyê Kotulê danê têtin û berekî bilind û mezin li kenarê rê heye, digehte wî berî û rehet dibitin.

(3) Li binê wî berî rûtinitin ku demê ji boyê hêsaya bibitin û paşê bi şûla xwe danê biçitin.

(4) Difekire ku ji dûr ve siwarekî pêkhatî bi lîbas û çek têtin.

(5) Weko ew rewend ewî siwarî ji dûr ve dibînitin û dikefte teme'a şelandina wî siwarî.

(6) Lakin rewend rût û bê çek û peya ye.

(7) Îcarê hema filhal paçêd di ber xwe danê bidertîne, tazî û 'uryan, pêxwas û serkol biderdikevite serê wî berî, ber bi qible li ser piyan disekinitin.

(8) Herdu destêd xwe bi jûr ve hildigirtin, guya ev mirofe ji Xwedê te'ala du'a û reca û hêvî diketin.

(9) Weha bi vê terzê li serê wî berî disekinitin.

(10) Ew siwarê rêwî jî digehite binê wî berî û bi jûr ve li serê wî berî dinêre ku mirofêkî rûs û ser pêxwas, li serê berî ber be qible westaye û herdu destêd xwe bi 'esmanan danê hilgirtiye û du'a diketin.

(11) Ew siwarê rêwî 'ecêb dimînitin ku eve çî hîkmet e û eve çî kesek e, însan e, welî ye, cinnî ye?

(12) Ew siwar didete di zengî û li binê berî disekine û li wî rewendê ku li serê berî westaye difikiritin, xwe bi xwe dibêjitin ku ev şûla elbete ji sirrekê xalî nînin, ez dê ji vî mirofî pirs û pirsiyarekê bikim, paşê ji êre diçim.

(13) Dikete gazî ku ey mirof, tu çî kes î û eve çî hal e, ji boyê min bêje.

(14) Ew rewend berê qet cewab nadetin, guya bi du'ayê meşxul e.

(15) Ji vê cewab nedana rewendî tem'a siwarî êdî zêde dibitin ku heye belko eve Hezretî Xizir e, weyaxo weliyekê Xwedê Te'ala ye.

(16) Elbete ez dê vî mirofî ziyaret bikim û ji vî ehwalî xeberdar bibim, paşê biçime şûla xwe.

(17) Ew siwar ji hespê danê peya dibitin û muntezerî rewendî disekinitin.

(18) Paşê demekî guya rewend du'a xwe tamam diketin û destêd (**r. 120**) xwe li ruyê xwe disotin û têne xwarê ser paçêd xwe.

(19) Îcarê ew siwar ji rewendî pirsiyar diketin ku tu bi Xwedêkî, tu çî kes î û eve çî hal e?

(20) Ji boyê min rast bêje.

(21) Îcarê rewend dibêjitin ku ez ji Erek im û eve bera ziyaretgah e û berê mirazan dibêjine vî berî, herçî kesê mirazek hebitin bête êre û destmêjê bigirtin û paşê rûs û tazî, serkol û pêxwas bibitin û biçite serê vî berî û ber bi qibleyê bisekinitin û ji Xwedê Te'ala miraza xwe bixwazitin, elbette du'a wî mirofî diqebile.

(22) Min jî mirazek hebû lew hatime êre û min ji Xwedê Te'ala mirazê dixwest.

(23) Eve ehwalê min û berê û du'ayê.

(24) Îcarê weko ew siware evê xeberê ji wî rewendî seh diketin, ew mirof jî şewqek lê peyda dibitin ku ez jî mirazekê ji Xwedê Te'ala li serê vê berê ziyaretê bixwezim, belku diqebile.

(25) Îcarê ew siwar dibêjite wî rewendî ku tu jî hespê min bigire da ez jî bişelim û biçime serê berê mirazekî ji Xwedê Te'ala ji boyê xwe bixwazim.

(26) Berê rewend dibêje ku ne şûla min heye, ez bi lez im, dê biçim.

(27) Îcarê ew siware zêde lawahiyan li rewendî diketin, rica û hêvî ji boyê kenarê Xwedê hespê min bigire, ez dê zû bême xwarê.

(28) Îcarê rewend dibêjitin ku bilanê wisan bitin, lakin zû were, ku şûla min heye.

(29) Îcarê ew siwar dişeltin û libas û çekêd xwe bîl-temam dispêre rewendî û bi xwe jî rûs û tazî serkul û pêxwas diçite serê berê û dest bi du'ayê diketin.

(30) Weko rewend mayî bi tenê, cilêd wî siwarî hemû berhevkirî û çekêd wî girêdayî li hespê siwar dibitin û libasêd wî jî dadînite ber xwe li wê navê.

(31) Ew mirofê li ser berî difikire ku rewend qesda çûnê ye, dikete gazî lo mirof, tu çi dikî?

(32) Rewend gazî diketin tu du'a xwe terk meke, Xwedê miraza min dayî, eve ez çûme halê xwe danê tu jî du'ayê bike da Xwedê mîrê mirazan e, da miraza te jî bidetin.

(33) Rewend evê xeberê dibêjitin û rikêban li hespê didetin, ya Allah diçite şûla xwe.

(34) Xweyê hespê wesânê rûs û tazî dimînitin û bi jarî têtê mala xwe.

(35) Rewendî ew hesp û çek wesânê birî û çûye şûla xwe.

(36) Êdî ji wî weqtî û zemanî, navê wî berî maye berê mirazan.

(37) Ev qiseya jî di nêva 'alemê danê bûye dastan darb-i mesel.

(38) Weko yek hîleyê li yekî biketin, dibêjitin ku eve jî ehwalê berê mirazan e.

Hikayeta Sîh û Heftê (r. 121)

(1) Riwayet dikin, ji qezayêd Wanê di qeseba Bêgiriye fileyek hebûye, navê Şatir.

(2) Weqtekî derwêşek berê biharê têtê wê qesebeya Bêgiriye û li mala wî Şatirê file dibite mêwan.

- (3) Bi emr Allah, ew derwêş navê jî Sarê Salte bûye, li mala wî Şatirî bêkêf dibitin û mudeyekê medîde nexweş radizêtin.
- (4) Ew Şatir û eger xars û ehlê malê zêde rehm bi halê derwêş tên û qewî qenc muqeyd dibin û xweyîfî li derwêş Sarê Salteyî dikin.
- (5) Paşê du heyvan, derwêş şîfa dibînitin û qenc dibitin.
- (6) Rojekê derwêş dibêjite Şatirî ku îşeve çewalekî û ben û berheste û şemal û betlek evne hazir bike, ez tu dê biçine derekê, te gelek zehmeta min kêşaye.
- (7) Bilanê ji ber wê zehmetê qenciyek bi te ranê bibitin.
- (8) Îcarê ew Şatirê file jî çewal û qewatêd Sarê Salteyî hemû hazir diketin.
- (9) Weko qederekê şevê diboritin, Sarê Salte û bi tedarik ji nêva avahî bi derdikevin û riya saetekê ji Bêgiriye wê danê, di nêva gundê Korzotê û Bêgiriye kelekê xerabe heye, ji kufarê mayî li serê girekî hemû bîna û 'emare têd qedîme ne.
- (10) Îcarê ew derwêş Sarê Salte û Şatirê file, herdu têne nêva wê kela xirabe.
- (11) Îcarê derwêş dibêjite wî Şatirî ku tu dizanî em ji boyê çi hatine êre?
- (12) File dibêjitin ne, tu dizanî.
- (13) Îcarê derwêş dibêje ku di nêva vê kelê danê ji kufarê mayî qedîm defîne heyn.
- (14) Ez dê bixwînim û sihra defîneyê betal bikim û em biçne nêva defîneyê, tu ji boyê xwe qederekî zêran biderîne.
- (15) Lakin esla êdî tu xeber nedeyî.
- (16) Evne qenc li Şatirî tenbiye diketin.
- (17) Derwêş miqdarekê dixwînitin û deng û zelzele di nêva wan bînayêd kevin peyda dibitin.
- (18) Paş mudeyekê bi rastî deriyek zahir dibitin, ew herdu diçine nêva wê xezîneyê.
- (19) Şatir fîndekê hildiketin û waqî'a Şatir dibînitin ku belê cihekî 'eqd û eshê û zêr û dirafêd kevin bi sikeyêd kufarî, terf terf û kom kom berhev kirîne.

(20) Lakin li ser komekê zêran dîsanê ji zêrê tokme, şiklê kewekê danîne û di cihê çawan danê elmas danîne dibiriqitin û mineqar û perêd wê şiklê kewê hemû bi cewahiran merseh kirîne, ji dûr ve weko rojê dibiriqitin.

(21) Derwêş guya destê xwe dirêj diketin û ewê şiklê goyê hildigirtin (**r. 122**) û datînite paşila xwe.

(22) Îcarê derwêş dibêjite Şatirî ku tu jî ji boyê xwe, ji van zêran miqdarê ku hildigirî tijî çewalê xwe bike da em biçin.

(23) Êdî Şatir jî qederê ku qadir dibitin hemil biketin, ji zêran tijî çewalê diketin û ji defneyê biderdikevin.

(24) Dîsanê derwêş dixwînitin û derê defneyê tete girtin.

(25) Îcarê ew herdu ji wê derê birê dikevin û qederekê bi êre danê tên.

(26) Îcarê derwêş Sarê Salte dibêjite Şatirî ku to here mala xwe, ez dê biçime şûla xwe, dibê bixatira te.

(27) Derwêş vediqete, cuda bi kenarekê diçitin.

(28) Weko derwêş ji Şatirî cuda dibitin, şeytan wesweseşê didete Şatirî ku eve çî bû, ewî derwêşî şiklê kewê mucewherê sipehî û zêrê qîmet ji boyê xwe birî û ev zêrane daye min.

(29) Ji boyê çî ez jî şirîk im, welleh ez dê bigehme derwêşî, qet nebitin ez dê bi zorê kewa zêrîn ji derwêş bistînim.

(30) Îcarê Şatir zêran ji piştî xwe datînitin ji şûve xwe digehîne derwêşî.

(31) Weko dengê piyan têtin, derwêş dizivire, dibînitin ku Şatir e li pê wî têtin.

(32) Îcarê derwêş dibêjitin ku Şatir xêr e, çî behs e?

(33) Êdî Şatir dibêjitin, ku rastî ez hatime kewê, min ew zêr nevēne.

(34) Îcarê derwêş dibêjite Şatirî here dîn mebe, ew zêr ji boyê te bes in, biçe şûla xwe, kew ji boyê min lazim bû û guya ez ji Firengistanê ji boyê vê kewê hatibûm.

(35) Lakin wisa bû ku ez nexweş bûyî, mala te mayîm û hinde zêr jî ji boyê te îkram bitin.

(36) Şatir vedigeritin, dîsanê şeytan weswese didetin ku kuro here û bi zorê kewê ji derwêşî bistîne û zêran jî nede wî, bilanê biçite şûla xwe.

- (37) Tekrar Şatir dîsanê vedigeritin û têtê nik derwêş.
- (38) Xulaseyê kelam her çi qeder derwêş şîretan li Şatirî diketin, çare nabitin.
- (39) Derwêş li Şatirî difekire ku merama Şatirî cebr e ku bi zorî kewê ji wî bistînitin.
- (40) Îcarê derwêş dibêjite Şatirî ku were nêzokê, ez dê kewê bideme te.
- (41) Weko Şatir nêzokê derwêş dibitin, tiştêkî didete ber kepuyê Şatirî, filhal bi bêhnê Şatir ji xwe ve diçitin û bê hiş li wê derê dikevitin.
- (42) Derwêş diçite şûla xwe.
- (43) Weko nêzokê subeyê dibitin, hişê Şatirî têtê serî.
- (44) Radibitin ku derwêş tunîne.
- (45) Îcarê têtin ewî çewalê zêran tînite mala xwe û xef diketin.
- (46) Hêdî hêdî milk û emlak û kotan û ker û aşan tedarik diketin.
- (47) **(r. 123)** Îcarê mîrê Bêgiriye se diketin ku elbete evî Şatirî ji cihekî mal bidest ketiye ku hinde emlak û eşya ji boyê xwe peyda kirin.
- (48) Îcarê cîran dibêjine mîrî ku pîlekê derwêşek hatî li mala vî bûye mêwan û mudeyekê nexweş bûyî.
- (49) Paşê şîfa dîtî, ew derwêş napedîd boyî evî Şatirî hinde mal peyda kirî.
- (50) Xulase ji êre da wê da, nimûna zêrêd kevin ji mala Şatirî bi der anîn û Şatir mîr girtî û hepis kirîn.
- (51) Qederekê zêran mîr ji Şatirî istandî, ji hepsê berdayî.
- (52) Îcarê eve xebera di nêva 'ewamê danê şayi' bûyî ku Şatirê Bêgiriye xezîne dîtiye.
- (53) Ev xebere bi guhê paşayê Wanê ketî.
- (54) Îcarê paşayê Wanê virêkirî û Şatir girtî, birîne Wanê.
- (55) Mudeyekî li Wanê hepis kirin û îza dayine Şatirî, keyfîyet weko bûyî îqrar kirî.
- (56) Miqdarekê zêran jî paşayê Wanê ji Şatirî istandî, Şatir ji hepsê bideranî.
- (57) Xulase ew Şatirî êdî kete belayê êre da wê danê, her ji wî distandin.

- (58) Ev qiseye eger çî hindekî ji 'eqlan dûr e, lakin li wan etraf û eknafan meşhur e, gihaye heddê tewatirê.
- (59) Niha jî mala wî Şatirî dîsanê li Bêgiriye heye û qewî me'mûr e.
- (60) Ewladêd wan heyn, xweyî emlak û aş û kotan û kerî.
- (61) Lakin maleka qewî zêde bervekirî ye, hesêbike tekye ye.
- (62) Her çî bête wê malê, file misilman men'i naken, dawerînin û îkram dikin.
- (63) Mala Şatirî ji wî weqtî heta niha jî di nêva ekradan danê meşhûr û me'rûf e.
- (64) Ekserêd ekradan dostî di gel wê malê heyn û pez û hediye ji boyê wê malê diben.
- (65) Iqtiza biketin ku ekrad dijminaniya Bêgiriye biken û talan û diziyê ji Bêgiriye biken, dîsanê nêzokê talan û mala wî Şatirî nabin.
- (66) Dibêjin ku tekye ye û nanê wan çavra dikin.
- (67) Bi vê terzê qisseyêd xezîne û defîneyan di Kurdistanê danê zaf heyn û ekrad zêde bawerî bi bûna defîne û xezîneyan heyn.
- (68) Gelekan jî cezwê kelê rast hatiye, êdî heqîqetê Xwedê dizanî.

Hikayeta Sîh û Heştê

- (1) Riwayet dikin ku di tarîxa hezar û dused û nozdeyê danê, di weqtê xîlafeta Sultan 'Ebdulhemîd Xan danê, ji hakimêd xwecihî Mehmûd Paşa hakimê Bazîdê bûyî.
- (2) Qewî mirofekî xeddar û zorbe bûyî.
- (3) Di weqtê hikumeta wî danê ji firengistanê mirofekî seyyah ji boyê seyr û temaşeya Hind (r. 124) û Îranê hatî, berê biharê gihaye bajêrê Bazîdê ku ji wê derê biboritin û biçite welatêd Îranê.
- (4) Emma di wê zemanê da esla tayîfeyêd efrencan li wan welatan danê peyda nedibûn û kesekî efrencî nedîtibûn.
- (5) Qewî li wan 'ecêb xuya dikirin û 'edaweta li tayfa efrencan li nik wan hebû.
- (6) Îcarê ew firengê hatî navê jî Jubir bûyî û qewî zêde tiştine spehî û nadîde di gel hebûyî.
- (7) Weko seetêd meqbule û sîlahêd du lûle û dûrbînêd spehî.

- (8) Ew Jubir hatiye nik paşayê Bazîdê Mehmûd Paşa û çend rojekan li wê derê bûyî mêwan.
- (9) Lakin weko etba'êd paşayê ewan tiştêd sipehî li nik Jubirî dibînin, dibêjine paşayî.
- (10) Êdî ew jî ji boyê evan tiştêd tuhef dikevite tem'ê û qesda şelandin û kuştin wendakirina Jubirî diketin.
- (11) Guya sûreten çend siwarekan di gel Jubirî datîne ku ewî bi selamet bibeyne welatê Îranê.
- (12) Lakin bi xef dibêji te wan siwaran ku min tenbiye kirîne dê birekî siwarêd ekradan bêne riya hewe û weko ew ekrad tên û peyda dibin, hûn birevin, bilanê ew siwarêd ekradan Jubirî bigirin û bikujin, her çi malêd heyî ji boyê min bînin.
- (13) Îcarê weko Jubir diçite sînorê Îranê û Bazîdê çiyayê Qazî, kullê ew siwarêd ekradan hucumî wan dikin.
- (14) Xulamêd Mehmûd Paşayî bi tehrîk in û direvin, Jubir dimîne.
- (15) Ekrad Jubirî digirin û dişelînin.
- (16) Lakin ecel nehatiye ewî nakujin.
- (17) Îcarê bi şev Jubirî jî di gel tiştêd wî tînine nik Mehmûd Paşayî, bi xef paşa ji wan pirsiyar diketin ku ji boyê çi we eve nekuştin.
- (18) Ekrad dibêjin ku birastî destê me neçûyê, me înaye.
- (19) Êdî Mehmûd Paşa dibêje ku elbete hîkmet heye, êdî ez evî niha nakujim, şûle dibitin ku eve mirofekî mezin bibitin, paşê xundkar lê bipirsitin.
- (20) Îcarê tînitin bi xef Jubirî di kelê danê ji berê kulayê tarî bê derî kulek, zîndanek qedîme hebûye ku derê wê ji serê berê kulek hebûye.
- (21) Jubirî ji wê kulekê davdihêline zîndanê.
- (22) Wê zemanê dizdarê kelê jî mirofekî kal navê Qasim Axa hebûye.
- (23) Paşa tenbîha wî Qasim Axayî diketin ku roj bi rojê nan û ava Jubirî ji kulekê dahêline nik wî.
- (24) Bilanê mudeyekê bi vê terzê bibitin, kanê axirî çewanê dibitin.

- (25) Lakin ev şûla bi xef me'lûmê ehali û kesekî nînin.
- (26) Îlla paşa di gel çend xulam û dizdarî bi vê ehwalê Jubirî dizanin, êdî kes pê weqif nînin.
- (27) (r. 125) Jubir bi vê terzê li wê zîndana wehşetfeza qederê salek mayî, lakin ewî Qasim Axayê dizdar û xatuna wî Rehîme Xatun, evne rehm li halê Jubirî kirî.
- (28) Bi şevan ji zîndanê bider tanîn û tînane nik xwe û eleqet dikirin û zad û te'am didanê û cilêd wî dişuştin û bi her wech bi dizî serê guhê qewî qenc li Jubirî dikirin.
- (29) Dilminayî didane Jubirî ku Xwedê mezin e, tu ji vê zîndanê elbet xelas dibî.
- (30) Zêde eleqet û muhebet bi xef di gel Jubirî dikirin.
- (31) Neql dikin ku ew Jubir jî qewî mirofekî xweyî kemal û sahib derk û dîrayet û ji hemû u'luman xwendî û xeberdar, mirofekî kamil bûye.
- (32) Xulase bi vê terzê salekê tamam Jubir girtî mayî.
- (33) Îcarê di tarîxa bîstê danê webayekî şedîd li Bazîdê peyda bûyî, bi emrê Xwedê Mehmûd Paşa fewt dibitin û birayê wî hebûye Îbrahîm Beg ji qezayêd Bazîdê li qeza Xamurê mîr bûye.
- (34) Ew Îbrahîm Beg têtin û li cihê birayê xwe Mehmûd Paşa dibite paşayê Bazîdê û sakin dibitin.
- (35) Emma ewî Îbrahîm Paşayî hay ji vê mada Jubirî û girtina wî û hepisbûnê nebûye.
- (36) Paşê çend rojekan ku Îbrahîm Paşa dibite waliyê Bazîdê û serî ji qerebalixî hêsayî dibitin, rojekê ew dizdar Qasim Axa tête huzûra Îbrahîm Paşa û bi xef ehwala hepsiyê Jubirî weko bûyî ji boyê Îbrahîm Paşayî neql û beyan diketin ku belê ehwalekî weha di weqtê birayê we Mehmûd Paşayî qewimiye û eve saleke ku ew Jubirê fireng di zîndanê danê girtiye û qewî zêde jar û ze'îf bûye, tu çi emir dikî?
- (37) Ew mirofe jî du'a li dewleta hewe diketin û hêvî diketin, bilanê yan min bikujin weya biderîne û aza bike.
- (38) Fî el-waqî'i, ew Jubir jî eger çi fireng e, lakin mirofekî begzade û qewî zêde kemal û xwendî û meqbul e.
- (39) Emrê hewe ye, lakin ewî aza biken qewî zêde qenc dibitin.

- (40) Êdî emir û hukm ê we ye.
- (41) Weko Îbrahîm Paşa evê ehwala Jubirî seh diketin, zêde te'eccub diketin ku eve şûla mezinan nînin û qewî bêmerwetî ye.
- (42) Fîlhal virê diketin Jubirî ji zîndanê bidertîne û tînite nik xwe û qewî jê 'uzirxwahî diketin ku ez te rica û hêvî dikim ku tu qusura me bibexşînî.
- (43) Eve şûlekî ne munasib û bê terz qewmiye, 'efu biken.
- (44) Her çi pertal û eşyayêd hewe çûyî, defter biken ez dê berhev bikem û destûra hewe bidem û mu'ezzez û mukerrem we bi rê bikeme Îranê.
- (45) (r. 126) Îcarê çend rojekan Îbrahîm Paşa zêde e'zaz û îkramê li Jubirî diketin.
- (46) Her çi ew tiştêd wî yê spehî ku li nik birayê wî Mehmûd Paşayî bûyî û lîbas û hûr murêd Jubirî ku li nik xulam û ekrada bûyî, pêkve berhev kirî û înayî bîltemam teslîmî Jubirî kiriye.
- (47) Bi xwe jî hespekî qenc û qederekê diraf li wî îkram kiriye.
- (48) Ew Jubirî jî ji emwal û eşyayêd xwe hediye qewî meqbûl daye Qasim Axayî û jinê û îkram kiriye.
- (49) Êdî Îbrahîm Paşayî zêde bi îkram û qedir, mirof di gel Jubirî danî û bi selamet virê kirîne Tebrêzê û Jubirî çûye sefera xwe.
- (50) Lakin paşê ewî Jubirî her sal bîst û pênc fîranse wezîfe li wî Qasim Axayê dizdar girê dayî.
- (51) Sal bi sal li Istanbulê virê dikirine nik qonsolêd firenksizê, ewî jî ew diraf ku hezar kuruş dibû virê dikirine Terebzônê û ji wê derê jî didane tucaran û qebzê distandin.
- (52) Tucaran jî virê dikirine Bazîdê teslîmî Qasim Axayê dizdar dikirin, ji zemanê wê qebzenameyê bi muhir distandin û ew qebzename virê dikirine nik Jubirê Firengistanê.
- (53) Heta ku Qasim Axa fewt bûyî, paşê wî kurekî Qasim Axa navê Mehmûd Axa hebû, heta van salan jî ku Jubirî di heyatê danê bûyî, dîsanê bi uslûba qedîme ew hezar kuruş, sal bi salê virê dikirine nik qonsolê Terebzônê û ewî jî ji Terebzônê virê dikirine nik qonsolê Erziromê înglîzan Musyu Birendî.

(54) Ewî musyu Birendî jî ew diraf virê dikire Bazîdê ji boyê kurê Qasim Axayê dizdar Mehmûd Axayî, ji wî sened distandin û virê dikirine Firengistanê ji boyê Jubirî.

(55) Bi xeyr ji vê jî her sê çar salan carekê, qederekê diyarî û cox û eşyane layiqe ji Firrengistanê didaye bazirganan û ji boyê mala Qasim Axayî diyarî virê dikirin.

(56) Bi rastî ew Jubir zêde mirofekî sahib însaniyet û xweyî însaf û merwet bûyî.

(57) Hinde salan ew hiqûq û mirovayî ji bîr nekirî, heta ku xweş bûyî, ew Qasim Axa û kur çavera kiriye û eve bi vê terzê dereca însaf û însaniyeta Jubirî êdî li Kurdistanê bûye derbî mesel, herkes te'eccub diketin ku mirofekî firengî hinde xweyî mirwet û îsanî bibitin, gelek şûl e.

(58) Kesek belko ji ehlê îslaman heta niha ev terze însaf û merwet nekirine.

(59) Ew Jubir jî paş li Firengistanê meşhûr û me'rûf bûyî.

(60) Kitêbêd tirkî û zimanêd dimayî tesnîf kirine, heta van nêzokan jî ew Jubir xweş bûyî.

(61) Lakin niha fewt bûyî.

(62) Eger çi ew jî fewt bûye, îlla ku navê qencî û însaf û merweta wî, hesêb ke anegora xwe wekî (r. 127) navê Nûşirwanê 'adil di nêva Kurdistanê mayî, herkes bi tehsîn û aferîn dikirin ku hinde salan bihitin û hinde qederê welatê wî dûr bibitin û bi xwe jî fireng bibe ji milletê axîre bibitin û derheqê misilmanan bi vê wechê îhsan û îkramê û qencyê biketin.

(63) Bi rastî ku şûlekî 'ecêbe ye û herkesî sed aferîn dikin.

(64) Qisseya Jubirî jî eve renga qewimiye û ekserêd ekradêd Bazîdê pê dizanin.

Hikayeta Sîh û Nehê

(1) Neql dikin di vê tarîxê danê 1235 weko bûye sefera Îranê û Romê, wî weqtî axayê Sîpkan Silêman Axa û axayê tayfa Zîlan Huseyn Axa, ew herdu di gel êlêd xwe li xaka Îranê bûyî, ximeta şahê Îranê dikirin.

(2) Weko nêzokê muharebeyê bûyî, nayîb el-seltenet 'Ebbas Mîrza, Silêman Axayê Sipkî û Huseyîn Axayê Zilî xwestiye nik xwe û her du jî birine huzura dîwanê û ekabîr û xewanende Îranê jî pêkve li huzûra 'Ebbas Mîrza'yî gelek newaziş û rûyê dil û teklîf ji boyê wan axalera û heryekî ji wane du şalêd şemlezê qîmet û şîrêd zêrîn îhsan kirî û gotiye wan ku hûn xulamêd sadîqêd şah in.

- (3) Muhareba me û Romê heye, we dibînim, li wan serhedan muqeyyed bibin û xulamî îcra bikin, elbete hûn ji kerema hezreta şahiyê çirax dibin.
- (4) Îcarê jî xewanendê ji xanêd Rewanê xanê tayfeya ayromiyan Zeman Xanê kurê Qasim Xanî ji hesedî gotiye ‘Ebbas Mîrzayê ku şah im eve çi ye tu hinde rexbet û rî'ayetê di nêva xewanenêd Îranê li van axayêd ekradan jin qehbe dikî.
- (5) Eger çi ‘Ebbas Mîrza ji vî xeberî sil bûye û Zeman Xan teqdîr kiriye.
- (6) Lakin Silêman Axayê Sîpkî ji xîretan nehemilandî, li wê huzûrê gotiye ku Zeman Xan subeyê jin qehbetî kifş dibitin.
- (7) Her çi ye ‘Ebbas Mîrzayî, Zeman ji huzûrê qewirand.
- (8) Êdî tenbîh û tekîd li Silêman Axayî û Huseyîn Axayî kiriye ku we dibînim, hûn di gel êlatêd xwe bar bikin û biçine sînora Romê û muqeyyed û baxeber bin, bilanê casusêd we ji semtê welatê Romê kêmbê û serguhya welatêd sînorêd Îranê bikin.
- (9) Îcarê Silêman Axa û Huseyîn Axa ji huzûra ‘Ebbas Mîrzayî (r. 128) vegeyriyayî bi şûve hatine.
- (10) Lakin Silêman Axayî gote Huseyîn Axayê Zilî, tu çi dibêjî?
- (11) Ez piştî jin qehbetiyê êdî li welatê Îranê nasekinim û belko ez dê vê tolê bi izna Xwedê ji Zeman Xanê Ayromî bistînim.
- (12) Lakin Huseyîn Axa bêxîret bûyî û li Îranê mayî, Silêman Axa filhal di gel heşt sed û neh sed malêd êla Sîpkî bar kirî û çûye Xolê Wanê nik Sert Mehmûd Paşa waliyê wê derê.
- (13) Lakin Huseyîn Axayê Zilî li Îranê mayî.
- (14) Weko şerrê Rom û Îranê li deşta Aleşgirê bûyî, ordiya Romê revî û belav bûyî.
- (15) Îcarê serdarê Rewanê Huseyn Qulî Xan, emrê Zeman Xanê Ayromî kirî, qederê sê hezaran siwarêd 'ecem û ekradan dayê. ew kiriye serok û çadir û tedarik dayê, ji boyê hifza re'ye û gundêd Rewanê ji ekradêd Romê, virê kirîne berekiya welatê.
- (16) Ew jî hatiye ji Qulpê jortirî, li çiyayê ‘Ebbas Gulê, guya ji boyê qeraxolê û li wê derê ordu vedayne.
- (17) Îcarê ev xebere gihaye guhê Silêman Axayê Sîpkî.

- (18) Lewranê ewî dayîm ji boyê heyfa zen qehbetiyê ji Zeman Xanî her guhdar bû, da rojekê derfetê bibîne û ewê tolê ji Zeman Xanî biderîne.
- (19) Weko ewî ev xebere seh kiriye, malêd wane li Keşîşgolê topraxa Wanê bûyî, ji êla xwe heftsed siwarêd bijare berhev kirî, qesda orduya Zeman Xanê Ayromî kirî.
- (20) Du roj û şevan şebxwon kirî, berê subeyê hatî bi ser orduya Zeman Xanî girtî û ji çar kenaran êroş birine orduyê.
- (21) Êdî xelqê orduyê perîşan bûyî, ê ku îmkân bûyî siwar bûyî û revîne û êdî mayî, ê ku hatine kuştin ê ku hatine esîr kirin û Zeman Xan jî girtin û înane nik Silêman Axayê Sîpkî.
- (22) Îcarê Silêman Axa gotiye Zeman Xanî ku çawa ne, niha zen qehbe kî ye?
- (23) Her çend Zeman Xanî eman û dad kirî fayde nekirî, Silêman Axa bi xwe daye şîrî, serê Zeman Xanî jê kiriye û bi xeyr ji wî jî sed ser ji 'eceman jê kirî û qederekî jî esîr kirine û orduya wan jî yexma kirî û ji sê sedî jortir espê extirme istandî.
- (24) Ji wê derê kaxezek ji boyê serdarê Rewanê Huseyn Qulîxanî nûsî û daye esîrekî ji boyê serdarî virê kiriye ku Xan zenqehbetiya camêran weha dibitin.
- (25) Îcarê qenc me'lûmî we bû ku ez 'eşîr im, ne zen qehbe me û bi xwe jî serê Zeman Xanê Ayromî di gel serêd mayî û esîran birî û çûye nik Mehmud Paşayê waliyê Wanê.
- (26) Îcarê Sert Mehmûd Paşa jî qewî zêde ji Silêman Axayê Sîpkî memnûn (**r. 129**) bûyî, tehsîn û aferîn kirî.
- (27) Ji sed Xelatan zêdetirî dayine torin û axalerêd tayfa Sîpkîyan û ew terze şeca'et û xîreta Silêman Axayê Sîpkî niha jî li Kurdistanê tete gotin.
- (28) Ewî Silêman Axayî qewî mehînekî baş hebûye navê Holê.
- (29) Îcarê keçêd tayfa Sîpkan istiran li Silêman Axayê Sîpkî girê dayine ku siwarê Holê bi vê terzê çûye û serê Zeman Xan li 'Ebbas Gulê birî û înaye û hinde namusê kiriye.
- (30) Niha jî ew istiranêd Silêman Axayê Sîpkî, di nêva ekradan tete gotin.
- (31) Kurêd wî jî heyn.
- (32) Lakin qewî jar bûyne li gundêd Aleşgirê yerlo bûyî, hesêb ke di dereceya re'yeyan danê sakin dibin.

Hikayeta Çilî

(1) Neql dikin ku di berê niha, zemanê borî, tayfeyeka leşkerê Romiyan hebûye, siwarê lewend digotin.

(2) Li hemû welatêd Romê ew leşkerêd lewendan hebûn û qewî leşkerekî serbest û bêperwa bûyî û gelek zilm û te'da li gundan û re'ye û feqîran dikirin û zaf caran îta'eta paşayêd welatan nedikirin.

(3) Her bi vê terzê roj bi rojê cebr û zilma wan zêde bûyî, tuxyan û 'isyan dikirin û bixweserî diçûne welatan û dibûne mêwan û diraf distandin û 'îbadullah dişelandin.

(4) Êdî ehlê Romê ji wê tayfa lewendan zêde 'acz bûyî, bi def'at 'erîze dayine xundkarî ku eman dad, evan lewendan em sotine.

(5) Êdî xundkar ew leşkerêd lewendan pêkve fermanlo kirî, bi hemû etrafêd welatêd Romê ferman belav bûyî ku belê emrê padşahî ye, tayfa lewendan hemû mezin û biçûk fermanlo ne.

(6) Îzn û destûr e li kê derê ew tayfa şeqî heyn û peyda dibin, bilanê ewan bigirin û bikujin, her çî hesp û eşyayêd wan jî heyn bilanê ji boyê ehalî û sekeneyêd welatan bibitin.

(7) Êdî li ser vê emrê xundkarî, li tayfa lewendan bûye fermana padşahî.

(8) Li 'Erebistan û Enedolê û Mûsil û Bexdayê dest pê kirine ew tayfa lewendan teref bi teref digirtin û dişelandin û dikuştin, 'eynî weko paşê li tayfa yengeçiryan waqî'e bûyî.

(9) Îcarê ji kenarê Sêwas û Toqat û Amasyeyê qederê du hezar siwarêd (**r. 130**) lewendan pev ketî û serekê hemûyan jî lewendbaş Axasî Hafîz Axa digotin.

(10) Ew jî di gel du hezar siwarêd lewendan ê fermanlo ji welatêd Sêwasê û hem ciwarêd wê xirabî kirin û mirof şelandin û ji gundan diraf distandin û dawerîn.

(11) Bi vê terzê kesekî quweta çûna berayîkê û muqawemetê nebûyî.

(12) Li ku hespêd çê hebûye distandin li ku derê kurekî emrid rind hebûyî direvandin û tînan ji boyê xwe dikirine kole.

(13) Xulase bi vê wechê xirabî û 'isyan, bera xwe dayine terefê Mûsil û Bexdayê û hatin û li kê derê jî li riyan ku dawerîn, dîsan kezalîk hespêd xelqê û kurêd emrid radikêşan û dibirin û diraf ji gundan 'ewayêd distandin.

- (14) Bi vê terzê bê tirs bi kêfa xwe her rojê du sê saet diçûn û li gundan dawerîn û carinan jî otrax dikirin.
- (15) Lewranê êdî ji kesekî tirs û perwa wan nebûyî.
- (16) Evne hatîne û ji Diyarbekirê û Deşta Bişêriyê û Deşta Cizîrê bi vê wechê borîne û daxilê sînore welatê Behdînan bûyî.
- (17) Qezayek Behdînan heye Akrê dibêjin, ekrad in û sê sed çarsed mal dibin û mîrekî wan ê xwecihî jî Mîr Şemdîn navê hebûye.
- (18) Weko lewend axasî Hafîz Axa nêzokê hêşeta Akreyê bûyî, başaxayê lewendan, bi gederê pêncê siwarê ji pêş ve ji boyê qonaxçitiyê virêkirine nik Mîr Şemdîn ku eve du hezar siwarêd lewendan du sê rojan bikî mêwan.
- (19) Paşê em dê biborin û biçine kenarê Mûsilê.
- (20) Weko başaxayê lewendan di gel wan siwaran ji pêş ve hatine nêva hêşeta Akreyê û bûyine mêwanê Mîr Şemdînê, êdî Mîr Şemdîn mulaheze diketin, eger em evne nekeyne mêwan û bikevine hesarê û bidene ber tifengan û asê bibin, dibitin ku evne du hezar siwar in û hinde cih hatine û fermanlo bûyne û ji canêd xwe borîne, paşê li me xalib bibin.
- (21) Ê qenc ew e ku em evne bi zimanê şîrîn û lêb, bêne nêva hêşetê.
- (22) Êdî pirs û pirsîyar nînin, ji xwe evne fermanlo ne, bi terzekî belko em evan lewendêd fermanlo berze û telef bikin, eve mal û çek û eşyayêd wane jî dimînitin ji boyê me.
- (23) Serêd çendekan jî ji axalerêd wan jê dikim û virê dikeme Mûsilê ji boyê waliyê wê derê.
- (24) Eve jî guya xizmetek ji boyê Romê dibitin.
- (25) Xulase çend mirofan ji ixtiyarêd Akreyê gazî nik xwe diketin û evê şêwrê bi xef di gel wan ixtiyaran diketin, xelq e, hin kurt û hin (**r. 131**) dirêj dibêjin.
- (26) Axirê Xanima Mîr Şemdîn ku keça paşayê 'Îmadiyeyê bûyî û navê Melîke Xatûn bû, ew jî li wê şêwrê bûyî.
- (27) Hindekan ji rîspiyêd Akreyê gotin ku belê qenc e, eve şûla.

(28) Lakin eve lewend Axasî Hafîz Axa, qewî camêrekî meşhur e û hinde şer û de'wa dîtine, dibitin ku bi me nexapitin û bawerî bi me neînitin, paşê şûla me zayî' bibitin û em û lewend li hevûdu ba bikevin.

(29) Evne du hezar siwar in, êdî binyata me biderînin.

(30) Êdî Melîke Xanim dibêjîtin, ku ne, şûla hewe ji kuştina Hafîz Axayî nebitin, bila Hafîz Axa li kelê bibite mêwan, kuştina wî li ûstûyê min, ez dê lêpekê li wî bikim û bê zehmet ewî bideme kuştin, hûn netirsîn, hûn tedbîrê li êd mayî biken.

(31) Xulase ehlê Akreyê mezin û biçûk li ser vê şêwrê îtîfaq kirine û subeyê cewab dayine Baş Axayê lewendan ku belê ser seran û ser çawan bilanê Hafîz Axa bêtin, mala wî ye bibite mêwan.

(32) Îcarê çend mirof ji ehlê Akreyê jî di gel Baş Axa diçine berayîka Hafîz Axayî û xelqê hêşet jî ewan siwarêd lewendan di gel Hafîz Axayî li malêd xwe parve dikin û qonaxan hazir dikin.

(33) Lakin Hafîz Axa bi xwe di gel çend etba'ekan, dê li serê kelê li Mîr Şemdînî bibite mêwan.

(34) Xulase weko Hafîz Axa û siwarêd lewendan nêzokê Akreyê dibin, Mîr Şemdîn û e'yanêd hêşetê pêk ve siwar dibin û diçine berayîya Hafîz Axayî û siwarêd lewendan û di gel yekûdu mulaqî dibin û ji hed zêde bi hev ra xwoş û bêş dikin û sureta ji hatina vane guya xoşnûd dibin.

(35) Evne bi e'zaz û bi qedir tînin û her kesek ji lewendan diçin û li qonaxêd dawerin.

(36) Hafîz Axa jî tete serê kelê û dibite mêwanê Mîr Şemdîn û ji heremê şerbet û qawe û kêfpîrsîn û xweşhatin ji boyê Hafîz Axayî virê dikin.

(37) Xanim cewabê virê diketin ku Hafîz ser seran hatine, eve mala wî ye û ew birayê min e, êdî bilanê ji Romê û fermanlo bûyîne esla tu fikaran neketin.

(38) Eve welatê me sînor e û Kurdistan e, hesêb ke hukmê Romê êdî li van kenaran naxebite.

(39) Bilanê rahet bibitin, eve welata pêkve di oxira wî dane.

- (40) Weko Melîke Xanimê bi vê terzê teklîf û dilminayî ji boyê Hafîz Axayî virê kiriye, ewî jî bi temamî hesêb kirî ji Melîke Xanimê û Mîr Şemdîn, qewî zêde memnun û razî bûye.
- (41) Xulase Hafîz Axa û lewend wê şevê li wê derê bûyîne mêwan û hêsayî bûyne.
- (42) Subeyê Melîke Xanim bi xwe hatiye yalê mêran silaviya Hafîz (r. 132) Axayî û yekûdu dîtî û dîsanê ji nû ve Melîke Xanimê zaf teklîf û newazîş li Hafîz Axayî kirine ku eve mala we ye û tu 'eynî birayê min î û hinde rê hatî û rehet bûyî.
- (43) Çend rojekan li êre sakin bibin da heywanêd hewe jî hêsayi bibin, paşê Xwedê selametî bidetin.
- (44) Eger te divêtin keçeke min heye, ez dê bideme te, li nik me bimîne.
- (45) Xulase kelam Hafîz Axayî jî bi van xeberêd Melîke Xanimê bawerî kirî, sê çar rojan li Akreyê sakin bûyin.
- (46) Qerar dayê û cewab ji boyê Bolukbaşêd lewendan virê kirî, tenbiye kirin ku belê ez û Melîke Xanim bûyîne bira û xuh.
- (47) Êdî Melîke Xanim sê çar rojan destûra çûnê nadetin, bilanê axaler û neferat jî çend rojan hêsayi bibin, paşî em dê bi semtê Bexdayê û 'erebêd çolê ve biçin.
- (48) Weko ev xebera Hafîz Axayî gihaye lewendan, ewan qewî ji vê şûlê hez kirin.
- (49) Lewranê evne mudeyek bûyî rehet nebûyîne, fermanlo û ji Romê tirsan û fikar dikirin, êdî guya ji tirsê emîn bûyîn, dê çend rojekan li Akreyê selamet rahet bibin.
- (50) Êdî qerara lewendan bûye mayîn.
- (51) Ê ku cilêd xwe didete şuştin, ê ku çek û sîlahêd xwe dibin û didine ostan durustkirinê û bi xwe jî emîn e, hesyayi li qonaxêd xwe sakin bûyî.
- (52) Rojê carekê weqtê nîvrojê têne serê kelê dîwana Hafîz Axayî û herkesek dîsanê diçite qonaxa xwe.
- (53) Melîke Xanimê û Mîr Şemdîn, bi xeberan û îkraman Hafîz Axa û lewend dayine baweriyê.
- (54) Lakin ji bin dest ew li tedarikê bûyîn.

- (55) Mirof bi xef virê kirine gundêd nêzokê Akreyê ku bilanê filan şevê çek û ratîb girêdayî, nivê şevê bêne nêva hêşeta Akreyê.
- (56) Bi xwe jî tenbiye xulamêd xwe kirine ku şeva çarê saet li sisiyan hûn hemû pêk ve bi çek û sîlah bi xef li serê kelê hazir bibin, bi dizî xeber virê kirine ji boyê xelqê hêşetê ku belê îşeve em dê şûla Hafîz Axayî di gel etba'êd li ser kelê tamam bikin.
- (57) Hûn jî di gel leşkerêd ku ji gundan dê bi şev bêtin, nivê şevê bê deng yeku yeko bi ser qonaxêd lewendan bigirin û bişelin.
- (58) Ê ku dest hildigirin bikujin û êdî mayî hepis bikin, heta sube dibitin.
- (59) Êdî Mîr Şemdîn ev tenbîh li axa û xelqê hêşetê kirine.
- (60) Weko bûye şeva çarê, guya subeyê lewend jî dê biçin, şeva duşembê se'et li sisiyan, Melîke Xanim guya disekine cilan datînite nêva boxçeyekê û hediye ji boyê birakê xwe Hafîz Axayî tînitin û têtê dîwanxaneyê nik Hafîz Axayî.
- (61) Demekî li odeyê rûtinitin û Hafîz Axa (r. 133) qederekê zêran didete xuha xwe Melîke Xanimê û di gel yekûdu xeber didin.
- (62) Mîr Şemdîn ji odeyê biderdikevitin, guya ji boyê destmêjê û bixef tenbiye xulamêd xwe diketin ku weko ez diçime odeyê, hûn derê odeya qawexanê li ser etba'êd Hafîz Axayî girê bidin û hûn pêkve werine nêva dîwanxaneyê.
- (63) Îcarê sê çar xulamêd Mîr Şemdîn di gel mîr bûyîne, dîwanxaneyê ku Hafîz Axa di gel Melîke Xanimê yaranî diketin, xulamêd Mîr Şemdîn guya seccadeyê hildigiritin ku ji boyê Mîr Şemdîn raxistin ku li ser nimêjê biketin, seccadeyê ji jor ve davêne ser Hafîz Axayî û dikevîne ser wî.
- (64) Xulamêd mayî jî sê çar rû dibine ser Hafîz Axayî.
- (65) Êdî mecala Hafîz Axa libatê û rabûnê nabitin.
- (66) Hafîz didine ber xençeran.
- (67) Xulamêd ji derve jî hucûm kirine qawexanê ser etba'êd Hafîz Axayî.
- (68) Êdî ewan jî îmkana dest hilatinê nebûyî, pêkve şelandin û girêdayn.
- (69) Xelqê hêşetê jî bêdeng yeko yeko qonaxêd lewendan basqûn kirî.
- (70) Ê ku dest hilanî kuştin, êd mayî hemû şelandin û dest girê dan.

(71) Êdî subeyê Mîr Şemdîn serê Hafîz Axayî û serêd mirofêd ku hatibûne kuştin jêkirin û di gel hespine wan ê bijare û çê, dayine çend mirofêd xwe û virê kirine ji boyê waliyê Mûsilê.

(72) Ehwalê Hafîz Axayî weko bûyî nivîsî û ew lewendêd ku girtibûn, ew jî azad kirine, her kes rûs û tazî bi kenarekî çûyîne.

(73) Ew qeder mal û sîlah û eşyayêd wan lewendan ji boyê Mîr Şemdîn û ehlê Akreyê mayî.

(74) Lakin eve şûla bicesaret e Melîke Xatûn bûyî meşhur e kirine.

(75) Mîr Şemdîn hinde tedbîr cerg nebûye ji boyê vê cesaretê.

(76) Paş fewta Mîr Şemdîn, mudeyekê mîrîtiya Akreyê bi xweser gihaye destê Melîke Xatunê.

(77) Niha jî ji wê sîlsîleyê dîsanê begzade li Akreyê heyn.

(78) Lakin hikumet gehaye destê Romê, biyanî hakim bûyîne.

(79) Çerxa felekê bi kesekê ra nedomandiye.

KURTEJIYAN

Şerif GÜZEL di tarîxa 01.09.1985an de li navçeya Bismila Diyarbekirê hate dinê. Dibistana seretayî, navîn û ya amadeyî li Bismilê xwend. Di sala 2008an de ji Zanîngeha Yuzuncu Yilê beşa Mamostetiya Agahiyên Civakî qedand. Di sala 2009an de di heman zanîngehê de di beşa Perwerdehiya Dîrokê de dest bi xwendina xwe ya lîsansa bilind kir. Di sala 2013an de li Zanîngeha Bîngolê di Beşa Ziman û Edebiyata Kurdî de lîsansa bilind a bêtez tamam kir. Di heman salê de li Zanîngeha Mûşê di Beşa Ziman û Çanda Kurdî de dest bi lîsansa bilind a bitez kir. Niha li Zanîngeha Bîngolê wek mamosteyê Kurdî dixebite. Zewiciye û zarokekî wî heye.

ÖZGEÇMİŞ

Şerif GÜZEL 01.09.1985 tarihinde Diyarbakır'ın Bismil ilçesinde dünyaya geldi. İlköğretim ve liseyi Bismil'de okudu. 2008 yılında Yüzüncü Yıl Üniversitesi Sosyal Bilgiler Öğretmenliği bölümünden mezun oldu. 2009 yılında aynı üniversitede Tarih Eğitimi alanında yüksek lisansa başladı. 2013 yılında Bingöl Üniversitesi'nde Kürt Dili ve Edebiyatı bölümünde tezsiz yüksek lisansını tamamladı. Aynı yıl Muş Alparslan Üniversitesi'nde Kürt Dili ve Kültürü alanında tezli yüksek lisansa başladı. Halen Bingöl Üniversitesi'nde Kürt Dili ve Edebiyatı Bölümü'nde öğretim görevlisi olarak görev yapmaktadır. Evli ve bir çocuk babasıdır.